



K.T

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYAYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

HUNERÊN EDEBÎ DI DÎWANA HADÎ (SEYDAYÊ LICÎ) DE

Aynur ILI

16711024

Şewirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn- 2019



T.C

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYEDE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

HADİ (SEYDAYÊ LICÎ) DİVANINDA EDEBİ SANATLAR

Aynur İLİ

16711024

Danışman

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin- 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Hunerên Edebî di Dîwana Hadî (Seydayê Licî) de” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin 3 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../...

Aynur ILI

KABUL VE ONAY

Aynur ILI tarafından hazırlanan HUNERÊN EDEBÎ DI DÎWANA HADÎ (SEYDAYÊ LICÎ) DE adındaki çalışma, 05.07.2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak oybirliği oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

Prof. Dr. M. Edip Çağmar (Başkan)



Doç. Dr. Hayrullah Acar



Prof. Dr. Abdurrahma Adak (Danışman)



PÊŞGOTIN

Di edebiyata kurdî ya klasîk de helbest û helbestkar cihekî girîng digirtin. Parastina zimanê kurdî û her weha parastina edebiyata kurdî bi riya helbestvanên klasîk hatiye domandin. Ji ber vê yekê mîsyoneke giran li ser milên wan bûye. Lewra edebiyata kurdî û her weha domandin û parastina zimanê kurdî hinekî jî bi saya wan dihat çêkirin.

Helbestvanê me Mihemed Hadî jî yek ji van nivîskarên xwedî mîsyona giran bûye. Piştî dawîlêhatina mîrektiyên wekî ekoleke dînî- tesewîfî ekola Xalidiyan ew cihê vala dadigirt. Di serdema ekola Xalîdiyan de giraniya edebiyata kurdî ya klasîk li ser milên wan bûye. Lewra bizava Xalîdîtiyê cihê ku ji mîrektiyên vala bûbû dadigirt. Ew valahî jî aliyê edebî, dînî, perwerdeyî, siyasî û civakî bû. Mihemed Hadî di nav ekola Xalidiyan de xwediyê roleke girîng bûye. Wî bi xwe jî gelek xwendekar perwerde kiribûne.

Hizra tesewîf û terîqetê bandoreke mezin li ser helbestên Mihemed Hadî kirine. Ev yek jî di dîwana wî de bi awayekî eşkere tê dîtin. Ji bilî hizra tesewîf û terîqetê tê dîtin ku Mihemed Hadî bi taybetî li pey şopa Mela meşiyaye û hewl daye ku di rengê helbestên wî de helbestên xwe binivîsîne. Ji bilî şopa Mela, rengê Feqî û Xanî jî di nav helbestên wî de xuya dikin.

Mihemed Hadî di helbestên xwe de serî zêde li hunerên edebî daye. Ev yek jî çêj û rengê helbestê diguhere û helbestê rengîntir dike. Tê dîtin ku carna di hundirê misreyekê de çendîn hunerên edebî bi hev re bi kar anîne ku ev yek jî hêza helbestê xurtir dike.

Me xwest ku em di vê xebatê de bi kurtî li ser belaxetê û bi şiklekî berfirehî jî li ser hunerên edebî yên di *Dîwana* Hadî de hatine bikaranîn rawestin. Piştî ravekirina hunerên edebî jî me xwest ku em di tevahiya Dîwanê de hunerên edebî yek bi yek tespît bikin û bi vî awayî jî bigihêjin encamekê. Bi saya tespîtkirina van hunerên mirov dikare bigihêje gelek agahiyên veşartî. Lewra hunerên edebî bi zanista belaxetê re têkildar in û ew jî her yek ji wan, di nav xwe de xwediyê kodên cuda ne. Tespîtkirina van kodan ji bo têgihiştina helbesta helbestvan gelekî girîng e.

Hizir, zanîn, daxwaz, hezkirin û gelek aliyên din yên helbestvan tê deşîfrekirin. Ji ber vê yekê di dîwaneke klasîk de tespîtîkirina hunerên edebî karekî girîng û hesas e.

Di edebiyata kurdî detespîtîkirina hunerên edebî zêde nehatine kirin. Bi taybetî jî di derheqê nivîskarê me Mihemed Hadî û dîwana wî de beriya niha xebateke bi vî rengî tu xebat nehatiye kirin. Ji ber vê yekê jî di dema lêkolînê de me gelek zehmetî kişand. Ji ber van zehmetî û kêmasiyan, me xwest ku vê xebata me yî mutewazî, kêmasiyên di warê hunerên edebî de dagire. Em hêvî dikin ku ev xebata me ya biçûk rê li ber xebatên mezin û kûr veke.

Di pêvajoya amadekirina xebata me de, hem ji bo peydaîkirina mijara min û hem jî di warê peydaîkirina çavkaniyan de gelek alîkariya şêwirmendê min birêz Prof. Dr. Abdurrahman ADAK çê bû. Ji ber keda wî û alîkariya wî ez spasdar im. Her weha di amadekirina teze de, ji bo ku gav bi gav bi hizir û teknîkên xwe bi min re bû, ji ber vê yekê spasdarê birayê xwe Ekrem ILI me. Dîsa ji bo ku di amadekirina teze de her dem bi fikir, motîvasyon û alîkariya xwe bi min re bû, ji hevalê xwe yê hêja Haşim ESEN jî re spas dikim.

Her weha ji bo her mirovî malbat lehengên veşartî ne. Di vê pêvajoya giran de alîkariya herî mezin ya wan e. Ji bo di'a û sebra wan ji diya xwe Ayşe ILI, ji xwişka xwe Hatice ILI, ji birayê xwe Mesut ILI û ji alîkara xwe ya biçûk ji xwarziya xwe Hiranur ILI re spas dikim.

AYNUR ILI

Mêrdîn- 2019

KURTE

HUNERÊN EDEBÎ DI DÎWANA HADÎ (SEYDAYÊ LICÎ) DE

Aynur ILI

Her çiqas di der heqê jiyana Mihemed Hadî de zêde agahî tunebin jî, em dizanin ku nivîskarekî zana, mitesewif û alimekî sedsala 19-20an e û ji devera Liceyê ye. Lewma jî wekî Seydayê Licî tê nasîn. Di nav qeydan de jî hatiye nivîsîn ku Mihemed Hadî çendîn salan li Liceyê muderîsî û muftîî jî kiriye.

Di helbestên wî de em reng û çêja serdema wî, hizra tesewif û terîqetê (bi taybetî jî terîqeta Neqşebendîtiyê ku ew jî endamekî wê bû) û ‘ilmê dînî dibînin. Mihemed Hadî, helbestên xwe bi zimanekî hunerî nivîsandine.

Belaxet, zanista xweş axaftin û xweş îfadekirinê ye. Derketina zanista belaxetê û gihîştina rengê wê yê îroyîn, teqabulî demeke dirêj dike. Sedema derketina vê zanistê di destpêkê de ji bo fêmkirina Qur’ana pîroz bûye lê belê pişt re qada xwe berfirehtir kiriye û ji bo fêmkirin û şîrovekirina berhemên klasîk jî hatiye bikaranîn.

Mijara me “Hunerên Edebî di Dîwana Hadî (Seydayê Licî) de” ye. Ji ber ku bi awayekî berfirehî li ser Hadî û mijara hunerên edebî xebat nehatine kirin, me wê hîlbijart û me tevahiya dîwanê ji aliyê hunerên edebî ve nixand.

Xebata me ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de li ser jiyana û berhemên Hadî hatiye rawestîn. Di beşa duyem de, li ser 44 hunerên edebî yên ku di dîwanê de hatine dîtin yek bi yek hatiye rawestîn. Hunerên edebî bi awayekî berfireh hatine pênasekirin û ji Dîwana Hadî jî ji bo her hunerekê mînakek hatiye dayin û mînak hatiye îzehkirin. Di beşa sêyem de jî dîwan ji destpêkê heta bi dawiyê hatiye nivîsîn û her 43 hunerên edebî hatine destnîşankirin. Di encamê de jî tespîtkirina huneran bi awayekî berawirdî hatine îzehkirin.

Bêjeyên Sereke: Mihemed Hadî, Seydayê Liceyî, Helbest, Hunerên Edebî, Belaxet.

ÖZET

HADÎ (SEYDAYÊ LICÎ) DİVANINDA EDEBÎ SANATLAR

Aynur ILI

Mihemed Hadî'nin hayatı hakkında her ne kadar az bilgiye sahip olursa da bilinmektedir ki 19. ve 20. yüzyılları arasında yaşamış olan bir âlim, şair, mutasavvuf ve aydındır. Muhammed Hadi Licelidir, bu da halk arasında bilinen adı olan Seydayê Licî mahlasından anlaşılmaktadır. Mihemed Hadî'nin Lice'de bir süre müderrislik ve müftülük yaptığı da kayıtlarda bulunmaktadır.

Şiirleri, yaşadığı dönemin fikir ve düşünce yapısı, tasavvuf ve tarikat anlayışı (özellikle kendisinin de üyesi olduğu Nakşibendi tarikatı) ve dini bilgisi hakkında geniş bilgiler vermektedir. Mihemed Hadî düşüncelerini şiirlere aktarırken sanatsal bir dil kullanmaktadır.

Belagât, güzel konuşma ve kendini güzel ifade etme bilimidir. Belâgatın çıkış noktası ve bugünkü halini alması uzun bir sürece tekabül eder. Belâgatın ilk çıktığı dönemdeki amacı Kur'anı Kerimi daha iyi anlamak içindi; ancak daha sonra alanı genişleyerek klasik edebiyat eserlerini yorumlamak ve anlamak için de kullanılmıştır.

Çalışmamızın konusu "Hadî (Seydayê Licî) Divanında Edebi Sanatlar" dır. Daha önce geniş bir şekilde edebi sanatlar konusunda ve Hadî'nin Divanı üzerinde bir çalışma olmadığı için bu konu tercih edilmiştir.

Çalışmamız üç bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde Hadî'nin hayatı ve eserleri üzerinde durulmuştur. İkinci bölümde Hadî'nin Divan'ında geçen 44 edebi sanat üzerinde çalışılmış ve bu sanatlar, teker teker açıklanıp divandan örneklerle yorumlanmıştır. Üçüncü bölümde ise divan baştan sona kadar yazılmış olup edebi sanatlar teker teker tespit edilip yazılmıştır. Sonuç kısmında ise tespit edilen edebi sanatlar karşılaştırmalı bir şekilde izah edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Mihemed Hadî, Seydayê Licî, Şiir, Edebi Sanatlar, Belagât.

ABSTRACT

LİTERARY ARTS IN DİVAN OF HADİ (SEYDAYÊ LICÎ)

Aynur ILI

Although there is no more information about Mihemed Hadî's life, we know that a writer, lecturer and scholar of 19th – 20th centuries and he is from Lice region. That's why he is known as Seydayê Licî. It is also mentioned in the article that Muhammad Hadi has been worked as a lecturer and mufti for several years in Lice.

His poems provide insight into his ideas and structure of ideas, his understanding of Sufism and sect (most especially the Naqshbandi order of which he is a member) and his religious knowledge. Mihemed Hadî wrote his poems with an artistic language.

Rhetoric means science of beautiful speech and beautiful expression. The origin of the rhetoric and its present situation refers to a long process. The purpose of the rhetoric in the first period was to understand the Qur'an better; however, it was also used to understand and interpret classical works of literature by expanding the area.

Our subject “Literary Arts in Divan of Hadi (Seydayê Licî)”. This topic has been preferred since there has not been a broad study of literary arts before and on Mihemed Hadî. The literary arts in the Divan were found and written one by one.

Our study consists of three parts. In the first part, Hadi's life and works are emphasized. In the second part, 44 literary arts in Hadi's Divan were studied and these arts were explained one by one and interpreted with examples from the Divan. In the third part, the divan was written from beginning to end and literary arts were determined and written one by one. In the conclusion part, the literary arts determined are explained in a comparative way.

Key words: Mihemed Hadî, Seydayê Licî, Poetry, Literary Arts, Rhetoric.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	v
KURTE	vii
ÖZET	viii
ABSTRACT	ix
KURTEBÊJE	xiv
DESTPÊK	1
ZANYARIYÊN BINGEHÎN	1
1. METODOLOJÎ	1
1.1. Mijar	1
1.2. Armanc, Girîngî û Sedema Hilbijartina Mijarê.....	2
1.3. Sînor û Çarçoveya Lêkolînê	3
1.4. Rêbaz û Teknîkên Lêkolînê.....	3
1.5. Pirsgirêkên Lêkolînê	4
1.6. Çavkanî.....	5
2. BELAXET	8
2.1. Têgeha Belaxetê	8
2.2. Xebatên ku li ser Belaxetê Hatine Kirin.....	8
2.3. Li gorî Serdeman Xebatên li ser Belaxetê.....	9
2.4. Şaxên Belaxetê	10
2.4.1. Meanî:	11
2.4.2. Beyan:	11
2.4.3. Bedî':	12
2.5. Taybetmendiyên Hunerên Edebî	12
BEŞA YEKEM	13
1. JIYAN Ê BERHEMÊN HADÎ (SEYDAYÊ LICÎ)	13
1.1. Nav û Nasnameya Wî.....	13
1.2. Binemala Wî.....	13

1.3.	Jîn û Serhatiya Wî	16
1.4.	Mirina Wî	17
1.5.	Berhemên Hadî	18
1.6.	Dîwana Hadî	19
1.7.	Serdema ku Hadî lê Jiyaye	20
BEŞA DUYEM		22
2.	RAVEKIRINA HUNERÊN EDEBÎ YÊN DÎWANA HADÎ	22
2.1.	Teşbîh	22
2.1.1.	Teşbîha Belîx	23
2.1.2.	Teşbîha Mufessel	23
2.1.3.	Teşbîha Mucmel	24
2.1.4.	Teşbîha Muekked	24
2.2.	Mecaz	25
2.2.1.	Mecaza ‘Eqlî (Mecaza Isnadî)	25
2.2.3.	Mecaza Ferhengî (Mecaza Zimanî)	26
2.3.	Îsti’are	27
2.3.1.	Îsti’areya Vekirî (Îsti’areya Muserrehe)	27
2.3.2.	Îsti’areya Girtî/ Veşartî	28
2.4.	Mecaza Mursel	29
2.5.	Kinaye	30
2.6.	Muwazene	31
2.7.	Tewşîh	31
2.8.	Tersî’	32
2.9.	Tesmît	32
2.10.	Cînas	33
2.10.1.	Cînasa Tam:	33
2.10.2.	Cînasa Basît	33
2.10.3.	Cînasa Murekeb	34
2.10.2.	Cinasa ne Tam/ Nîvco	34
2.11.	Qelb	35
2.12.	Iştîqaq	35
2.13.	Alîterasyon	36
2.14.	Asonans	37

2.15. Î'ade.....	37
2.16. 'Eks.....	39
2.16.1. 'Eksa Tam	39
2.16.2. 'Eksa Nivco	40
2.17. Teşxîs û Întaq	40
2.18. Husnê Te'lîl.....	42
2.19. Tecahula 'Arif	44
2.20. Mubalexe	45
2.21. Tecrîd	46
2.22. Îstîdrak.....	48
2.23. Nîda	48
2.24. Terdîd	51
2.25. Rucû'	52
2.26. Tekrîr	53
2.27. Tedrîc	54
2.28. Îstîhfam.....	55
2.28. Tezad	56
2.30. Muqabele	57
2.31. Tenasub	58
2.32. Teşabîhu'l Etraf.....	59
2.33. Teraduf / Sînonîm.....	60
2.34. Tarîz	61
2.35. Leff û Neşr	61
2.35.1. Leff û Neşra Muretteb	62
2.35.2. Leff û Neşra Muşewweş.....	62
2.36. Sihra Helal	63
2.37. Nezîre	64
2.38. Tezmîn.....	65
2.39. Îqtibas	68
2.40. Irsala Mesel	69
2.41. Telmîh	69
2.42. Mu'emma	71
2.43. Tarîx	73

2.43.1. Tarîxên Vekirî	74
2.43.2. Tarîxên bi Hesabê Ebcedê.....	74
2.44. Mulemme'	75
BEŞA SÊYEM	77
TESPÎTKIRINA HUNERÊN EDEBÎ YÊN DÎWANA HADÎ	77
ENCAM.....	293
ÇAVKANÎ.....	297



KURTEBÊJE

b. : Bend

Bnr. : Binêrin

ç. : Çavkanî

Dr. : Doktor

Doç : Doçent

h.b : Heman behrem

Hwd. : Her wekî din

m. : Malik

Prof. : Profesör

r. : Rûpel

Weş : Weşanxane

w : Wefat

z. : Zayinî

DESTPÊK

ZANYARIYÊN BINGEHÎN

1. METODOLOJÎ

Di vê beşa metodolojiyê de dê bi awayekî giştî behsa mijar, armanc, girîngîya lêkolînê, sînor û çarçoveya tezê, rê û rêbazên ku hatine bikaranîn, çavkaniyên xebatê û astengiyên li ber nivîsandina xebatê bê kirin. Her weha di vê beşê de dê behsa jiyana Hadî jî bê kirin û bi kurtî dê behsa belaxetê jî were kirin. Li ser belaxetê em ê zêde ranewestin lewra armanca xebata me ne tenê belaxet bi xwe ye. Mijara me hunerên edebî yên *Dîwana* Hadî ye. Belaxet mijar û qadeke pir girîng û berfîreh e ku pêwîst e ji çavkaniyên erebî xebatek bê amadekirin. Lê belê ji ber ku belaxet bingeha hunerên edebî ye, me xwest ku bi kurtî be jî em cih bidin wê jî.

1.1. Mijar

Mijara vê xebatê “Hunerên Edebî di *Dîwana* Hadî de ye. Nivîskarên serdema klasîk ji ber ku di medreseyan de perwerde bûbûn, bi zimanên erebî û farisî baş dizanîbûn û her weha bi zanista belaxetê re jî têkildar bûn. Ji ber vê yekê jî dema em li metnên edebiyata kurdî ya klasîk dinêrin em vê taybetmendiye bi şiklekî eşkere dibînin. Wekî nimûne *Dîwana* Baba Tahirê Uryan, *Dîwana* Melayê Cizîrî, *Dîwana* Feqiyê Teyran, *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî û her weha di nav van nivîskarên mezin de em dikarin *Dîwana* Hadî ku bûye çavkaniya xebata me jî wekî mînak nîşan bidin. Di *Dîwana* Hadî de em bandora nivîskarên serdema klasîk bi awayekî eşkere dibînin. Ji bîlî bandora ku li ser helbestên wî kirine, em ji aliyê bikaranîna hunerên edebî ve jî dibînin ku nivîskarê me şogerekî nivîskarên serdema klasîk e.

Mihemed Hadî an jî bi navê ku di nav gel de tê zanîn Seydayê Licî, di *dîwana* xwe de cih daye gelek hunerên edebî. Bikaranîna hunerên edebî jî qabîliyet û zanabûna nivîskar derdixe pêş. Tespîtkirina van huneran jî xebateke kûr û zêde dixwaze. Bi saya vê tespîtê mirov dikare gelek aliyên nivîskar yên veşartî derbixe.

Lewra carna nivîskar, xwe di pey hin hevokan de vedişêrin û li bende xwîneran dimînin ku xwîner werin wan ji wê derê derbixin.

1.2. Armanc, Girîngî û Sedema Hilbijartina Mijarê

Armanca vê xebatê ew e ku bi riya tespîtîkirina hunerên edebî yên di Dîwana Hadî de, têgihiştina dîwanê zelaltir bibe û bi vê xebatê rê li ber xebatên bi vî rengî vebe. Bi riya tespîtîkirin û nîşandana hunerên edebî em ê nivîskarê xwe û serdema ku tê de jiyaye, ji aliyê edebî û civakî ve baştir nas bikin. Lewra hunerên edebî di nav xwe de gelek kod û şîfreyan dihewînin. Ev kod hem ji aliyê edebî - bi taybetî jî çend hunerên ku zanabûn û qabîliyeteke mezin dixwazin (wekî muwazene, tewşîh, tesmît, tersî, îstî'are, mulemme') û hem jî ji aliyê civakî ve (wekî tarîz, tarîx û mu'emma) gelek peyaman didin xwîneran. Helbet ji bo her xwîner an jî xwendekarên kurdî tespîtîkirina hunerên ne hêsan e. Ev yek jî dibe ku ji aliyê têgihiştinê ve hinek astengiyên derxe holê. Ji bo berterefkirina vê astengiyê me xwest ku em li ser vê xebatê rawestin û hunerên edebî bi awayekî berfireh li ser dîwanekê îzah bikin.

Ji bilî tespîtîkirina hunerên edebî armanca me ya dîtir jî ew e ku Mihemed Hadî bêtir bê naskirin. Di hilbijartina Mihemed Hadî de gelek sedem hebûn ku em wî hilbijêrin. Heta roja îro tu kes li ser wî tu xebat nehatibûn kirin û ev yek jî ji bo edebiyata kurdî ya klasîk kêmasiyeke mezin bû. Lewra ta'm û çêja helbestên wî, hizra wî ya tesewif û terîqetê, hizra olî, bikaranîna hunerên edebî, bikaranîna bêjeyên zimanên din (erebî- farisî), ji bo tercîhkirina me roleke sereke dilîst. Ji ber van xalên girîng me xwest ku em li ser Dîwana Hadî bixebitin.

Sedema hilbijartina mijarê ew e ku Mihemed Hadî, ji bo xebata kurdî qadeke musaid e. Heta niha di edebiyata kurdî de li ser wî ji bilî çapkirina dîwana wî ti xebat nehatine kirin. Lê belê li ser mijara hunerên edebî yên di dîwanên klasîk de çend xebat hatine kirin. Sedemeke dî jî ew e ku di dema xwendina *Dîwana* Mihemed Hadî de bi taybetî hin hunerên edebî bala me kişand û ji ber vê yekê jî me xwest ku em aliyê Mihemed Hadî yê edebî jî derxin meydanê. Lewra ji bo edebiyata kurdî ev kêmasiyeke mezin e ku nivîskarên mîna Hadî heta niha li ser wan xebatên bi vî rengî nehatibe kirin.

Girîngiya vê xebatê jî ew e ku heta niha bi şiklê xebata me di edebiyata kurdî de xebatek nehatiye kirin. Heta niha çend kes di dîwanên klasîk de li ser hunerên edebî rawestiyane lê belê ew jî gelekî kêmtir dimînin. Lewra hem pênasayên hunerên edebî pir kurt hatine dayin ku ev yek jî têgihiştina hunerên kêmtir dike û hem jî bi tenê li ser çend hunerên ku ji aliyê her kesî ve tên zanîn, hatine rawestandin. Ji ber vê kêmasiyê me xwest ku em bi tenê li ser dîwanekê -lê belê bi awayekî berfireh-rawestandin ku ev yek jî ji bo xwendevanên kurdî bibe çavkaniyek.

1.3. Sînor û Çarçoveya Lêkolînê

Ev xebat bi hunerên edebî yên di *Dîwana* Hadî de dê bê sînorkirin. Her çiqas di hemû dîwanên klasîk de hunerên edebî hebin jî me xwest ku em bi tenê li ser dîwanekê rawestandin da ku xebatek kûr û baştir derkeve meydanê.

1.4. Rêbaz û Teknîkên Lêkolînê

Ji bo xebatên akademîk divê rê û rêbazên zanistî werin şopandin. Divê her lêkolîn û xebateke zanistî bi vê hizrê were amadekirin û piştî xwe bide xebatên zanistî. Di her xebateke akademîk de uslûb û hin teknîk û qaîde hene ku divê mirov li gor wan qaîde, teknîk û uslûbê tevbigere. Li gorî pêdivî û pêwistiya mijara xebatê mirov rê û rêbaza xwe hildibijêre û heta dawiya mijarê, mirov li gorî rêzikên wê rêbazê xebata xwe didomîne. Bo nimûne ji aliyê mînakdayinan em ê li gorî sîstemekê bimeşin. Ji bo her hunereke edebî em ê bi tenê mînakekê – bi tenê di 3 hunerên edebî de em ê mecbûr bimînin ku ji mînakekê zêdetir bidin- bidin.

Ji aliyê tesnîfkirina hunerên edebî di gelek pirtûkên edebiyata tirkî de polînkirinên cuda cuda hatine kirin. Di vê xebata xwe de ji bo em cih nedin nîqaş û gengeşiyên em ê bêyî tesnîfkirinekê hunerên edebî bidin û em ê paneseya her hunerê jî bi nimûneyeke ji *Dîwana* Hadî girêbidin.

Dikare were gotin ku hunerên edebî reng û xemla helbestê ne. Bêyî bikaranîna hunerên edebî helbest dê sar û xav bin. Ji aliyê wateyê ve jî helbestkar dê gelekî zahmetiyê bikşînin û dê xwe nikaribin baş îfade bikin. Ji ber vê yekê jî hunerên edebî roleke girîng werdigrin. Lê belê li ser polînkirina hunerên edebî gelek gengeş hene. Di gelek pirtûkên belaxetê de polînkirinên cuda cuda hatine bikaranîn.

Ji bo ku vê gengeşî û aloziyê em berteref bikin me hunerên edebî yên di *Dîwana Hadî* de nexistiye nava kom an jî tesnîfekê. Di beşa sêyem de 43 hunerên edebî yek bi yek hatine pênasekirin û ji *Dîwana Hadî* jî ji bo her hunerekê nimûneyek hatiye dayin û herî dawî jî şîroveya huner û nimûneyê bi hev re hatiye girêdan.

Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de dê behsa jiyana nivîskarê me Hadî û berhemên wî bê kirin. Di beşa duyem de dê pênaseya 44 hunerên edebî bi awayekî berfireh were kirin û ji bo her hunerê jî ji *Dîwana Hadî* nimûneyek dê bê dayin û li ser wê mînakê jî dê şîrove bê kirin. Di beşa sêyem de tevahiya *Dîwana Hadî* dê were nivîsîn û hunerên edebî dê yek bi yek werin destnîşankirin. Lê belê ji ber ku di beşa sêyem de em ê bi şiklekî berfireh îzeha huneran û şîroveya nimûneyan bikin, em ê di beşa sêyem de li ser şîroveya huneran ranewestin.

Di xebata me de hunerên edebî dê neyên senifandin lewra di nav nivîskarên pirtûkên edebiyatê de jî lihevkirinek kamil û dirust hêj çênebûye. Ji ber vê yekê jî em ê hunerên edebî bêyî qaîdeyekê ji yekê heta bi çil û sêyan li pey hev rêz bikin û ligel mînakeke ji *Dîwana Hadî* jî şîrove bikin.

1.5. Pirsgirêkên Lêkolînê

Zahmetî û pirsgirêkên vê xebatê di kurmancî de kêmbûna xebatên li ser hunerên edebî û her weha nebûna xebatên li ser Mihemed Hadî ne. Ji ber ku di edebiyata kurdî ya kurmancî de berhemên serbixwe yên di mijara hunerên edebî nehatine nivîsîn, em ê wekî çavkanî ji pirtûkên tirkî îstîfade bikin. Her weha beriya xebata me tu kes li ser *Dîwana Mihemed Hadî* xebat nekirine û di çavkaniyan de jî mixabin agahiyên di derbareyê wî de pir kêm in. Ev yek jî ji bo naskirina wî tenê riyekê dide ber me. Em ê wî bi riya helbestên wî nas bikin. Kod û şîfreyên di helbestên wî de dê me ronî bikin.

Astengiyeke din ya xebatê jî ew e ku di latînzekirina pirtûkê de xeletiyên pir mezin hatibûn kirin. Mirov dema pirtûkê bi awayekî hûrgilî bide ber çavan hem ji aliyê kiteyan ve hem ji aliyê rastnivîsê ve û hem jî ji aliyê wateyê ve hevokên gelekî xelet hatine çêkirin. Ji ber wan xeletiyên, di peydakirina wateya bêjeyan de em bi astengiyên mezin re rû bû rû diman. Wekî tê zanîn qismek ji hunerên edebî bi wateyê

re t kildar in. L  bel  ger b je k m an j  xelet hatibin lat n zekirin helbet d  ji aliy  peydakirina huner n edeb  ve j  pirsgir k derkevin hol . Di v  xebata xwe de j  em gelek caran bi xeterey n weha re r  bi r  man.

Ji bil  pirsgir k n l kol n  k masiyeke d tir derdikeve hol . Di edebiyata me de ji bo d wan n klas k ferhengeke bi r k   p k n n e. Ev k mas  j  mirov mecb r  ferheng n ziman n din dike. M nak ji ber k masiya ferhengeke kurd  em mecb r man ku li ferhenga Ferit Devellio lu bin rin.

Tesn fkirina huner n edeb  j  ji bo me sedema astengiyek  b . Lewra me ji bo p naseya huner n edeb , ji 5 pirt kan  st fide kir. L  bel  di her pirt k  de tesn fkirinek cuda cuda hatib    kirin. Her niv skarek sedema tesn fkirina xwe bi awayek  xwe ik  fade kirib n   ew  fade bi mantiq j  b n. L  bel  me di v  xebata xwe de nexwest li gor  tesn fa  exsek  herin lewra ev tesn f dikare ji aliy  gelek kes n din ve xelet were d tin   ji xwe armanca me j  ne ev e. Ji ber berterefkirina v  xal  em   huner n xwe ji yek  heta bi  il   s yan yek bi yek r z bikin.

1.6.  avkan 

Di v  xebat  de ji bo be a teor k (belaxet   d rok eya belaxet    p naseya huner n edeb ) em   ji pirt k n edebiyata tirk   st fide bikin. Lewra di edebiyata kurd  ev qad gelek  vala ye   ji bo xebat n n  vekiriye.

Ji bo xebata xwe me wek   avkaniya sereke em   D wana Had  ya ku di 2012an de ji aliy  Tehs n  brah m Dosk  ve hatiye amadekirin   ji N bihar  derketiye esas bigrin.

Di be a b yografiya Had  de ji bo b tir naskirina malbata w  em   ji pirt k n ku behsa d roka kurd  dikin  stifade bikin. L  bel  di war  kesayet   berhem n w  de  avkaniya me ya sereke d  M.  efik Korkusuz (Tezkire-i Me ayih-i Amid)   her weha Tehs n  brah m Dosk  (D wana Had ) ne.

Di derbar  mijara huner n edeb  de, di edebiyat n faris , tirk    ereb  de xebat   gelek tez n l sansa bilind   doktoray  hatine amadekirin. L  bel  di edebiyata kurd 

de hejmara pirtûk û tezên li ser vê mijarê pir kêr in. Yê ku hene û me di amadekirina teza xwe de daye ber çavan jî ev in:

Di sala 2013an de ji aliyê Perwîz Cîhanî, pirtûka bi navê “*Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*” ji weşanxaneya Nûbiharê derketiye. Cîhanî di vê pirtûkê de di destpêkê de bi kurtî behsa 22 hunerên edebî dike û ji Mem û Zînê jî nimûneyan dide.

Di sala 2016an de ji aliyê Hayrullah Acar, “*Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*” hatiye amadekirin û li weşanxaneya Nûbiharê hatiye çapkirin. Di vê dîwanê de jî Acar, beşekê jî ji bo hunerên edebî terxan kiriye. Di vê beşê de Acar li ser 13 hunerên edebî rawestiyaye û ji bo her hunerê jî ji dîwanê çend mînak daye.

Di sala 2017an de li Zanîngeha Muş Alparslanê di beşa edebiyata tirkî de ji aliyê Erkan Akın ve bi navê “*Bikaranîna Hunerên Edebî di Xezelên Melayê Cizîrî de*”, tezeke masterê hatiye amadekirin. Xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de jiyan û kesayeta Mela hatiye nivîsîn. Di beşa duyem de bi şiklekî analîzî li ser hunerên edebî yê di xezelên Mela de hatiye rawestîn. Di beşa dawî de jî li gel hunerên edebî behsa hin bûyerên ku hunerên edebî wan îşaret dikin hatiye kirin.

Di sala 2017an de li zanîngeha Mardin Artukluyê ji aliyê Jegr Najeb Abulrazaq ve tezeke masterê bi navê “*Binyatê Honerî di Destana Zembîlfiroş ya “Feqiyê Teyran û Miradxanê Bazidî” da*” hatiye nivîsîn. Ev tez bi zaravaya soranî hatiye nivîsandin. Tez ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de çîrok bi awayekê berfireh hatiye vegotin. Di beşa duyem de behsa lehengên çîrokê hatiye kirin û di beşa dawî de jî ji aliyê hunerên edebî ve her du Zembîlfiroş hatine berawirdkirin.

Dîsa di sala 2017an de li zanîngeha Van Yüzüncü Yılê ji aliyê Luqîman Awla Resûl ve tezeke masterê hatiye amadekirin. Navê teza wî “*Ciwankariya Peyvan di Helbestên Kurdî yê Salim de*”, ye. Tez ji sê beşan pêk tê. Di her sê beşan de jî bi awayekî giştî li ser hunerên edebî hatiye rawestîn.

Di sala 2018an de jî li zanîngeha Van Yüzüncü Yılê ji aliyê Edip Saydun tezeke masterê bi navê “*Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî di Dîwana Feqiyê Teyran de*” hatiye amadekirin. Ev tez, ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de jiyan û berhemên Feqiyê Teyran cih girtiye. Di beşa duyem de ji aliyê şikil û uslûbê ve *Dîwana Feqî*

hatiye nîrxandin. Di beşa sêyem de jî Saydun cih daye hunerên edebî yên ku Feqî di *Dîwana* xwe de bi kar anîye.

Dîsa di sala 2018an de li zanîngeha Bingölê ji aliyê Şadiman ‘Emer Salih ve tezeke masterê hatiye amadekirin. Navê teza wî “*Ciwankarî le Şi’rî Hawçerxî Kurdî da: Be nimûney Şi’rekanî Goran ‘Ebbas*” e. Ev tez ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de behsa belaxet û dîroka belaxetê dike. Beşa duyem rasterast ji bo hunerên edebî hatiye veqetandin. Yek bi yek pênaseya wan hatiye dayin û ji bo her hunerê jî mînak hatine dayin. Di beşa sêyem de jî dîsa behsa hunerên edebî hatiye kirin lê belê bêhtir li ser beşa bedî’iyê hatiye rawestin.

Di pênasekirina hunerên edebî de ji ber kêmasiya çavkaniyên kurdî em ê berê xwe bidin edebiyata tirkî. Ji bo pênasekirinê, çend berhemên sereke yên ku me ji wan îstîfade kirine ev in: Cem Dilçin, “*Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*”, M. A. Yekta Saraç, “*Klasik Edebiyat Bilgisi: Belagat*”, Vedat Ali Tok, “*Edebi Sanatlar Ansiklopedisi*”, Menemenlizade Mehmet Tahir, “*Osmanlı Edebiyatı- Belagat*”, R. Selçuk Uysal, “*Belagat ve Edebi Sanatlar Lügatı*”.

Di warê pênaseya hunerên edebî de ji bilî pirtûkên tirkî me ji notên dersê yê Abdurrahman Adak jî sûd wergirt. Lê belê ji ber ku nehatine çapkirin me wekî çavkanî nîşan nedan.

Helbet ev xebatên ku hatine kirin ji bo edebiyata kurdî bi qîmet û hêja ne lê belê pêdivî bi xebatên kûr û berfirehtir hene. Ji bo vê jî divê hemû dîwan û mesnewiyên serdema klasîk ji aliyê hunerên edebî ve bînan analîzkirin. Em ê jî bi vê mebestê li ser *Dîwana* Hadî rawestin. Ji ber vê yekê jî, bi vê xebata xwe ya biçûk me xwest ku em aliyekî vala dagirin.

2. BELAXET

2.1. Têgeha Belaxetê

Belaxet di ferhengê de tê wateya gihaştina armançekê. Wateya têgehê jî, vegotina tiştêkî bi awayekî xweş û li gorî wateya wî tiştî ye. Yanî divê xweşkirina bêjeyê li gorî wateya wê ya rast be. Belaxet hem wekî wesfê gotinê û hem jî wekî wesfê kesê ku diaxive tê dîtin (Bolelli, 2000: 26). Bi awayekî berfirehtir jî belaxet wekî hunera xweşaxaftin, xweş nivîsîn û îqnakirina mirovan e. Ji bo belaxetê gelek wateyên dîtir jî tên gotin lê belê pênaseya herî berbelav ev e (Orak, 2013: 17).

Li ser hunera belaxetê ji serdema berê de jî xebatên cur bi cur dihatin kirin. Lê belê li ser hunera belaxetê xebatên du medeniyetan bêhtir derketine pêş. Ev medeniyet jî yewnan û ereb in. ereb û yewnan li ser belaxetê bi awayekî berfireh û bi rêbazeke sîstematîk rawestiyane. Wekî tê dîtin medeniyetên piştî yewnan û ereban ku tevî vê xebatê bûne jî, hizrên wan qebûl kirine û di riya wan de çûne û gelek tişt jî li ser wê zêde kirine (Orak, 2013: 17).

2.2. Xebatên ku li ser Belaxetê Hatine Kirin

Di edebiyata ereban de xebatên li ser belaxetê bi tenqîda edebî dest pê dikin. Di serdema Îslamîyetê de jî hem ji bo î'caza Qur'anê û hem jî ji ber tenqîta edebî xebat bi şeklekî bi lez dimeşyan. Ji ber ku mebest têgihîştina Qur'ana pîroz bû ji gelek aliyan ve gelek kesan (muffesîr û usûlîyan) piştgirî didan van xebatan û ew jî tevî xebata belaxetê dibûn (Orak, 2013: 19).

Bi firehbûna sînorên cîhana Îslamê re xetereya şaşfamkirina Qur'anê jî derket meydanê lewra êdî di nav sînorên 'alema Îslamê de milletên ne ereb jî hebûn. Ji bo ku vê xetereyê ji holê rakin qaîdeyên rêzimana zimanê erebî diviyabû bihatina tespîtkirin. Dema ku ev qaîde dihatin tespîtkirin jî ziman û edebiyat ji hev nehatibû veqetandin û pispor li ser her duyan bi hev re dixebitîn. Lê belê Sîbeveyhî di pirtûka xwe ya bi navê *el-Kîtab* de ji bilî mijarên li ser ziman, behsa mijara meaniyê jî kiriye ku ew jî beşek ji belaxetê ye (Kılıç, TDVİA, 1992: 380). Dîsa di heman serdemê de ji bo ku pirsgerêkên civakî, siyasî û çandî yên di nav sînorên misilmanan de çareser

bikin zanista “kelam”ê bêhtir derket pêş. Geşedanên di nav zanista kelimê bi xwe re geşedaneke di belaxetê de jî pêk anî (Orak, 2013: 19).

Bi kurtî, di serdema Îslamê de belaxet di encama xebatên li ser Qur’anê hatine kirin bûye zanistekê serbixwe. Ev xebat jî; ji bo fêmkirina peyamên di Qur’anê de, fêmkirina rêzimana wê, ‘ilmê tefsîrê û xebatên li ser tenkîta edebî ne (Orak: 2013: 19).

2.3. Li gorî Serdeman Xebatên li ser Belaxetê

Lêkolîner, li gorî çavkaniyan merhaleyên xebatên belaxetê yên edebiyata ereban, bi awayekî kronolojîk bi Qur’ana pîroz didin destpêkirin û li gorî dîrokê jî li gorî rêza jêrîn dabeş dikin (Orak, 2013: 21):

a. Serdema Yekem (Qur’ana Pîroz- Sedsala X.)

Ji nuzula Qur’ana pîroz û heta bi dawiya sedsala X. dewam kiriye. Di vê serdemê de xebatên li ser belaxetê, mijarên li ser ziman û edebiyatê, tefsîr, tenkîta edebî û zanista kelimê bûn. Lê belê armanca sereke fêmkirina Qur’ana pîroz bi awayekî baş û dirust bû. Di destpêkê de qismek ji ereban Qur’an bi awayekî hêsan fêm dikirin lê belê nifşên pêy wan û bi taybetî jî misilmanên ne ereb, ji bo ku Qur’anê baş fêm bikin dest bi hin xebatan kirin. Di encama van xebatan de- ku ew jî digihê heta dawiya sedsala XIan- belaxat bûye wekî zanistekê serbixwe. Tefsîrên ku di vê serdemê de hatine nivîsîn ji bo belaxetê wekî çavkaniyên ewil têne hesêb, lewra zimannas û wêjevanên vê serdemê di heman demê de ‘alimên tefsîrê jî bûn (Kılıç, TDVİA, 1992: 381). Di vê serdemê ji bilî alimên misilman ên ereb, tesîra alimîn misilman ên ne ereb nayê hîskirin (Orak, 2013: 21).

b. Serdema Duyem (Sedsalên X-XIVan)

Belaxetê bi têgehên xwe, di vê serdemê de hêdî hêdî wekî zanistekê mustaqîl cihê xwe girtiye. Di dawiya vê serdemê de belaxetê bi awayekî sistematîk şax vedaye. Şaxên wê jî “meanî”, “beyan” û “bedî” in (Orak, 2013: 21).

Di vê serdemê de berhemên herî hêja berhemên Ebdulqadir el-Curcanî yên bi navê (w.1078) “*Dela’ilu’l-î’caz*”û “*Esraru’l-belaxa*” ne. Lê belê di vê serdemê de

Zemaxşerî (w.1143) gelekî bi nav û deng e û wekî alimê ziman û rêzimanê tê dîtin. Di pirtûka xwe ya bi navê *el-Keşşaf* de wekî esas nêrînên Curcanî girtine û Qur'an ji aliyê belaxetê ve rave kiriye (Orak, 2013: 21).

Kesên wekî Ye'qûb es-Sekkakî (w.1229), Fexrûddîn er-Razî (w. 1209) jî di vê serdemê de berhem nivîsandine. Lê belê berhebên wan li ser bingeha yên beriya wan in û heta berhema Fexrûddîn er-Razî wekî kurteya pirtûka Curcanî hatiye nivîsîn. (Orak, 2013: 21). Ji bilî wan Ebû Hilal el-Eskerî (w.1070-71), Îbn Sînan el-Hafacî, Ebû Tahîr Muhammed b. Heyder el-Bexdadî (w. 1123) jî derbarê belaxetê de berhem nivîsandine (Kılıç, TDVİA, 1992: 382).

c. Serdema Sêyem (Sedsalên XIV-XIXan)

Wekî gelek zanistên din di vê serdemê de, di zanista belaxetê de jî sekinandinek pêk hatiye. Bi ser navê belaxetê di vê serdemê de Xetîb el-Qezwînî li ser berhema Sekkakî ya bi navê "*Miftahu'l-'ulûm*" (li ser beşa sêyem) xebitîye. Qezwînî navê berhema xwe ya ku ji şerh, haşîye û te'lîqa "*Miftahu'l-'ulûm*"ê pêk hatiye kiriye "*Telhîsu'l Miftah*" (Kılıç, TDVİA, 1992: 384).

Êdî di cîhana Îslamê de, pispor şûna berhemên mustaqîl, ji zanistên cuda cuda li te'rîf, tesnîf û nixandinên bi mentiq digeriyan. Ev lêgerîn li gorî zanistê di zanista belaxetê de jî dihate dîtin. Di vê serdemê de di berhemên belaxetê de, tesnîfa meanî, beyan û bedî'ê dîsa wekî serdema duyem dewam kiriye (Kılıç, TDVİA, 1992: 384).

d. Serdema Çarem (dawiya sedsala XIXan û heta bi roja îro)

Di berhemên derbarê belaxetê ên vê serdemê de tê dîtin ku berhem bi du şiklan hatine nivîsîn. Hin nivîskaran bi terza klasîk dewam kirine yanî bi teknîkên klasîk dewam kirine û liigel van yên ku şiklekî modern xistine nav terzönklasîk jî derketine. Ev kesên ku modern û klasîk têkel kirine jî şopînerên edebiyata Rojava bûn (Orak, 2013: 22).

2.4. Şaxên Belaxetê

Belaxet di hundirê xwe de dibe 3 beş. Ev beş jî: Meanî, beyan û bedî' in. Niha jî bi likşekî kurt em ê li ser her sê şaxan rawestin.

2.4.1. Meanî:

Meanî ew e ku, gotin di cî de ye û li gorî rewşa muxatabê gotinê ye. Mînak kesek di şîn û dawetan de axaftina xwe li gorî cihê ku lê ye hildibijêre. ‘İlmê meaniyê jî li ser van gotinên di cî de radiweste. Her weha gotin, navê hevokê yê taybet e û meanî jî di heman hevokê de ji bo ragihandina herî baş were îfadekirin bêjeyên herî baş hildibijêre. Di nîveka duyem ya sedsala bîstem de ji bo zanista meaniyê “semantik” hatiye gotin lê belê ji ber ku gelek aliyên meaniyê jî hene, semantik hinekî ji bo wê navlêkirinê kêr dimîne (Durmuş, TDVİA, 2003: 204).

2.4.2. Beyan:

‘İlma beyanê behsa hunerên; teşbîh, îsti’are, mecaz, kinaye û hwd dike û li ser wan radiweste (Bolelli, 2000: 33).

Beyan di ferhengê de tê wateya derxistina meydanê, vekirîbûn, eşkerebûn, ravekirin û vekirîkirin e. Ji aliyê wateya têgehî ve: beyan ew zaniste ku li ser vegotina wateyekê bi bêje û usûlên cuda radiweste. Beyan, yek ji şaxên zanista belaxetê ye. Vekirîbûna îfadeyan li gorî cureya ku dê were bikaranîn tê guhertin. Yanî îfade li gorî heqîqet, teşbîh, mecaz, îsti’are û kinayeyê tê guhertin. Hunera beyanê jî, ji van huneran kîjan hîn xweşiktir e li ser wê radiweste (Bolelli, 2000: 33).

‘İlmê beyanê li wateya heqîqî ya bêjeyekê nagere û pê eleqedar nabe. Lê belê ji bo ku wateya mecazî were fêmkirin ewil divê wateya heqîqî were fêmkirin. Ji ber vê yekê heqîqet jî mijareke beyanê ye. Mînak dema peyva “şêr” were gotin û qesta wan jî ajal be wê demê ew bêje di wateya xwe ya heqîqî de hatiye bikaranîn û ti kes li vekirîbûn an jî girtîbûna bêjeyê napirse. Li belê li gorî ‘ilmê beyanê heman bêje dikare di çendîn wateyên din de jî were bikaranîn (Hacımuftuoğlu, TDVİA, 1992: 22).¹

Avakerê vî ‘ilmî Ebû ‘Ubeyde Ma’mer b. el-Musenna et-Temennî ye (w.825). Piştî wî bi rêzê ev ‘alim li ser vî ‘ilmî xebitîne: el-Cahiz (w.869), Îbnu’l Mu’tez (w.909), Qudame b. Ce’fer (w.948) û Ebû Hilal el-Eskerî (w.1009); îbn Reşîk el-Kayrewanî (w. 1064) û Ebdulqadir el-Curcanî (1078-79) (Bolelli, 2000: 33).

¹Ji bo agahiyên berfirehtir bnr: Hacımuftuoğlu, TDVİA, 1992: 22-23

2.4.3. Bedî’:

Wateya bedî’ê ya ferhengê, ji bo mûcîdekî/ê ku îcadeke bêhempa afirandibe, tê gotin. Di Qur’ana pîroz de jî, ji bo vê afirandina bêemsal weha tê gotin: “Ew afirînerê bêhempa, erd û esman afirandiye” (Beqere 2/ 117). Wekî meala vê ayete jî bedî’ê wateyê îfade dike. Wekî têgeheke edebî jî bedî’, lêkolîneke li ser bêjeyên ku di hundirê wan de gelek hunerên edebî hebin, ji aliyê lefzê ve bêqusûr bin û ji aliyê wateyê ve jî maqûl û di heman demê de xwediyê ahengekê bin. (Müftüoğlu, İslam Ansiklopedisi, 1992: 320).

2.5. Taybetmendiyên Hunerên Edebî

Di edebiyata me de edebiyata kurdî ya klasîk, xwediyê cihekî girîng û taybet e. Her weha belaxet û bikaranîna belaxetê di berhemên edebî de gelekî zêde ne. Bi saya deşîfrekirin û tespîtîkirina hunerên edebî, mirov dikare peyam û hizra nivîskar baştir fêmkiribe. Ev fêmkirin jî ji bo ronîkirin û zelalkirina serdema klasîk gelekî girîng e. Lewra em dizanin ku berhemên klasîk tev bi riya hunerên edebî hatine xemilandin. Ev xemilandin carna ji bo sansurkirinê û carna jî ji bo xweşîkiya nivîsînê bûn. Lewra wekî tê zanîn belaxet, vegotina tiştekî bi awayekî xweş û li gorî wateya wî tiştî ye. Yanî divê xweşkirina bêjeyê li gorî wateya wê ya rast be. Belaxet hem wekî wesfê gotinê û hem jî wekî wesfê kesê ku diaxive tê dîtin (Bolelli, 2000: 26)

Tespîtîkirina hunerên edebî yan jî bi awayekî berfirehtir belaxet, di destpêkê de, ji ber xetereya şaş fêmkirina Qur’ana pîroz derketiye meydana lewra piştî qebûlkirina dînê Îslamê, sînorên xaka misilmanan jî fihtir bû û êdî nîfşên nû ji peyam û zimanê Qur’anê baş fêmkirin. Di demên ewil de bi tenê ji bo fêmkirina Qur’ana pîroz hatiye bi kar anîn lê belê piştî re li gorî şert û mercan belaxet bi şiklekî berfirehtir hatiye bikaranîn.

BEŞA YEKEM

1. JIYAN Ê BERHEMÊN HADÎ (SEYDAYÊ LICÎ)

1.1. Nav û Nasnameya Wî

Navê wî Mihemed Hadî ye. Kurê Şêx Sibxetullahê kurê Resûl Paşayê Rewandizî ye. Malbata wî teqrîben du sedsal berê ji gundê Ziyareta qezeya Erbilê ya bajarê Mûsila Kurdistana Iraqê hatine Liceyê (Korkusuz, 1997: 157).

Şêx Sibxetullah li Liceyê zewicîye û di heman demê de ji ber ku ew jî ‘alimeke mezin bûye ji aliyê gel ve dihate naskirin. Ji zewaca Şêx Sibxetullah 2 keç û kurek wî çêbûye. Navên wan: Mihemed Hadî (Seydayê Licî), Emîne û Rehîme bûne. (Korkusuz, 1997: 157).

Di *Dîwana* Hadî de tê dîtin ku Mihemed Hadî di helbestên xwe de du mexles bi kar tîne. Yek Hadî û ya din jî Muhammed e. Lê belê Hadî ji bilî helbestekê di temama helbestên xwe de mexlesa Hadî bi kar aniye.

1.2. Binemala Wî

Mela Mihemedê Liceyî, neviyê Resûl Paşayê mîrê dawî yê mîrnişîna Soran e ku paytexta wê Rewandiz bûye (Doskî, 2012: 14). Ji bo navê mîrekiyê di pirtûka *Kurdistana Tarihi* de Ethem Xemgîn weha dibêje: “Ji ber ku sînga xwe di kevirên sor, yên ku li derdora ku lê dijiyan zêde bûn didan, navê seng/sûhrî ku tê wateya sor li wan hatibû kirin û bi demê re jî ew nav wekî Sohran hatiye veguherîn (Xemgîn, 2004: 290).” Lê belê agahiyên di pirtûka Mihemed Emîn Zekî Beg de, yên der barê navê mîrekiyê de bêhtir maqul xuya ne. Li gorî Mihemed Emîn Zekî Beg, Îsa kurê Kewlos yê mezin bû û ji aliyê xweşsohetî, comerdî û mêraniyê ve deng dabûye. Xelk dema diketin tengasiyekê Îsa dikirin mezinê xwe. Carekê dîsa bûyerek diqewime û Îsa û hevalên xwe li ser hinek kevirên sor ên li hemberî Kela Awanê şer dikin û çavên kesên ku keleyê diparêzin ditirsînin. Piştî vê bûyerê xelkên keleyê navê wan dikin “Kevirê Sor” (Soreberdî). Pişt re jî nesla Mîr Îsa bi navê Soran deng dide (Zekî Beg, 2002: 536).

Binemala mîrên Soran yek ji binemalên kevn ên kurdan e. Bi sedan salan mîrîtî li deverê kirine, yekemîn kesê ku ji vê binemalê hatiye nasîn zilamekî bi navê “Kilos” bûye û eşkere ye ku “Kilos” nasnavê wî bû lê belê navê wî yê rastî nehatiye zanîn (Doskî, 2012: 14). Ji bo nav an jî nasnavê “Kilos” çendîn nêrîn hene. Di *Şerefnameyê* de li ser vê meseleyê weha tê gotin: “*Eslê fermanrewayên Sohran, digihîje mirovekî ji zarokê giregirên erebên bedewî yên Bexdayê yê navê wî Kelos bû*” (Bedlîsî, 2012:365). Her weha di pirtûka *Dîroka Kurd û Kurdistanê* de jî Mihemed Emîn Zekî Beg weha dibêje: “Dr. French dibêje, ev navê Kewlos ne navekî ereban e, divê kurdî be. Lewra li gor vî navê han, kesekî ku diranê wî yê pêşiyê ketibe û paşa jî be jê re Kewlos/kel tê gotin. Her çaw be jî, nêrîna Dr. French mantiqîtir e” (Zekî Beg, 2002: 536).

Destpêka hukumdariya vê binemalê, digihêje nêzî sedsala duwazdê zayinî û şeşê mişextîyê. Dema dewleta Osmanî, di nivê yekê sedsala nozdehê zayinî de dawî li vê hukumdariyê aniye ev mîrîtî nêzî heft sed salan jiyaye. Paytexta hukumdariya vê binemalê jî ji çend cihan hatiye guherandin. Ew cih jî cihên wekî: Hewdiyan, Diwîn, Erbîl, Şeqlawe, Herîr, Xilêfan û dawiyê jî Rewandiz. (Doskî, 2012: 14).

Di vê mîrekiyê de mîrê herî navdar Mîr Mihemmedê kurê Mistefa Begê ye. Bi nasnavê “Mîrê Kore” hatiye nasîn. “Mihemmed Beg, pîştî wefata bavê xwe, her du mamên xwe bi girtin dan û ew îdam kirin. Hêdî hêdî dest bi mezinkirina mîrekiya xwe kir. Eşîreta Sîlwanî (Şîrwanî) û Biradostî bi Surçiyên re kir bin hukmê xwe. Mîrekiya Babe ji Herîrê derxist, Bajarê Hewlêrê zebt kir û Eşîreta Dizeyî da sekinandin. Altinkoprî, Koye û Raniyeyê jî dagir kir û Zêya Koye di navbera xwe û Baban de kir sînor”(Zekî Beg, 2002: 540). “Bi kurtî Mihemmed Paşa (Paşayê Kor) di demeke kurt de gelek welat dagir kirin. Ji Ranyeyê bigir heta Deşta Pîşderê û heta bê bigihîja Nisêbînê, Mêrdînê û ji Keleşîrê bigir heta bê bigihîje Mexmerê kir bin hukmê xwe (Zekî Beg, 2002: 540-541).”

“Bi vî awayî bi ser ket û nifûz û mezintiya Mihemmed Paşa, Dewleta Osmanî xiste tengiyê. Sultan Mehmûd, sedir’ezem Mustefa Reşîd Paşa bi leşkerekî giran ve şand ser û Elî Riza Paşa yê Bexdayê û Mehmûd Paşayê Mûsilê jî ji bo alîkariya wî memur kirin. Dema ku Mîr Mihemmed Paşa bi vê hesiya, kêşa Rewandizê û xwe ji

bo berevaniyê amade kir. Leşkerên sedir'ezem, piştî zebtkirina Behdînan berê xwe dan Rewandizê (Zekî Beg, 2002: 540-541).”Elî Riza Paşa û leşkerên Mûsilê jî berê xwe dan ser. Gelek ji nav eskerên sedir'ezem û ‘Elî Riza Paşa Kurd bûn. Her du komên leşkeran baregeha xwe li Deşta Diyala û Herîrê danîn (Zekî Beg, 2002: 541). “Mîr Mihemmed Paşa jî Geliyê ‘Elî Begê girt. Sedir'ezem pê re pêwendî danî û bala wî ji bo xwînrijandina misilmanan û li hemberderketina xelîfe kêşand. Li ser vê, Mihemmed Paşa teslîmî Mustafa Reşîd Paşa bû, ew birin Stenbolê û efû kirin û vegeheriya. Lê li ser pêşniya ‘Elî Riza Paşayê Bexdayê, di sala 1253yê koçî (1837ê z) de li Trabzonê girtin û kuştin” (Zekî Beg, 2002: 540-541).²

Dema Mîr Mihemmed ber bi Stenbolê ve birin, Mîr Mihemmed li şûna xwe birayê xwe Ehmed Beg danîbû, lewra ew kordunde bû. Dema Mîr Mihemmed nezîvirî, ew li şûna wî bû mîrê Rewandizê. Piştî du salan Ehmed Beg jî bi destê pismamên xwe hatiye kuştin. Lewma birayê wî yê din Silêman Beg li şûna wî bû mîr. Ji ber ku Silêman Beg mirovekî lawaz bû, birayê wî Resûl Beg ji Amêdiyê vegeheriya Rewandizê. Li şûna Silêman Beg ew bû mîr û Resûl Paşa wekî mîrê dawîn yê vê mîrektiyê tê jimartin (Dokî, 2012: 16).

Resûl Paşa jî wekî birayê xwe Mîr Mihemmed mirovekî bi hîmnet bû û hewl daye ku mîrata bav û kalên xwe vegeherîne. Lê belê ev hewldana Resûl Paşa ne bi dilê dewleta Osmanî bû. “Piştî bûye mîr bi heft salên durist, di sala din de biryar daye ku vergîya salane nede dewletê. Lewma waliyê Bexdayê yê Osmanî Necîb Paşa êrîşeke dijwar biriye ser mîrnişîniya wî û piştî çend şerên giran leşkerên Soran şikestine, mîrê wan Resûl Paşa jî neçar bûye bireve û ber bi Kurdistana Îranê ve biçê. Bi vî awayî pênc salan li bajarê Şîno akincî bû. Paşî dewletê bi şertekê efûya wî da ku li deverên ereban, li Iraqê akincî bibe” (Dokî, 2012: 16).

“Resûl Paşa, pişt re li ser ricaya Îranê hatiye efûkirin û çûye Bexdayê, ji aliyê hikûmetê ve meaş jê re hatiye girêdan. Pişt re çûye şerê Qirimê û li Erziromê bûye fermandarê eşîretan û bi hêza alîkarvan re di sala 1858ê zayînî de çûye Bexdayê. Piştî sefera Hîcazê û Stenbolê ew kîrîne muteserrifê Wanê û sê sal paşê çûye

² Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. Zekî Beg, h.b, r. 540-541-542.

Erziromê û li wira bicîh bûye û di sala 1883yan de li Erziromê wefat kiriye” (Zekî Beg, 2002: 542).³

Resûl Paşa di saxiya xwe de li gelek deverên cuda cuda jiyabû ji ber wê jî piştî wefata wî de ji malbata wî gelek kes li bakurê Kurdistanê mabûn. Yek ji van jî bavê Seydayê Licî, Mela Mihemmed Sibxetullah e. Lê belê balkêşiyek heye ku di jêderên ku behsa Resûl Paşa dikin de behsa pênc kurên wî dikin û navên wan jî: Es’ed, Fetah, Reşîd, Baram û Îhsan in. Di jêderan de behsa navê Sibxetullah nayê kirin. Ev jî bi xwe re du ihtimalan tînin. Yek, Sibxetullah di jêderan de yan hatiye jibîrkin. Ya duyan jî Sibxetullah, ne kurê Resûl Paşa ye, neviyê wî ye. Lê belê ew her çawa be jî tiştêkî mîsoger heye ku li gorî xelkên devera Liceyê, Seydayê Licî ji binemala Resûl Paşa ye û ji ber vê yekê jî xelkê ji Mele Mihemed Hadî re bi zaravaya deverê digotin: Melayê Sorî, yan jî Melayê Soranî (Doskî, 2012: 17).

1.3. Jîn û Serhatiya Wî

Mihemed Hadî di mîladî 1852an de li taxa Mollayê ya Liceyê hatiye dinyayê. Hadî perwerdeya ewil ji bavê xwe dîtiye û ji bilî wê li çendîn medreseyan jî ders wergirtiye. Di navbera salên 1880-1886an de li Ruşdiyeya Liceyê mamostetî kiriye. Xwendekarên wekî Mele Mistefayê Sîsî, Hecî Fettahê Hezroyî û Mele Hisênê Farqînî perwerde kiriye ku ev yek jî ji bo zanabûna wî delîleke mezin e. Di mîladî 1891ê de ji Mele Xelîlzade Fethullahê Sêrtî îcazeta xwe werdigire (Korkusuz, 1997: 158).

Di sala 1909an bûye muderrîsê Liceyê. Mihemed Hadî bi ilmê tesewifê jî girêdayî bû, ji ber vê yekê jî di sala 1909an de ji Şêx Ebdulqadirê Hezanî îcazet wergirtiye û kevneşopiya hizra tesewifa Xalidiyan li Liceyê domandiye (Kubat, 2017: 159).

Mihemed Hadî bi taybetî di nehwa, mantiq, isti’are, ‘arûz û fiqha Şafiî de zana bû. Hetta tê gotin ku berhema Ibn Hacer ya bi navê Tuhfe ji ber kiribû. Hadî, dersên fikihê jiberkî dida xwendekarên xwe (Korkusuz, 1997: 158).

³ Di derbareyê wefata wî de hevgerînek nîn e lewra ji bo dîroka wefata wî Tehsîn Îbrahîm Doskî dibêje ku di sala 1881a zayinî de wefat kiriye.

Mihemen Hadî di tesewifê de bi xelifeyê Şêx Ebdurrehmanê Taxî, Şêx Ebdulqadirê Hezanî ve girêdayî bû û ew hî xelfetîya xwe ji Şêx Ebdulqadirê Hezanî wergirtibûye. Piştî ku Hadî dibe xelife, şêxê wî dixwaze ku biçê Siweregê û li wira îrşadê bike. Lê belê ji ber ku du medrese û gelek jî xwendekarên wî li Licê hebûn Hadî vê daxwazê qebûl nake û li cihê xwe dimîne (Korkusuz, 1997: 158).

Hadî du caran zewicîye. Jina wî ya ewil Hafsete ye û çar kurên wê çêdibin. Navên wan; Cemîl, Mihemed, Beşîr û Abdulsamed e. Piştî wefata jina wî ya ewil careke din zewicîye. Navê jina wî ya duyem jî Rabîe ye û ji wê jî du keçên wî çêdibin. Navê wan Amber û Samîye ne. Nêviyên Mihemed Hadî hêj jî li Liceyê jiyana xwe didomînin (Korkusuz, 1997: 158).

Mihemed Hadî di zanînen şer'î û di fiqhê de pêşketî bûye û îcazeta 'ilmê jî sitendiye lê belê ne diyar e ku îcazeta xwe ji kê wergirtiye. Her çiqas ew di helbestên xwe de mexlesa xwe wekî Hadî û Muhammed nivîsîbe jî, di nav xelkê de wekî Seyda tê nasîn (Doskî, 2012: 18).

Mihemed Hadî ji dîwana wî jî eşkere dibe ku murîdekî terîqeta Neqşibendî bûye û ji helbestên wî jî diyar dibe ku aliyê hizrê ve gelekî di bin tesîra şêxê xwe Şêxê Hezanî de maye. Di dîwana xwe de, di gelek helbestên xwe de behsa wî kiriye. Li gorî zimanên ku di dîwana wî de derbas dibin tê fêmkirin ku Mihemed Hadî bi zimanê-erebî, farisî û tirkî jî dizanîbûye. Ew yek jî zanabûna wî destnîşan dike.

1.4. Mirina Wî

Seyda Mele Mihemed Hadiyê Liceyî di sala 1330 mişextî, 13.01.1912ê zayinî de li Liceyê çûye ber dilovaniya Xwedê. Mezelê Hadî li Liceyê ye û di goristana Begên Liceyê de ye (Korkusuz, 1997: 158).

Piştî wefata Hadî ji zarokên wî re wekî mal ev mane:

1. Xêniyek di ebata 400 zira'î de
2. 2 seccade
3. Hawanek
4. Satilek

5. Oberîyek (merşên ku dişibin kulavan)
6. 3 palos
7. Kulavek
8. 4 merş
9. 2 teşt
10. 3 beroşên piçûk
11. 3 beroşên mezin
12. 4 sênî
13. 2 tawe
14. Safokek (parzûnk)
15. 3 doşek

Fiyetê wan jî bi tevahî dikir 2630 qurûşê wê demê (Korkusuz, 1997: 159). Ev agahiya biçûk gelek aliyên Hadî derdixe pêş. Ger Hadî kesek ji malê dinyê hezkirî baya dê xwedî mal û milk baya. Lê belê ji vê hûrgiliyê jî tê fêmkirin ku ew dem û qabîliyeta xwe di riya zanîn û ‘ilmê de serf kiriye.

Mirina wî tesîreke mezin li ser şagirdên wî kiriye. Şagirdê wî Mela Ruşdî Efendî li ser Mihemed Hadî yek jê bi erebî û yek jî bi kurdî du helbest nivîsandine. Di hundirê helbesta xwe ya erebî de bi hesabê ebcêdê dîroka nivîsîna helbesta xwe dibêje ku ew jî muqabilî sala mişextî 1320î dike (Dokî, 2012: 20).

1.5. Berhemên Hadî

Neviyê Mihemed Hadî, Mela Mihemed Cemîl Seyda dibêje ku bapîrê wî gelek nivîs û berhem di mijarên dînî de nivîsandibû lê belê piştî serhildana Şêx Seîd di sala 1925an de şikest, leşkerên tirkan girtin ser deverê û ew nivîsana sohtin. Her weha dibêje ku bi tenê du berhem ji berhemên wî parastî man, ew jî ev in: Kitêbeke biçûk di derbareyê ilmê tecwîdê de ye û ew jî bi kurdî ye û ya din jî Dîwana wî ye (Dokî, 2012: 21). Berhema Hadî ya Tecwîdê berhemeke menzûn e û hatiye çapkirin. Di heman demê de Hadî di zanista astronomiyê de jî zana bû lê belê li ser vê qadê ti berhemên wî li ber destan nîn in (Korkusuz, 1997: 158).

1.6. Dîwana Hadî

Dîwana Mihemed Hadî yek ji dîwanên edebiyata kurdî ya klasîk e. Ji dîwana Mihemed Hadî bi awayekî eşkere diyar dibe ku di bin bandora helbestkarên klasîk yê beriya xwe de maye. Ji van helbestkaran jî herî zêde di bin bandora Mela de maye ku em vê yekê ji nezîreyên wî yê li ser helbestên Mela nivîsine fêhm dikin. Ji bilî Mela şopên helbestkarên klasîk yê wekî Feqî û Xanî jî di helbestên wî de tên dîtin.

Dîwana Mihemed Hadî ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de mulemme'ek heye ku zimanên mulemme'a wî ji kurmancî, farisî, erebî û tirkî pêk tê. Ji bilî mulemme'ê di dîwana wî de helbestên cur bi cur jî hene. Di beşa yekem de helbestkar gelekî pesnê terîqeta Neqşebendî û şêxê xwe daye. Di gelek helbestan de mirov rastî navê Şêx Ebdulqadirê Hezanî tê. Di beşa duyem ya dîwanê de gelek zezel, qesîde û helbestên edebî hene. Naveroka van helbestan dîsa wekî beşa yekem terîqeta Neqşebendî, Şêxê Hezanî, dîn û tesewif e.

Di hundirê helbestên *Dîwana* Hadî de, gelek hunerên edebî bi awayekî serkeftî hatine bikaranîn ku ev yek jî aliyê wî yî edebî û zana derdixe pêş. Di beşa sêyem de jî li ser çend helbestên Mela nezîre nivîsandine. Nezîreyên ku nivîsandine dema ku tên xwendin, tê dîtin ku ji aliyê edebî ve gelekî serkeftî ne. Ji bilî nezîreyan di beşa sêyem de li ser wefata şêxê xwe helbestek nivîsiye. Çar helbestên erebî û helbesteke tirkî jî di beşa sêyem de heye.

Mihemed Hadî di helbestên xwe de ji bo xwe du mexles bikaraniye. Ew jî: Muhammed û Hadî ne. Lê belê ji nav van her du helbestan bêtir mexlesa Hadî tercîh kiriye.

Dîwana Hadî, di sala 1987an de bi destê Mela Ehmedê kurê Mela Ehmedê Cewzî yê Mexnîsanî hatiye nivîsîn û bi rengê wênekirinê li Diyarbekirê hatiye belavkirin (Doskî, 2012: 22). Piştî vê jî ev dîwan ji weşanxaneyê Nûbiharê jî derketiye.

1.7. Serdema ku Hadî lê Jiyaye

Terîqeta Neqşîbendîtiyê navê xwe ji Bahaeddînê Neqşîbendê Buxarayî, yê di sedsala 14an de jiyaye wergirtiye. Di Asyaya navîn de bi taybetî jî piştî Bahaeddînê Neqşîbend bêtir bi hêz bûn û bêtir belav bûne (Gevevî, 2017: 39).

Di erdnîgariya kurdan de derketina bizava Neqşîbendîtiyê teqabulî sedsala 16an dike. Di vê derdemê wekî komên biçûk li Stenbol û derdora Stenbolê û li erdnîgariya kurdan falîyetên xwe didomandin. Mînak tê gotin ku alimên mezin yê kurdan (Mela û Xanî) jî şopgerên vê terîqetê bûne. Di sedsalên 17 û 18an de ji bilî şaxeke Neqşîbendîyan hemû şaxên vê terîqetê hebûna xwe ji dest dane û ji holê rabûnê. Di destpêka sedsala 19an de bi awayekî berfireh vê terîqetê ji aliyê Mewlana Xalidê Şarezorî (m. 1827) ve belav bûye. Ji ber ku Mewlana Xalid gelekî baş teblîx dikir, şêxê Qadiriyan Şêx Ebdulqadirê Nehrî jî tevliyî terîqeta Neqşîbendîtiyê bûye (Tenik, 2015: 88).

“Mîrektiyên kurdan, ku piştî dawîlêhatina dewleta Ebasiyan û hukûmeyên kurdan di sedsalên 13. û 14. de li deverên cuda ên Kurdistanê hatibûn damezirandin, teqrîbî piştî 700 salî, di nîveka sedsala 19em de ji aliyê Osmaniyan ve ji holê hatin rakirin. Di serdema mîrektiyan de kurd xwediyê statuyeye siyasî bûn. Lê belê dema dawî li mîrektiyan hat ev statû ji holê rabû û statuyeye nû nehat bidestxistin (Adak, 2017: 61)”

Piştî dawîlêhatina serdema mîrektiyan kurd ji gelek liyan ve ketine van valahiye mezin. Lewra mîrektî ji bilî aliyên siyasî, aliyên civakî, edebî û dînî jî dadigirtin.

“Di vê qonaxê de di nav civaka kurdan de bizaveke dînî- tesewîfî belav dibe ku ev bizav vê valahiyê dadigire. Ev bizav jî “Neqşîbendîtiya Xalidî” ye. Xalidîti bi taybetîbi riya tekyayên Tewîle/ Beyara, Basret, Nehrî û Palo wek tevnekê li seranserê Kurdistanê belav dibe û li her deverê Kurdistanê nûnerên (xelîfeyên) ku bi van şaxan ve girêdayî derdikevin meydanê. dema ku dawî li mîrektiyên kurdan hat, ev bizav ji xwe li Kurdistanê belav bûbû. Lê belê dawîlêhatina mîrektiyan û aloziyên civakî pêşiya wê bêtir vekir û ji bo belavbûneke zêdetir û bidestxistina

hêzeke mezintir şert û mercên guncav çêbûn. Xalidîtî, bi riya van tekyayan ji nîveka yekem a sedsala 19em heta bi dawîlêhatina Dewleta Osmanî (1826- 1923) li Kurdistanê desthilatdariyeke dînî, perwerdeyî, ciwakî û siyasî bi dest xistiye (Adak, 2017: 61)."

Di vê rewşê de bi awayekî xwezayî vê rewşê tesîr li edebiyata kurdî jî kiriye. Edebiyata kurdî ya klasîk bi saya nûner û şêxên vê terîqetê hebûna xwe domandiyê. Dema dîwan û herweha berhemên vê dewrê werin analîzkirin dê bê dîtîna ku ji gelek aliyên ve wekî dewama serdema mîrektîyan in. Ji aliyê hizra tesewifê, ji aliyê bikaranîna sembola û metaforan, ji aliyê bikaranîna arûzê ve gelekî nêzî hev in. Ji bilî şibandinê jî helbestvanên wê serdemê, helbestvanên beriya xwe (bi piranî Mela, Feqî, Xanî) ji xwe re mînak digirtin.

Di helbestên *Dîwana* Hadî de em rastî ew xalên li jor tevan tînin. Hadî di *Dîwana* xwe de behsa rewşa civaka xwe jî kiriye. Heta di çend helbestan de bi hesabê ebcêdê dîroka bûyerên ku ji bo civaka kurdan girîng jî daye û herweha behsa êş û pîrsgirêkên wê serdemê jî kiriye. Dîsa di dîwanê de eşkere dibe ku Hadî mitesewifeke serdema xwe ye. Lewra gelek helbestê wî li gorî hizra tesewifê hatine nivîsîn.

BEŞA DUYEM

2. RAVEKIRINA HUNERÊN EDEBÎ YÊN DÎWANA HADÎ

2.1. Teşbîh

Teşbîh bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê şibandin û lêkçivandin e (Reşad, 2009: 529). Wateya hunera teşbîhê ya têgehî, ji bo ku gotinê bêhtir bi hêz bikin du tiştên ku ji aliyên cuda ve eleqe di navbera wan de heye, bi hev tîndarî şibandin. Lê belê di vê şibandinê de aliyê lawaz dişibînin aliyê bihêz. Bêje bi wateya xwe yî heqîqî tê bikaranîn yanî tê de mecaz nîn e (Tok, 2011: 285). Mînak, “Zeyneba deh salî wekî şêrekî li hember wan sekinî û doza mafê xwe kir.” Di vê mînakê de Zeynebê ji aliyê xurtbûnê ve şibandiye şêrî. Di vê derê de aliyê lawaz Zeyneb e û aliyê xurt jî şêr e. Wekî ku di mînakê de jî hatiye dîtin teşbîh, bi hin daçekan tîndarî çêkin. Ev jî; wek, wekî, weku, mîna, bi mislê, bi husnê, sifet, şubhet, şubhî, fena û hwd in.

Hunera teşbîhê di axaftina mirovan ya rojane de jî gelekî tê bikaranîn, bi saya bikaranîna wê jî axaftin hem şênbertir dibe û hem jî mebest baştir û hêsantir tê fêmkirin.

Di teşbîhê de 4 unsûrên girîng hene:

1. Muşebbeh (aliyê ku dişibe),
2. Muşebbehun bîh (aliyê ku tê şibandin),
3. Wech-î şebah (wechê teşbîhê),
4. Daçeka teşbîhê (Saraç, 2007:129).

Di her teşbîhekê de ev çar unsûr ne mecbûrin ku her tim hebin. Hunera teşbîhê ji aliyê hebûn û nebûna van unsûran ve bi navên cuda tê binavkirin (Tok, 2011: 285). Nivîskarê me Hadî, di dîwana xwe de hunera teşbîhê di gelek helbestan de bi kar aniyê. Niha jî em ê yek bi yek li ser binbeşên teşbîhê rawestin û ji bo her hunerekê em ê mînakekê ji *Dîwana* Hadî bidin.

2.1.1. Teşbîha Belîx

Ger bi tenê aliyê ku dişibe (muşebbeh) û aliyê ku tê şibandin (muşebbehun bîh) hatibin bikaranîn û di hevokê de wechê teşbîhê (wech-î şebih) û daçeka teşbîhê tunebe wê demê ji wê teşbîhê re teşbîha belîx tê gotin (Tok, 2011: 285). Niha jî ji bo vê cureya teşbîhê em ê ji *Dîwana* Hadî li ser mînakekê rawestin:

Her roj hezar 'îbret heyê

*Dil kor e **nefs jî hem se ye***

Hes kirye dunya qehbe ye

Hem xemra engûr wezaz. (r.104, b. 4)

Di vê malikê de helbestvanê me dibêje ku “di her rojekê de ji bo yên ku bixwaze bibîne bi hezaran ders û îbret hene. Lê belê ji ber ku dilê me kor e, em van ders û îbretan nabînin û em ji vê dinyayaya derewîn û nebaş hez dikin. Her weha em xwe li ber rengê dinyaya xapînok wenda dikin.” Di vê malikê de teşbîha belîx hatiye bikaranîn lewra ji her çar hêmayên sereke yên teşbîhê bi tenê aliyê ku dişibe û aliyê ku tê şibandin hatiye bikaranîn. Di misreya duyem de nefis (muşebbeh) şibandine seyê (muşebbehun bîh). Di vê mînakê de aliyê lawaz nefis û aliyê xurt an jî bihêz se ye. Taybetiyeke seyan jî ew e ku har in û xurt in, bi riya wê harbûna xwe gelek tiştan bi zorê be jî bi dest dixin û di dema wê bidestxistinê de jî gelek tiştên girîng paşguh dikin. Ji ber vê yekê helbestvanê me nefis şibandiye seyî. Lewra nefis jî dema bi manewiyatê neye terbiyekirin dikare wekî seyekî har bibe û gelek tiştên xerab bike.

2.1.2. Teşbîha Mufessel

Di vê cureya teşbîhê de her çar unsûrên teşbîhê (muşebbeh, muşebbehun bîh, daçeka teşbîhê û wech-î şebih) jî tîn bikaranîn (Dilçin, 2009: 407). Di *Dîwana* Hadî de ji bo vê cureya teşbîhê gelek mînak hene, ji van mînakan yek jê ev e:

*Ji Tûrê qelbê **wek şem'e***

Bi sîne çu giha lem'e

Bûye medhûş û bê sem'e

***Wekî** Mûsa binî 'Imran e. (r.31, b. 5.)*

Di vê benda jorîn de her çar hêmanên teşbîhê hatine bikaranîn. Qelb, muşebbehun bîh; wek, wekî, daçeka teşbîhê; Mûsa Îbn 'Imran, muşebbeh; bi sîne çu

giha lem'e, wech-î şebêh e. Wekî tê dîtin di vê qîteyê de her çar hêmayên teşbîhê jî hatine bikaranîn.

2.1.3. Teşbîha Mucmel

Ger di helbestekê an hevokekê de muşebbeh, muşebbehun bîh, daçeka teşbîhê hebe, lê belê wech-î şebêh tunebe ev huner çêdibe (Dilçin, 2009: 408). Nebikaranîna wech-î şebêh ji aliyê wateyê ve tu kêmasiyê naxe nav beytê an jî bendê. Niha jî em ê vê taybetiyê li ser nimûneyekê ji dîwana xwe destnîşan bikin:

Bi namîzed hebîba min

Şebîhî mahê Ken'an e

Bi sed sogend tebîba min

Ji bo derdan çî Loqman e. (r.29, b. 1.)

Di vê mînakê de her sê hêmanên teşbîhê (edata teşbîhê, muşebbehun bîh, muşebbeh) hene lê belê wechê teşbîhê nehatiye gotin. Muşebbehun bîh, di misreya yekem de ye ew jî yar e (hebîba min), şebîhî; edata teşbîhê ye û Hz. Yûsif (mahê Ken'an) jî muşebbeh e. Ji ber ku wech-î şebêhê di vê mînaka jor de nehatiye bikaranîn ji vê cure teşbîhê re “teşbîha mucmel” tê gotin.

2.1.4. Teşbîha Muekked

Ger di hevokê de ji bilî daçeka teşbîhê her sê unsûrên din hebin teşbîha muekked çêdibe (Dilçin, 2009: 408).

Mînak:

Ev dinê bi xwe duşmin e, lê binefş xuya ye

Teşbîhî 'erûsan e bi wî qelb û dilan henc (r.96, beyta 8.)

Di vê malikê de Mihemed Hadî dinyayê wekî duşmin dibîne lê belê dibêje her çiqas wekî duşminan be jî xwe xweşik nîşan dide û wekî gulan, binefşan dixuye. Di vê malikê de dinya muşebbehun bîh e û dinya şibandiye dijminekî, wech-î şebêh jî di vir de bêjeya “binefş xuya ye” ye. Yanî wekî tê dîtin di misreya ewil de, ji bilî

daçeka teşbîhê her sê hêmayên din hatine bikaranîn. Di misreya duyem de daçeka teşbîhê heye (teşbîhî) lê belê mebesta me û mînaka me misreya yekem e.

2.2. Mecaz

Mecaz peyveke erebî ye û wateya wê ya ferhengî derbasbûna ji cihekî ber bi cihekî ve ye (Reşad, 2009: 248). Wateya hunera mecazê ya têgehî jî, bikaranîna peyvekê ne bi wateya wê ya rasteqîn, bi wateyeke din e. Hunera mecazê ji bo ku zindîbûnê, xweşikyê û rengê bixe nav vegotinê tê çêkirin (Tok, 2011: 173). Ji bilî xweşikî û rengî, hunera mecazê kûrbûn, hêz û zerafetekê jî dixê nav vegotinê. Hunera mecazê jî wekî hin hunerên din di nav axaftina rojane de jî zêde tê bikaranîn. Mînak dema em dibêjin “bi wî zimanê xwe yê şêrîn eqlê her kesî ji serê wan bir” di vir de qesta ji zimanê şêrîn ne qesta wateya heqîqî, wateya mecazî ye.

Ger qesta me di peyvekê de ne wateya rasteqîn, wateya mecazî be wê demê divê di nav her du wateyên bêjeyê de pêwendî hebe. Bi saya astenga qerîneya me’nayê (peyva ku nahêle wateya heqîqî were famkirin) bêje wekî wateya xwe yî yekem an jî wateya heqîqî nayê fêmkirin. Qarîneya manî’eyê ji bo mecazê delîlek e û bi riya wê tê fêmkirin ku vebêj bêjeyê bi wateya wê yî rast bi kar neaniye (Saraç, 2007: 109).

Bêjeyek bi du armancan bi wateya “mecazê” tê bikaranîn:

1. Ji bo şibandinê
2. Ji derveyî şibandinê yanî ji bo armanceke din.

Mecaz dibe du beş:

2.2.1. Mecaza ‘Eqlî (Mecaza Isnadî)

Dema kirinek ji bilî bikerê wê yî ‘eslî bi kesekî din ve were girêdan mecaza ‘eqlî çêdibe. Di mecaza ‘eqlî de bêje bi wateya xwe ya ‘eslî tîn bikaranîn (Saraç, 2007: 109). Yanî ji bo ku ev cureya mecazê çêbibe divê têkiliyek di navbera bikêrê heqîqî û lêkerê de hebe.

Di dîwana nivîskarê me de jî ji bo vê cureya mecazê gelek mînak hene. Lê belê em ê niha li ser nimûneyekê vê cureyê bibînin û şîrove bikin:

Ateşê sîne ne bes bû ku te da can û dile

Hatî ba tîx û teber qelb û çiger kir te du ker (r.62, beyta 2.)

Di vê beytê de jî helbestvanê me Mihemed Hadî mecazê bi kar aniye. Ji bo ku ev mecaz jî bikeve kategoriya mecaza ‘eqlî (isnadî) divê bi şeklekî eşkere were dîtîn ku di navbera biker û lêkerê de pêwendî hebe. Di vê beytê de em dibînin ku nivîskar bikêr û lêkerê digihîne hev. Vê gihaştinê jî em ji misreya yekem ya beytê fêmkirin. Helbestvan, di beytê de wekî muxatab bi yara xwe re diaxive û “dibêje wekî ku ew agirê di sînga min de vêketiye û min dişewitîne ne bes bû, îja te agir bêtir kir û tu bi can û dilê min jî dixî”. Wekî ji helbestê jî tê fêmkirin di vê beytê de di navbera bikêr (kesê ku bûye sedema agirê dilê helbestkar) û lêkerê (şewat) de têkiliyek heye. Her weha bêjeya “sîne ateş” jî ne di wateya heqîqî de hatiye bi kar anîn. Di ‘eslê xwe de Xweda ew agir xistiye hundirê ew kesî. Ev yek jî bi xwe re mecaza ‘eqlî derdixe meydanê.

Helbestvanên klasîk bi piranî di helbestên xwe de bi evîndara xwe re diaxivin. Evîndara wan jî bi piranî Xweda ye. Êş û elemên ku dikişînin, ji ber firqeta ji yara wan e. Daxwaza wan jî tenê gihaştina yara wan e. Mihemed Hadî jî li gorî vê têgihiştinê çûye û wî jî di helbestên xwe de ev daxwaz û êş û azarên xwe bi zimanekî tije huner ragihandiye xwînerên xwe.

2.2.3. Mecaza Ferhengî (Mecaza Zimanî)

Ji ber hin sedeman –an jî têkiliyên di nav peyvan de- ger bêje ji xeynî wateya xwe yî ferhengê werin bikaranîn çêdibe (Saraç, 2007: 110).

Li jêr em ê li ser mînakekê ku me di dîwana Mihemed Hadî de peyda kiriye rawestin:

Mey didî bi fincan û tas e

Dil bi reqsî bû şunas e

Nas kirî dêr û kenas e

Terk kirî wî xaneqan (83, qiteya 1.)

Di vê qiteyê de bêjeyên “mey, fincan û tas” bi wateya xwe yî ferhengî hatine bikaranîn. Wekî tê zanîn mey, av an jî tiştên wekî wan di fincan û tasan de tên

vexwarin. Nivîskar di vir de ev bêjeyan bi wateya wan ya ferhengî bi kar aniye û mecaza ferhengî an jî zimanî çêkiriye. Lê belê her çiqas di wateya ferhengî de jî hatibe bikaranîn, dîsa jî wekî tê zanîn mebesta eslî ne ev yek e. Di edebiyata klasîk de mey, xwediyê wateyeke taybet e. Mey, evînê ango ‘eşqê temsîl dike û vexwarina meyê jî muhebbeteke bi hêz û bê dawî temsîl dike. Her weha nivîskarê me jî li gorî vê hizrê çûye. Di helbestên helbestkarên klasîk de jî ev têgeh gelekî hatiye bikaranîn. Nivîskarê me Seydayê Licî jî di gelek helbestên xwe de têgeha “mey”ê bi kar aniye.

2.3. Îsti’are

Îsti’are bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê jî emanetgirtin an jî deynkirin e (Devellioğlu, 2008: 453). Di îsti’areyê de hin bêje ji wateya xwe ya yekemîn bi emanetî yan jî bi şiklê deynkirinê tên girtin û di hin wateyên din de tên bikaranîn (Bozarslan, 1994: 79). Her weha bêjeya ku bi emanetî hatiye sitendin dikare di wateya mecazî de jî bê bikaranîn

Di îsti’areyê de hunera teşbîhê pêwist e, ev yek jî nîşan dide ku îsti’are rewşeke taybetiya hunera teşbîhê ye. Li gorî vê taybetiyê jî îsti’are, bi riya negotina muşebbehê yan jî muşebbehun bîhê derdikeve hole. Ji her duyan yek nayê bikaranîn (Dilçin, 2009:412). Ji van pênaseyan jî tê derxistin ku îsti’are hem mecazeke û hem jî hunera şibandinê ye. Lê belê divê di şibandinê de jî armancek hebe ku xwîner bikaribin muşebbehun bîhê û muşebbehê ji hev cuda bikin.

Îsti’are jî di nav xwe de dibe çend beş. Ji van beşan em ê li ser du beşên ku bêtir tên bikaranîn rawestin. Yek îsti’areya vekirî, ya duyan jî îsti’areya girtî ye. Niha jî ji bo ev her du binbeşên îsti’areyê ji *Dîwana* Hadî dê mînak werin dayin û werin îzehkirin:

2.3.1.Îsti’areya Vekirî (Îsti’areya Muserrehe)

Ger bi tenê muşebbehun bîh hatibe bikaranîn wê demê îsti’areya vekirî çê dibe (Özden, 2000: 14). Mînak, “şêr derbas dibin” di vê hevokê de armanc, ne derbasbûna şêrên wateya yekem e, yanî wate ne wateya heqîqî ye. Têgeha “şêr” temsîla cesaret, mêranî û hêzê ye. Piştî serkeftinek mezin “mirov” şibandine “şêran”.

Niha jî dê ji *Dîwana* Hadî nimûneyek were dayin û îzehkirin:

Ez gunehkar û hezîn û bê kes û bê maye me

Kelbê dergah im tuyim rehmê ez yek hubab (r. 58, beyta 6.)

Di vê mînakê de muşebbehun bîh hatiye bikaranîn. Wekî tê dîtin nivîskarê me di vê malikê de êş û azara dilê xwe bi awayekî eşkere radigihîne û dibêje ku ez gunehkar, xemgîn û bê kes mame. Ez wekî kelbekî (kûçik) li ber dergaha te me, tu rehmê li min bike lewra ez evîndarek im. Wekî tê zanîn di rastiyê de kûçikek dema ji malekê xêrekê an jî hezkirinekê dibîne ji ber deriyê wê malê naçe, ji ber vê yekê jî ew bi xwe wekî ajaleke sadiq tete nasîn. Nivîskarê me jî îhtimale ku ji ber ew muhabbeta ku dîtiye an jî hîs dike ji ber deriyê dergahan naçe û gazî yara xwe dike. Her weha ji ber ku di vê malikê de muşebbehun bîh (kelbê dergah) hatiye bikaranîn îsti'areya vekirî çêbûye.

2.3.2. Îsti'areya Girtî/ Veşartî

Ger bi tenê muşebbeh hatibe bikaranîn wê demê îsti'areya girtî çêdibe. Yanî berevajîya îsti'areya vekirî ye. Her tim bi îsti'areya girtî re teşxîsek jî heye lê belê îfadekirina hebûna vê teşxîsê ne şert e (Özden, 2000: 18).

Mînak:

Qelbê ker û kor û lal

Ger nexwe xemra helal

Nîne wî yek cezb û hal

Nabe ji cinse xewas (r.119, qîteya 4.).

Di vê qîteyê de tê gotin ku ger em ji şeraba helal (xemr) venexwun dê qelbê me her ker, kor û lal bimîne. Nivîskar dibêje eger em ji wê şerabê vexwun dê ti wextî dilê me ker û kor û lal nebe. Yanî di vir de di bêjeya xemrê (şerab) de îsti'areya girtî heye. Şerab ji bo evîna Îlahî hatiye şibandin. Evîn ku aliyê ku dişibe ye û di qîteyê de nehatiye zikirkirin. Di şûna wê de xemr (şerab) hatiye bikaranîn. Ji ber vê yeke jî ev dibe mînaka îsti'areya veşartî/ girtî.

2.4. Mecaza Mursel

Dema ku peyvek bêyî armanca şibandinê, ji bilî wateya xwe ya yekem û rastî di wateyeke din de bê bikaranîn hunera mecaza mursel çêdibe. Di zimanê axaftinê de bi awayekî xwezayî ev huner gelekî tê bikaranîn. Bi taybetî jî di nava biwêjan de hejmara wan zêde ye. Îfadeyên vê hunerê ne tenê di nivîsê de di zimanê axaftinê de jî zêde tên bikaranîn. Wekî mînak, dema em dibêjin “dema ku sol li topê ket, top li hewa zîzikî û wekî guleyekê çû nav du dîregan” peyva “sol li topê ket” em dizanin ku qesta vebêj tişta di hundirê solê –pî- ye. Her weha bi saya vê hunerê reng, xweşikî û hêzek ketiye nav axaftinê. Di vê mînakê de ji bilî hunera mecaza murselê çendîn hunerên din jî tên dîtin (mubalaxa, mecaz, teşbîh).

Di mecaza mursel de du taybetî divê hebin. Ev jî:

1. Divê bêje ne di wateya xwe yê yekem û rastînî de bin
2. Divê delîleke astengê (qerîneya manî'e) hebe.

Di mecaza murselê de bêjeyek yan jî gotinek heta di wateya wê ya mecazî de bê veguhestin, di nav du tiştan de pêwendiyên cuda cuda tên avakirin. Ev pêwendî jî, pêwendiyên ji bilî du nesne û têgehên in û curbicur in (Dilçin, 2009:415).

Niha jî em ê li ser nimûneyeke ji *Dîwana* Hadî rawestin:

Were carek bi merdane

*Ku şa ke **babê meyxane***

Tu mey de cumle rindane

Meded Geylaniyê Sanî. (r.41, b. 6.)

Di vê mînakê de hunera mecaza murselê hatiye bikaranîn. Lê belê dema xwînerê bi baldarî lê binêre ew ê fêhm bike ku “babê (deriyê) meyxaneyê” ne tiştekî zindî ye û nikare şad an jî xemgîn bibe. Mebesta nivîskarê me ew e ku bi hatina Seydayê wî, şadiya kesên li pey babê/deriyê meyxaneyê ye. Yanî şadiya murîd û şagirdan e.

Hunera mecaza murselê bi awayên cuda jî dikare were bikaranîn. Bi saya bikaranîna vê hunerê hêz û veşartîbûnek dikeve nav helbestê ku ev yek jî çêja helbestê bêhtir dike.

2.5. Kinaye

Wateya kinayeyê ya têgehî, ger peyvek bi du wateyan bê bikaranîn û di nava hevokê de fêmkirina wateya yekem jî caîz be lê belê mebesta sereke fêmkirina wateya mecazî be hunera kînayeyê çêdibe. Di kinayeyê de mebesta sereke wateya bêjeyê ya mecazî ye. Lê belê bêje dikare bi wateya xwe ya rasteqîn jî bê nirxandin (Tok, 2011:152).

Gelek caran mirov naxwaze ku mebestekê rasterast ragihîne, ji ber vê yekê jî mirov mebesta xwe bi şêweyek sergirtî û vepoşandî radigihîne. Ji vê mebesta sergirtî û vepoşandî re kinaye tê gotin. Bi gotineke din kinaye tê wateya gotinên sergirtî û vepoşandî (Cîhanî, 2013: 40).

Ji bo kinayeyê em dikarin çend mînakên weha bidin da ku mijar zelaltir were fêmkirin. Mînak ji bo kesên comerd çav fire an jî dest vekirî tê gotin. Di vê mînakê de wateya heqîqî jî dikare bê fêmkirin lê belê di vir de mebest wateya mecazî ye.

Di *Dîwana* Hadî de jî ev hunerê bi vî awayî hatiye çêkirin:

Ez bê beser im

Hem bê xeber im

Ji guh jî kerr im

Şeyxim meded ke (r. 45, b. 4.).

Di vê mînakê de nivîskarê me aliyên xwe yî kêr vedibêje û dibêje ku ez nabînim, nabihîsim û nikarim û lal im. Ji ber van kêmasiyên xwe jî ji Şêxê xwe alîkariyê dixwaze û dibêje were alîkariya min bike da ku ez ji vî derdî rizgar bibim. Di vê bendê de wekî tê dîtin nivîskar ne kor, kerr û lal e. Helbet mirov dikare wekî wateya rast jî wê fêm bike lê belê mebesta nivîskar wateya mecazî ye. Nivîskar dixwaze kêmbûna xwe ya me'newî bi noqsaniya bedenî bîne zimanî. Ji ber vê yekê jî hunera kînayeyê di vê bendê de bi kar aniye.

2.6. Muwazene

Hunereke bi hevşibînê re têkildar e. Muwazene bêjeyeke erebî ye û di ferhengê de tê wateya mîzênê du aliyên. Ger di nezmê yan jî di nesrê de peyvên ku wekî rawest tên qebûl kirin bi tenê di heman weznê de be, lê belê dibê heman deng neyê dubare kirin. Bi vî şîlkî jî hunera muwazeneyê çêdibe (Saraç, 2007:258).

Hunera muwazeneyê ji bo herikbariya helbestê hunereke girîng e. Bi saya vê hunerê helbest dibe xwediyê mûsiqiyekê û ev mûsiqî jî çêjeke mezin dide xwîneran. Çêkirina hunera muwazeneyê qabîliyet û hêza nivîskariya helbestvan derdixe meydanê. Nivîskarê me jî ev huner di gelek helbestên xwe de bi kar anîye. Li jêr em ê mînakekê ji *Dîwana Hadî* bidin.

Kewser û şehd û nebat î were ey rûhê beşer

Zemzem û abêheyat î were pêş can û ciger. (r.62, beyta 4.)

Wekî ji pênaseya vê hunerê jî tê fêmkirin, di navbera her du misreyan de wekhevî û şibandinek ji aliyê kêş, kite û dangan ve heye. Di beyta jor de di navbera bêjeyên kewser-zemzem; rûhê beşer-can û ciger de ji aliyê kêşê ve hunera muwazeneyê heye. Lewra hejmara kiteyên wan wekî hev in. Ji aliyê kurtbûn û dirêjbûna dangan jî û ji aliyê ahenge jî her du aliyên mîzênê wekî hev in.

2.7. Tewşîh

Ji hebûna du qafiyeyan di misreyekê de tewşîh, yan jî teşrî' tê gotin. Her weha bi wateya “misreya xwediyê du qafiyeyan” jî tê gotin. Her du qafiyeyên carinan di dawiya misreyê de li pey hev tên, carinan jî ji hev dûr in. Eger ew qafiyeyên li pey hev bin ew dibê “tewşîha muteqarîn”, eger qafiyeyên dûrî hev bin, ew jî dibê “tewşîha mehcûb”. (Adak, Notên Dersê, 2018).

Mînak:

Ev herdu çavê nergisîn wan dil ji min bir bê niza'

Her didu qewsê qelemîn wan tîr li dil dan bê difa'. (r.129, beyta 1.)

Di vê beytê de wekî tê dîtin, du qafiyeyên cuda di heman beytê de cih girtine. Qafiyeyên ku ji “çavê nergisîn- qewsê qelemîn; bê niza'- bê difa'” pêk hatine du

qafiyeyên ji hev cuda ne lê bele di nav xwe de komek ava kirine ku ev kom jî hunera tewşîhê çê dike.

2.8. Tersî'

Di helbestê de wekheviya bêjeyên di misrayan de ye. Divê bêje ji aliyê, hejmar, kêş û qafiyeyê ve wekhev bin. Ji vê wekheviyê re “tewazun” û ji helbestên ku bi vî şeklî hatine nivîsîn re jî “muressa” tê gotin (Dilçin, 2009: 488).

Mînak:

Her tu yî mewcûd û bes

Hem tu yî me'bûd û bes

Hem tu yî meqsûd û bes

Rebbî nekî min yu şaş (r.118, b. 1.)

Di vê bendê de ji xeynî qafiyeya dawiyê di navbera cînava “tu yî” de qafiye heye. Di heman deme de di navbera bêjeyên “mewcûd- me'bûd- meqsûd” de jî qafiye heye. Ji ber vê yekê jî ev qite dibe mînaka tersî' yê.

2.9. Tesmît

Tesmît di ferhengê de tê wateya eliqandinê. Di belaxetê de jî dema beytek bibe çar beş, her sê beşên ewil di nav xwe de bi qafiye bin, beşa dawî jî bi beytên jor re bi qafiye be hunera tesmîtê derdikeve meydanê (Adak, Notên Dersê: 2018).

Di xezel û qafiyeyan de hebûna vê hunerê herikbarî û ahengekê dixwe nav helbestê. Ji aliyê mûsiqiya helbestê ve jî hunera tesmîtê xweşiyekê dixwe nav helbestê. Helbet çêkirina vê hunerê jî dîsa qabîliyet û zanabûneke mezin dixwaze. Lewra di çêkirina vê helbestm de du xalên pir girîng hene. Ew jî; yek naskirina mûsiqiyê û zanabûna ji aliyê bêjeyan. Em ji mînakên vê hunerê têdigihêjin ku Mihemed Hadî di her du qadan de jî xwediyê zanabûnê ye. Nivîskarê me di gelek helbestên xwe de cih daye hunera tesmîtê.

Mînak:

Min go: Di kecxêşê da kuştî te min nehifî

Go: Sal kec û xişşe ev zulme hukmê **salî**

Min go: Şahê Hezanî min kuşt bi ev nîşanî

Go: Şahê Taxî kuştî wî jî bi ev mîsalî. (r.34, beyta 2.- 3.)

Di beyta duyem de tê dîtin ku beyt bûye çar beş. Ji van beşan her sê beşên ewil di nav xwe de (Hezanî- nîşanî- kuştî) bi qafiye ne û beşa dawî (mîsalî- salî) jî bi dawiya beyta beriya xwe re qafiyeyekê çêdike. Vê yekê jî herikbariyek xistiye nav helbestê. Bi vî awayî jî hunera tesmîte derdikeve meydanê.

2.10. Cînas

Cînas, bi riya bikaranîna bêjeyên telafûza wan yek lê belê wateya wan cuda çêdibe. Wateya wê yî têgehîn, bikaranîna du bêjeyên di telafûzê de wekhev yan jî nêzî hev, lê belê di wateyê de ji hev cuda bin wê demê hunera cînasê derdikeve holê. Bi gotineke din hunera cînasê; bikaranîna peyvên ji aliyê dangan ve yek, lê belê ji aliyê wateyê ve cuda ye. Ji bo ku hunera cînasê çêbibe divê her du bêje jî bi hev re û di heman cihî de werin bikaranîn (Tok, 2011: 40).

Ji bo cînasê “tecnîs” jî tê gotin (Dilçin, 2009: 467).

Du cureyên cînasê hene: Cînasa Tam û Nivco.

2.10.1. Cînasa Tam:

Di nav lefzên wan de wekhevî tam e. Cînasa ku di navbera du peyvên de ji aliyê hejmar, rêz û cureyên tîpan de wekhevî hebe jê re cînasa tan tê gotin (Zivingî, 2013: 47). Cînasa tam jî di nav xwe de dibe du beş. Ew jî: cînasa basît û cînasa murekeb e (Saraç, 2007: 247):

2.10.2. Cînasa Basît

Bêjeyên ku cînasê diafirînin ger hejmara wan wekî hev be wê deme cînasa basît çêdibe. Di cînasa basît de bêje ji aliyê şikil ve jî û ji aliyê bêjeyan ve jî divê wekî hev bin. Helbestvanê me jî ev cure di helbestên xwe de zêde bi kar aniye, em ê bi van nimûneyan li ser vê yekê rawestin:

Arî ku ji barî bi dilan bîte mehebbet

Şa nabe bi xeyr ji Barî Te'ala bi tu meqsed. (r.102, beyta 6.)

Di vê mînakê de jî cinasa basit hatiye bikaranîn lewra di navbera her du bêjeyan (Barî- barî) de ji aliyê şikil ve wekheviyek tam heye. Lê belê wateya her du bejeyan jî ji aliyê wateyê ve cuda ye. Di misreya yekem de mebest lêkera “barîn”ê ye lê belê di misreya duyem de “Barî” ji navên Xweda yek e.

2.10.3. Cînasa Murekeb

Ew bêjeyên ku cînasê ava dikin herî kêr yek ji wan ji du bêjeyan pêk hatibe wê deme cinasa murekeb çê dibe (Saraç, 2007: 247). Seydayê Licî jî di gelek helbestên xwe de cih daye cinasa murekeb.

Mînak:

Ruh û can bi ew mecan e

Dilber e hem ew me can e

Can çi kim bê can canan e

Hûriya mînu nîşan (r.80, b. 5.)

Di vê bendê de di her du “mecan”an de cinas heye. Di misreya yekem de di peyva “mecan”ê de beje wateyeke serbixwe girtiye ku tê wateya dermanî, lê belê di misreya duyem ya vê qiteyê de “me can” wateyeke nû wergirtiye. Cînava me û “can” bi hev re di wateyeke din de hatiye bikaranîn yanî tê wateya “canê me” û bi vê riyê jî cinasa murekeb çê bûye. Wateyên her duyan cuda ne lê belê ji aliyê şiklî ve yek in û bi vê riyê jî cinasa murekeb çêbûye.

2.10.2. Cinasa ne Tam/ Nîvco

Di nav bêjeyên ku cînasê ava dikin de wekhevî heye lê di heman demê de ji çar xisûsan herî kêr di yekê de divê cûdabûn hebe. Ev çar xisûs jî; cins, hejmara herfan, hereke û rêzbûna herfan in (Saraç, 2007: 247). Nivîskarê me Mihemed Hadî di çend helbestan de cih daye ev cure hunerê. Niha ji ji van mînan em ê li ser yekê rawestin.

Mînak:

Ew nazika sîmdê m e

Roja wekû ez dê m e

Bûm dînekî bêbê m e

Wek bîme di lertzîn da (r.54, b. 6.).

Di vê bendê de jî wekî ku tê dîtîn di navbera bêjeyên “sîmdêm, dêm û bêbêm”ê de nêzikiyek heye. Lê belê ev nêzîkahî ji aliyê deng û ahenge ve ye. Wateya bêjeyan ji hev cuda ye lê belê ji ber ku di bilêvkirinê de ev bêje nêzî hev in cînasa nîvco derdikeve meydanê.

2.11. Qelb

Qelb bêjeyeke erebî ye. Wateya wê ya têgehî, dema bêjeyek ji aliyê beravajî ve bê xwendin û bi wê beravajîkirinê re bêjeyek nû û bi wate derkeve holê wê demê hunera qelbê derdikeve meydanê. Vê hunerê bêhtir bi xisûsiyeta elîfbaya kevin ve têkildar e (Tok, 2011: 14).

Cînaseke ji guhertina cihê herfên bêjeyan pêk tê. Lê belê bêjeya ku bi vê riyê derdikeve meydanê divê bi wate be. Ji ber ku qelb dikeve nav hunerên cînasê navê cînas-a qelb jî lê tê kirin. Qelb bi navên wekî cînas-a qelb, tecnîs-a qelb û meqlûb jî tê binavkirin (Dilçin, 2009: 481).

Ev huner bêhtir bi bêjeyên bi elîfbaya erebî tîr çêkirin re çêdibe lewra di elîfbaya erebî de ji bilî herekeyan tîpên dengdêr nayên bikaranîn, ev taybetî jî ji bo hunera qelbê zemîneke guncav ava dike. Derxistina vê hunerê şiyaneke xurt dixwaze. Ji bo helbestkarek bikaribe vê hunerê çêbike dibê hostetiyeyeke wî yî xurt ya bêjeyan hebe. Îhtimal e ku ji ber nelihevgerîna elîfbaya kurdî-erebî di *Dîwana* Hadî de mînakên wê hunerê –ji bilî mînakeke biçûk- nehatine bikaranîn. Ew mînak jî ev e:

Madam ku min dil çû ji dest
Çaye çî ye ey ew heqperest
Go: Mey vexwî pê bî tu mest
Behsê ji kewneyn biberî (r.79, b. 2.)

Di benda jor de gireya “ye”yê wekî baneşana “ey”ê hatiye qelibandin an jî zîvirandin. Bi riya vê qelibandinê jî bêjeyek nû derketiye û hunera qelbê çêbûye.

2.12. Îştîqaq

Îştîqaq bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengî, tîkiliya di navbera bêjeyên ji kokekê tîr e (Tok, 2011: 136). Wateya hunera îştîqaqê ya têgehî jî, bêjeyên ku ji heman kokê tîr û bi hev re di cihekî de tîr bikaranîn e. Di vê hunerê de unsûra

kelecanê ne zêde bi bandor e. Hunereke bi binyada bêjeyan ve girêdayî ye (Tok, 2011: 136).

Ji bo ku hunera îştîqaqê çêbibe divê herî kêr du bêjeyên ji heman kokê derketine bên bikaranîn. Îştîqaq jî dikeve nav hunerên cînasê (Dilçin, 2009: 483).

Hunera îştîqaqê di gelek dîwanan de tenê bi erebî an jî farisî tên çêkirin lê ev ne qaîdeyek e. Her weha di gelek helbestên serdema klasîk de mînakên îştîqaqê bi peyvên erebî an farisî hatine dayin. Lê belê ligel vê yekê di dîwana Mihemed Hadî de mînakên safî kurdî jî hene. Yanî ev huner dikare bi zimanên din jî were çêkirin. Niha jî dê li ser numûneyeke ji *Dîwana Hadî* were rawestîn:

Me'şûqe dilber

Her 'îşq e rehber

Cîger me kerker

Şeyxim meded ke. (r.45, b. 2.)

Di vê bendê de nivîskarê me Mihemed Hadî jî du bêjeyên ji heman kokê hatine, bi kar anîye ku ew bêje jî erebî ne û ji heman kokê ne.

Di benda jor de du peyvên ku koka wan yek e û di heman bendê de wekî hevtemamker hatine bikaranîn hene. Wekî tê zanîn 'îşq yanî bi kurdî evîn û me'şûq yanî evîndar ji heman kokê tên. Di vê mînakê de tê dîtin ku bi paşgir û pêşgiran ji heman kokê bêjeyeke nû hatiye çêkirin.

2.13. Alîterasyon

Wateya hunera alîterasyonê ya têgehîn, dubarekirina konsonantên (bêdeng) bêjeyên di helbestê an jî di nesrê de ye. Armanca vê hunerê ew e ku di helbestê de ahengeke xweş derxe meydanê (Tok, 2011: 35). Bi riya bikaranîna vê hunerê ahenga helbestê tê parastin. Nivîskarê me Mihemed Hadî jî ev huner di gelek helbestên xwe de bi kar aniye. Wekî mînak:

Dunya tamam rence dewam

Cama mudam bikîşîne kam

Qîza rezan waye li Hezan

Her çî nezan mehrûm bû (r.69, b. 5.)

Di mînakê de di neh cihan de tîpa “m”yê hatiye bikaranîn û her weha hunera alîterasyonê derketiye meydana.

2.14. Asonans

Wateya hunera asonansê ya têgehî, dubarekirina vokalên (bi deng) bêjeyên di helbestê an jî di nesrê de ye (Tok, 2011: 35). Asonans jî wekî alîterasyonê di helbestê an jî di nesrê de bi mebesta ahengeke xweşik derkeve tê çêkirin. Bi riya asonans û alîterasyonên di helbestan de helbest diherike û bi wê herikandinê, xwîneran jî dikişîne nava deryaya xwe.

Niha jî li jêr em ê li ser çend mînakên ku hunera asonansê tê de hatine bikaranîn rawestin. Bi riya vê hunerê di xwendina helbestê de herikbariyek çêdibe û ew jî ta’ma ku xwîner ji helbestê digire zêdetir dike.

Mînak:

Çi xweş gulxêd û neyqed e

Çi cadoçeşm û lebqend e

Çi şêrîn û şekerxend e

Hezar wek min bi qurban e (r. 29, b. 5.)

Di mînakê de, di şanzdeh cihan de tîpa “e”yê hatiye bikaranîn û hunera asonansê hatiye çêkirin. Bi riya dubarekirina vê hunerê malik wekî yek aheng û yek deng tê xwendin.

2.15. Î’ade

Î’ade bêjeyeke erebî ye. Wateya vê hunerê ya têgehî, bêjeya dawî ya beytekê an qiteyekê ku bibe bêjeya ewil ya beyt an benda din û bi wê bêjeyê beyteke nû were nivîsîn wê demê hunera î’adeyê derdikeve meydana. Ev huner dema tê çêkirin hest wenda nabe û wate jî xera nabe lê belê ahengek xweş di nava helbestê de çê dibe. di pirtûkên edebiyatê de ji bo vê hunera “Reddul-acez ale’e-sadr” jî tê gotin (Tok, 2011: 65). Wateya î’adeyê zîvirandina dawîya bêjeyê ye û ev zivirandin dibe destpêka beyta pêy xwe. Lewra wateya “acuz” di nesrê de dawîya îbareyê ye, di nezmê de qisma dawî ya beytê ye; “sadr” jî di nesrê de destpêka hevokê ye, di nezmê de jî destpêka

beytê ye (Saraç, 2007: 261). Ji bo helbestên ku bi hunera î'adeyê hatine çêkirin re “mûad” tê gotin (Dilçin, 2009: 486).

Di bêjeyên ku di hunera î'adeyê de tên dubarekirin de ger daçek bi wan hatibe girêdan wê demê daçek dikare were rakirin yan jî ger daçek tunebe û di beyt an qite yan jî destpêka hevoka nû de pêdivî pê hebe dikare lê were zêdekirin. Yanî guherînên weha biçûk li ber çavan zêde nayên girtin. Her weha bêjeyên ku tên dubarekirin ger ne heman bêje bin lê belê ji heman kokê hatibin (îştîqaq) yan jî nêzî peyvê an kokê bin jî (şubhî îştîqaq) wekî hunera î'adeyê tên qebûlkirin (Saraç, 2007: 261).

Di helbestên Mihemed Hadî de tê dîtîn ku di tevahiya çend helbestan de hunera î'adeyê hatiye bikaranîn lê belê di hin helbestan de jî tenê di navbera yek an du beyt an qiteyan de ev huner-hatiye çêkirin. Di hin helbestan de jî ji bo lihevkerina ravek û qafiyeyê guherîn hatine kirin. Li jêr em ê ji van helbestan mînakekê bidin:

Ev qewlê ji Qur'an e
Mustexnî ji tuxyan e
Lew feqrê ji fexran e
Qan'i be m emin kal e

Kalê ku dibê temma'î
Bo tûla emel ra'î
Xeyran ra tu menna'î
Guh dêre bi gûş bale

Balê ku hebit tarî
Nûr lê nirêjî bi barî
'Arî nebitin ji 'arî
Ew balekî bedhal e. (r.84, b. 6.)

Di tevahiya vê helbestê de hunera î'adeyê hatiye bikaranîn. Bêjeya dawiya qiteya yekem bûye bêjeya destpêka qiteya ku li peywê hatiye. Di tevahiya helbestê de huner bi vî awayî didome.

2.16. ‘Eks

‘Eks bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê berovajîkirin e (Reşad, 2009: 8). Wateya wê ya têgehî jî, hunera dubarekirin û beravajîkirina bêjeya ewil e. Di vê beravajîkirinê de bêjeya nû -ya ku ji bêjeya beravajîkirina bêjeya beriya xwe welidiye- divê wateyeke nû sitendibe an jî dijberî bêjeya ewil be. Ev huner ji heyecanê bêhtir xwe dispêre unsûra baldariyê lewra di hunera ‘eksê de helbestvan deng û bêjeyan wekî kereste bi kar tînin û vê hunerê derdixin holê. Yanî hunereke ku li gorî planekê tê çêkirin e (Tok, 2011: 21).

Di hunera ‘eksê de parçeyên ku cih diguherin divê parçeyên bi wate bin (Saraç, 2007: 267). Yanî parçeya ku ji ya din diwelide divê xwediyê wateyekê be.

Di mantiqê de jî ji bo ‘eksê weha tê gotin; bêyî ku wesfa îfadeyê xera bike, kirdeyê bike pêveber, pêveberê jî bike kirde û îfadeyê nû bi dest bixe çêdibe (Saraç, 2007: 267).

‘Eks li gorî bikaranîn û guherîna peyvên dibe du beş:

2.16.1. ‘Eksa Tam

Hevok an jî komepeyvên di misrayê de bêyî guherînekê, ji bêjeya dawî heta bi destpêkê tê dubarekirin û çêkirin (Tok, 2011: 21). Wekî mînak:

*‘Ebdal û bi nalîn bin
Hem zar û hem bi kalîn bin
Du’ a kin ne dalîn bin
Dunya bivê ew dal e*

*Dal e ew kese bedkar e
Dunyê ra ‘ilimdar e
Axret wî ne efkar e
Bedkêşek û bedqal e. (r.86)*

Di van her du bendên jor de ‘eksa tam hatiye bikaranîn (ew dal e- dal e ew). Lewra komepeyvên misreya dawî ya benda yekem bêyî guherînekê di destpêka

benda pey xwe de hatiye berovajîkirin û di vê berovajîkirinê de jî bêjeya yekem (ew dal e), ji dawiyê ber bi pêşiyê ve (dal e ew) hatiye berovajîkirin.

2.16.2. ‘Eksa Nivco

Di nav malikê an jî di nav hevokê de bêje cî diguherin û digel vê yekê jî hin bêje bi bêjeyên nû zêde dibin yan jî ji hevokê hin bêje tên avêtin. Bi vê riyê jî ‘eksa nivco çêdibe (Dilçin, 2009: 485).

Mînak:

Ev Zal ku dunya ye

Şêrîn û şekerxend e

Wek bûkekê xwuya ye

Xeddar û heyyal e

Heyyal e û hem xeddar e

Wek ‘eqreb û hem mar e

Mel’ûn e û hem har e

Lê bi neqş û xet û xal e (r.86).

Di her du mînakên jor de ‘eksa nivco hatiye bikaranîn lewra di berovajîkinê de bêje li hevoka duyem hatiye zêdekirin. Lê belê vê zêdekirinê ji aliyê wateyê guherînekê çênekiriye.

2.17. Teşxîs û Întaq

Teşxîs peyveke erebî ye û tê wateya kesatîpêdanê. Di nav hunerên edebî de jî ew e ku kesek taybetiyên mirovan û kesan bide tiştan û wan bi rewş û fîtalên mirovan bide nîşandan û wek mirovan raber bike (Cîhanî, 2013: 48).

Di hunera întaqê de jî tiştên ku tên kesatîpêdan wekî şexsan wan didin axivandin (Reşad, 2009: 530). Wateya teşxîs û întaqê ya têgehî jî ew e ku tiştên hest, tevger, axaftina wan tunebe wekî mirovan dibihîsin, hereket dikin, hîs dikin û diaxivin (Tok, 2011: 294).

Di teşxîsê de helbestkar tiştên ne zindî dixin şûna mirovan û taybetiyên mirovan li wan tiştan dikin. Întaq jî ew tiştên ku taybetiyên mirovan li wan tên kirin

wekî mirovan didin axivandin. Wekî mînak, di helbesta Feqî ya bi navê *Ey Av û Av* de Feqî avê dide axivandin (Dêreşî, 2011: 61). Yanî di vê helbestê de hem hunera teşxîsê (helbestkar avê xistiye dirûvê mirovan û wekî muxatab wê daniye hemberî xwe û pê re diaxive) û hem jî hunera întaqê (av wekî mirovan bersivê dide helbestvan) hatiye bikaranîn.

Mirov carna di rewşên awarte de, ji ber derûniya xwe tiştên ne zindî wekî zindî dibînin û tiştên ku qabiliyeta wan ya axaftinê tunebe jî dikarin wekî diaxivin bibînin (Tok, 2011:294). Yanî bi gelemperî ew axaftin û kesatîpêdan berhemên xeyalan in û gelek caran ji alema nivîskar ya derûnî peyaman didin xwîneran.

Hunera teşxîs û întaqê ji bo armancên cuda jî dikare werin çêkirin. Yanî nivîskarek ji bo sansurkirina peyamekê jî dikare wesfê mirovan li tişteke din bike û wê jî li gorî fikr û ramanên xwe bide axivandin. Bi saya vê nivîskar dikare merama xwe bi awayekî sergirtî û vepoşandî bîne ziman.

Dema hunera teşxîsê tê çêkirin ji hunerên wekî teşbîh û îsti'areyê jî tê îstîfadedekirin. Di hunera întaqê de her tim teşxîs heye lê belê di her teşxîsê de ne pêwîst e ku întaq hebe (Dilçin, 2009:419).

Nivîskarê me Mihemed Hadî jî di dîwana xwe de cih daye gelek mînakên teşxîsê û di hin helbestan de jî em rastî întaqê tên. Di hin helbestan de jî teşxîs û întaq bi hev re bi kar anîne ku ev yek jî çêjeke din xistiye navê helbesta wî. Niha jî em ê ji dîwana nivîskarê xwe, li ser nimûneyekê rawestin:

Pursîm ji dil min bi xef

Kan ew dilê min çû ji kef

Go: Purs bike ji zulfê bi lef

Mecnûn ewî ji bi xeyrkerî. (r.77, b. 2. Teşxîs).

Di vê mînakê de jî hunera teşxîsê hatiye bikaranîn. Nivîskar zulfên yarê ji xwe re wekî muxetab dibîne û wê dixê şiklê kesan û pirsan jê dike. Lê belê têgeha zulfê jî di edebiyata klasik de ji aliyê gelek nivîskarên serdema klasik ve hatiye bikaranîn. Ji nav van helbestvanan jî yê herî navdar wekî tê zanîn Melayê Cizîrî ye ku Mela zuluf bi gelek awayên cuda cuda bi kar aniyê. Heta di dîwana wî de xezelek

ku ji deh misreyan pêk tê û ji redîfa zulufê pêk hatiye jî heye (Dîwan, 2008: 375). Bikaranîna zulufê jî li gorî wate û cihê wê hatiye pejirandin. Carna zulufên wekî çengel, carna zulufên reş, carna zulufên wekî sunbulê û hwd. Her weha Feqiyê Teyran jî din av helbestên xwe de cih daye vê têhega girîng.

Pursîm ji zulfê ruyê mal

Go: Halê dil purs ke ji xal

Xal go: Bipurse ji qewsê hilal

Dil kuşt xedengê xencerî. (r.77, b. 3. Teşxîs û Întaq)

Di vê mînaka jorê de nivîskarê me Seydayê Licî di heman qiteyê de her du huner (teşxîs û întaq) bi hev re bikaraniye. Nivîskar zulf û xala yara xwe dixê dirûvê mirovan û bi wan re diaxive. Wekû zulf û xal zindî bin, tişteke xwedî qabîliyeta tevgerê bi wan re hebe daye nîşandan. Lê belê em dizanin ku tişteke bi vî rengî ne mimkun e. Di dewama wê de jî vê carê helbestkar xalê dide axivandin ku ev axaftinê jî hunera întaqê çêdike.

Nivîskarên serdema klasik fikr û ramanên xwe bi riya simbol û metaforan dianî ziman. Mihemed Hadî jî di şopa wan de diçû û ji xwe di dîwana wî de jî tê dîtî k udi gelek helbestên xwe de eşkere dike ku şopgereke Mela û Feqî ye. Di mînaka jor de jî tê dîtî ku nivîskarê me jî têgeha zulufê bi fikra tesewifê bi kar aniye lê belê em niha li ser vê yeke nasekirin. Lê belê em dikarin bibêjin ku ev ji bo teşxîsê mînaekeke eşkere û vekirî ye lewra zulufa yarê xistiye şuna mirovekê.

2.18. Husnê Te'lîl

Wateya husnê te'lîlê ya ferhengê ew e ku ji bo xweşikiyê bixe nav gotinê sedema 'eslî ya hin bûyer û rewşan bi sedemeke din girêdide. Bi vê riyê jî hunera husnê te'lîl çêdibe (Tok, 2011: 52). Wekî mînak gelek caran di helbestan de, helbestvan derketina tavê bi ruyê yara xwe yî xweşik ve girêdidin û dibêjin: "Tav îro ji bo te germ bike an jî ji bo te bibîne û silavan li te bike hilat." Di rastiyê de em dizanin ku derketina tavê tiştekî xwezayî ye û bêyî îradeya mirovan hiltê lê belê di vê hunerê de nivîskar tişteke xwezayî bi sedemeke din girêdidin û hunera husnê te'lîlê çêdikin.

Di çêkirina vê hunerê de qabîliyeta nivîskar gelekî girîng e. Ji bo ku husnê te'hlîleke serkeftî bê çêkirin divê nivîskar xwîneran qani' bike ku sedema ne xwezayî (sedema ku ew behs dike) rast e û bi ser de jî xwîneran jî tevlî nav hestên xwe bike. Ji bo vê yekê jî divê ewil nivîskar baweriya xwe bi sedema ku wî afirandiye bîne û û wê qene'etê jî bide xwînerên xwe (Saraç, 2007: 231). Yanî sedema ne rastî ya ku nivîskar behsa wê dike her çiqas ku xwîner dizanibe ne rast e jî divê ji aliyekî ve mejiyê wî îqna bike ku ew sedem dikare bibe sedema rastî jî. Yanî wekî mînaka li jor, xwîner divê bawer bike ku tav ji bo dîtina yarê derketiye. Ev yek jî bi riya teswîreke xweşik dikare bi şiklekî baştir çêbibe. Helbestvan dema behsa ruyê yara xwe bike û bibêje “horî jî dema wê bibînin ew ê ji qehra her du dinyayan jî biterikînin, çavên wê şîneke weha ye ku çem û behr wê bibînin ew ê bimiçiqin û zuha bibin, ji ber vê yekê tav jî ji bo ku ji dîtina vê xweşikiyê bêpar nemîne her roj hildihat.”

Di husnê te'hlîle de jî nivîskar wekî tecahula ‘arif sedema rastî wekû nizanibe dide nîşandan. Lê belê cudahiya di nav her duyan jî ev e; di husna te'hlîle de nivîskar encama tiştekî heyî û rastî bi sedemeke xeyalî ve girêdide (Dilçin, 2009: 443).

Di husnê te'hlîle de tecahula ‘arif, mubalexe, teşbîh û îstî'are jî dikare hebe. Nivîskarê me di dîwana xwe de cih daye vê hunerê.

Mînak:

Ji feyza sermedî dilber

‘Eyan bû sermedî ether

Bi çavdil sir me di enwer

Dema ku hatî cewlan e. (r. 29, b. 3.)

Di mînakê de nivîskar dibêje ku “ji ber ronîya ebedî ya yarê li asîmanan ronîyeke bêdawî peyda bû”. Yanî wekî ku tê dîtîn ev tiştekî xeyalî ye û rastiyê di xwe de nahewîne. Lewra em dizanin ku erd û asîman bi şewqa tu kesî ronî nabin. Ew bi xwe xwediyê ronahiyekê ne lê belê di vê helbestê de nivîskar sedema ronîkirina asîmanan bi şewqa yara xwe ve girêdaye. Lê belê ligel ku ev yek ne rast e jî, dîsa jî ji bo xwîneran ne tiştekî dûrî aqilan e. Her weha ji bo vê yeke xwîner dikarin bibêjin “çima nebe!”. Ev fikr û girêdana sedemeke ne rast hunera husna te'hlîle çêdike.

2.19. Tecahula ‘Arif

Tecahula ‘arif, bêjeyeke erebî ye û wateya wê jî ev e; kesek ku di eslê xwe de ‘arif be lê xwe wekî cahilan bide nîşan. Wateya hunera tecahula ‘arif ya têgehî jî, helbestkar tişteke ku di rastiye de zane lê belê xwe wekî ku nizanibe yan jî bi awayekî din zanibe dide nîşandan. Helbestkar ji bo nukteyekê, di rastiye de tişteke ku dizane lê belê wekî ku nizanibe tev digere û derbareyê wê tiştê ku dizane lê belê xwe wekî ku nizane nîşan dide jî pirsan dike (Tok, 2011: 237). Mînak, ger helbestkar bibêje “ey tayê sipî ev çiyê ku te hatiye di nav mulkê min de konê xwe vegirtiye, ma tu kî yî û tu ji ku hatiyî?” di rastiye de nivîskar di vir de sedema tayê sipî ya di nav porê xwe de dizane lê belê xwe li nezanîne datîne û ji wê pirs dike. Sedema derketina porê sipî tişteki xwezayî ye û bi salan ve girêdayîye lê belê di mînakê de nivîskar wekî ku sedema vê yekê nizanibe û wekî ku dixwaze sedema wê hîn bibe tevdigere. Di vê mînakê de hunera tecahula ‘arifê bi alîkariya hunerên teşxîs û îstîhfamê hatiye çêkirin.

Nivîskar ji bo ku îfadeyên wekî rexne, pesin, hezkirina zêde, lome û şaşmayinan bikaribe bîne ziman serî li vê hunerê dide. Di vê hunerê de nukte unsûreke gelekî girîng e. Ev huner ger ji aloziyê dûr be dikare serkeftî be (Tok, 2011: 237).

Tecahula ‘arif ne qet nezanîn e û ne jî veşartina zanebûnê ye. Di hunera tecahula ‘arif de ji hunera îstîhfamê (hunera pirskirinê) tê îstîfadedekirin (Dilçin, 2009:441). Tecahula ‘arif gelek caran bi hunerên teşbîh û mubalexeyê jî tên çêkirin (Saraç, 2007: 228).

Bi riya pirskirinê helbestvan dikare rengeke din bixe nav helbesta xwe ku ev reng jî xweşikiyekê dixê nav helbestê. Mihemed Hadî jî di *Dîwana* xwe de di gelek helbestên xwe de serî li vê hunerê daye. Niha jî em ê ji dîwana wî li ser nimûneyeke hunera tecahula ‘arif rawestin:

Xweş nazikî ku ya ku ji gul qet ne siruşt î

Aya melek î ya perî ya hûriya bihişt î

Herdem bi xedengê xwe min mezlûmê te kuştî

İmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî (r.36, b. 5.)

Di vê mînakê de nivîskarê me ji ber xweşikîya yarê mat maye û ev matmayîna xwe jî bi riya pîrsê aniye ziman. Nivîskar ji yara xwe re dibêje ku “tu wekî gulê xweşik î, gelo tu melek î yan perî yî yan hûriyeke ji bihuştê yî?” Di vê mînakê de bi tecahula ‘arif re hunera îstîfham û mubalexeyê jî heye. Lewra wekî tê zanîn xweşikîyeke bê qusûr û îlahî bi ti kesîre nîn e ji ber vê yekê jî mubalexe hatiye bikaranîn. Nivîskarê me li ber xweşikbûna yara xwe mat maye û ji wê pîrs dîke lê belê ji bo pîrsa xwe li bersivê nagere. Di vê hunerê de tenê xwe linezanîndayîn heye. Di rastiyê de nivîskar bersiva pîrsa xwe dizane lê xwe wekî ku nizane dide nişandan û pîrs dîke. Lê belê di encamê de bersiv ji bo vê pîrse hewce nake.

2.20. Mubalexe

Mubalexe peyveke erebî ye û tê wateya pîr mezinkirina karekî yan tişteki (Devellioğlu, 2008: 630). Wateya mubalexeyê ya têgehî jî, bi tesîra bûyerekê an jî kelecaneke objeyê ji şiklê wê yî rastîni pîr mezintir an jî pîr biçûktir nişandan e (Tok, 2011: 189).

Hunera mubalexeyê di nav axaftina rojane, di nav gotinên pêşîyan (mînak, dîkê çê di hêka xwe de bang dide) û di nav biwêjan de zêde tîni bikaranîn. Bikaranîna vê hunerê reneke cuda dixê nav helbestê an jî axaftinê.

Mubalexe bi pîranî bi şiklê mezinkirina tişteki an jî kesekî tê zanîn lê belê ev wekî cureyeke şibandîne ye û divê wekî xala şibandîne ya herî bi hêz a jor û ya herî bi hêz a jêr bê hesibandin. Mînak, mirovekî pîr tîronek, ji aliyê şibandîna herî bi hêz a jêr ve dişibînin mişkan. Ev mubalexe ye, lewra mirov ji aliyê gîrsbûnê ve ji mişkan gelekî mezintir e (Tok, 2011: 189). Lê belê di nav edebiyatê de bi pîranî mubalexe ji bo mezinkirina tişteki tê bikaranîn û tê zanîn.

Li gorî dereceya pîroletiyê mubalexe dibe sê beş. Ew jî ev in:

1. **Tebîfx:** Ev cureya mubalexeyê li gorî aqil û toreyên civakê ye.
2. **Îşraq:** Ev cure jî li gorî aqilan e lê belê ne li gorî toreyan e.
3. **Gulûv:** Ev cureya mubalexeyê hem ne li gorî aqil e û hem jî ne li gorî toreyan e (Dilçin, 2009: 447).

Di mînakên *Dîwana* Mihemed Hadî de ji nav cureyên mubalexeyê bêtir cureya teblîxê hatiye bikaranîn. Mubalexeyên ku hatine çêkirin li gorî aqil û toreyan in. Em dikarin bibêjin ku cureya gulûvê di nav helbestan de nehatiye dîtin. Niha jî dê mînaeke ku ji dîwanê hatiye testîpkirin, were îzehkirin:

Alam û derdê ser min ger ser cemel ba cana

Kafir dê biçne cennet fam ke tu ev mealî. (r.34, beyta 9.)

Di vê beytê de helbestkar, ji ber pîrbûna êş û azarên xwe bi gazindan e. Lê belê ji bo vê gazinda xwe bîne ziman, serî li hunera mubalexeyê daye. Mihemed Hadî di helbesta xwe de dibêje ku; “ev êş û derdên li ser min ger li ser çiyayekî jî bûna, ew ê ew çiya ji berev derdan hilweşiyana û xera bibûna. Û ji ber vê êşa zêde ku ez dikşînim ger kafîrek be jî ew ê ji aliyê Xweda ve bihata efûkirin û ew ê biçûya bihuştê.” Wekî tê zanîn ji ber tu êş û derdî çiya hilnawêşin û xera nabin. Hilweşîna çiyayan an bi awayekî xwezayî yan jî bi destê mirovan dikare were kirin. Ji ber vê rastiya ku tê zanîn, xwîner fêm dîkin ku di vê beytê de bi şiklekî eşkere hunera mubalexeyê hatiye bikaranîn. Helbet qesta helbestkar ne çiya ye, di vir de çiya bi însan hatiye îsti’arekirin. Dîsa jî em dizanin ku mirov jî ji ber êşa evîne an jî êşeke wekî wê namirin.

2.21. Tecrîd

Tecrîd bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengî veqetandin û hilbijartin e (Tok, 2011: 244). Wateya wê ya têgehîn jî, helbestkar dema xîtabî xwe dike mirov dibêje qey ne behsa xwe behsa kesêke din dike (Tok, 2011: 244). Yanî di vê hunerê de helbestkar bangî xwe dike an jî behsa xwe dike lê belê ji xwînera heye ku helbestkar xîtabî kesê sêyem dike lê belê helbestkar di helbestê de xîtabî xwe dike.

Di *Dîwana* Hadî de jî hunera tecrîdê hatiye bikaranîn û helbestkar xwe dixê ûna kesê sêyem û bi xwe re diaxive. Mihemed Hadî bi riya vê hunerê di gelek cihan de wekî şîretan li xwe dike, bangî xwe dike an jî bangî hin kesên din dike ku dixwaze wan ji hin tiştan haydar bike.

Tecrîd ew hunere ku nivîskar rasterast an jî bi riya mecazê xîtabî xwe dike. Helbestkar xwe ji îfadeyê cuda dike û weke ku kesekê din be tevdigere (Tok, 2011: 244).

Hunera tecrîdê kelecana helbestkar gelekî baş radigihîne xwîneran û di heman demê de jî derûniya helbestkar baş dike (Saraç, 2007: 192). Bi riya tecrîdê xwîner dikarin binhişê helbestkar bixwînin. Ev taybetmendî jî ji bo naskirin û têgihiştina fikrên helbestkar hunereke gelekî girîng e. Lewra dema ku helbestkar di nezdê kesekî sêyem de bi xwe re diaxive bi piranî kêmasî û qusûrên xwe deşîfre dike ku ev yek jî ji bo fêmkirina hizr û ramanên nivîskar gelekî girîng e.

Mihemed Hadî ev huner di gelek helbestên xwe de bi kar aniyê. Lê belê em dikarin bibêjin ku bi giştî di dawiya helbesta xwe de ev huner bi kar aniyê.

Mînak:

HADÎ ne tişt e

Wî fi'le zîst e

Birîn gihîşte

Şeyxim meded ke (r.47, b. 3.)

Di vê mînakê de helbestkar xwe xistiye dewsa kesekî din û bi xwe (Hadî) re diaxive. Dibêje ku Hadî bi xwe ne tiştê e, ew (Hadî), kiryareke xerab e, birîna wî heye, gihîştîye, zêde bûye û dibêje Şêxê min bi hewara wî ve here. Wekî tê dîtîn mirov dibêje qey kesekî sêyem ji bo Hadî ji şêxê wî rica dike û dibêje here bi hewara wî ve da ku tu wî ji wan kirinên wî yên xerab xelas bikî. Bi vê riyê jî hunera tecrîdê derketiyê meydanê.

Helbestvanê me, helbestên xwe bi hizra tesewif û terîqetê (terîqeta Neqşebendî) nivîsandine. Mihemed Hadî bi xwe jî di destpêkê de murîdekî terîqeta Neqşebendiyê bû û paşê wî jî wekî mamosteyekî wê terîqetê xwendekarên xwe gihandine. Ji ber vê taybetiya wî jî em di gelek helbestên di dîwanê de hizra terîqeta Neqşebendîtiyê dibinin. Heta di çendîn helbestan de rasterast gaziya şêxê xwe dike û jê alîkariyê dixwaze da ku ji derd û cefayên xwe xelas bibe.

2.22. Îstîdrak

Îstîdrak bêjeyêke erebî ye û wateya wê ya ferhengê têgihîştina daxwazê û xwestinan e (Reşad, 2009: 179). Wateya hunera îstîdrakê ya têgehîn jî, wekî pesnê tiştekî an kesekî dide tê nîşandan lê di rastiyê de wî tiştî an wî kesî rexne dike, an jî wekî ku tiştekî an kesekî rexne dike xuya dike lê di rastiyê de pesnê wî tiştî an kesî vedede (Tok, 2011: 117). Lewma du aliyên vê hunerê hene:

1. Bi riya pesindayinê rexnekirin.
2. Bi riya rexnekirinê pesindayin (Tok, 2011: 117).

Yanî ger ji bo keseke ma'dtirş re em bibêjin “maşellah îro nûr ji wechê te dibare” hunera îstîdrakê çê dibe lewra ew kes di rastiyê de rûyê wî/wê tirş e lê belê em ‘eksa vê yekê dibêjin û em dixwazin balê bi riyeke din bikşînin ser wî/wê kesî/kesê. Yanî em di dirûvê ecibandin û pesindayinê de wê/wî kesî rexne dikin.

Niha jî li jêr ji *Dîwana* Hadî em ê li ser nimûneyekê rawestin lê belê ev nimûne jî -wekî nimûneyên vê hunerê yên di dîwana Hadî de-ji aliyê îstîdrakê ve ne mîna keke gelekî bi hêz e.

Çi xweş gulxêd û neyqêd e

Çi cadoçêşm û lebqend e

Çi şêrîn û şekerxend e

Hezar wek min bi qurban e.(r.29, b. 5.)

Di vê mînakê de tenê hevokeke ku helbestkar bi kar aniye qene’eta hunera îstîdrakê dide me. Em ji bo bêjeya “cadoçêşm”ê dikarin bibêjin hunera îstîdrakê ye lewra helbestkarê me ji bo çavên yara xwe dibêje “çav cado” û wekî tê zanîn jî cado hem ji aliyê şikil ve û hem ji aliyê xerabiyê ve bi awayekî negatîf tê zanîn. Ji ber vê yekê jî em dikarin bibêjin ku di vê bêjeyê de mebesta helbestkarê me pesindayin e lê belê wekî rexnekirinê hatiye nîşandan. Di tevahiya helbestê de helbestkarê me bi bêjeyên nazik û xweşik behsa yara xwe kiriye û pesnê xweşikbûna wê daye. Ev yek jî dibe sedema qene’eta me ya ji bo hunera îstîdrakê.

2.23. Nîda

Nîda bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê bangkirin, gazîkirin û qîrîn e (Devellioğlu, 2008: 833). Hin bûyerên ku helbestkar gelekî hestiyar dikin û kelecana wî bilind dikin vê hunerê derdixin meydanê. Piştî vê hestiyarî û kelecane, helbestkar wan bûyeran û kesan tîne ber çavên xwe û bangî wan dike. Ji ber vê yekê jî gelek caran nîda bi hunerên tekrîr û teşxîsê re tê bikaranîn (Dilçin, 2009: 253).

Hawar, gazîkirin, bangkirin, feryad û hwd. bi riya nîdayê çêdibin. Em dema dikevin tengasiyekê em dikin qêrîn û gazîyî hinan dikin da ku em ji wî halê bi êş an jî xerab xelas bibin. Hunera nîdayê bi baneşanên wekî “ey, aye, hey, wey, ya û carna jî rasterast bi navê kesan” tê çêkirin. Bi riya nîdayê helbestkar derdên dilê xwe diqêrin, ‘ecziyata xwe nîşanî muxetabê xwe didin (muxetab di edebiyata klasîk de bi piranî Xwedê ye), bêçarebûna xwe bi hêz û kelecaneke nîşanî derdora xwe didin. Mihemed Hadî jî di gelek mînakên xwe de wekî xelasker bangî Xwedê dike û bi baneşana “Ya Reb” hunera nîdayê çêdike.

Di hin mînakên nîdayê yên di dîwanê de nivîskarê me, rasterast bangî nefsa xwe, ruhê xwe dike û bi vê riyê hunera nîdayê çêdike. Niha jî em ê ji nav wan mînakan li ser mînakekê rawestin:

Ku tu çawanî ey naçar

Birîn te sist e ya dişwar

Hekîmê tek î ye her car

Bi naz e yane xemxwar e. (r.59, b. 2.)

Di vê mînakê de nivîskarê me bangî xwe û nefsa ruhê xwe dike. Bi baneşana “ey”ê gazîyî xwe dike, hunera nîdayê çêdike. Û di heman demê de jî ji bo xwe dibêje ku tu kesekî bêçare yî. Di berdevama helbestê de jî bi riya pirsan halê xwe eşkere dike da ku xwînerên wî hay ji merama dile wî hebin. Nivîskarê me ji ruhê xwe re dibêje ku birîna kême yan dişwar e û ji bo vê birîna te baş bike nûjdarê te yî herdem kî ye gelo? Wekî tê zanîn hem derd û hem jî derman tene ji Xwedê ne. Nivîskarê me di vê qiteyê de ji bilî hunera nîdayê serî li hunera tecahula ‘arif jî daye lewra pirsên ku dike ne pirsên ji bo gihaştina bersivê ye. Her weha di vê mînakê de nîda bi wateya xwe ya heqîqî hatiye çêkirin.

Di hin helbestên Mihemed Hadî de jî wekî li jor jî hatiye behskirin, muxetab raste rast Xweda ye. Mihemed Hadî di gelek helbestan de rasterast dibêje “Ya Reb, ey Xweda” û bi vî awayî hunera nîdayê bi kar tîne. Nivîskar dema di helbesta xwe de bangî Xwedê dike kesekî/ê din naxe navbera xwe û Xweda. Niha jî li jêr em ê li ser çend mînakên bi vî awayî rawestin:

Ya Reb çi bê wefane ev dilberanê cado

Dikujin kefen jî nakin kuştîyê xet û xalî. (r.34, beyta 5.)

Ya Rebbî bi îmanekî kamil ji dilê min

Sar ke tu dinê hubba xwe de qelbî wekî wenc. (r.97, beyta 3.)

Wekî di van her du mînanan de jî tê dîtin, Mihemed Hadî wekî muxetab rasterast Xweda dibîne û gaziyî wî dike. Di beyta yekem de dibêje “ya Reb ev yar çi bê wefaye, yara min bi êşê min dikuje lê belê min kefen jî nake. Helbestkar gazindên xwe, derd û meramên xwe ji Xweda re dibêje da ku Xweda riyekê nîşanî wî bide û wî ji wî derdê mezin rizgar bike. Li gorî vê beytê jî em dibinin ku derdê nivîskar hezkirina û tatêlên dinyê ne, helbestkarê me dibêje ku Ya Reb ji dilê min hezkirina vê dinyê bavêje ku ez bi tene ji te hez bikim û ruyê xwe tene bizîvirînim aliyê te.

Di beyta duyem de jî heman rewş xuya dike. Dîsa helbestvanê me daxwaza dilê xwe ji Xweda re tîne zimên û dibêje “ya Reb bi îmaneke gihaştî/ kamil tu evîna dinyayê ji dilê min sar bike”. Bi vî awayî alîkariyê ji Xweda dixwaze û hunera nîdayê çêdike.

Ji bilî bangkirina nefsa xwe û Xweda, di hin helbestan de jî helbestvanê me gaziyî yara xwe û di hin helbestan de jî bangî kesên ku ji her tiştî bê xeber dike. Niha jî ji van mînanan em ê li ser mînakekê rawestin:

Pêş ve çûn ev xweş melan

Hûn werin ey cahilan

Bihn kin ji werd û gulan

Mebine ji feyzê mehas. (r.121, qita 1.)

Di vê qiteyê de helbestkarê me bangî ew kesên ku gelek tiştan ji bîr kirine an jî nizanin dike û dibêje “di pey melan ve herin lewra ew bi pêş ve çûne, werin wê xweşiyê te’ m bikin û bêhn bikin û ji wê feyzê bêpar nemînin”. Di vê mînakê de bi baneşana “ey”ê hunera nîdayê hatiye çêkirin.

2.24. Terdîd

Terdîd bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengî redkirin, paşdexistin û zîvirandin e. Wateya wê ya têgehî jî, nivîskar vegotina ramanekê bi du îhtimalan vedibêje lê belê gotina xwe bi encameke ku xwîner ne li hêviyêne diqedîne. Di bikaranîna vê hunerê de xwîner gelek caran rastî encameke ku ne li hêviyêne tên (Tok, 2011: 278). Helbestvan meraqa xwîneran zêde dike û ji nişka ve bi encameke cuda ve wan rû bi rû dihêle. Yanî di terdîdê de nivîskar, bala xwîneran dibe ser xwe û weke ku ew ê tiştekî pir girîng bibêje lê belê di encamê de gotina xwe bi mîzahê diqedîne û ev yek jî xwîneran şaş dike (Tok, 2011: 278). Mînak ger helbestkar bibêje “ey yarê ti çendî şêrîn bû, gotinên te mîna şekir bûn ku min her dixwest wan bibihîsim lê baş bû ku tu mirî” wê demê hunera terdîdê çêdibe. Lewra di destpêkê de helbestkar bi şikleki erênî behsa yarê dike û xwîner jî li hêviya dewama wan gotinên erênî dimînin lê belê ji nişkê ve hevok bi tişteke neyênî diqede. Ev yek jî xwîneran şaşo maşo dike. Lewra tu kes piştî wan gotinên nazik û xweş hêviya daxwaza mirina yarê nake.

Encama gotin bi awayekî balkêş diqede ku xwîner li benda wê encamê ne (Dilçin, 2009: 460).

Di *Dîwana Mihemed Hadî* de ji bo hunera terdîdê mînakên pir saxlem nîn in. Yanî ji bo ku em bibêjin teqez ev hevok an jî ev beyt ji bo terdîdê dibe, kê mînak in. Bi tenê hin aliyên mînakan ew gumanê dane me. Niha jî em ê li ser mînakeke ku gene’eta terdîdê daye me rawestin:

Carek tu were bal û peran xweş biweşîne
Ji ev kaxê dinê seyr ke bi firdewsa berîne
Bimre ku tu hêjî nemiriye bi hubb û bi evîne
İmdad û meded qutbê Hezan bêji bi enîne
Da penc letaif hemî seyrkin bi semayê. (r.49, b. 2.)

Di vê bendê de wekî ku di pênaseya vê hunerê de me behs kir çar hevokên erênî hene lê belê di cihekî de (bimre ku tu hêjî nemiriye) helbestkar, bala xwîneran daye cihekî din û ew bi vî awayî şaş kirine. Di vê bendê de helbestkarê me gaziya yara xwe dike û dibêje xwe ji vê hezkirina dinyê dûr bixe û xwe hilweşîne, were ji vê dinyayê li buhuştê temaşe bike û dibêje bimire ku tu hêjî bi evînê nemiriye. Di vê misreyê de ji nişkê ve hevokeke ku xwîner ne li hêviyê bûn derdikeve holê. Ji ber vê hevokê jî xwîner matmayî dimînin. Piştî wê misreya ku terdîd tê de heye, dîsa helbest di seyra xwe ya ewil de didome. Ev yek jî taybetmendiya hunera terdîdê ye.

2.25. Rucû'

Rucû' bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê zîvirandin, ji gotina xwe zîvirîn, paşvekişandina gotinê ye (Devellioğlu, 2008: 900). Wateya hunera rucû'ê ya têgehîn jî, mijareke ku helbestkar vedibêje di cihekî de wê qut dike, xwe paş ve dikşîne û ji bo ku gotinê bihêztir bike bi îfadeyê cudatir wê tamam dike (Tok, 2011: 208).

Dema ku nivîskar gotina xwe qut dike û paş ve vedigere, di wê baweriyê de ye ku ew ê gotinên dewlemendtir û pêketîtir bibîne. Mebest ew e ku îfadeya ewil bihêztir bike (Tok, 2011: 208).

Vegera hunera rucû'ê, ji aliyê nivîskar ve dikare vegereke li gotina xwe ya ku ewil gotibe be jî û dikare gotina ewil betal bike û ber bi aliyê gotineke nû ve jî here. Ger hunera rucû'ê di cî de hatibe çêkirin derfeta ku helbestkar kelecana dilê xwe derbixe derve dide. Her weha hêzeke mezin dide ramana ku dê were îfadekirin (Saraç, 2007: 187).

Helbestvan ger ji gotina xwe ya ewil bizîvire, wê bi peyvên wekî “na, na ne weha ye, min xet kir” destnîşan dike (Dilçin, 2009: 457). Bi riya van peyvên jî xwîner fêhmî dikin ku helbestvan ji gotina xwe ya ewil vedigere an jî dizîvire.

Mihemed Hadî hunera rucû'ê di nav helbestên xwe de gelekî hindik bi kar aniyê. Niha jî em ê li ser mînakeke ku me di dîwanê de peyda kiriye rawestî:

*Tade wekî vî 'elîlî tu bi derdan wî ji derd
Ta bibit sewda û mecnûn tewbe ke ji 'eqlê rezîn.*

*Min xelet go sahib istixna ne her çi xwe biro
Wan çi bake ez bibim talan û hem endohegîn. (r.61, beyta 3. û 4.)*

Di vê mînakê de bi şiklekî eşkere tê dîtîn ku helbestvan ji gotina xwe ya ku ewil behs kiriye vegeyriyaye. Ji ber vê yekê jî di destpêka beyta peyrewa beyta ewil de gotina “min xelet go” bikar aniye. Ev gotin ji bo hunera rucû'ê delîlek e.

2.26. Tekrîr

Tekrîr bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê dubarekirin e (Devellioğlu, 2008: 1067). Wateya wê ya edebî jî, ji bo ku gotinek bêhtir were xurtkirin û tesîra wê bêhtir were kirin, bi zanetî ew gotin an beje tê dubarekirin (Devellioğlu, 2008: 1067).

Wateya tekrîrê ya têgehî jî, di helbestekê de tişta ku herî zêde bala helbestkar dikşîne û bandoreke mezin lê dike wê gelek caran dubare dike û bi vê dubarekirinê jî dixwaze ku mejiyê xwîneran li ser wê xalê zûq bike (Tok, 2011: 259).

Bi alîkariya hunera tekrîrê helbestkar peyama ku dixwaze bide xwîneran bi hêsanî digihîjîne wan. Ev yek jî rehetiyekê dide helbestkar lewra ew bi riya vê hunerê dikare balê bikişîne ser hin bêje an hevokan û hêza vegotina xwe zêdetir bike.

Di tekrîrê de divê pîvanek hebe. Di vê hunerê de mebest ew e ku tesîra gotinê bilind bike û xurt bike. Bêje an kombêjeyên ku tên dubarekirin, ger bandorekê li ser gotinê çenekin ji wan re “kesret-î tekrar” yan jî “tekerrur” tê gotin û ev jî wekî qusûreke nivîsînê tê dîtîn. Ji bo tekrîrên ku bi mirovan xweş tên û bandora gotinê bilind dikin jî “husn-î tekrar” tê gotin (Dilçin, 2009: 452).

Di hunera tekrîrê de carna tevahiya hevokê, carna tenê bêjeyek, carna jî kombêje dikarin bîna dubare kirin. Di *Dîwana* helbestvanê me Mihemed Hadî de jî tê dîtîn ku carna wekî neqeretê misreyek hatiye dubarekirin (Mînak, helbesta Mehwa Cesed Ke, Ji Hesret Ez Dibêm Daim, Ev ‘Umrê Giran Maye) û carna jî tenê hin bêje ji bo balê zêdetir bikişînin ser xwe çendî caran hatine dubarekirin.

Mînak:

Rûh û can bir ew mecan e

Dilber û hem ew me can e

Can çî kim bê canan e

Hûriya mînû nişan.(r.80, b. 5.)

Di vê mînakê de jî tê dîtin ku bêjeya “can”ê di qiteyê de çendîn caran hatiye dubarekirin û bi vê riyê jî hunera tekrîrê derketiye holê.

2.27. Têdrîc

Têdrîc bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê derece derece, pêl bi pêl pêşketin, tevgera hûr bi hûr e (Devellioğlu, 2008: 1054). Wateya hunera têdrîcê ya têgehîn jî ew e ku nivîskar ramanekê, hestekê, xeyalekê û hwd. derece bi derece bilind bike an jî derece bi derece daxê ber bi jêr ve û di nava pergalekê de wê îfade bike, ye (Tok, 2011: 249). Helbestvan dema ku hestên xwe îfade dike wan ji biçûk ber bi mezin ve, yan jî ji mezin ber bi biçûk ve rêz dike û dixwaze xwîneran bixe nava kelecaneke (Tok, 2011: 249). Di axaftina rojane de jî û di gotinên pêşiyên jî em gelek caran rastî vê hunerê tên. Mînak, sal bi sal xwezî bi par, di vê gotina pêşiyên de îfadeyêke derece derece ber bi aliyê nebaşiyê ve diçe heye. Nivîskar ji dêvla ku bi awayekî dirêj bibêje “her sala nû xweziya me bi sala borî tîne û em li sala borî digerin” dibêje “sal bi sal”.

Mihemed Hadî jî di helbestên xwe de serî li hunera têdrîcê daye. Lewra hunera têdrîcê di nav zimanê kurmancî de aktîf e. Di axaftina rojane de jî zêde tê bikaranîn. Ji ber vê yekê jî helbestkarê me di nava helbestên xwe de jî gelek caran ev huner bi kar aniyê, ji van mînan jî niha em ê li ser yekê rawestin:

Mînak:

Ji roja hucre û mehdê

Bike cehdê heta lehdê

Mebêje: Sebtê ya lehdê

Teleb ra nîn e peyan e. (r.30, b. 5.)

Di vê mînakê de jî di misreya duyem de bi riya biwêjekê hunera têdrîcê hatiye çêkirin. Nivîskarê me dibêje ku “tu xebata xwe bidomîne, hewl bide, cehd bike heta roja ku deriyekî ferecê li te vebe” lê belê ji dêvla hevokeke weha dirêj,

helbestkar bi riya biwêjekê mebesta xwe aniye ziman. Bi saya vê hunerê helbestkar hem ji îsrafa bêjeyan xelas dibe û hem jî rengêkî dixwe nav helbesta xwe. Di vê mînakê de jî çûyinek ber bi cihekî ve heye.

2.28. Îstîhfam

Îstîhfam bêjeyeke erebî ye û tê wateya pirskirinê. Helbestvan ji bo ku hêza bêjeyan xurtir bikin pirsan dikin lê belê ji bo van pirsan tu bersiv ne hewce ye. Matmayinên li hember kes an bûyeran bi riya van pirsan têne îfadekirin. Helbestvan, ji bo ku balê bikşînin ser hest, fikir û têgehekê an jî ji bo ku balê her li ser hin tiştan bihêlin bi cînavên pirsîyariyê yên wekî “kîjan, kanî, çima û hwd” pirsan dikin û hunera îstîhfamê çêdikin (Dilçin, 2009: 456).

Hunera îstîhfamê û tecahula ‘arif dişîbin hev lê belê di nav wan de ferq heye ku ev ferq jî wan ji hev cuda dike. Di tecahula ‘arifê de jî pirskirin heye lê belê bersiva wê pirse ji aliyê kesê ku dipirse tê zanîn. Lê belê kesê ku pirse dike xwe wekî ku bersiva wê nizanibe nişan dide. Yanî xwe li nezanîne dertîne û di pirse de jî nukteyek heye. Lê belê îstîhfam hinekî ji wê cudatir e. Di îstîhfamê de jî pirskirin heye lê belê nivîskar van pirsên xwe ji bo ku hestên xwe yên wekî matmayin, xemgînî bîne ziman an jî bale bikşîne dike. Hunera îstîhfamê divê bi cînavên pirsîyariyê werin çêkirin ku ev taybetmendî jî di navbera her du huneran de ferqeke girîng e. Di her du huneran de jî helbestkar ji bo ku bersivê wergire nake. Lewra bersiva pirsan di her du huneran de jî tê zanîn.

Mihemed Hadî jî di helbestên xwe de cih daye vê hunerê. Niha jî em ê li ser nimûneyekê li vê hunerê binêrin.

Ku tu çawanî ey naçar

Birîn te sist e ya dişwar

Hekîmê te kî te her car

Bi naz e yane xemxwar e (r.59, b. 2.).

Di vê mînakê de di her sê misreyên ewil de jî hunera îstîhfamê hatiye çêkirin. Di misreya yekem de bi alîkariya rengdêra pirsîyariyê “çawanî”, di misreya duyem de jî pirs hatiye kirin “birîna te kêma an dişwar e?” û di misreya sêyem de jî dîsa bi

alîkariya cînava pirsiyariyê “kî” pirs hatine kirin. Ev jî ji bo hunera îstîhfamê mînaeke gelekî vekirî û xweş e. Helbestvan ji bo van pirsan li bersivê nagere lewra ew bi xwe jî dizane bê derde wî ji ber çî ye û her weha dermanê wî çî ye. Tene ji bo bale bikîşîne ser xwe û xemgînî û halê xwe bîne zimên van pirsan dike.

2.28. Tezad

Tezad bêjeyeke erebî ye û ji koka “zidd”ê tê. Wateya wê ya ferhengê, ‘eksî hev, dijberî hevbûn e (Devellioğlu, 2008: 1105). Wateya wê ya têgehî jî, di helbestekê de bi riya bêjeyeke ku du wateyan di xwede bihewîne çêdibe. Lê belê divê ji van wateyan yek wateya rastînî û ya din jî wateya mecazî be. Ji bêjeyên dijberî hev, divê teqez yek ji wan bi wateya xwe yî rastî û ya din jî bi wateya mecazî be (Tok, 2011: 306).

Taybetiyên tiştên ku dijberî hev xuya dikin jî dikevin nava hunera tezaadê. Ya na rêzkirina bêjeyên ku ji aliyê rêzimanê ve zidî hev bin nakevin nav vê hunerê. Mînakên wekî germ-sar, hişk-ter, biçûk-mezin ji aliyê rêzimanê ve dijî hev in lê belê ji bo hunera tezaadê nabin mînak (Dilçin, 2009: 449). Mînak, ger di hevokê de helbestkar bibêje ku “dema tu mirî, li pê te tu wate ji bo saxbûna min nema. Ez jî mirin li pê te” wekî di vê mînakê de jî tê dîtin saxî û mirin du bêjeyên dijî hev in û bi hev re hatine bikaranîn. Ji van bêjeyan jî bêjeyek di wateya xwe ya rastî (mirin) û bêjeya din jî di wateya mecazî (saxî) de hatiye bikaranîn.

Di *Dîwana* Hadî de jî gelek bêje di heman beyt an bend an jî bendê de bi wateya tezaadê hatine bikaranîn. Niha jî em ê li ser mînaeke ku ji dîwanê hatiye tespîtkirin rawestin:

Dûrî ji te heq merge, eger navî heyat e
Xweşbext î ewe rojekê ew pêşda giha te
Dûr mame tenê ez ji lebê şehd û nebat e
Imdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî (r.35, b. 3.)

Di vê bendê de jî wekî tê dîtin du têgehên dijî hev hatine bikaranîn. Têgeha merg (mirin) û heyatê du bêjeyên dijî hev in. Ji bo ku ev bêje wekî tezatê bê qebûlkirin divê her du bêje dijî hev bin û ji van bêjeyan yek jê di wateya xwe ya

heqîqî (heyat) de û ya din jî di wateya mecazî (merg) de hatibe bikaranîn. Di vê mînakê de jî bi awayekî eşkere tê dîtin ku merg û heyat du bêjeyên dijî hev in û di heman hevokê de bi hev re hatine bikaranîn. Ev yek jî hunera tezadê çêdike.

Hunera tezadê di edebiyata klasîk de bi navên tîbaq, mutabeqet, tethîq, tekafû jî tê bilêvkirin (Dilçin, 2009: 449). Ji bilî van navan, hunera tezadê bi navê mutezadê jî tê binavkirin (Saraç, 2007: 163).

Bêjeyên ku di nav wan de tezad heye dikarin ji heman cinsê bin, yanî her du bêje dikarin navdêr an jî lêker bin û her weha her du bêje dikarin du cinsên cuda bin jî (Saraç, 2007: 163).

2.30. Muqabele

Muqabele bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê bersivdayin, pêşwazîkirin e (Devellioğlu, 2008: 677). Wateyê wê yî din jî, tiştên ku di navbera wan de tezad (dijberî) û teqabul (wekhevî) hebe û ger her du di cihê de werin bikaranîn ev huner çêdibe (Uysal, 2010: 148).

Di îbareyekê de pîştî ku du an zêdetir bêje werin gotin û li gorî wê rêzê bimînî û ji aliyê wateyê ve gotinên dijî wan yan jî miqabilî wan ger werin bikaranîn wê demê hunera muqabeleyê derdikeve meydanê (Saraç, 2007: 164). Hunera muqabeleyê ji bilî helbestan di nav gotinên pêşyan de jî gelekî tê bikaranîn. Mînak, dema yek ji yekî/ê re dibêje “tu bikî nekî Xwedê bi te de” di vira de di navbera bikî- nekî de tezad heye lê belê ji wateyê jî tê fêmkirin ku ev dijberî ne ji bo tezadê hatiye gotin. Kirin û nekirin du bêjeyên hevtemamker in û di vê mînakê de jî ji bo ku hev temam bikin bi hev re hatine bikaranîn û bi vê riyê jî hunera muqabeleyê hatiye çêkirin.

Hunera muqabeleyê û tezadê ji aliyê bêjeyan ve wekî hev in lê belê dema bi giştî li hevokê were nerîn wê demê dê were fêmkirin bê ew tezad e an muqabele ye. Di muqabeleyê de bêjeyên dijber ji bo ku hev temam bikin bi hev re tînan bikaranîn û armanc ne vegotîneke dijberiyê ye lê belê di tezadê de armanc rasterast derxistina aliyê dijber e.

Mihemed Hadî di gelek helbestên xwe de hunera muqabeleyê bi kar aniye. Ji van mînakên em ê li jêr yekê bidin û îzeh bikin:

'Elauddînê 'Ettar e
'Ubeydullahê Ehrar e
Nucûm û şems û eqmar e
Muziyê erd û esman (r. 29, b. 2.).

Di vê mînakê (di misreya çarem) de di navbera erd û esmanî de dijberî heye. Erd û esman du bêjeyên dijî hev in lê wekî ji tevahiya helbestê jî tê fêmkirin di vir de mebesta bikaranîna erd û esmanê ne ji bo dijberiyê ji bo li hev anîna hevok û qiteyê ye.

2.31.Tenasub

Tenasub ji koka nisbetê tê û bêjeyeke erebî ye. Wayeta wê ya ferhengê, lêhatin, munasibî, pêketin û bihevgerin e (Devellioğlu, 2008: 1076). Wateya wê ya têgehî jî, du an zêdetir bêje, têgeh an jî biwêjên bi hev re têkildar in, bêyî ku di nav wan de tezad hebe werin bikaranîn hunera tenasubê çêdibe (Tok, 2011: 274).

Bêjeyên ji heman malbatê an jî bi hev re têkildar, dema di heman beyit an qite an jî bendê de werin bikaranîn wê demê hunera tenasubê çêdibe. Mînak, ger di beyt, qite an jî di bendekê de behsa gul, sunbul, lale û gulîstanan bike wê demê hunera tenasubê çêdibe. Lewra di navbera gul, sunbul, lale û gulîstanê de têkiliyek xurt heye û tev jî dikevin nav malbata kulîlkan.

Ji bo rêzkirina van bêjeyên ku bi hev re têkildar in qaîdeyek nîn e. Bêje, têgeh an jî bêjeyên ku di nav wan de têkilî heye bi şiklekî rasthatî tên rêzkirin (Dilçin, 2009: 43). Yanî dema helbestkarê me Mihemed Hadî di beyteke xwe de bêjeyên “saz, def, ney û qewal”ê bi kar anîne li gorî qaîdeyekê rêzkirinê neçûye û ji xwe qaîdeyek jî ji bo vê rêzkirinê jî tune ye.

Ji bo hunera tenasubê, “muraat- nazir, cem’iyyet, telfik, tewfiq, îtîlaf û muwahat jî tên gotin (Dilçin, 2009: 43).

Xusûseke girîng ji bo tenasubê jî, divê bê zanîn ku mînakên leff û neşrê di heman demê de hunera tenasubê jî di xwe de dihewînin (Saraç, 2007: 160).

Taybetiyên hunera tenasubê (yanî li hevanîna bêje, têgeh an jî biwêjan) axaftin û nivîsînê ciwan û balkêş dike (Cîhanî, 2013: 50).

Mînak:

Kibir û riya û hesed

Reş kirine wan kebed

Sahibe wan bûne bed

Gerçi bineqşîne qaş (r.116, b. 5.).

Di vê mînakê de jî bêjeyên ku ji bo mirovan wekî negatîf tînin di hev re hatine bikaranîn. Ev bêjeyên negatîf jî di çarîna de hev temam dikin û ahenga helbestê bêtir dikin. Tenasub atmosfereke weha çêdike ku xwîner ji her bêjeyê heman tiştî dikare derbixe. Lewra em dizanin ku kibir, riya, hesed, reşbînî, reş, xerab tev bêjeyên heman malbatê ne û ji bo li hev kirinê jî bi hev re hatine bikaranîn.

2.32. Teşabîhu'l Etraf

Teşabîhu'l etraf, bêjeyê erebî ye û tê wateya şibandina tiştê dirûvpêketî bi tiştê ecêb re (Devellioğlu, 2008: 1093).

Teşabîhu'l etraf ew hunere ku, qedandina hevokê munasibî destpêkê be. Mînak, ger helbestkar di destpêka beytê de behsa gulê bike û dawiyê jî bi bêjeyên wekî bexçeyên gulan, bulbul, sunbul û hwd. biqedîne, ev huner çêdibe (Saraç, 2007: 160). Yanî di vê hunerê de divê destpêka beytê û dawiya beytê li gorî hev bin û hev temam bikin. Ji aliyekî ve dişibe hunera tenasubê jî. Di tenasubê de çawa ku bêjeyên tînin bikaranîn nêzî hev in, di vê hunerê de jî dîsa nêzîkayîyek heye.

Mihemed Hadî hem hunera tenasubê û hem jî hunera teşabîhu'l etrafê di gelek helbestan de bi kar aniye.

Mînak:

'Işq û zewq û mestî û rindî bi zor nabit bizan

Nayête coş dîz eger bin da nebitin iltihab (r.58, beyta 4.).

Di vê mînakê de bêjeyên ku li hev dikin di destpêka beytê de jî û di dawiya beytê de jî hene. Lewra tê zanîn ku bi her ‘îşqê re zewq û mestî heye lê belê ligel vê yeke tê zanîn ku bi ‘îşqê re jî her tim êş û îltîhabek jî heye. Di pênaseya vê hunerê de jî hat gotin ku di nav vê hunerê de tenasub jî heye, di vê mînakê de jî em vê qaîdeyê dibinin. Ji vî aliyê jî em dikarin vê mînakê ji bo hunera teşbîhu’l etrafê bidin.

2.33.Teraduf / Sînonîm

Teraduf yan jî sînonîm bêjeyêke erebî ye û ji koka “redf”ê tê. Wateya wê ya ferhengê, du an zêdetir bêjeyên ku wateya wan wekhev bin, hevwater bin, e (Devellioğlu, 2008: 1082). Teraduf yan hevwaterî ew e ku kesek di nivîs an axaftinê xwe de, du yan çend peyvên ku wateya wan yek be, bi hev re bi kar bîne. Ev huner jî xweşikiyêke taybet dixê nav gotin û axaftinê (Cîhanî, 2013: 48).

Hunera teradufê an jî bi navê din sînonîm, di edebiyata klasîk de ji aliyê gelek helbestvanî hatiye bikaranîn. Ev huner qabîliyeta helbestkar jî derdixe pêş lewra sînonîm bi riya çend zimanan tê çêkirin. Mînak wekî şeker û qend, dil û qelb, çeşm û çav, hubb û evîn û hwd. Ev yek jî qabîliyet û zanabûnekê dixwaze. Ji van bêjeyan, bêjeyek dikare bi kurdî û ya din jî bi erebî be (şems û ro), an bêjeyek bi kurdî û yek jî bi farisî be (çeşm û çav), an jî bêjeyek bi farisî û yek jî bi erebî (seg û kelb) be. Em di helbestên *Dîwana* Mihemed Hadî de mînakên wan îhtimalan tevan dibînin. Ev yek jî hostetîya wî ya zimanan derdixe pêş.

Mînak:

Min go: Were tu rûnê ser her du çeşm û çavan

Go: Ji xar muje dibîne cismê herîr melalî. (r.33, beyta 9.)

Di vê mînakê de bi saya bêjeyên “çeşm û çav”ê hunera sînonîmê hatiye çêkirin. Her du bêje xwediyê heman wateyê ne lê belê çeşm bi farisî ye û çav jî bi kurmancî ye.

2.34. Tarîz

Tarîz ji bo wan gotin û îfadeyên ku bi armanca rexnekirin û henekê xwe pêkirin û nîşandana rastiye re tê gotin (Saraç, 2007: 145). Yanî di vê hunerê de bi riya rexneyan an qerfan rastiyeke tînin ziman.

Mihemed Hadî jî di çend helbestên xwe de serî li vê hunerê daye. Bi riya vê hunerê dewra ku tê de dijîya, mirovên ku li gorî baweriya wî ji rê derketibûn, kesên ku çavên xwe ji rastiye dînyayê re girtine hatine rexnekirin. Ev huner ji aliyê civakî agahiyan dide xwîneran. Em bi saya bikaranîna ev hunerê hay ji gelek aliyên nivîskar jî dibin.

Li jêr em ê ji Dîwana Hadî li ser nimûneyeke tarîzê rawestin:

Her roj hezar 'ibret heye

Dil kor e nefî jî hem se ye

Hes kirye dunya qehbe ye

Hem xemra engûr wezaz

Di vê mînakê de nivîskarê me Hadî bi zimanekî tund nefî, dînyayê, hezkirina ji dînyayê û herweha kesên ku ji nefî û dînyê hez kirine rexne dike. Dibêje ku di her rojekê de bi hezaran 'ibret hene. Lê belê ji ber ku dil kor e ku kesek nayê dîtin û her weha nefî jî wekî seyî har e. Di berdwama helbestê de jî dibêje ku her kesê ku ji dînyayê hez kiriyê qehbe ye.

Di vê mînakê îhtimal e ku nivîskar hin kesên dewra xwe rexne kiriyê. Nivîskar xwestiyê wan hişyar bike da ku ew jî vegerin û hezkirin û şadiya rast bibînin û hez bikin.

2.35. Leff û Neşr

Hunera leff û neşrê ji du bêjeyan pêk tê û ev her du bêje jî bêjeyên erebî ne. Leff tê wateya werpêçan û berhevkirinê. Neşir jî tê wateya belavkirin û weşandinê. Lê belê di zanista hunerên edebî de, leff ew e ku helbestkar çend peyvên li pey hev tîne û rêz dike û paşê çend peyvên din ku pêwendî û tîkiliya wan bi peyvên ewil re hene, tîne û wan bi hev ve girêdide. Ji desteya yekem re leff û ji desteya duyem re jî neşir tê gotin (Cîhanî, 2013: 53). Yanî bi kurtî dema hunera leff û neşrê çêdibe, du

kom derdikevin meydanê. Di koma yekem yanî koma leffê de bêje tên nivîsîn û di koma duyem an jî koma neşrê de jî bêjeyên koma yekem tên vekirin an jî îzehkirin.

Leff û neşr jî di nav xwe de dibin du beş, ew jî:

2.35.1. Leff û Neşra Muretteb

Di leff û neşra muretteb de gotinên ku di misreya ewil de hatine gotin, di misreya duyem de jî bêyî ku rêzê xera bikin, hatibin dayin wê demê leff û neşra muretteb yan jî leff û neşra bi tertîb çêdibe (Tok, 2011: 162). Mînak, ger di koma leffê de helbestkar bibêje “li çiyayan bulbul, qaz û berx” û di koma neşrê de jî ji bo ku wan bêjeyan veke û tamam bike bibêje “dikirin cîq cîq, qare qar û me’ me” wê demê leff û neşra muretteb (bi tertîb) çêdibe.

Mihemed Hadî di *Dîwana* xwe de her du cureyên leff û neşrê jî bi kar anîne. Ev yek jî hayedarbûna wî ya ji cureyên edebîyatê derdixe pêş. Niha jî em ê ji dîwana wî li ser nimûneyekê rawestin:

Kewser û şehd û nebat î were ey ruhê beşer

Zemzem û abêheyat î were pêş can û ciger (r.62, beyta 1.)

Di vê beytê de misreya yekem dibe leff yanî koma yekem û misreya duyem jî dibe neşr yan jî koma duyem. Wekî tê dîtin di koma yekem de nivîskarê me bêjeyên “kewser”, “şehd”, “nebat” û “ruhê beşer” li pey hev rêz kirine. Ji bo ku hunera leff û neşra muretteb çêbibe divê di misreya duyem de jî ew bêjeyên koma leffê werin vekirin û tamamkirin. Em dibînin ku di misreya duyem de jî nivîskar bêjeyên ku misreya ewil tamam dikin bi kar anîne. Ew jî bêjeyên wekî “zemzem”, abêheyat” û “can û ciger” in. Misreya duyem (koma neşrê), misreya beriya xwe (koma leffê) tamam kiriye û ji aliyê rêzê ve jî guherîn pêk nehatiye yanî bêjeyên misreya duyem ên tamamker li gorî rêzkirina bêjeyên misreya ewil çûne. Ev yek jî leff û neşra muretteb çêdike.

2.35.2. Leff û Neşra Muşewweş

Di leff û neşra muşewweş de, bêjeyên ku di misreya ewil de hatibin gotin beranberî wan misreyan di misreya duyem de ji aliyê çepê ve rêza yekem were

taqîbkirin vê hunerê çêdibe. Yan jî ger di misreya duyem de bêje belawela hatibin rêzkirin vê demê leff û neşra bêtertîb yan jî bi gotineke din leff û neşra muşewweş çêdibe (Tok, 2011: 166).

Di leff û neşra muşewweş de jî qaîdeyên leff û neşra muretteb derbasdar in lê belê cudahî ew ê ku di vekirinê de nivîskar ne mecbûre wekî leff û neşra muretteb here. Em ê ji bo vê cure leff û neşrê jî niha li ser nimûneyekê ji *Dîwana Hadî rawestin*:

Ew hebîba xwe melek tîrek li dil da kir birîn

Me enîn û ahû nalîn dil biket nabit 'itab (r. 57, beyta 8.)

Di vê beytê de hunera leff û neşrê heye lê belê ji ber ku di misreya duyem an jî di koma neşrê de ji aliyê rêzkirinê ve guherîn pêk hatiye, bi navê leff û neşra muşewweş yan jî leff û neşra bê tertîb tê binavkirin. Di vê mînakê de di koma leffê de nivîskarê me gotiye ku “*Ew hebîba xwe melek tîrek li dil da kir birîn*” û di misreya duyem ango di koma neşrê de jî vê hevokê îzeh kiriye yanî ji bo têgihîştina xwîneran ew hinekî vekiriye. Lê belê di vê îzehkirin û vekirinê de rêza bêjeyan hatiye guhertin. Mînak, di koma leffê de bêjeya “birîn”ê di dawiya misreyê de ye. Lê belê îzeh û temamkera “birîn”ê, ah û nalîn di destpêka koma neşrê de cih girtiye. Ji ber vê guherînê jî ev beyt dikare wekî leff û neşra muşewweş bê dîtin.

2.36. Sihra Helal

Sihra helal bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengî sêhrekariya helal e (Tok, 2011: 220). Wateya wê ya têgehî jî, bêjeyek an jî kombêjeyek, di dawiya misreya yekem ya beytekê de hem wateya misreya yekem temam dike û hem jî wateyê dixe misreya duyem. Ji bo ku vê hunerê bi awayekî xweş çêbibe, divê bêjeya ku tê dawiya misreya ewil ya beytê hem misreya ku têdeye û hem jî misreya pey xwe rave bike û temam bike. Hunereke bi hiş û aqil ve girêdayî ye (Tok, 2011: 220).

Ji aliyê rêzimanê ve ger mirov li vê hunerê binêre, dawiya misreya yekem ya beytê dibe kirdeya misreya duyem, yanî vê hunerê her du misreyên beytê bi hev girêdide. Lê belê hunera sihra helal tenê bi vê taybetiyê çênabe. Di heman demê de divê ji aliyê wateyê û hev temamkirinê jî li hevhatî bin.

Nivîskarê me Mihemed Hadî jî di gelek beytên xwe de ji hunera sihra helalê îstîfade kiriye û wê bi kar aniye. Lê belê wekî di pênaseya vê hunerê de jî derbas dibe, di helbestê de yan divê îbareyek ser sêhrekariyê hebe, yan jî divê di beytekê de bêje an kombêjeyên dawiya misreya yekem di heman demê de bibe kirdeya misreya duyem û ji aliyê wateyê ve jî her du misre hev temam kiribin. Mihemed Hadî di *Dîwana* xwe de tenê di cihekî de bêjeya “sihra helal” bi kar aniye û ji bilî vê jî tu îbareyên sêhrekariyê nehatine dîtin. Lê belê di gelek beytan de misreyên hevtemamker bi kar anîne.

Mînak:

Ya Reb çi bêwefa ne ev dilberanê cado

Dikujin kefen jî nakin kuştîyê xet û xalî. (r.34, beyta 5.)

Di vê beytê de kombêjeya “ev dilberanê cado” misreya yekem e û heman komebêje ji bo misreya duyem jî bûye destpêka hevoka yekem. Yanî ger em weha jî bibêjin “Ya Reb çi bêwefa ne ev dilberanê cado, ev dilberanê cado, dikujin kefen jî nakin kuştîyê xet û xalî”. Wekî tê dîtin ji aliyê wateyê ve jî û ji aliyê rêzimanê ve jî tu xeletî û ti kêmasî çênabe.

Nûtqa wî ji bo ‘amî dîbî ‘eynê zelal e

Ya sihrê helal e. (r.38, misreya6.)

Wekî li jor jî me behs kir Mihemed Hadî di *dîwana* xwe de tenê di cihekî de têgeha “sihra helal” nivîsiye ku ev jî ji bo vê hunerê delîleke ji bo me.

2.37. Nezîre

Nezîre bêjeyeke erebî ye û wateya wê ji, li ser helbesta helbestvaneke din ji aliyê qafîye û weznê û giraniyê ve nivîsîna helbesteke nû ye (Reşad, 2009: 395).

Di hunera nezîreyê de girîngî û bi xwe bawerî jî derdikeve meydanê. Helbestvanek ji bo ku bikaribe nezîreyekê li ser helbesta keseke navdar binivîse dibê ji aliyê qabîliyet û zanebûna xwe ne kêmî helbestvanê ku ji xwe re mînak girtiye be. Ger ji aliyê qabîliyetê ve kêmî wî be wê demê helbesteke lawaz derdikeve holê. Di edebiyata kurdî ya klasîk de wekî tê zanîn kesayetê herî navdar Melayê Cizîrî ye û

gelek helbestkaran li ser helbestên wî nezîre nivîsîne. Ev jî girîngiya Mela û şopgerên wî, hezkiriyên wî kêr zêde dide ber çavan. Nezîreyên kesateyên wekî Mîr Îmadedîn û Feqî dikare wekî mînak bînin gotin (Adak, 2014: 218). Di dîwana ku bûye çavkaniya lêkolîna me de jî, li ser helbestên Melayê Cizîrî nezîre hatine nivîsîn û li jêr em ê li ser wan ji aliyê taybetmendî û giraniyê ve rawestînin.

BIKE REHMÊ LI ME EY DÊMDÛR

Bike rehmê l ime ey dêmdûra zerrîn bi serê

Lew ji mêj ve tijî dil bûne ji derd û kederê

Dil bi van derd û xeman her ew e bot e meqerê

Qasidek nîn e verêkin du selaman di berê

Ey nesîmê sibehê ma di mecala seherê

Sed selaman bigehîne ji me wê lebşekerê (r.161-164.).

Di vê helbestê nivîskarê me, Mela ji xwe re wekî îdol hîlbijartîye û li ser helbestên wî nezîre nivîsandine. Di van nezîreyan de jî tê dîtîn ku qafiyê, wezn û mijar yek in. Helbet mirov nikare bibêje ku asta wan wekî hev e. Lewra Mela di edebiyata klasîk de di lutkeyê de ye ku hem di serdema wî de û hem jî piştî serdema wî ti kes negihaştîye asta wî. Lê belê li gel vê yekê jî em dibînin ku Mihemed Hadî jî helbestên bi qîmet nivîsandine ku ev jî ji aliyê ta'm û çêja edebî ve gelekî xweş in.

2.38. Tezmîn

Tezmîn bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê, dayîna heqê zerer û xesara ku bûne sebeb e. Wateya tezmînê ya têgehîn jî, ger helbestvanek di helbesta xwe de misreyek an jî beyteke helbestkarekî din binivîse wê demê ev huner çêdibe. Helbestvan dema misre an beyteke kesekî din di helbesta xwe de bikar tîne carna navê xwediyê mirse an beyta ku bikaraniye dibêje û carna jî nabêje. Di vê hunerê de, ji jêgirtina misreyek an beyteke helbestvanekî din tê fêmkirin ku heyranîyek û ecibandînek heye (Tok, 2011: 235). Yanî nivîskar li ser helbestên her kesî nezîreyan nanivîsin. Ji bo ku nezîre werin nivîsîn divê ew kesê ku dê nezîre li ser helbestên wî werin nivîsandin kesekî di edebiyatê de girîng be. Ev girîngî jî hem ji aliyê edebî ye û hem jî ji aliyê zanabûn û 'ilma wî ye.

Ji bo helbestvanekî bikaranîna hevok an beytên helbestkarên navdar ne kêmasiyeke, bereksa vê yekê bi riya bikaranîna hevok an beytên helbestvanên navdar, xwîner girîngiya helbestvanên din baştir fêm dikin. Her weha asta helbestvanê ku nezîre nivîsiye jî dikarin bipîvin.

Di hunera tezmînê de em dikarên şopên hin helbestvanên din jî bibînin. Helbestvanek ji bo çend sedeman dikarin misre an rasterast qîte an beyta nivîskarekî din wergirin. Sedemek jê, dibe ku ji ber heyraniya nivîskariya helbestvan be, sedemek din jî, dibe ku helbestvan xwestibe ji bo rexneyekê li helbesta helbestvanê din bike. Ji ber vê yekê di nav helbesta xwe de cih daye misre, hevok an jî beyteke helbestvanekî din.

Di nav helbestên helbestvanê me Mihemed Hadî deşopa helbestvanên serdema klasîk bi awayekî eşkere tê dîtin (Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran). Ji aliyê hizr, bikaranîna simbol û têgehên tesewifê û ji aliyê ‘ilmê dînî ve di şopa helbestvanên serdema klasîk de çûye. Ji nav helbestvanên klasîk jî bi taybetî şopa Melayê Cizîrî tê dîtin. Ji aliyê herkesî ve jî tê zanîn ku Melayê Cizîrî di edebiyata kurdî ya klasîk de xwediyê cihekî girîng û taybet e. Ji ber vê girîngî û taybetiyê jî gelek helbestvanên piştî Mela ew şopandine û helbestên wî ji bo xwe wekî mînak bi kar anîne.

Nivîskarê me Mihemed Hadî jî di *Dîwana* xwe de li ser çend helbestên Mela nezîre nivîsîne û ji bilî nezîreyan jî di çend helbestên xwe de cih daye hevokên di helbestên Mela de derbas dibin. Hin beyt an jî hevok hene ku ji bo helbeskaran wekî destnîşan tên dîtin. Mînak, “şox û şengê, zuhre rengê dil ji min bir dil ji min” mirov dikare bibêje ku tevahiya xwînerên kurdî dizanin ku di vê misreyê de, destnîşana Mela heye. Mihemed Hadî jî îhmaleke mezin e ku bi zanetî hevoka “şox û şeng” û “dil ji min bir” di çend helbestên cuda de bi cî kiriye. Ji bilî Melayê Cizîrî em di çend cihan de jî şopa Feqî dibînin. Niha jî li jêr em ê li ser van hevokan û helbestan rawestin:

Çi şox û şeng û dildar e

Ji dil avêtî exyar e

Di dil da rakirî nar e

Meded Geylaniyê Sanî. (r.42, b. 5.)

Wekî di şîroveya jor de jî me behs kiribû, Mihemed Hadî di gelek helbestên xwe de cih daye van hevokên navdar. Helbet ji sedî sed em nikarin bibêjin ku Mihemed Hadî ev hevok ji Mela deynkirine. Lê belê ji ber ku di tevahiya dîwana wî de şopa Mela xuya dike, em dikarin tiştêkî weha bibêjin.

Dil ji min bir bi xet û xal û ruxê şemsî misal

Kirime medhûş û bi wî sewtê xweş û dengê xisas. (r.94, beyta 6.)

Ev du çavê nergisîn wan dil ji min bir bê niza'

Her didu qewsê qelemîn wan tîr li dil dan bê difa'. (r.129, beyta 1.)

Di van her du helbestan de jî em rastî destnîşaneke Melayê Cizîrî tên. “*Dil ji min bir, dil ji min*” hevokeke navdar ya helbesta Melayê Cizîrî ye. Nivîskarê me jî, ji ber ku di şopa Mela de diçe, di helbesta xwe de cih daye wan hevokên wî û bi vê riyê jî hunera tezmînê çêkiriye.

Min nema sebr û qerar e eşkê xwûnîn têne xwar

Tu bike imdad û çare muflis im 'alem xerab. (r.58, beyta 7.)

Wekî Melayê Cizîrî şopa Feqiyê Teyran jî di helbestên Mihemed Hadî de tê dîtin. Lewra ji gelek aliyên ve hizr û ramanên helbestvanên serdema klasîk wekî hev in. Hem ji aliyê hizra tesewifê, hem ji aliyê îfadekirina evînê, ji aliyê bikaranîna sembolan, ji aliyê têgihîştina hebûn û zanînê nêzî hev in. Ji ber vê yekê jî sembol û têgehên ku bi kar anîne nêzî hev in. Wekî di mînaka beriya vê beytê de me behsa destnîşana Mela kiribû, di vê beytê de jî em dikarin behsa rengê Feqî bikin. Wekî tê zanîn helbesteke Feqî ya bi navê “*Ey Dilberê, Ey Dilberê*” (Dêreşî, 2011: 221) heye. Di vê beyta Mihemed Hadî de jî hevokeke helbestê bi guherîna hin bêjeyan cih girtiye. Feqî di helbesta xwe de nêzî vê hevokê dibêje ku “*wêran ez im mal im xirab*” û Seydayê Licî jî di vê beytê de dibêje “*muflis im 'alem xerab*”. Ev bikaranîn jî Feqî dixwe bîra mirov.

2.39. Îqtibas

Îqtibas bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê, bêyî guherîn jêgirtina hevokekê an jî bêjeyekê ye (Devellioğlu, 2008: 424). Wateya wê ya têgehîn, di helbest —an di nesrekê de— divê bi mijara ku tê behskirin re eleqedar be- nivîsîna ayetek, hedîsek, qisseyeke navdar, gotineke navdar û hwd. were bikaranîn wê demê hunera îqtibasê çêdibe. Di helbestan de bi gelemperî ayet yan hedîsên ku tên zikr kirin tenê qismek ji wan tên îqtîbaskirin (Tok, 2011: 83).

Nivîskarê me di dîwana xwe de nimûneyên ku mirov bibêje teqez ev ji vê ayetê an jî ji vê gotina navdar e nedaye. Bi tenê di çend helbestan de gotinên ku di dewra Xalidiyan de wekî “wird” dihatin gotin di nav helbesta xwe de nivîsandine. Li jêr em ê ji van nimûneyan li ser çend nimûneyan rawestin.

Carek tu were bal û peran xweş biweşîne
Ji ev kaxê dinê seyr ke bi firdewsa berîn e
Bimre ku tu hêjî nemiriye bi hubb û bi evîn e
Îmdad û meded qutbê Hezan bêji bi enîne
Da penc letaif hemî seyrkin bi semayê (r.49,b. 2.).

Di vê bendê de ji bo cihê ku me bi sitûr nivîsandiye dibêjin ku “ev ji bo sofîyên serdema Mihemed Hadî wekî îşaretekê bû. Û ji bo wê gotinê sofîyan digotin: “*Mûtû qeble en temûtû*” û heta hin kes bi xeletî, ji bo vê hevokê jî dibêjin ew hedîsek e” (Doskî, 2012: 49).

Mînak:

Ji îmanê ye hubbê weten ey ‘arifê exbar
Nê Şam û ‘Iraq e weten ey mexzenê esrar
Serdest li ‘erşê ‘alemê rûhê weten ey yar
Îrsal bi weten penc letaif ke tu yek yar
Der sohbetê wê dilberê mehbûbê Xwedayî. (r.49, b. 3.)

Di misreya yekem a vê bende de jî ji bo hevoka “*ji îmanê ye hubbê weten*” hin kes dibêjin hadîs e. Îhtimal e ku ev hevok jî wekî hevoka “*bimre ku tu hêjî nemiriye*” din av sofîyên serdema Xalidiyan navdar bû. Dibe ku ji ber vê yeke wê wekî hadîsê dîtine û weha bawer kirine. Lê belê li gel vê qene’etê jî, di tu dere de em rastî hedîsek weha nehatin.

2.40. Irsala Mesel

Irsala mesel bêjeyeke farisî ye û wateya wê, di axaftinê de bikaranîna gotinên pêşiyên e (Devellioğlu, 2008: 446). Carna jî fikrek bi alîkariya pêkenokekê tê îzehkirin (Reşad, 2009: 175). Wateya wê ya têgehîn jî, ji bo ku rengê bide vegotinê, di helbestekê de bi bîr anîna gotinên pêşiyên, biwêj, methelok an jî gotinên bi hîkmet in (Tok, 2011: 97).

Bi gelemperî di beytekê de mesel di misreya beytê ya duyem de tê bikaranîn. Li gorî wezn, qafiye û kêşê dikare di 'eslê gotinan de hin guherîn jî pêk were (Tok, 2011: 97).

Hunera irsala meselê jî wekî hunera telmîhê girîng e. Wekî hunera telmîhê ew jî îsrafê ji bêjeyan dike û bi gotineke pêşiyên an jî bi biwêjekê kevirekî dixwe qozîya vala. Mihemed Hadî wekî telmîh, irsala mesel jî di gelek helbestan de bi kar aniye. Bikaranîna vê hunerê haydarbûna nivîskar ya ji folklorê kurdî nîşan dide. Niha jî em ê li ser mînakê ji dîwana wî rawestin:

Ji roja hucre heta mehdê

Bike cehdê heta lehdê

Mebêje sebtê ya lehdê

Teleb ra nîne payan e (r.30, b. 5.).

Di misreya duyem a vê mînakê de tê dîtin ku biwêjek hatiye bikaranîn. Vê biwêjê li gorî kite û qafiyeya helbestê reng daye. Di bikaranîna irsala meselê de hem helbest ji hewa xwe hinekî dûr dikeve û hem jî rengê dikeve nav helbestê.

2.41. Telmîh

Telmîh bêjeyeke erebîye û wateya wê ya ferhengê biriqandin an jî çirûsandin e. Wekî hunereke edebî, her çiqas di hevokê de behsa wê nehatibe kirin jî îşaretî qisseyeke ku herkes pê dizanetê kirin. Ev qisse, qisseyeke Qur'anê, qisseyeke kesayetên navdar, gotineke pêşiyên, pêkenokeke navdar, bûyereke dîrokî an jî helbesteke navdar e (Uysal, 2010: 198). Bi riya bikaranîna van qisse û gotinan hunera telmîhê çêdibe.

Tiştta ku tê telmîhkirin bi awayekî dirêj û hûrgilî nayê ravekirin, bi du sê hevokan tê bi bîr xistin (Dilçin, 2009: 261). Telmîh divê di nava uslûbeke xwezayî de were çêkirin, vebêjer her çiqas, çavkaniya telmîhê neyne ziman jî divê bê fêmkirin ku bûyer ji çî hatiye telmîhkirin (Saraç, 2007: 282).

Di edebiyata klasîk de û bi taybetî jî di helbestan de, hunera telmîhê zêde tê bikaranîn. Wekî tê zanîn helbest, bi bêje û gotinên kurt tînan nivîsîn û her tişt bi şiklekî dirêj nayê îzehkirin. Bi taybetî jî di edebiyata klasîk de, ji ber ku helbest bi qaliban dihatin nivîsîn ji bo wan herfêk jî bi qîmet bû. Vê yekê jî bêtir cî ji hunera telmîhê re vedikir. Bi saya vê hunerê, hem bûyerên pir navdar û girîng di helbestê de dihatin bi bîr xistin û hem jî bi saya wan nivîskar, ji vegotîneke dûdirêj xwe xelas dikir. Mînak, li hember êş û nexweşiyên dinyayê zêfbûnek bi mirovan re çêdibe. Lê belê dema helbestvan di helbesta xwe de bibêje ku “divê tu mîna Eyyub sebr bikî”, wê demê hemi kes dê ji wê hevoka kurt wateyên gelekî kûr derxin. . Lewra em dizanin ku tu hevok nikare sebrê bi qasî navê Eyyub pêxember xweş rave bike. Ev yek jî hem rehetiyekê dide helbestkaran û hem jî pîleya helbesta wî berztir dike.

Helbestvanê me Mihemed Hadî jî di rêça helbestkarên klasîk de çûye û wî jî di helbestên xwe de telmîh gelekî bi kar aniye.

Mînak:

Ji Tûrê qelbê wek şem'e

Bi sine çû giha lem'e

Bûye medhûş û bê sem'e

Wekî Mûsa binî 'Imran e (r.31, b. 5.)

Di vê mînakê de telmîh bi Mûsa Pêxember hatiye kirin. Ev qisse jî: “Ey Mûsa, ez Rebbê te me. Pêlavkên xwe derxe lewra tu li çiyayê pîroz Tûrê yî. Min tu hilbijartîye û ji niha şûnde li gor tiştta ku min wehîy kiriye guhdar bike. Ez Xweda me, ji xeynî min Îlah nîn e; ji ber vê yekê ji min re ta'etê bike û ji bo ku tu min zikir bikî nimêja xwe bi şiklekî dirust bike (Sureya Taha, 11-14)”. Wekî di Qur'ana pîroz de jî derbas dibe Hz. Mûsa cara yekem li çiyayê Tûrê wehîy sitendiye û li wira bûye elçiyê Xweda. Di vê qiteyê de jî Mihemed Hadî balê dikşîne wê bûyera pîroz. Di naveroka qiteyê de jî behsa çiyayê Tûrê bi awayekî pîroz tê kirin. Li çiyayê Tûrê Hz. Mûsa jî matmayî mabû û ketibû dehşetekê. Di vê qiteyê de jî behsa tirs û dehşeta Hz.

Mûsa tê kirin.

Ketim vê ceng û xewxayê

Ji Belqisê xeber nayê

Meger Hudhud ji Sebayê

Beşaret bîne ev 'erde.(r.149, b. 5.)

Di vê bendê de wekî tê dîtin behsa qisseyaya Belqisê û Hz. Silêman dike. Ev qisse di Qur'ana pîroz de di sureya Nemlê de tê behskirin. Li gorî vê qisseyaya ku di sureya Nemlê de derbas dibe, Hudhud rojekê wenda dibe. Hz. Silêman hers dibe û dibêje ku çawa bê hayê min ji nav çivîkan çû ye, ku were ez ê serê wî jê bikim. Lê belê dema Hudhud ji Sebayê vedigere behsa Belqisê jê re dike û dibêje ku ew xwediye textekî mezin e û dewlemend e. Lê belê baweriya wan ji Xweda nîn e û ew secde ji tavê re dikin. Li ser vê gotinê Hz. Silêman mektûbekê dinivîse û ji bo ku ew mektûb bigihêje Belqisê wê dide Hudhud. Hudhud ji paceya Belqisê re dikeve hundirê wê û mektûbê datîne hundirê wê. Piştî vê mektûbê hin buyer diqewimin lê belê di herî dawî de Belqis îmanê bi Xweda tîne û dîne Îslamê dipejirîne.

Wekî di mînanan de jî hatiye dîtin nivîskarê me bêtir bûyerên dîni di nav helbesta xwe de telmih kirine. Ev yek jî aliyê wî yê dîni bêtir derdixe pêş. Ji bilî qisseyên dîni telmih dikare li ser gelek bûyerên navdar jî werin kirin lê helbet ev yek jî bi daxwaz û terciha nivîskaran re girêdayî ye.

2.42. Mu'emma

Mu'emma bêjeyeke erebî ye û ji koka bêjeyên “’eyn, mîm û ye”yê çêdibe. Îsm-î mef’ûl e. Wateya wê korbûna ji her du çavan e. Yanî tişt, ji bo ku çav wan nebîne û wan nas neke tîn veşartin. Veşartina tişteki ye û ev tişt veşartî bi şikleki belawela tê nîşandan. Ji bilî helbestê, veşartina tişteki di wateya mutleq de jî wekî mu'emma tê pênasekirin. Di helbestê de dema helbestkar wateyêgirtî bihêle, veşêre û eşkere neke û di vê wateyê de –tişt ku hatiye veşartin- şexs û hwd.- wekî mu'emma tîn binavkirin (Saraç, 2007: 289).

Wateya mu'emmayê ya têgehî jî, amadekirina mamikên ku bi şiklê navekî bipirsin in. Di destpêkê de mu'emma wekî mamikên ji bo Esmâ'ul Husnayê dihatin amadekirin lê belê pişt re ji bo navên mirovan jî hatine nivîsîn (Tok, 2011:181).

Mu'emma bi alîkariya remz û îmayê, yanî ne bi şiklê eşkere bi awayekî neyekser tê çêkirin û navek tê pirsîn. Veşartina navekî bi vî şiklî divê tersî çêja edebî nekeve û divê têgihîştina wî navê ku hatiye veşartin mumkun be (Saraç, 2007: 289).

Çêkirina vê hunerê di helbesta klasik de ne karekî hêsan e. Ji bo çêkirina ev huner divê qabîliyetek bi helbestkar re hebe ku bikaribe bi awayekî serkeftî wê çêbike. Nivîskarê me Mihemed Hadî vê hunerê di çendîn helbestên xwe de bi awayekî serkeftî bi kar aniye. Ev bikaranîn jî xurtbûna aliyê wî yê edebî derdixe pêş çavan. Niha jî em ê ji dîwana wî li ser mînakekê vê hunerê îzeh bikin.

Mînak:

Yek noqteyek ji 'ûd ket

Hemd pişt wî hat bi 'illet

Me ji dest wî pur dî zahmet

Xelq bûn bi zulmê ew zax (r.134, b. 2.).

“Yanî eger noqteyek ji peyva “ûd”ê bê rakirin, dê bibe Ebdulqadir; peyva “hemd” jî eger ‘illet ku herfa “y” ye, digel be dê bibe Hemîd. Û wê deme ew ê bibe ‘Ebdulqadir el-Hemîd. Bi vî rengî helbestvan, navê sultan vedişêre ku di misreya pişt de bi hêsanî derdê xwe vebêje.” Di berdewama helbestê de tê dîtin ku xelqê ji ber zilma sultanê serdemê zahmetî kêşane. Ji ber ku helbestvan jî, wekî berpirsên serdemê tînin dîtin wan zilm û zehmetiyan di helbestên xwe de dinivîsin. Bi riya hunera mu'emmayê jî xwe ji xetereyan diparêzin. Em dizanin ku rexneya mezinên serdeman, li ku be jî û di kîjan demê de be jî, ne karekî hêsan e. Mihemed Hadî jî dibe ku ji ber vê yeke ev nav bi riya hunera mu'emmayê nivîsîbe. Lewra bi şiklekî hêsan ew nav nayê dîtin.

'Eyn û du dal û du elîf ba û qaf

Rê, jî di axir li min kir rê şefaf.(r.136, beyta 8.)

Mebest ji ‘eyn, bê, dal, qaf, elîf û rê, Ebdulqadir e ku ew jî şêxê ew jî Şêx Ebdulqadirê Hezanî yê şêxê Mihemed Hadî ye. Mihemed Hadî ji ber hezkirin û rêza

wî, di gelek helbestên xwe de cih daye şêxê xwe. Heta li ser wefata wî mersiyeyek nivîsiye ku wê mersiyeyê jî di dîwana wî de cih girtiye.

2.43. Tarîx

Tarîx bêjeyeke erebî ye. Wateya wê ya ferhengê, bêje yan jî reqemên ku roj, meh an jî sala bûyerekê nîşan didin e. Wateya wê ya têgehî jî, di elîfbaya erebî de her tîpek xwediyê reqemekê ye. Ji vê qaîdeyê re jî ebcêd yan jî hesabê ebcêde tê gotin. Helbestvan ji bo ku behsa rojek an jî bûyereke taybet bike bêjeyeke weha dinivîsinin ku ew bêje li gorî hesabê ebcêde dîroka wê roj an jî bûyera taybet dide (Tok, 2011:224).

Di edebiyata klasîk de gelek nivîskar dîrokên nivîsîna berhemên xwe dinivîsin, an jî dîroka jidayikbûna xwe di nav helbesta xwe de dinivîsin. Ev nivîsîn ji bo edebiyata kurdî ya klasîk tiştekî pir bi qîmet e. Lewra edebiyata kurdî di demek nêz de derbasî nivîsê bûye. Ji ber vê yekê jî em îro dîroka jidayikbûn an jî wefata kesayetên girîng tam nizanin. Em li gorî dîrokên di berhemana de derbas dibin digihêjin qene'tekê.

Hesabê ebcêde û beranberiya tîpan yê li gorî hejmaran dê li gorî tabloya jêrîn dê baştir were fêmkirin (Tok, 2011:224).

EBCED	HEWWEZ	HUTTÎ	KELEMEN
Elîf: 1	Hê: 5	‘Hê: 8	Kaf: 20
Bê: 2	Waw: 6	Tê (tê ya qalind): 9	Lam: 30
Cîm: 3	Zeyn: 7	Yê: 10	Mîm: 40
Dal: 4			Nûn: 50
SE’FES	QEREŞET	SEXIZ	DAZUX
Sîn: 60	Qaf: 100	Sê: 500	Dat: 800
‘Eyn:70	Rê: 200	Xê: 600	Zê: 900
Fê: 80	Şîn: 300	Zal: 700	Xeyn: 1000
Sad: 90	Tê: 400		

Li gorî vê tabloya hesabê ebcêdê tê dîtîn ku di alfabeya erebî de her tîp xwediyê reqemê ye û li gorî van reqeman helbestvanên edebiyata klasîk dîroka bûyereke girîng an dîroka nivîsîna berhemên xwe an jî dîroka wefata kesayetên girîng nivîsandine ku ev taybetî jî şiyaneke xurt û zanabûneke pir dixwaze.

Mihemed Hadî li gorî nivîskarên edebiyata kurdî ya klasîk nêzîktirî serdema me ye. Ji ber vê yekê jî di nav qeyd û nivîsan de dîroka jidayikbûn û wefata wî teqez e. Lê belê ew bi xwe di dîwana xwe de bi hesabê ebcêdê dîroka jidayikbûna xwe nedaye û her weha dîroka nivîsîna helbestên xwe jî nedaye. Bi tenê cih daye dîroka hin bûyer û kesayetên ku ji bo wî girîng in.

2.43.1. Tarîxên Vekirî

Ger tarîx bêyî tîpan yanî bi awayekî vekirî û eşkere were nivîsîn wê demê ev bi navê tarîxa vekirî tên binavkirin. Li jêr ji dîwana nivîskarê me Mihemed Hadî em ê li ser nimûneyeke vê hunerê rawestin:

Hezar û sê sed û bîst û şeşan da xem li min danî

Wefat û rihleta Şahê Hezan Geylaniyê Sanî

Cemad ewwel di bîst û heşt di merqed girî mihmanî

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im (r.181, b. 5.).

Di vê mînakê de nivîskar dîrokeke vekirî daye me. Ji helbestê jî em fêhm dikin ku ew dîrok, dîroka wefata şêxê wî ye. 1326 ji bo Mihemed Hadî dîrokeke girîng e. Helbestvan dibêje ku di wê salê de xem û derd û êşan xwe li min danîn. Lewra di wê dîroka reş de şêxê min yanî Şahê Hezanê wefat kir. Û dibêje ku ez ji wê dîrokê şûn de birîndar im. Ji derde dûrbûna wî her bi êş im û her daîm elemdar im.

2.43.2. Tarîxên bi Hesabê Ebcêdê

Ji bo nivîsîna helbestên ku li gorî qaîdeyên me li jor bi riya tabloyê nîşandan, hatine nivîsîn re tê gotin. Di van helbestên ku bi şiklê tarîxa ebcêdê hatine nivîsîn de, dîrokên jidayikbûn an jî wefata kesayetên girîng (an jî dîroka jidayikbûna nivîskar bi

xwe), dîroka nivîsîna helbestê, dîroka qedandina dîwanên helbestvanên klasîk, dîroka bûyerên dîrokî û hwd. dikarin werin bidestxistin. Bi saya van helbestên ku di hundirê xwe de dîrokan dihewînin em digihêjin agahiyên rast û durist.

Bikaranîna vê hunerê wekî gelek hunerên din qabîliyetekê dixwaze. Nivîskarê me Mihemed Hadî jî di dîwana xwe de cih daye vê hunerê.

Mînak:

Ev sal çî pur wexîm e

“Xeyn” û “şîn” “kaf” û “cîm” e

Qetl û qital ‘ezîm e

Der koh û sehl û hem rax.(r.134, b. 1.)

Di vê bendê de jî li gorî hesabê ebcêde “xeyn (1000)”, “şîn (300)”, “kaf (20)” û “cîm (3)” teqabulî sala hîcrî 1323 û mîladî 1905-1906an dike. Li gorî ku ji helbestê jî tê fêmkirin îhtimal e ku helbestvanê me xwestiye bala bikêşe ser rewşa siyasî ya wê serdemê. Wekî ji dîroka wê serdemê jî tê fêmkirin dîroka 1905 ji bo dewleta Osmaniyan dîrokeke girîng e ku di wê demê de ji aliyê Padîşahê wê serdemê Sultan Abdulhamîd ve gelek astengî û zordarî hatine kirin.

Helbestvanê me Mihemed Hadî jî di helbesta xwe de bal kişandiye ser wê serdemê. Her weha ji bo wê serdemê jî dibêje ew salên 1905-1906 çî salên wexîm in ku di van salan de kuştin û qetl pir hatine kirin. Helbestvanê me bi riya helbesta xwe hem ew dîroka reş û hem jî hinek bûyerên wê serdemê di helbesta xwe de nivîsîne.

2.44. Mulemme’

Mulemme’ bêjeyeke erebî ye û ji koka lem’ê tê. Wateya wê ya ferhengî, tiştê birikandî û reng reng e (Devellioğlu, 2008: 719). Wateya hunera mulemme’ê ya têhehî jî, nivîsîn an jî gotina helbesteke ku herî kêr bi du zimanan e. Helbestvan bi riya vê hunerê dixwaze ku zanabûn û me’rîfetên xwe bide pêş çavan (Tok, 2011: 197).

Di *Dîwana* Hadî de jî mulemme’ek hatiye nivîsîn û mulemme’a nivîskarê me bi çar zimanan e. Misreya yekem bi erebî, misreya duyem bi farisî, misreya sêyem bi

tirkî û misreya çarem jî bi zimanê kurdî hatiye nivîsîn. Helbet nivîsîna helbesteke weha ne karekî hêsan e. Ji bo ku helbestkar dikaribe helbesteke weha binivîse divê ew zimanên ku pê dinivîse pirî baş zanibe ku di encamê de helbesteke bi qelîte derkeve meydanê. Di helbesta Mihemed Hadî de em vê huner û zanabûnê bi awayekî eşkere dibînin.

Hadî di *Dîwana* xwe de bi tenê helbestek bi şiklê mulemme'ê nivîsandiye. Ji wê helbestê benda ewil ev e:

Nûru 'eynî nûru 'eynî qelle wezdade eş-şu'ûn
Taxet ber dili leşkeri xemnake salari cunûn
Taqetîm taq oldî bende qalmadî sebr we sukûn
'Eql û dîn te bir bi talan can û dil te kir zebun.

BEŞA SÊYEM

TESPÎTKIRINA HUNERÊN EDEBÎ YÊN DÎWANA HADÎ

Di vê beşê de em ê hemû hunerên edebî yên di *Dîwana* Hadî de tespît bikin. Di vê beşê de em ê pênaseya huneran nekin û mînakên jî em ê yek bi yek îzeh nekin. Lewra di beşa yekem de bi awayekî hûrgilî em li ser pênaseya hunerên edebî rawestiyan û me ji bo her hunerekê jî mînakek ji *dîwana* Hadî da û me şîroveyeke berfireh jî lê kir.

METNA DÎWANÊ

PIŞKA YEKÊ

1

NÛRU ‘EYNÎ NÛRU ‘EYNÎ

Nûru ‘**eynî nûru** ‘eynî qelle wezdade eş-şu’ûn

- 1 Taxet ber dili leşkeri xemnake salari cunun
Taqetîm taq oldî bende qalmadî **sebr we sukûn**
‘Eql û dîn te bir bi talan can û dil te kir zebun

Hunerên Edebî: ‘Eynî nûr (**isti’are**), sebr we sukûn (**sînonîm**), tevahiya helbestê jî **mulemme’** e.

Qed usellil-bale înan banet ‘elamatul-wisal

- 2 Kefti dil durest înan xwoş xamî mî bîzî xiyal
Mumkin olmaz kîm îde sultan we gedaye îttîsal
Tu bike rehmê **şepalê** bes **li min dil ke tu xwûn**

Hunerên Edebî: Şepalê (**isti’are**), bes li min ke tu xwûn (**mubalexe**), tevahiya qîteyê jî **mulemme’** e.

- Fî meqasatîl-hewa bittu ke'yiben billiwa
3 Bes nebûd î n daxi ferzûdî bizan nari newa
Noldî gîr sor sen dîsen halîn nedîr ey bî newa

Da ku bêjim xanima min te li min dil kir dirûn

Hunerên Edebî: Da ku bêjim xanima min te li min dil kir dirûn (**mubalexe**), tevahiya qîteyê jî **mulemme'** e.

- Lem yezuq mîn xeddihîl-werdî kû'sen mîn şerab
4 Ankê ez 'îşq Xuda der dil nebûd est iltlhab
Oyle ebleh bîlmez asla qiymet xemr we kebab
Tu bi mey hey ke Xwedaya ev dilê jar û nugûn

Hunerên Edebî: Di tevahiya qîteyê de hunera **mulemme'**ê heye.

- Qet sebet Selma reşîqel qeddî 'eqlî billihaz
5 Der piyşi uftadi dil min 'eş nekerd **pend û w'az**
Herke muştâq ole 'îşqî lewm île olir xelaz
Tu tenê fersode dil mayî heval **borîn û çûn**

Hunerên Edebî: Pend û wa'z (**sînonîm**), borîn û çûn (**sînonîm**), tevahiya qîteyê **mulemme'** e.

- Kullema izdadet hewa balî hunen zadeleh
6 Arî yek nûnest ferqîşan binezdi 'aqileh
Mecnûn olur 'îşq hicûm edtikçe nefsi kamileh
Her ez im **meqtûlê wan çeşmê du sad û birh û nûn**

Hunerên Edebî: Meqtûlê wan çeşmê du sad û birh û nûn (**mubalexe û isti'are**), tevahiya qîteyê jî **mulemme'** e.

- Kun edîben Hadiya la tebxî fîl-erzîl fesad
- 7 **Misli Setfeddîn** mebaş bî bak ez ehli reşad
Bîrgun elbette bulur zalim cezasini çoq şîdad
HADÎ mûnqadê Şehê Sanî bi Şahê dehnimûn

Hunerên Edebî: Misli (**teşbîh**), Setfeddîn (**telmîh**), tevahiya qiteyê jî mulemme' e.

2

BI NAMÎZED HEBÎBA MIN

Bi namîzed hebîba min

1. **Şebihî mahê Ken'an e**

Bi sed sogend tebîba min

Ji bo derdan **çi Loqman e**

Hunerên Edebî: Şebihî (**teşbîh**), Mahê Ken'an (**telmîh**), çi Loqman e (**telmîh**).

'Elauddînê 'Ettar e

2. **'Ubeydullahê Ehyar e**

Nucûm û şems û eqmar e

Muziyê erd û esman e

Hunerên Edebî: 'Elauddînê 'Ettar, 'Ubeydullahê Ehyar (**telmîh**), şems û eqmar (**muqabele**), erd û esman (**muqabele**).

Ji feyza sermedî dilber

3. **Eyan bû sermedî ether**

Bi çavdil sir me dî enwer

Dema ku hatî cewlan e

Hunerên Edebî: Ji feyza sermedî dilber, 'eyan bû sermedî ether (**husna te'lîl**), çavdil (**teşxîs**), sermedî- sir me dî (**cînas**).

Birû qews e cenan quds e

4. Ji halê kes tu napirse
‘Uşaqan dikuje bê tirs e
Ji ah û zar û efxan e

Hunerên Edebî: Birû qews (**teşbîh**), cenan quds (**teşbih**), ‘uşaqan dikuje bê tirs (**mubalexe**), ah, zar û efxan (**tenasub**).

Çi xweş gulxed û neyqed e

5. Çi cadoçesm û lebqend e
Çi şêrîn û şekerxend e
Hezar wek min bi qurban e

Hunerên Edebî: Gulxed, neyqed, lebqend, şekerxend, şêrîn (**tenasub**), çi cadoçesm û lebqend e (**îstîdrak**) hezar wek min bi qurban e (**terdîd**), dengê –e’yê (**asonans**), gulxend, şekerxend (**îştîqaq**).

Bi ev reng û naz û dildarî

6. **Bi ev** dîhîmê serdarî
Bi ev ruxsarê gulnarî
Hemî te kirne heyran e

Hunerên Edebî: Bi ev (**tekrir**), reng, naz, dildarî (**tenasub**).

Ji ser ta pê hemî nûr î

7. Ji bû’ d û xeflet û dûr î
Te nabînim meger sûr î
Ji me’na mane hirman

Hunerên Edebî: Ji ser ta pê (**tedrîc**), te nabînim meger sûr î (**tecahula** ‘Arif).

Were **ey can** bibe aşiq

8. Vexwe **camek** meya raiq

Di sohmet rûne dil sadiq

Bibin esrarê rehmmann e

Hunerên Edebî: Ey can (**nîda**), vexwe camek meya raiq (**mecaza mursel**).

Eger sed sal teqwa key

9. **Ji işqê jî nebit dil key**

Mesafe nabitin qet tey

Di tîhê dê bî 'etşane

Hunerên Edebî: Eger sed sal teqwa key, ji 'işqê jî nebit dil key (**mubalexe**).

Nizanim hov î ya kov î

10. **Di dil naçînî rast tovî**

Mebe **sofiye fen rovî**

Bi rastî gav da meydane

Hunerên Edebî: Nizanim hov î ya kov î (**îstihfam**), di dil naçînî rast tovî (**teşxîs**), sofiye fen rovî (**teşbîh**).

Ji roja hucrê heta mehdê

11. **Bike cehdê heta lehdê**

Mebêje sebtê ya lehdê

Teleb ra nîne payan e

Hunerên Edebî: Ji roja hucrê heta mehdê (**tedrîc**), bike cehde heta lehdê (**irsala mesel**), mebêje sebtê ya lehdê (**tedrîc**), dengê –eyê (**asonans**).

Eger sed sal bikî ta'et

12. **Tecellî nayite dil rahet**

Di sohbet rone yek sa'et

Tecellî bîte keşan e

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), tecellî nayite dil rahet (**kinaye**).

Qesem ban le'lê şêrîn e

13. Tu pîrê sohbeta nîne

Bi mislî babê Şêrîn e

Ziyabexşê dil û can e

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), bi mislî (**teşbîh**).

“Te’alî Ellah” çî sultan î

14. **Çî xweş şah î çî xweş xan î**

Çî xweş deng û çî xweş xwan î

Melek reqşî di keywane

Hunerên Edebî: Dengê –îyê (**asonans**), çî xweş (**tekrîr**), dengê –xyê (**aliterasyon**), çî (**tewşîh**).

Du şems û du hilalê geş

15. **Li ser sûret çî xweş bûn neqş**

Ji çahê xebxeba rûbexş

Heyat da cumle insan e

Hunerên Edebî: Şems û hilal (**tezad**), li ser sûret çî xweş bû neqş (**isti’are**), ji çahê xebxeba rûbexş, heyat da cumle insan e (**husna te’lîl**).

Heçî ku şeh ewî mey da

16. Nihayet bûye ew şeyda

Ji yûmn û himmeta seyda

Çirax hilkir di eywan e

Hunerên Edebî: Heçî ku şeh ewî mey da (**terdîd**), çirax hilkir di eywan e (**mubalexe, kinaye**).

Ji **Tûrê** qelbê **wek** şem'e

17. Bi sîne çu giha lem'e

Bûye medhûş û bê sem'e

Wekî Mûsa binî 'Imran e

Hunerên Edebî: Tûr (**telmîh**), wek, wekî (**teşbîh**), Mûsa binî 'Imran (**telmîh**).

Çû qesd dil ke ew nexçîr e

18. Ji wan taqê mûqernes tîr e

Wî barand feyz kir tesîr e

Şebihî ebrê Nîsan e

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), şebihî (**teşbîh**), şebihî ebrê nîsanê (**irsala mesel**).

Di vî 'esrî mebe xafil

19. Meborîn 'umrî bê hasil

Vexwe **camek** meya nahil

Ji destê **pîrê meyxane**

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), vexwe camek meya raiq (**camek-mecaza mursel**), pîrê meyxanê (**isti'are**).

Hero mey nayête bazarê

20. Eger nekirî tu vê carê

Tu nabînî di dil narê

Ji wî le'lê Bedexşan e

Hunerên Edebî: Hero mey nayête bazarê (**teşxîs, kinaye, mecaza mursel**), tu nabînî di dil narê (**mecaz**).

Meya engûrî lew nîne

21. Şeraba wehdet û dîn e

Şeh anî wî ji Nûrşîn e

Gihand pê **can** bi **canan** e

Hunerên Edebî: Meya engûrî lew nîne, şeraba wehdet û dîn e (**kinaye û mecaz**), şeh anî wî ji Nûrşîn e (**isti'are**), can û canan (**îştîqaq**).

Tu şem'a cem'ê xullan î

22. Bi hûsnê Mahê Ken'an î

Tu Ebdulqadirê Sanî

Bi te ruh hat seyrane

Hunerên Edebî: Tu şem'a cem'ê xullan î (**isti'are**), bi hûsnê (**teşbîh**), Mahê Ken'an (**telmîh**).

Bi "Qutbil-arifîn" Taxî

23. Bû "Şemsuddîn" di vî baxî

Muhammed Hadiyê Laxî

Nekî mehrûm ji Irfan e

Hunerên Edebî: Dengê -îyê (**asonans**), dengê myê (**alîterasyon**), Muhemmed Hadiyê Laxî (**tecrîd**).

Esîr û bê newa maye

24. Feqîr û mubtela maye

Merîz û bê dewa maye

Meded ke bo wî derman e

Hunerên Edebî: Dengê -eyê (**asonans**), dewa û derman (**sînonîm**), li hevkirina tevahiya qîteyê jî (**teşbîhul etraf**) e.

EV DILBERA RÛMAHÎ

1. Ev dilbera rûmahî bi qewsê xweyê hilalî
Yek du xedeng li dil da mecruh bû û nalî

Hunerên Edebî: Dilbera rûmahî (**isti'are**), qewsê hilalî (**teşbîh**), xedeng li dil da (**teşxîs**), mecruh û nalî (**sînonîm**).

2. Min go: Te tîr li min da ji wan ebrû kemanî
Ku geh li min ke tîranê di xwe û dikalî

Hunerên Edebî: Te tîr li min da (**mecaz**), ji wan ebrû kemanî (**teşbîh**), ku geh li min ke tîranê di xwe û dikalî (**mecaz**).

3. Min go: Ji zulfê mişkîn yek merhemek li dil ke
Go: Merhema ji misk e, jê tê zerer tewalî

Hunerên Edebî: Ji zulfê mişkîn (**teşbîh**) yek merhemek li dil ke (**mecaz û teşxîs**), go: merhema ji misk e (**întaq**), zulfê mişkîn- jê tê zerer tewalî / merhemek li dil ke- merhema ji misk e (**leff û neşr**).

4. Min go: Bi heqqê zulfeyn pêl bûse dim du le'leyn
Go: Mahê sewm û bûse şer' nadîtin helalî

Hunerên Edebî: Du le'leyn (**isti'are**), bi heqqê zulfeyn pêl bûse dim (**teşxîs**).

5. Min go: Di şeb serayê dê bêmê xelweta xas
Na na mehremî go: Nabe nezer dî min cemalî

Hunerên Edebî: Min go: Şeb serayê dê bêmê xelweta xas (**teşxîs**), merhemi go: Nabe nezer dî min cemalî (**întaq**).

6. Min go: **Ji dest fîraqê ez sîne çak û dal im**

Go: Çakê dil xwe rîbe **dal dale** ser delalî

Hunerên Edebî: Ji destê fîraqê (**teşxîs**), ez sîne çak û dal im (**teşbîh**), dal-dal- dal (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**), Min go: Ji destê fîraqê- Go: Çakê dil xwe rîbe / ez sîne çak û dal im- dal dal e ser delalî (**leff û neşr**), dengê –lyê (**alîterasyon**).

7. **Min go: Ez birîndar hem tihme ey nikarî**

Go: **Dilbirînê** avê nabe **vexwe ji zelalî**

Hunerên Edebî: Min go: Ez birîndar- Go: Dilbirînê avê / tihme ey nikarî- vexwe ji zelalî (**leff û neşr**), ey nikarî (**nîda**), dengê –iyê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

8. **Min go: Ji çêşmê cado bes bikuje min feqîrî**

Go: **Cadowan çi kar e, xeyrî kuştin û qitalî**

Hunerên Edebî: Min go: Ji çêşmê cado (**isti'are**) – Min go: Cadowan çi kar e / bes bikuje min feqîrî (**teşxîs**) – xeyrî kuştin û qitalî (**leff û neşr**), kuşrin û qital (**sînonîm**).

9. **Min go: Were tu rûnê ser her du çêşm û çavan**

Go: Ji xar muje dibîne cismê herîr melalî

Hunerên Edebî: Were tu rûnê li ser herdu çêşm û çav (**mecaz û sînonîm**).

10. **Min go: Ez im di îro sail û nabime menhûrî**

Go: **Dilberan û ‘ûşşaq** nakevin vî meqalî

Hunerên Edebî: Dilber û ‘ûşşaq (**sînonîm**), dengê –iyê (**asonans**).

11. **Min go: Di kecxêşê da kuştî te min nehîfî**

Go: Sal kec û bi xişşe ev zulme hukmê salî

Hunerên Edebî: Min go: Di kecxêşê da kuştî – Go: Sal kec û bi xişşe / te min nehîfî – ev zulme hukmê salî (**leff û neşr**), dengê –eyê (**sînonîm**).

12. **Min go: Şahê Hezanî min kuşt bi ev nîşanî**

Go: Şahê Taxî **kuştî** wî jî bi ev **misalî**

Hunerên Edebî: Hezanî- nîşanî- kuştî- misalî (**tesmît**), Şahê Hezanî min kuşt bi ev nîşanî (**kinaye**), misalî (**teşbîh**).

13. **Her çi min go şepalê yek yek ewan wê red kir**

Ev renge **şenê** şahan hukmî dikin li mewalî

Hunerên Edebî: Şepalê- wê- şenê (**tesmît**), ev renge (**teşbîh**), yek yek (**tedrîc**).

14. **Ya Reb çi bê wefa ne ev dilberanê cado**

Dikujin kefen jî nakin kuştîyê xet û xalî

Hunerên Edebî: Ya Reb (**nîda**), cado (**sihra helal**).

15. **Ebrû hilalî rûrojî, sînesedef, didandur**

Şeb zulfan gîso ‘enber kuştîm bi yek xiyalî

Hunerên Edebî: Ebrû hilalî, rûrojî, sînesedef, didandur, zuluf (**tenasub**), tevahiya beyte (**teşbîhul etraf**), şeb zulfan gîso ‘enber kuştîm bi yek xiyalî (**mubalexe**).

16. **Her kes bi qedr û hal e, ez mam feqîr û jar e**

Bes ke li min delalî vê xedr û vî kelalî

Hunerên Edebî: Her kes bi qedr û hal e – bes ke li min dellaî / ez mam feqîr û jar e – vê xedr û vî kelalî (**leff û neşr**), feqîr û jar (**sînonîm**).

17. Bû **hevde sal tamam e**, dikêşim ev **melame**

Keftim ji qedd û **qame** qet min nedî **kemalî**

Hunerên Edebî: Bû hevde sal tamam e (**tarîxa vekirî**), tamam e- melame- qame- kemalî (**tesmît**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**).

18. **Alam û derdê ser min ger ser cemel ba cana**

Kafir dê biçne cennet fam ke tu ev mealî

Hunerên Edebî: Alam û derdê (**sînonîm**) min ser cemel ba cana (**mubalexe**), kafir dê biçne cennet fan ke tu ev mealî (**mubalexe**).

19. **Yek sal** di sohbeta şah yek sa’etek xwuya kir

Roja ku wî nebinim yek saleke bi celalî

Hunerên Edebî: Yek sal (**tarîxa vekirî**) di sohbeta şah yek sa’et xwuya kir (**mubalexe**), roja ku wî nebînim yek saleke bi celalî (**mubalexe û mecaz**).

20. Îmdad ke Xews û Seyda feryadresî ji wan e

Şahê Hezan jî nabe dûr be ji wî mecalî.

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

4

EV ‘UMRÊ GIRAN MAYE

Ev ‘umrê giran maye ji dest çû bi nezanî

1. Rû zerd e ji firqet heme **wek** berke xezanî

“Ya leytenî bi elwesile za al xul ciranî”

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Wek (**teşbîh**), ya leytenî bi elwesile za al xul ciranî (**îqtibas**), îmdad û meded (**îştîqaq**), îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezan (**neqeratek e yanî dibe tekrîr**).

Ba ah û fîxan bes ke şeb û rojê dinalim

2. **Mecrûh û birîndar** im nehîf **şubhî** hîlal im

Qamet çû **elîf** bûm ji xeman **şubhetî dal im**

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Ah, fîxanî nalîn, mecrûh, birîndar (**tenasub**), şeb û roj (**muqabele**), şubhî (**teşbîh**), mecrûh û birîndar (**sînonîm**), qamet çûm elîf bûm (**isti'are**) şubhetî dal im (**teşbîh**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Dûrî ji te heq **merge**, eger navî **heyat** e

3. Xweşbext î ewe rojekê ew pêşda giha te

Dûr mame tenê ez ji **lebê şehd û nebat** e

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Merg û heyat (**teзад**), denge –eyê (**asonans**), lebê şehd û nebat (**teşbîh**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Heşt wesfê zekaxur di me da hatine wucûdê

4. Heşt cennete husne da te xweş kiriye qu'ûdê

Heqqê xwe dixwazim ji te **ey menbe'ê cûdê**

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Ey menbe'ê cûdê (**nîda**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

Îro te simat kêşa bi her sûyî diyar e

5. Cuz men hemî xwar in ji wî emrod û enar e

Der **şewq û tereb** cumleyê eyyam buhar e

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Şewq û tereb (**sînonîm**), denge –eyê (**asonans**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Naçar û kelîl mame ji dest nefsa rezîle

6. **Bedkêşe** xwe qet naspêre **jar** û delîl e

Heqqê ku di ‘ûqba dibitin **jar** û zelîle

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Naçar û kelîl, bedkêş, jar (**tenasub**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Zulfeynê ku li şemsê ruxê te girte sehabe

7. **Her geh ku seba lê diditin jê diçî tab e**

Her roj ji wî sed dil û can kiriye kebab e

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Her geh ku seba lê diditin jê diçî tab e (**husna te’lîl**), denge –eyê (**asonans**), her roj ji wî sed dil û can kiriye kebab e (**mubalexe û mecaz**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Her yek ku digel dostê xwe daim di wisal e

8. **Ew cennete firdewsî ji halê wî missal e**

Mehcûrê ji yarê xwe wî dozex bûye hal

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Ew cennete firdewsî ji halê wî missal e (**mubalexe û kinaye**), denge –eyê (**asonans**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Ger min hebitin sed **rih** û sed **qalib** û sed **qelb** e

9. **Îro dê fîda kem ji bo ew xadimê ‘utbe**

Min bîne şûmarê tu di rêza **seg** û **kelbe**

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Rih, qalib, qelb (**tenasub**), seg û kelb (**sînonîm**), denge –eyê (**asonans**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Xweş nazikî ku ya ku ji gul qet ne siruşt î

10. **Aya melek î ya perî ya hûriya bihişt î**

Herdem bi xedengê xwe min mezlûmê te kuştî

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Aya melek î ya perî ya hûriya bihişt î (**tecahula ‘arif û tenasub**), denge –eyê (**asonans**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Ez **mufliis û naçar û birîndar û nezarim**

11. **Daim bi şeb û rojê di hecra te dizarim**

Her çi kut e navê min ewî avêt û dikarim

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Ez mufliis û naçar û birîndar û nezarim (**tenasub**), şeb û roj (**muqabele**), denge –iyê (**asonans**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Ew sohbetê can sozê te iksîrê bi sogend

12. **Wî da di dil û cane hezar sukker û hem qend**

Ew kes ku nenasî te meala ewe derbend

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Ew sohbetê can sozê te iksîrê bi sogend (**mecaz**), denge –eyê (**asonans**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Erkanê diyanet bi te îro bûye muhkem

13. **Her kes ku te dî ew bi mehebbet bûye me’len**

Nabîne te her kes tu yî yek kenzê mutelsem

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Erkanê diyanet (**îsti'are**) bi te îro bûye muhkem (**husna te'lîl**), denge –eyê (**asonans**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Ya Rebbî mueyyed kî tu vî şahî ji bo me

14. Kêşaye bi çavan ji mehebbet ewî surme

Bû şemse di Îslamê bi roj û bi şevê me

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Ya Rebbî (**nîda**), kêşaye bi çavan ji mehebbet ewî surme (**mubalexe û kinaye**), denge –eyê (**asonans**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

Ev cewirkê dergehê te **HADÎ** çi kemîn e

15. Me'wa û melazê wî mudam babê emîn e

Îro tu bi seyda kî birêjî feyze mubîne

Îmdad û meded qutbê zeman Şahê Hezanî

Hunerên Edebî: Ev cewrikê dergehê (**îsti'are**) te **HADÎ** çi kemîn e (**tecrîd**), denge –eyê (**asonans**), denge –myê (**aliterasyon**), îmdad û meded (**îştîqaq**) qutbê zeman Şahê Hezanî (**tekrîr**).

5

FEYZ Ê KEREMA BARÎ

1. **Feyz û kerema barî dibarî** bi kemalî

Seyda bi cemal e

Hunerên Edebî: Feyz û kerem (**sînonîm**), barî- dibarî (**cînas**).

2. **Dunya ji fuyûzatê wî bû behr û newal e**

Pur cezbe û hal e

Hunerên Edebî: Dunya ji fuyûzatê wî bû behr û newal e (**husna te'lîl**).

3. Wî fâniye mutleq di vî ‘esrî tu bizane

Bi şekk û guman e

Hunerên Edebî: Fâniye mutleq (**îsti’are**), şekk û guman (**sînonîm**).

4. ‘Alem ji elem xalî bû, bû gulşen û lale

‘Aşiq di wisal e

Hunerên Edebî: ‘Alem ji elem xalî bû, bû gulşen û lale (**teşxîs**), dengê –ayê (**asonans**).

5. Xweş pîrê xerabate Xweda kir wî huweyda

Ruh im fida seyda

Hunerên Edebî: Pîrê xerabatê (**îsti’are**).

6. Nûtqa wî ji bo ‘amî dibî ‘eynê zelal e

Ya sihre helal e

Hunerên Edebî: Nutqa wî ji bo ‘amî (**mecaza mursel**), ya sihra helal e (**sihra helal**).

7. Zulfeynê mû’enber ku li dor xeddî xuya ye

Qanûn û şifa ye

Hunerên Edebî: Zulfeynê mu’enber (**îsti’are**).

8. Derman û dewa ye ji bo emraz û melal e

Def’ kir wî kelale

Hunerên Edebî: Derman û dewa (**sînonîm**), denge –eyê (**asonans**).

9. Ceninatê ne’îm behs ku ji wî tê bi dewam e

Metlûbê ‘ewwam e

10. Ew ‘aşiqê şûrîde **meram wî xet û xal e**

Hem zulfê delal e

Hunerên Edebî: Meram wî xet û xal e (**kinaye**).

11. **Xweşxo** yî çî **xweşgo** yî çî **xweşbo** yî tu seyda

‘Alem ji te şeyda

Hunerên Edebî: Xweşgo, xweşxo, xweşbo (**îştîqaq**), çî (**tekrîr**), dengê –xyê (**alîterasyon**).

12. Sohbet ku dikî bi **saz û def û ney û qewal**

Dil serxweş û lal e

Hunerên Edebî: Saz û def û ney û qewal (**tenasub**), dil serxweş û lal e (**teşxîs, mecaz**).

13. ‘Işqa te xedar e dil û can bû ji wî ‘ar e

Sotin ji wî nare

Hunerên Edebî: Sotin ji vî nar e (**mecaz û mubalexe**), dengê –ayê (**asonans**).

14. Gîsoyê mû’etter ku seba lê bû hewale

Da dil wî celale

15. Seyda ku **sera payî** bûye mezherê nûr e

Her dil ji wî **Tûr e**

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), sera payî (**tedrîc**), Tûr (**telmîh**).

16. **Hubba wî li dor şemsê dilî bûye çî hale**

Rêfî li wî jale

Hunerên Edebî: Hubba wî li dor şemse dilî bûye çî hale (**mubalexe û mecaz**).

17. Wellah di vî ‘esrî wekî Şahê me Taxî

Nabit di vî baxî

Hunerên Edebî: Nabit di vî baxî (**mecaza mursel**), dengê –îyê (**asonans**).

18. Her kesê ku ji destê wî **vexwar camekê ale**

Napuxte û kal e

Hunerên Edebî: Vexwar cameke ale (**mecaza mursel**), dengê –eyê (**asonans**).

19. Mişkîn kire **Nûrşîn** ku ji wî reşkê dikit çîn

Xweş babê Ziyadîn

Hunerên Edebî: Nûrşîn (**mecaza mursel**), dengê –iyê (**asonans**).

20. “**Wer-rîn ‘en’îl-qelbî ezabe we ezale**

Wel hub beda lehu”

Hunerên Edebî: “wer-rîn ‘en’îl-qelbî ezabe we ezale, wel hub beda lehu” (**îqtibas**), dengê –eyê (**asonans**).

21. **Ew qulzemê zexxar e hezar yemmê cewahir**

Bûye ji wî zahir

Hunerên Edebî: Ew qulzemê zexxar (**îstî’are**) e hezar yemmê cewahir, bûye ji wî zahir (**husna te’lîl**), dengê –eyê (**asonans**).

22. Îslam bi wî geş bû û nema fisq û delal e

Qelb girtî siqale

Hunerên Edebî: Qelb girtî siqal e (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

23. **Qewseynê li ser şems û qemer kiriye qirane**

Feyz rête cihane

Hunerên Edebî: Qewseynê li ser şems û qemer (**muqabele**) kiriye qirane (**teşxîs**), dengê –eyê (**asonans**).

24. Qeyd kiriye di bende da eger **Rustemê Zal e**

Ew zulfe rû male

Hunerên Edebî: Rustemê Zal (**telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

25. Her roj bi texeyyul hezar bos û kenare

Dil sendê jiyare

Hunerên Edebî: Her roj bi texeyyul hezar bos û kenare (**mubalexe**), dil sendê jiyare (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

26. Lew meşqê mehebbet ji bo dil “xa” û du “dal” e

Ya “qaf” û du “dal” e

Hunerên Edebî: Tevahiya misreyê (**mu’emma**), dengê –eyê (**asonans**).

27. Seyda tu kerem ke were pêş Şahê cihanî

Hem qutbê zemanî

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**).

28. Lutfa xwe birêje ku cihan wehm û xeyal e

Hem curm û webal e

Hunerên Edebî: Lutfa xwe birêje (**teşxîs**) ku cihan wehm û xeyal e (**sînonîm**), curm û webal (**sînonîm**).

29. “Qutbul’arifîn” î tu di Nûrşîn da nişînî

Nisbet dereşînî

Hunerên Edebî: “Qutbul ‘arifîn (**mecaza mursel**) î ti di Nûrşîn da (**mecaza mursel**), dengê –îyê (**asonans**).

30. Her gih bi cemale ji te nadir tê celal e

Xweş xulq û xisal e

Hunerên Edebî: Her gih bi cemala te nadir tê celal e (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

31. Geylaniyê Sanî ji te ra **dost û mu’in** e

Ba ‘eqlê rezîn e

Hunerên Edebî: Dost û mu’in (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

32. Her gih ku şebeyxunê dike ber sehl û cibale

Manendê cibal e

Hunerên Edebî: Dengê –yê (**asonans**).

33. Der daireye ‘îşqê tu yî merkez û ‘umde

Her dil bi te qesd e

Hunerên Edebî: Der daireya ‘îşqê tu yî merkez û ‘umde (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

34. Me’na te mu’emma ye ne me’qûlê bi qal e

Derka te mehale

Hunerên Edebî: Me’na û mu’emma (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**).

35. Ev bey’û şiraya te di ‘îşqê çî bi ca ye

Mehza ji Xweda ye

Hunerên Edebî: Dengê –iyê (asonans).

36. Her kes ku şemala te wî dî bûye hilal e

Perwane missal e.

Hunerên Edebî: Her kes ku şemala te wî dî bûye hilal e (**husna te'lîl**), perwane missal e (**teşbîh**), dengê –eyê (asonans).

37. ‘Alem hemî yek cism û di wê tu **wekî** ruh î

Ya şûbhetî yûhî

Hunerên Edebî: Tu **wekî** ruh î (**teşbîh**), ya (**nîda**) şûbhetî (**teşbîh**) yûhî, dengê –eyê (asonans).

38. Her dil ji te mecruh û ji ‘işqa te dinale

Manendî Bilal e

Hunerên Edebî: Her dil ji te mecruh û ji ‘işqa te dinale (**mecaz**), manendî Bilal e (**telmîh û teşbîh**).

39. Seyda ku bi wê ‘alemê berzex kirî hicret

Xerq bû di şhadet

Hunerên Edebî: Seyda ku bi wê ‘alema berzex kirî hicret, xerq bû di şhadet (**telmîh**).

40. Îro me tesellî bi Ziyadînê delal e

Pûr nûr û şemal e

Hunerên Edebî: Nûr û şemal (**sînonîm**).

41. Ew nisbet û feyza ku îlahî te li seyda

Dîtî bû ji xeyda

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), dîtî bû ji xeyda (**mecaz**).

42. Îro bi Zîyadîn de bi **tekmîl û kemal** e

Sohbet ke bi hal e

Hunerên Edebî: Tekmîl û kemal (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

43. **Manendî Muhammed** tu nekes **muflîs û naçar**

Efxan dike her car

Hunerên Edebî: Manendî Muhammed (**teşbîh û telmîh**), muflîs û naçar (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

44. Xweş cewrekê xalê dişîrîne bi **cezal** e

“Allah **cezale**”

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**)î cezal e cezale (**cînas**).

6

JI HESRET EZ DIBÊM DAIM

Ji hesret ez dibêm daim

1. Tu nûra çav û hem can î

Ji xeflet ez heme naim

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Tu nûra çav û hem can î (**teşbîh**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Gunehkar im birîndar im

2. Ji destê nefse **bêzar** im

Feqîrhal im niyazdar im

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Gunehkarî birîndar, bêzar, feqîrhal, niyazdar (**tenasub**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**), tevahiya qîteyê (**teşbîhul etraf**).

Esîr im muflîs im bêkes

3. Disojim ez wekî quqnes

Ez im xaşak û xar û xes

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Esîr im muflîs û bêkes (tenasub), dengê –eyê (asonans), wekî quqnes (teşbîh), xaşak, xar, xes (tenasub), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Ez naçiz û hem la şey

4. Menazil nabitin qet tey

Hezîn im ebkem hem ‘ey

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**), dengê –nyê (**alîtrasyon**), dengê –eyê (asonans).

Ji şewqa qameta ‘er’er

5. Dil û can min bûye kerker

Nebatî şehd û hem şeker

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Ji şewqa qameta er’er (**teşxîs**), dil û can mi bûye kerker (**teşbîh**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**),

Were carek bi merdane

6. Ku şa ke babê meyxane

Tu mey de cumle rindane

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Babê meyxane (**mecaza mursel**), mey (**mecaz**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

Çû gest im wan **du şehmaran**

7. Birîndar im gelî yaran
Dibarin eşk wek baran
Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Du şehmar (**telmîh, îsti'are**), dengê –ayê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Wekî murxê seher hergeh

8. **Dinalim ez li ber dergeh**
Heta ku bête min mergeh
Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Wekî murxê (**teşbî**), dinalim ez li ber dergeh (**kinaye**), dibarin eşk wek baran (**mubalexe û teşbîh**), dengê –ayê (**asonans**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Di xewna da yê Geylan e

9. Digo bi navê min nav dane
Li wî hemla xwe ya xane
Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Dengê –ayê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Wekî navê te wî danî

10. Dibî elbette rebbanî
Dibêm ez lew xezel xwanî
Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Wekî navê te (**teşbîh**), dibêm ez lew xezel xwanî (**rucû'**), dengê –eyê (**asonans**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Çi şox û şeng û dildar e

11. Ji dil avêtî exyar e

Di dil da rakirî nar e

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Çi şox û şeng û dildar e (tezmîn), ji dil avêtî exyar e (kinaye), di dil da rakirî nar e (mubalexe û mecaz), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Dinalim ez şeb û roze

12. Bi pêt û agir û soze

Dibêjim ez bi deryoze

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Şeb û roz (**muqabele**), pêt û agir (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Hemî eshab sefer kêşa

13. Digel ehbab û derwêşa

Tinê dûr mame ez êşa

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Hemî eshab sefer kêşa (**telmîh**), dengê –eyê (**asonans**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Li dergehê te me çakir

14. Wekî ku min li wî ça kir

Cewarih cumle bûn şakir

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Çakir û ça kir (cînas), wekî (teşbîh), dengê –iyê (asonans), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Te zaxan îro **çîn çîn** kir

15. Minê miskîn te pê **dîn** kir

Bi wî teqûyyeta **dîn** kir

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Çîn çîn (**tekrîr**), dengê –iyê (asonans), dîn û dîn (cînas), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

Xwedê daye te ev rutbe

16. Ez im **Qitmîrê** ev ‘utbe

Dikim efxan **wekî kelb e**

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Qitmîr (telmîh), wekî kelb e (teşbîh), dengê –eyê (asonans), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Hezan da îro tu şah î

17. Ji bo Îslamê tu rah î

Bi te çêbûne gumrah î

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Hezan (**mecaza mursel**), bi te çêbûne gumrah î (**husna te’lîl**), dengê –ayê (asonans), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Li ser sethê xerabatê

18. Dirêjî her fuyûzatê

Te dil kir xesb û xarate

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (asonans), meded Geylaniyê Sanî (tekrîr).

Bi heqqê sirrê seyda kî

19. **Bi heqqê** Xewsê Xeyda kî

Bi rahek ruhê min şa kî

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Bi heqqê (tekrîr), bi rahek ruhê min şa kî (mecaz), meded Geylaniyê Sanî (tekrîr), dengê –êyê (asonans).

Nema min **sebr û temkin** e

20. **Ji şewqa babê şêrîn** e

Hewar babê Ziyadîn e

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Sebr û temkin (sînonîm), ji şewqa babê şêrîn e (husna te'lîl), hewar babê Ziyadîn (nîda), meded Geylaniyê Sanî (tekrîr).

Tu yî dildar û hem **dilber**

21. **Tu yî** hem **zemzem û kewser**

Tu yî serdar û hem **serwer**

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Tu yî (tekrîr), hem hem (tekrîr), dilber û dildar (îştîqaq), zemzem û kewser (sînonîm), serdar û serwer (îştîqaq), meded Geylaniyê Sanî (tekrîr).

Bi heqqê merqeda seyda

22. **Nekî** nasê mine şeyda

Wekî seyda bi te mey da

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Wekî (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Çi serhed îro te qesde
23. Te şadî bir duda wer de
Ji nûve dê birîn serde

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Di xakê derge rû mal im
24. Ji derdê firqetê dal im
Ji bê halî çî xweş hal im

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Ji derdê firqetê dal im (**teşbîh**), bê hal û xweş hal (**tezad**), dengê –eyê (**asonans**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

Muhammed hatî ber babe
25. Wexwe da ew **meya** nabe
Ku şeş perde du car nabe

Meded Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Muhammed (**tecrîd**), mey (**mecaz**), dengê –yê (**asonans**), meded Geylaniyê Sanî (**tekrîr**).

7

MEHWA CESED KE

Mewa cesed ke
1. İhya kebed ke
Şeytanî terk ke
Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Me'şûqe dilber

2. Her 'işq e rehber

Cîger me kerker

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Me'şûq û 'işq (**îştîqaq**), cîger me kerker (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Ez hema xafil

3. Bê 'eql û baqil

Nadan û cahil

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Bê 'eql û baqil (**tezdad**), nadan û cahil (**sînonîm**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Ez bê beser im

4. Hem bê xeber im

Ji guh jî kerr im

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Ez bê beser im (**kinaye**), hem bê xeber im (**kinaye**), ji guh jî ker im (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Tu şeyxê ekber

5. Ez 'ebdê efxer

Muflîs û ehqer

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Ekber û efxer (**težad**), dengê –eyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Ez bûme bê heş

6. **Pejmurde dilreş**

Naçar û nexweş

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Ez bûme bê heş (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**), bê heş-pejmurde- dilreş- naçar û nexweş (**tenasub**), tevahiya qîteyê jî (**teşbihul etraf**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Feyza Xweda ye

7. **Nik te xuya ye**

Min ke dewa ye

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Serrafê canî

8. **Didî me canî**

Xemra cinan î

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Can (**tekrîr**), can û cinan (**îştîqaq**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Min çû ji deste

9. **‘Umrê xwe custe**

Umêd ku suste

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: ‘Umrê xwe custe (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

“Q”ed merre ‘umrî

10. Webyedu şî’rî

Fextel emrî”

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Ez hatime **dergah**

11. Ba eşk û sed ah

Ez bûme gumrah

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Dergah (**mecaza mursel**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Min pure alam

12. Kesîre esqam

Wefire asam

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Hubba te rûh e

13. Lal û sebûh e

Dil pê futûh e

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Hubba te rûh e (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

Dil kir te talan

14. Cûyê Resûlan

Ez mame nalan

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: Dil kir te talan (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

HADÎ ne tişt e

15. Wî fi'îlê zîşt e

Birîn ghişte

Şeyxim meded ke

Hunerên Edebî: HADÎ ne tişt e (**tecrîd**), dengê - iyê (**asonans**), şeyxim meded ke (**tekrîr**).

8

‘AŞIQ KU HEBE MEZHER E

‘Aşiq ku hebê mezher e, bo cewr û cefayê

Hem mexzenê ekdar û xem û derd û belayê

1. Sercûn dibên xetweya ewwel di wefayê

Her suxte dibit bakir sed new'ê enayê

Da piştî fena bû'dê beqa bête liqayê

Hunerên Edebî: Cewr û cefa (**sînonîm**), ekdar û xem û derd û bela (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

Heyret bide bende xwe bi ifratê mehebbet

Rehmê ke li **qelbê ku disojit ji meweddet**

2. Minnet bike carek veke berqe' tu ji tel'et

Mehzûz bibe ta bende ji ruxsarî bi ru'yet

Ma dê çi bibit ger vekî berqe' ji semayê

Hunerên Edebî: Qelbê ku disojit ji meweddet (**teşxîs û mecaz**), ma dê çi bibit ger vekî berqe' ji semayê (**îstîhfam**).

Dilber bi hezar **cilwe** û sed **naz** kirişme

Carek li 'ûşşaqê xwe tecellî dîke dême

3. **Ew mehwe dibin ji ru'yeta wî 'arizê sîme**

Xalî dikirin ew hemî fi'lê di zemîme

Xweş dewlet e, ger diyese yek 'ebdê fenayê

Hunerên Edebî: Dilber, naz, cilwe, 'ûşşaq (**tenasub**), cilwe û naz (**sînonîm**), carek li 'ûşşaqê xwe tecelli dîke dême, ew mehwe dibin ji ru'yeta wî 'arizê sîme (**husna te'lîl**).

Ev dirhem û dînar û hemî malê muqenter

Ev mensib û ev cah û we reng libsê mu'etter

4. **Ev dilber û re'na ku şeban mû'nîse der ber**

Xafil kirine **qelb û dilan guh jî kirin ker**

Ya Reb tu meded ke ji bo vî **derd û dewayê**

Hunerên Edebî: Dirhemî dînar, mal (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –ryê (**alîterasyon**), qelb û dil (**sînonîm**) guh jî kirin ker (**irsala mesel**), ya Reb (**nîda**) derd û dewa (**muqabele**).

Ev nefis û hewa dunya û şeytan ku çar in

Qûtta'ê terîq in ji me ra şubhetî mar in

5. **Her çî ku li dû wan biçitin şubhî dewar in**

Ger mîr û mela, **şah û geda** bin hemî xar in

Der sûretê zahir hemî yek reng numayê

Hunerên Edebî: Ev nefis û hewa dunya û şeytan ku çar in (**telmîh**), qutta terîq in şubhetî (**teşbîh**) mar in (**tarîz**), her çî ku li dû wan şubhî (**teşbîh**) dewar in (**tarîz**).

Carek tu were **bal û peran** xweş biweşîne

Ji ev **kaxê dinê** seyr ke bi firdewsî berîne

6. **Bimre ku tu hêjî nemiriye bi hubb û bi evîne**

Îmdad û meded qutbê Hezan bêji bi enîne

Da penc letaif hemî seyrkin bi semayê

Hunerên Edebî: Bal û per (**sînonîm**), kaxê dine (**îsti'are**), bimre ku tu hêjî nemiriye (**îqtibas**), hubb û evin (**sînonîm**), îmdad û meded (**îştîqaq**).

Ji îmanê ye hubbê weten ey 'arifê exbar

Nê Şam û 'Iraq e weten **ey mexzenê esrar**

7. Serdest li 'erşê 'alemê rûhê weten **ey yar**

Îrsal bi weten penc letaif ke tu yek yar

Der sohbetê wê **dilberê mehbûbê** Xwedayî

Hunerên Edebî: Ji îmanê ye hubbê weten (**îqtibas**), ey mexzenê esrar (**nîda**), ey yar (**nîda**), dilber û mehbûb (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Ji **nefsa xebîs** nayête ita'ê bi nezarî

E'malê di zahir hemî xam in riya karî

8. **Sotin ji mehebbet** di vê **wek** 'ûs û qumarî

Ta nefsa bibit nacî û hem 'arî ji 'arî

Her zilla di pere dikujit **nefs gedayî**

Hunerên Edebî: Nefsa xebîs (**irsala mesel**), dengê –eyê (**asonans**), sotin ji mehebbet (**mecaz**), wek (**teşbîh**), ta nefsa bibit nacî û hem 'arî ji 'arî (**kinaye**), nefsa geda (**irsala mesel**).

'Amiyê "kal'in'am" çî dizanît heqê sohbet

Her çî ku ji sohbet kirî fehm kiriye wî xizmet

Ba **mal û beden** def' wî kir **şuhret û rexbet**

9. Me'yûs ji hemî xelqê cihan bûye bi himmet

Ev renga bi 'işqê diçitîn ew li beqayê

Hunerên Edebî: Dengê –iyê (asonans), mal û bedn û şuhret û rexbet (tenasub), ev renge (teşbîh).

**Rehma te Xwedayî li wî ‘ebdî be hezar car
Zanî ku çi miqdar e ji heddê xwe nebû mar**

10. Tacê tûj di vî ‘esrê xerab kirine bi yek c

**Qelb û dilê wan cahile mecrûhê birîndar
Ya Rebbî ji tacê tuj bide xelqî rehayê**

Hunerên Edebî: Rehma te Xwedêyî li wî ‘ebdî be hezar car (îrsala mesel), zanî ku çi miqdar e ji heddê xwe nebû mar (teşbîh), tacê tûj (îsti’are) div î ‘esrê xerab kirine bi yek car (tarîz), qelb û dil (sînonîm), ya Rebbî (nîda), dengê –eyê (asonans).

Îblîsê ku ne rê li ‘ewamanê feqîr hal
Her yek dibêjit: “Murşîdbillah”î me nînim mal

11. Lew “murşîdbillah”î melbes sewbekê mal

Der sûretê zahir hemî yek rengeş û yek qal
Lew hadî û çal qet nebû wan ferq û cudayî

Hunerên Edebî: Iblîs (telmîh), lew hadî (tecrîd û kinaye) û çal qet nebû wan ferq û cudayî (sînonîm), dengê –eyê (asonans).

Murşîd ew e ku ji sohbeta wî cem’ê dilan bit
Ji ewsafê bi ser xalê bitin **şubhî gulan bit**

12. Meşrebmelekî bin ji buzurgan û kelan bit

Her safî û sadiq be ne ‘eqreb ne yilan bit
Ev murşide laiq ji bo her **medh û senayê**

Hunerên Edebî: Şubhî gulan bit (teşbîh), her safî û sadiq be ne ‘eqreb ne yilan bit (teşbîh), mehd û sena (sînonîm), dengê –iyê (asonans), dengê –nyê (alîterasyon).

HADÎ bi mesel Şahê Hezan qutb tunîne

Her çi ji dilan kore wî nabîn û nevîne

13. Ba teyles û ba mirweh û ba tac ku nîne
Nik ehle siwer nabe hebîb babê şirîn e
Ya Rebbî ji van dilan rake ‘emayê.

Hunerên Edebî: HADÎ (**tecrîd**) bi mesel (**teşbîh**) Şahê Hezan qutb tunîne, her çi ji dilan kore wî nabîn û nevîne (**tarîz**), ya Rebbî (**nîda**) ji van dilan (**mecaza mursel**) rake ‘emayê, dengê –eyê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

9

EV ÇI DAR E ÇI DIYAR E

1. Ev çi **dar** e, çi **diyar** e ku hemî **gulşen** û **bax** e
Dilê min ji firqeta wî bûye birin û **dax** e

Hunerên Edebî: Dar û diyar û gulşen û bax (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**), bax e û dax e (**cinasa nîvco**).

2. Cihê ‘uşşaqê Xweda ye ku hemî mehremser in
Her çi damanê di wan girtî wî dil bûye sax e

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

3. **Şahid** û **saqî** û **mutrib** ku li wî **cem’** dibin
Ji xweş sohbeta yek salê di wan yek çax e

Hunerên Edebî: Şahid û saqî û mutrib û cem’ (**tenasub**), ji xweş sohbet yek salê di wan yek çax e (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

4. **Canfida xizmetê canan** dike **wek perwane**

Her çi ku ji ‘işqê giha **lezzet** û **zewqê bi dimax** e

Hunerên Edebî: Canfida û canan (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**), wek perwane (**teşbîh**), ‘îşq, lezzet, zewq (**tenasub**), xizmetê, ‘îşqê, zewqê, dîmax e (**tesmît**).

5. Her çi ku bihn kî xweş bihn kiriye bibînî xwe
Xadim û zairê wî merqedê Şahê Tax e

Hunerên Edebî: Dengê –byê (**alîterasyon**), dengê –iyê (**asonans**).

6. Bûye demsazê di nêv rewzê Qutbê Taxî
Her yek **bulbulsifet** e nîk tebî’et zax e

Hunerên Edebî: Bilbilsifet (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

7. Kiriye iqrar bi qutbîniya şah, **şah û geda**
Her çi ew reng didît çavê di wî ma zax e

Hunerên Edebî: Şah û geda (**muqabele**), dengê –eyê (**asonans**).

8. **Dem Mesîh e şehê** min hey kirî **qelbê** di mirî ye
Bûye memlû’ ji **fuyûzatê** wî sehl û **dax e**

Hunerên Edebî: Dem Mesîh e (**telmîh û teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**),
sehê, qelbê, fuyûzatê, dax e (**tesmît**).

9. Çi ku mesbûx bûye bi “sibxe Allah” lew bûye
Cumle **etba’ê** di wî ji dînê mûbîn ra max e

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), etba’ (**mecaza muesel**).

10. Wî çi xweş tehliye kir **qesra dil** û hem dîn e
Bi musendir bi **nuqûş** û bi **ref** û hem **cax e**

Hunerên Edebî: Qesra dil (**teşxîs**), dengê – yê (**asonans**), nuqûş, ref û cax (**tenasub**).

11. Her ke sabit qedem e, ew di riya **dostî** bizan
Wasile her ke **bi her ba biçitin** ew lax e

Hunerên Edebî: Dost (**mecaza mursel**), bi her ba biçitin (**kinaye û irsala mesel**), dengê –eyê (**asonans**).

12. Tu bi xwe dibînî mebe xafil **cananê canim**
Xûd nûma her ke heye **şubhî** hubab û max e

Hunerên Edebî: Canan û can (**îştîraq**), şubhî (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

13. Şahê Nûrşîn î, muresse' kirî rûh û can e

Her ke teslîm nekirî dil bûyî ew wek nax e

Hunerên Edebî: Her ke teslîm nekirî dil bûyî ew wek (**teşbîh**) nax (**mecaz**), denhê –îyê (**asonans**).

14. Xwuziya min bi wî 'ebdê ku li nik Şahê xwe rûne

Vexwe şîrê du sediyên û biket pur kax e

Hunerên Edebî: Vexwe şîrê du sediyên (**kinaye**), dengê –iyê (**asonans**).

15. Sohbeta Şahê Buxara tu di **Nûrşînê** bibîn

Mebe **wek mişkê di mişkanê** sefih û kax e

Hunerên Edebî: Sohbeta Şahê Buxara tu di Nûrşînê (**mecaza mursel**) bibîn, mebe wek (**teşbîh**) mişkê di mişkanê (**irsala mesel**) sefih û kax e.

16. Tu bi hubba **Şahê Nûrşîn** bike hey **qelbê miriye**

Da ku mehkem bibe **dil şubhî buyûtê sax e**

Hunerên Edebî: Şahê Nûrşîn (**mecaza mursel**), qelbê mirî (**mecaz**), mirî-sax (**tezad**), dil şubhî (**teşbîh**) buyûtê sax e.

17. **Hadiyê name siyah** maye wehîd û bêkes

Meded feyz û kerem xwestî ji Şahê Tax e.

Hunerên Edebî: Hadiyê (**tecrîd**) name siyah (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

10

EW DILBERA QEWS EBRÛ

Ew **dilbera qews ebrû**

1. Wesla xwe me mizgîn da

Ew tel'etê mah û rû

Camek bi me şîrîn da

Hunerên Edebî: Ew dilbera qews ebrû (**teşbîh**), camek (**mecaza mursel**).

Ew we'da ber û taqan

2. **Bû mutrib û 'ûşşaqan**

Ew **şah** in û hem **xaqan**

Weslê ku bi te'yîn da

Hunerên Edebî: Mutrib û 'ûşşaq (**sînonîm**), şah û xaqan (**sînonîm**), dengê –ayê (**asonans**).

Her çend firaq tal e

3. **Her rojekê yek sal e**

Teslîm be meke nal e

Dilber wî we tehsîn da

Hunerên Edebî: Her çend firaq tal e (**mecaz**), her rojekê yek sal e (**mubalexe**), dengê –eyê (**asonans**).

Mecnun bûye hem şeyda

4. **Wek** Wamiq e pur **sewda**

Her çi ku di ‘**işqê** da

Dersek di wî telqîn da

Hunerên Edebî: Mecnûn (**telmîh**), mecnûn û şeyda (**sînonîm**), **wek** (**teşbîh**)
Wamiq e (**telmîh**), ‘işq û sewda (**sînonîm**).

Xaib ku ji nasût e

5. Rû reng ji lahut e

Wek mûrxek ceberut e

Her gavekê telwîn da

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), **wek mûrxek ceberut e** (**teşbîh**).

Yek carkî xef çûm **ez**

6. **Le’leynê bibûsim ez**

Le’leynê nebûsam ez

Tekdîrekî rengîn da

Hunerên Edebî: Le’leynê- le’leynê (**tekrîr**), bibûsim- nebûsim (**tezad**), ez- ez (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

Zulfeynê li ser xeddeyn

7. **Wek halekê li dor şemseyn**

Qewseynê li ser terefeyn

Xweş terefekî temkîn da

Hunerên Edebî: **Wek halekê li dor şemseyn** (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Zulfê wê sû'ba ne

8. Gestî dil û hem can e

Ez mame bi heyran e

'Eqreb ku li perwîn da

Hunerên Edebî: Zulfê wê sû'ba ne, gestî dil û hem can e, ez mame bi heyran e, 'eqreb ku li perwîn da (**terdîd û kinaye**).

Her çende ez im rencûr

9. Ew dilbera sîrethûrî

Min dît û ji xem bûm dûr

Lem'ê ku li balîn da

Hunerên Edebî: Ew dilbera sîrethûrî (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Didandur û leble'l e

10. Min çav ji bo wê ne'le

Ku bike nebê te'l e

Ker meşke di sengîn da

Hunerên Edebî: Leble'le, ne'le, te'le (**cînas**), min çav ji bo wî ne'le (**teşbîh**), ker meşke di sengîn da (**tarîz û irsala mesel**).

Ew nazika sîmdêm e

11. Roja wekû ez dêm e

Bûm dînekî bêbêm e

Wek bîme di lertzîn da

Hunerên Edebî: Sîmdêm, dêm û bêbêm (**cînas**), roja wekû (**teşbîh**) ez dêm e. Bûm dînekî bêbêm (**teşbîh**). Wek (**teşbîh**) bîme di lertzîn da. tevahiya qiteyê jî (**teşbîhul etraf**) e.

Wek kebkê durê ew yar

12. Reftar kirî yek car

Can û cigerê kir nar

Min di rê da dil û dîn da

Hunerên Edebî: Wek (**teşbîh**) kebkê durê ew yar, can û cigerem kir nar (**mecaz û mubalexe**), min di rê da dil û dîn da (**kinaye**).

Ew me'denê esrar e

13. **Hem qulzum û zexxar e**

Her kes ji wî nezzar e

Wî hisse min nalîn da

Hunerên Edebî: Ew me'denê esrar e (**teşbîh**), hem qulzum û zexxar e (**teşbîh**).

Ew roj lew li cewza ye

14. **Berqek li Licê daye**

Her kes ji wî sewda ye

Ez mame di nifrîn da

Hunerên Edebî: Berqek (**mecaza mursel**) li Licê (**mecaza mursel**), ez mame di nifrîn da (**mecaz**).

Roj ku biçitin seretan

15. **Hîvî me heye ji rehman**

Ku em biçin nik **sultan**

Sultan bi xwe te'zîn da

Hunerên Edebî: Sultan (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

Berqe' ku ji ber tel'et

16. Rakir li me bû cennet

Mecnûn kir û wehm best

Der kakûlê perçîn da

Hunerên Edebî: Berqe' ku ji ber tel'et, rakir li me bû cenet (**husna te'lîl**).

Ew hûriya mînû ye

17. Menzer wê wekî ro ye

Ew nazik û xweşxuy e

Tîrek li minê dîn da

Hunerên Edebî: Menzer wê wekî (**teşbîh**) ro ye, tîrek li minê dîn da (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –wyê (**alîterasyon**).

Bû **dilber** û hem **dildar**

18. Her çi ji wî bû hişyar

Ew 'arife "zulfekar"

Kor maye di texmîn da

Hunerên Edebî: Dilber û dildar (**îştîqaq**), ew 'arife "zulfekar" (**telmîh**), kor maye di texmîn da (**kinaye û terdîd**).

Ew şeh ji Resûlan e

19. Dil bir wî bi talan e

Ez mame bi nalan e

Di firqeta xwûnîn da

Hunerên Edebî: Dil bir wî bi talan e (**mecaz û teşxîs**), di firqeta xwûnîn da (**teşbîh**), dengê –ayê (**asonans**).

Ev feyz û futuha tam

20. Ev nisbet û ev in'am

Ev xemr û subûha cam

Nûr kir wî di **Nûrşîn** da

Hunerên Edebî: Ev (**tekrîr**), dengê –ayê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**), nûr kir di Nûrşîn (**mecaza mursel**) da.

Xodbîn ne Xwedabîn e

21. Her çend e ku miskin e

Me'na ji mecazîn e

Ew dale di **xwudbîn** da

Hunerên Edebî: Xodbîn û Xwedabîn û xwudbîb (**îştîqaq**)î, dengê –xyê (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

“Fallahu huwel hadî

22. **Welmurşîdu seyadî**

Welzile mu'tadî”

Fanî ne Xwedabîn da

Hunerên Edebî: “Fallahu huwel hadî, welmurşîdu seyadî, welzile mu'tadî” (**îqtibas**), dengê –îyê (**asonans**).

HADÎ li dû dergahan

23. **Bikşîne ji dil ahan**

Telbeke ji wan şahan

Rahek bi me nûşîn da.

Hunerên Edebî: Hadî li dû dergahan (**tecrîd**), dergahan û ahan (**cinas**), rahek bi me nûşîn da (**kinaye**).

MIN TE'ALELLAH DIGOTÎ

1. Min te'alellah digotî çon bi meş hat ew cenab
Kakûlê mişkîn li ser bedre belav bû bû hicab

Hunerên Edebî: Kakûlê mişkîn (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

2. **Sorgul û nergiz mi dî yaro we çavê ekhel**
 Dur û le'le yane **didan û lebê ew mahtab**

Hunerên Edebî: Sorgul û nergîz û le'le (**tenasub**), sorgul û nergîz- dur û le'le / yaro we çavê ekhel- didan lebê ew mahtab (**leff û neşr**), dengê –eyê (**asonans**).

3. “**Nûn**” û “**mîm**” e ez **dibînîm yane ebrû û dihan**
 Ew **Şebê Yelda** ye ya kakulê pur pîç û tab

Hunerên Edebî: “Nûn” û mîm e ez dibînîm tane ebrû dihan (**teşbîh**), Şebê Yelda (**telmîh û tezmîn**) ye ya kakulê pur pîç û tab (**tecahula 'arif**).

4. Ew du “**sad**” in wan qerîne yek “**elîf**” bû fasile
Yane herdu çavşirîn e ketye ortê enfê nab

Hunerên Edebî: Ew du “sad” in wan qerîne yek “elîf” bû fasile (**teşbîh**), yane herdu çavşirîn e ketye ortê enfê nab (**tecahula'arif**).

5. Ew **şepala** pur cemala **nazika sîmînbenedeb**
 Dîn û dil bir wê ji her kes ba **def û çeng û rebab**

Hunerên Edebî: Ew şepal (**îsti'are**), nazika sîmînbeden (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), def, çeng û rebab (**tenasub**).

6. **Yek peyale** ji wê mudamê tu bike ihsan li me
Sofiye nadan bila bêjit: **Xebîs e ew şerab**
Hunerên Edebî: Yek peyale (**mecaza mursel**), dengê –eyê (**asonans**), xebîs e ew şerab (**teşxîs û mecaz**).
7. Qîl û qal û ‘ilmê min hebûn ekser ji ber
Lami’ê berqa evînê kir tulu’ ew bûn serab
Hunerên Edebî: Lami’ê berqa evînê (**îsti’are**).
8. **Ew hebîba xwe melek tîrek li dil da kir birîn**
Me enîn û ah û nalîn dil biket nabit ‘itab
Hunerên Edebî: Ew hebîba xwe melek tîrek li dil da kir birin (**mecaz**), enîn, ah û nalîn (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).
9. Der ezel her çi nivîsîn herkesi qismet ew e
Hingî ra fetwa û teqwa **hingî ra xemr û kebab**
Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), hingî ra fetwa û teqwa hingî ra xemr û kebab (**mecaz**).
10. Ez di cebha wê dibînim ayeta “**Nûr el hadî**”
Wê xeta me’na dixwînim her wekî katib kitab
Hunerên Edebî: Ayeta “Nûr el hadî” (**îqtibas**), katib û kitab (îştîqaq), dengê –iyê (**asonans**).
11. **Nake lazim ku bibîne her kes ew xetta Xweda**
Bûcehl çawan nedî nura Muhemmedî sewab
Hunerên Edebî: Nake lazim ku bibîne her kes ew xetta Xweda (**telmîh**), Bûcehl çawan nedî nûra Muhemmed sewab (**telmîh**), dengê –ayê (**asonans**).

12. ‘İşq û zewq û mestî û rindî bi zor nabit bizan

Nayête **coş** dîz eger bin da nebitin **iltihab**

Hunerên Edebî: ‘İşq û zewq û mestî û rindî û coş (**tenasub**), ‘işq û zewq û mestî û rindî – nayête coş dîz eger / bi zor nabit bizan- bin da nebitin iltihab (**leff û neşr**), dengê – iyê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

13. Dêrdê min **ya Reb** hezarkî qet nebin noqsan ji min

Her kesê amîn biket mexfûr bit “yewm el’uqab”

Hunerên Edebî: Ya Reb (**nîda**), dengê –eyê (**asonans**).

14. Ez **gunehkar û hezîn û bê kes û bê maye** me

Kelbê dergah im tuyim rehmetê ez yek hubab

Hunerên Edebî: Gunehkar û hezîn û bê kes û bê maye (**tenasub**), kelbê dergah (**îstî’are û telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

15. Min nema **sebr û qerar** e eşkê xwûnîn têne xwar

Tu bike **imdad û çare mufllis** im ‘alem xerab

Hunerên Edebî: Sebr û qerar (**sînonîm**), eşkê xwûnîn têne xwar (**kinaye**), imdad û çare û mufllis (**tenasub**) im ‘alem xerab (**tezmîn**), dengê –eyê (**asonans**).

16. **Ne’t û wesfê** te çi mumkin ez bikim **şerh û beyan**

Medhê te da ebkem im girte ji min sed mustebab

Hunerên Edebî: Ne’t û wesf, medh û şerh û beyan (**sînonîm**), dengê –iyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**).

17. Şeyx Ebdulqadirê Sanî û himmet ‘alî yî

Hadiyê şermende seyra bike ji feyza bê hisab.

Hunerên Edebî: Hadiyê şermende seyra bike ji feyza bê hesab (**tecrîd**), dengê –eyê (**asonans**).

12

XWUZÎ YARA RÛ GULNAR E

Xwuzî yara rû gulnar e

1. Bipursîna wê yek car e
Ji halê mine bêçare

Ku dil bûye sed pare

Hunerên Edebî: Ku dil bûye sed pare (**mecaz û mubalexe**), dengê –eyê (**asonans**).

Ku tu çawanî ey naçar

2. Birîn te sist e ya dişwar
Hekîmê te kî ye her car

Bi naz e yane xemxwar e

Hunerên Edebî: Ku tu çawanî (**îstihfam**) ey naçar (**nîda**), birîn te sist e ya dişwar (**îstihfam**), hekîmê te kî ye her car (**îstihfam**), bi naz e yane xemxwar e (**îstihfam**), dengê –eyê (**asonans**).

Bigota min ez im bê heş

3. **Birîn** min xwûn bûye tê reş
Birîndarê te me dilgeş
Dewa ke min bi dîdar e

Hunerên Edebî: Birîn û birîndar (**îstihfam**), birîn û dewa (**tezdad**), dengê –iyê (**asonans**), tevahiya qîteyê (**teşbîhul etraf**).

Ez im **bulbul** di nêv **bustan**

4. Dixwazim **sorgul** û rindan
Çi kim dê desteye **reyhan**
Ku **sorgul** dil birî xar e

Hunerên Edebî: Bulbul, bustan, sorgul, reyhan (**tenasub**), tevahiya qiteyê (**teşbîhul etraf**).

Di eflakan **şems** û **ro**

5. Ez im **wek Nîl** û **Fer îro**
Bi hîvî nakim ebrû ro
Ku **şemsê dil kirî har e**

Hunerên Edebî: Şems û ro (**sînonîm**), ez im **wek (teşbîh)** Nîl û Fer (**telmîh**) îro, ku şemse dil kirî har e (**kinaye û teşxîs**).

Tu **yî şemsa dilê pur boht**

6. Ez im **perwaneya** pur soht
Bi mihr û mahê nabim coht
Ku **şem'ê dil kirî nare**

Hunerên Edebî: Tu **yî şemsa dilê pur boht (teşbîh)**, ez im **perwaneya pur soht (teşbîh)**, ku **şem'ê dil kirî nar e (mubalexe û mecaz)**.

Ez im **dil teşneyê soxtî**

7. Tu **safî av** û **ber bextî**
Bireşîn xwe li min meytî
Xeyrî av navim pare

Hunerên Edebî: Ez im **dil teşneyê soxtî (teşbîh)**, **bireşîn xwe li min meytî (teşbîh)**, **xeyrî av nabim pare (mecaz)**, **dengê –eyê (asonans)**.

Bero ey Hadiyê naçiz

8. Bi damanê şehan awîz
Bi Ebdulqadirê amîz
Ez û bîndurê şehwar e.

Hunerên Edebî: Bero ey (**nîda**) Hadiyê naçiz (**tecrîd**)î dengê –eyê (**asonans**).

13

HERKESÎ TIŞTEK DIXWAZIT

1. **Herkesî tişteq dixwazit ya ne'îm ya hûrî 'în**
Ez dixwazim ku li dergahê te bim 'ebdek kemîn

Hunerên Edebî: Ez dixwazim ku li dergahê te bim 'ebdek kemîn (**terdîd**).

2. Her yekî dilxwahê wî mal weyaxûd mensib e
Min divê daim hebim mecrûh fuad û dilbirîn

Hunerên Edebî: Dilxwah û dilbirîn (**îştîqaq**), dengê –iyê (**asonans**).

3. **Tîrekî ji mujgan te avête dil û rûh bû niza'**
Her yekî ji bo xwe divêt yek dî jî bavêji bîre kîn

Hunerên Edebî: Tîrekî ji mujgan te avête dil û rûh bû niza' (**mecaz û mubalexe**), dengê –îyê (**asonans**).

4. Tade **wekî** vî 'elîlî tu bi derdan wî ji derd
Ta bibit sewda û mecnun tewbe ke ji 'eqlê rezîn

Hunerên Edebî: Tade **wekî** (**teşbîh**) vî 'elîlî, dengm –eyê (**asonans**).

5. **Min xelet go** sahib istixna ne her çî xwe biro
Wan çî bake ez bibim talan û hem endogehîn

Hunerên Edebî: Min xelet go (rucû'), dengê –eyê (asonans).

6. Ez heme **miskin feqîr û musitemend û bê 'eqar**

Qet xelas naket ji dest miskin tiwanger asetîn

Hunerên Edebî: Miskîn, feqîr, musîtemend û bê 'eqar (**tenasub**), dengê –iyê (asonans).

7. Ew cemala ku Xweda daye te qet nîne 'eceb

Tu bi her kişwer ku meş kî ew bibin sewda û dîn

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (asonans), tu bi her kişwer kum eş kî (**kinaye**).

8. **Şeyx Ebdulqadirî himmet ji qutbê Taxî ye**

Canfeza ye bi **hubbê** wan herdem divê **HADÎ evîn**

Hunerên Edebî: Şeyx Ebdulqadirî himmet ji qutbê (**teşbîh**) Taxî ye, hubb û evin (**sînonîm**), Hadî (**tedric**), dengê –eyê (asonans).

14

KEWSER Ê ŞEHD Ê NEBAT Î

1. **Kewser û şehd û nebat î** were ey ruhê beşer

Zemzem û abêheyat î were pêş can û ciger

Hunerên Edebî: Kewser, şehd, nebat, zemzem, abêheyat (**tenasub**), ey ruhê beşer (**nîda**), kewser û şehd û nebat- zemzem û abêheyat î / were ey ruhê beşer – were pêş can û ciger (**leff û neşr**). Kewser û şehd û nebat î (**îsti'are**), zemzem û abêheyat î (**îsti'are**), dengê –eyê (asonans), tevahiya helbestê (**teşbîhul etraf**).

2. **Ateşê sîne ne bes bû ku te da can û dile**

Hatî ba tîx û teber **qelb û ciger kir te du ker**

Hunerên Edebî: Ateşê sîne (**mecaz**), qelb û ciger kir te du ker (**teşxîs**), dengê –eyê (**asonans**).

3. Aysê di ‘arizê gulgûnê te da nûra Xweda

Şubhî perwane li dor wê geriya dil bi keser

Hunerên Edebî: Şubhî perwane (**teşbîh**) li dor wê geriya dil bi keser (**teşxîs** û **mecaz**).

4. Ji “Elest” mest nivîsîbû Xwedayê ezeli

Her çi îro ji meyê nakite bes şam û seher

Hunerên Edebî: Her çi îro ji meyê nakite bes şam û seher (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

5. **Bûye mexmûrê ebed her ke dî wan nergisê mest**

Her çi goş kir wî hedîsek ji te bîr kir wî şeker

Hunerên Edebî: Bûye mexmûrê ebed (**îsti’are**) her ke dî wan nergisê mest (**teşxîs**), her çi goş kir wî hedîsek ji te bîr kir wî şeker (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

6. **Mey bidê ger divê şehre tu ev terz û nemet**

Dê bide rehna meyê ‘abidê şehre xerqeyê ber

Hunerên Edebî: Mey bidê (**mecaz**), terz û nemet (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

7. **Te dibînim ku serapayê ji lutfa semedî**

Te beşer her ke tinê dît wî nezer kiriye **beşer**

Hunerên Edebî: Te dibînim ku serapayê (**tedrîc**) ji lutfa semedî, beşer (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

8. Ji kemalatê beşer xeyrî nubuwet çî hebit
Xwedê wan daye te yek ‘unsurekê pakê guher

Hunerên Edebî: Ji kemlatê beşer (**mecaza mursel**), dengê –eyê (**asonans**).

9. Meyle mehlûlê bike **geşt û guzarek** di dilî
Dil bi xwe mulkê mewat bûne wî hey kir bi huner

Hunerên Edebî: Geşt û guzar (**sînonîm**), dil bi xwe mulkê mewat bûne (**teşxîs**) wî hey kir bi huner (**mecaz**).

10. Tu dibe bes bike **efxan** û bike **sebrê** demî
“Min cinî elxil fuadeh wesbî keyf sebr?”

Hunerên Edebî: Efxan û sebr (**tezad**), dengê –eyê (**asonans**).

11. Ti wî ew **kenzê mutelsem di vê ‘esrê** “welakin
Setre-llahu mefatihehi înşa’ e zeher”

Hunerên Edebî: Ew kenzê mutelsem (**teşbîh**) di vê ‘esrê (**mecaza mursel**).

12. Neqşebendî ji Şahê Taxê tu **me’zûn û nexust**
Feyz û nisbet ji wî hatî bi te **ey nûrê beser**

Hunerên Edebî: Me’zûn û nexust (**sînonîm**), ey nûrê beser (**nîda**), dengê –eyê (**asonans**).

13. Ronî **hişyarî** mebe mani’ê **feyza** xwe bira

“Kul men eyqeze fi elsohbe bilfeyzê zefer”

Hunerên Edebî: Hişyarî û feyz (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

14. **Ew gedayê ku li dergahê te yek nisbetê dî**

“Xak kuweyt biruxeş xûşter ez kelîl beser”

Hunerên Edebî: Ew gedayê ku li dergahê te yek nisbetê dî (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

15. **Ateşê sorgulê ruxsarê sohtî dilê min**

Dil cesed sohtî cesed sohtiyê wî libsê di ber

Hunerên Edebî: Ateşê sorgulê (**teşxîs**) ruxsarê sohtî dilê min (**teşxîs**), dil cesed sohtî (**teşxîs û mecaz**), cesed sohtiyê wî libsê di ber (**teşxîs û mecaz**), tevahiya beytê (**teşbîhul etraf**).

16. **Birjî ji ‘iyda wisala xwe eger noqteyekê**

Dê ji qudret bibe şeq fai’lê wî bîne biber

Hunerên Edebî: Dengê –iyê (**asonans**).

17. **Hadiyê name siyah cewrekê dergahê te ye**

Tu bi seyda kî tu bi kerem lutf û nezer.

Hunerên Edebî: Hadiyê (**tecrîd**) name siyar (**mecaz**) cewrekê dergahê te ye (**teşbîh**).

15

‘UMRÊ MIN ÇÛ BI HEWA

‘Umre min çû bi hewa û hewes û bê xeberî

Mame der xeflet û derd hîret û der bê hunerî

1. Her bi rehma xwe li ser min veke **Rebbî** tu derî
Lew ji mêj ve dikişinim xem û derd û kederî
Tu xenî û tu kerîm û tu rehîmê di berî

Hunerên Edebî: ‘Umrê min çû bi hewa û hewes û bêxeberî (**tenasub**), xeflet û derd û hîret û bê hunerî (**tenasub**), her bi rehma xwe li ser min veke Rebbî tu derî (**nîda**). Lew (**rucû**) ji mêj ve dikişinim xem û derd û kederî (**tenasub**), tu xenî û tu kerîm u tu rehîmê di berî (**tenasub**), tu (**tekrîr**).

Ji ezel ta bi ebed her tu kerîm î û xenî
Tu ji qelbê me derîn hubba evê dunya denî

2. Tu bi lûtfê xwe mutî’î me ke ev nefsa genî
Vî le’înî ji me hem dûr xe bi me ta nekenî
Çiku **rehma** te li pêşî **xezeba** te digerî

Hunerên Edebî: Ji ezel ta ebed (**tedrîc**), rehm û xezeb (**tezad**), dengê –eyê (**asonans**).

Ketine vê dewrê exîrê bi qetl û bi şer e
Tu dibê gurg e bi hev girtine new’ê beşer e

3. **Bûne xwûnxwarê ji hev ra hemî muslim beşer e**
Walî û sedr û selatîn tu dibê bûne ker e
Qet nema çare **Îlahî li me ke yek nezerî**

Hunerên Edebî: Tu dibê gurg e (**tarîz**) bi hev girtine new’ê beşer e, bûne xwûnxwarê ji hev ra hemî muslim beşer e (**tarîz**), walî û sedr û selatîn (**tenasub**) tu dibê bûne ker e (**tarîz**), Îlahî (**nîda**) li me ke yek nezerî, dengê –eyê (**asonans**), tevahiya bend u (**teşbîhul etraf**).

Dikujin hev bi tebahî tu divê **seydê kew e**
Rahet û emîn û selamet ji me çû hem jî **xew e**

4. **Zulm pur bû li dinê nabînin em nan û dew e**
Zaliman birne **denanîr û dirhem berr û cew e**

Şubhî dilber ji mela girtiye can û cigerî

Hunerên Edebî: Dikujin hev bi tebahî tu dvê seydê kew e (**tarîz û teşbîh**), rahet û emîn û selamet û xew (**tenasub**), zulm pur bûn li dinê nabînin em nan û dew e (**kinaye**), denanîr, dirhem, berr û cew (**tenasub**), şubhî dilber (**teşbîh**).

Belê ta qurbî qiyamet dê hebit hingî ‘ibad
Ku li ser heqqî dimeş kin **bi** sewab û **bi** sidad

5. Nabînin ew ji **muxalif tu zîrar û tu fesad**

Her **bi** ev **rengî** hene nagihî wan zu’f û fesad
Lew bi ev terzî kirî we’de peyember xeberî

Hunerên Edebî: Muxalif, zîrar û fesad (**tenasub**)î bi (**tekrîr**), ev rengî (**teşbîh**), lew (**rucû’**).

Her ew new’ê ‘ibadan bi yeqîn û bi yemîn
Nas bike qutbê Hezanî bi widad û bi evîn

6. Rûniye ber subhetê **qelbê xwe bi işqê bikelîn**

Da bibe xalî ji emraz û bibe durra semîn
Her ji bo tuhra qulûban dike **geşt û guzerî**

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), qelbê xwe bi ‘işqê bikelîn (**mecaz**), geşt û guzerî (**sînonîm**), qelb û qulûb (**îştîqaq**).

Nefsa însan e’edûwê mezin e pur bi hiyel

Nakuje nefsê meger zilla di pîranê komel

7. Ne bi pîrê ku bi tac dike ew xişş û dexel

Ji bedel nisbeta batin dilê wî pur ji xebel
Tu bi heqqê xwe ke **ya Rebbî** hilîn vê zererê

Hunerên Edebî: Nakuje nefsê (**mecaz**) meger (**rucû’**) zilla di pîranê komel, dengê –iyê (**asonans**), ya Rebbî (**nîda**).

Bi duristî ne perestiye Xwedayê xwe kesê
Bûne bo şehdê dine meselî zubab û megesê

8. Kes di vê rekbê tune seh bike denge ceresê
Xwe xelas ke ji vê sicna dunya xar û xesê
Vexwe kasek ji meya hubbê di weqtê seherê

Hunerên Edebî: Vexwe kasek (**mecaza mursel**) ji meya hubbê di weqtê seherê (**mecaz û nîda**).

Ye'nî bistîne ji destê **zeriya sîmî beden**

Dilbera hûra bihiştê ku dila bir wê bi fen

9. Nêrgisên çeşm e mujetîr e we reng sîbe ziqen
Qedehek wê ji meya saf ku ji dil da vî deren
Da bibe saf û bixwe ji 'umrê di maî semere

Hunerên Edebî: Zeriya sîmî beden (**îsti'are**), dil û dilber (**îştîqaq**), dila bir eê bi fen (**teşxîs**), qedehek wê ji meya saf ku ji dil da vî deren (**mecaz**), da bibe saf û bixwe ji 'umrê di mî semere (**teşxîs**), dengê –eyê (**asonans**).

Hatî **Quranê 'Ezîm** da heçî kafir ku hene

Axret avêtî puşt û ji dine hes kirine

10. Mu'mînê heqq e bi 'eksa wan her çi diçîne
Were însafê bike kanî ji **ev rengî** kene
Hifza îmana me ke Rebbî di nez' û deberê

Hunerên Edebî: Hatî Quranê 'Ezîm (**telmîh**), ev rengî (**teşbîh**), hifza îmana me ke Rebbî (**nîda**), dengê –eyê (**asonans**).

HADÎ pur gotî bi nezim û bi nesr nushê gelek

Gerçî lezzetê didit ew **mislî te'am** bi nemek

11. Ger nebit **HADÎ Xweda** çendê tenê **şubhî xesek**
Her kesê 'eqlê me'aşê girtiye bu ibnî felek
Lew bigîr 'eqlê me'ad ger heye bot e hunerî.

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**) pur gotî bi nezm û nesr (**muqabele**) nushê gelek, ew mislî te'am (**teşbîh**), Hadî û Hadî (**cinas**), şubhî xasek (**teşbîh**), her kesê 'eqlê me'aşê girtiye bû ibnî felek (**telmîh**), lew (**rucû'**).

16

ELLAH ÇI 'ECEB

1. **Ellah çî 'eceb narekî xeddar deranî**

Sohtî bi wî canî

Hunerên Edebî: Ellah çî 'eceb narekî xedar (**kinaye**) deranî, sohtî vî canî (**mecaz**).

2. **Neqqaşê ezel neqşê bedî'ek li wî danî**

Heyrî di dumanî

Hunerên Edebî: Neqqaşê ezel (**îsti'are**), neqqaş û neqş (**îştîqaq**).

3. **Her çî ku ji 'işqê nebit ew me'denê enwar**

Hem mexzenê esrar

Hunerên Edebî: Me'dena enwar (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

4. **Bê faide dê her biçitin 'umrê zemanî**

Meqsûdê nizanî

Hunerên Edebî: Dengê –îyê (**asonans**).

5. **Qesda te ye ger tu bikî ishala di nefse**

Mehfûz bike ricsê

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

6. **Rabe bi edeb meş ke bi nik Şahê cihanî**

Geylaniyê Sanî

Hunerên Edebî: Rabe bi edeb meş ke bi nik Şahê cihanî (**tedrîc**).

7. **Sed sondê dixwem ez bi wan ebruwê hilalî**

Tu ‘eynî cemalî

Hunerên Edebî: Wan ebruwê hilalî (**teşbîh**), tu ‘eynî cemalî (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

8. **Qet nîne bi mislê te tebîbê dil û canî**

Qetbek di vî anî

Hunerên Edebî: Mislê te tebîba dil û canî (**teşbîh**).

9. **Her rojê li ser bamê xerabatê çi xweş tê**

Ew hûra bihiştê

Hunerên Edebî: Her rojê li ser bamê xerabatê çi xweş tê (**kinaye**), hûra bihiştê (**teşbîh**).

10. **Her gav bi ‘ûşşaqî didit raha cinanî**

Hey kiriye cenanî

Hunerên Edebî: Her gav (**tedrîc**), cenan û cinan (**îştîqaq**).

11. **Xew nayête çavan ku bininim wî di xew da**

Bed tali’e peyda

Hunerên Edebî: Xew û xew (**tekrîr**), xew nayê te çavan (**irsala mesel**).

12. Xweşbexte ku **dilber** veke berqe' bi 'eyanî

Dil şa ke nihanî

Hunerên Edebî: Dil û dilber (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

13. Her kes ku cemala te wî dî bi 'eynê qulûbe

Safî ji 'ûyûbe

Hunerên Edebî: Her kes ku cemala te wî dî bi 'eynê qulûbê, safî ji 'ûyûbe (**husna te'lîl**).

14. Memlû' bibe dil wî ji mebanî û meanî

Wek seb'ê mesanî

Hunerên Edebî: Wek (**teşbîh**) seb'ê mesanî.

15. Wî tel'etê gulbarî veke **dil ke kebab e**

Der ehdê şebab e

Hunerên Edebî: Dil ke kebab e (**mecaz û mubalexe**), dengê –eyê (**asonans**).

16. **Kesek bide bende ji meya le'lê yemanî**

Mehbûbê zemanî

Hunerên Edebî: Kasek (**mecaza mursel**) bide bende ji meya le'lê yemanî (**teşxîs**).

17. Ez kuştîyê û mecrûhê ewan **çêşmê du "sad" im**

Xeib ji murad im

Hunerên Edebî: Çêşmê du "sad" im (**teşbîh**).

18. Carek tu bi ser geştîyê xudres bi rewan

Îhya ke wî fanî

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

19. Ez bendeyê naçar û **segê derge** me herde
Tu şahê sifet cem
Hunerên Edebî: Segê derge (**îsti'are**), tu şahê sifet cem (**îstidrak**).
20. **Camek** ji meya tel'et û xeddeynê rumanî
İhsan ke tu canî
Hunerên Edebî: Camek (**mecaza mursel**).
21. Xweş dêm e ku dî me tu dibe **bedra munîr e**
Hem **nura zemîr e**
Hunerên Edebî: Berda munîr e (**teşbîh**), nûra munîr e (**teşbîh**), dengê –eyê
(asonans).
22. **Loqmansifetî** xweş dikî emrazê nihanî
Tu Şahê Hezanî
Hunerên Edebî: Loqmansifet (**teşbîh**).
23. Tu şahî li **serhedê heta biçite beriye**
Ev xelq û beriye
Hunerên Edebî: Li serhedê heta biçite beriye (**tedrîc**), dengê –eyê
(asonans).
24. “Bilcumle” ji te dîtine **esrar û me'anî**
Tu yî behra ‘Ummanî
Hunerên Edebî: Esrar û me'anî (**sînonîm**).
25. Her lehze **wekî kebkê** dere tu ke bi meş tê
Dil **xweş e û geş tê**
Hunerên Edebî: Wekî kebkê (**teşbîh**), xweş û geş (**sînonîm**), dengê –eyê
(asonans).
26. Weqta **wekû sohbet** dikî tu **sirr û ‘elanî**
Feyz tê **wekî kanî**
Hunerên Edebî: Wekû sohbet (**teşbîh**), sirr û ‘elanî (**tezad**), wekî kanî
(**teşbîh**).
27. **Qitmîrsifet** ser li berî ‘ûtbeyê yar im

- Her çende nezar im
Hunerên Edebî: Qitmîrsifet (**teşbîh û telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).
28. “Lew yudrib bilseyfî fuadî û cinanî
 La ûtwî ‘inanî”
Hunerên Edebî: Dengê –iyê (**asonans**).
29. Tu sahibê enfasî di **Qudsî û Êweysî**
Nas î te nenasî
Hunerên Edebî: Tu sahibê enfasî di Qudsî û Êweysî (**telmîh û teşbîh**), nas û nenas (**tezad**).
30. Tu **mexzenê eltafi** çi zanit û çi şanî
 Ev mûnkirê Sanî
Hunerên Edebî: Tu mexzenê eltafi (**teşbîh**).
31. Her yek bi omêdek dike ew **geşt û guzare**
 Der kûh û diyar e
Hunerên Edebî: Geşt û guzar (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).
32. **Mecnûnsifet im terk kirim amal û emanî**
 Der ‘îşq û ciwanî
Hunerên Edebî: Mecnûnsifet (**teşbîh û telmîh**) im terk kirim amal û emanî.
33. Her çend li vê etrafê hebûn gelek meşayix
 Bûn bêber û nî bîx
34. Hîna ji Resûlan kire teşrif bi keyanî
 Ew qutbê heqanî
Hunerên Edebî: Dengê –ayê (**asonans**).
35. **Hezan da** Xweda qutbekî Dawan û Hezan da
 Yek dî jî nişan da
Hunerên Edebî: Hezan da (**mecaza mursel**), hezan û hezan (**tekrîr**), dengê –ayê (**asonans**).
36. Geylaniyê Sanî ye bi **nam û bi nîşanî**
 Rebbanê mebanî
Hunerên Edebî: Nam û nîşanî (**sînonîm**).

2. Le'lê zelal xettê delal
Ew bûne sef wan da bi xef
Camek bi kef mextûm bû

Hunerên Edebî: Camek bi kef (**mecaza mursel**).

‘Aşiq daye ser pur bû keder

3. Ew **rûqemer da dil zeher**
Ceng û selem êş û elem
Roja qelem meqsûm bû

Hunerên Edebî: Rûqemer (**îsti'are**), da dil zeher (**kinaye**), ceng û selem, êş û elem (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

Qewsê letîf enfa elîf

4. **Qeddê munîf zendê şerîf**
Her yek ji wan avête can
Tîr û keman mesmûm bû

Hunerên Edebî: Qewsê letîf (**teşxîs**) enfa elîf (**teşbîh**), qeddê munîf zendê şerîf (**teşxîs**), her yek ji wan avête can (**kinaye**), tîr û keman mesmûm bû (**terdîd**).

Dunya tamam rence dewam

5. Cama mudam bişkîne kam
Qîza rezan waye li Hezan
Her çi nezan mehrûm bû

Hunerên Edebî: Qîza rezan (**mecaz**) waye li Hezan, dengê –ayê (**asonans**).

Sîm xebxebê dêm kewkebê

6. **Zulf ‘eqrebê leb ‘inebê**
Camek mûlî ji rengê gul î

Da wî dilî mehmûm bû

Hunerên Edebî: Dengê –êyê (**asonans**), sîm xebxebê dêm kewkebê (**teşbîh**), zulf ‘eqrebê leb ‘înebê (**teşbîh**), camek mûlî (**mecaza mursal**) ji rengê gul î (**teşbîh**), sîm, dêm, zulf, leb (**tenasub**).

Fasid mizac pavêje tac

7. Xemre ‘ilac **cama zucac**

Bigre bi dest **wek meyperest**

Ev jî e”elest” meqsûm bû

Hunerên Edebî: Cama zucac (**teşbîh**), wek meyperest (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Sohbet xweşê kakul keşê

8. **Xal hebeşê** hacib reşê

Tîra qizil avête dil

Dil ku ji xil mexmûm bû

Hunerên Edebî: Xal hebeşê (**teşbîh**), tîra qizil avête dil (**kinaye**).

Lebşekerê hûr peykerê

9. Tac bi serê zêr kemere

Îro bi kerb ker kir wê qelb

Dil hate cezb mehmûm bû

Hunerên Edebî: Lêbşekerê hûr peykerê (**teşbîh**), îro bi kerb ker kir wî qelb (**teşxîs**), dil hate cezb (**teşxîs**).

Ew xedtufah **sînesebah**

10. **Camek ji rah weqtê rewah**

Hatî xeram da dil tamam

Dil kir qiyam wek mûm bû

Hunerên Edebî: Sînesebah (**teşbîh**), camek ji rah (**mecaza mursel**), dil kir qiyam (**teşxîs**) wek mûm bû (**teşbîh**).

Dosta xecend ew purezend

11. Sîret lewend himmet bilend

Zulfê herîr lêkir ‘ebîr

Dil kir munîr meşmûm bû

Hunerên Edebî: Sîret lewend himmet bilend (**teşbîh**), dil kir munîr (**teşxîs**).

Neqşê xerîb **xettê** ‘ecîb

12. Zanî lebîb rûyê hebîb

Nura rewan cezba cenan

Her tim ji wan mefhum bû

Hunerên Edebî: Neqş û xet (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Ew şehsûwar hatî bi xar

13. Tîrek xedar teşbîhî mar

Avête rûh da dil futûh

Teşbîhî yûh melzûm bû

Hunerên Edebî: Tîrek xedar (**teşxîs**) teşbîhî mar (**teşbîh**), avête rûh da dil futûh (**kinaye**), teşbîhî yûh (**teşbîh**) melzûm bû, dengê –eyê (**asonans**).

Feryadres her ‘işqe bes

14. Baqî hewes nef’i nade kes

Cumle ‘ulûm pêkve sunum

Qal û rusûm mewhûm bû

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –ûyê (**asonans**).

Ew leb ‘eqîq camek rehîq

15. Da min xerîq ez bû herîq
Cem’ a du zid wî kir bedîd
Qanûn cedîd merqûm bû

Hunerên Edebî: Ew leb ‘eqîq (**teşbîh**) camek rehîq (**mecaza mursel**) dengê –îyê (**asonans**), dengê –qyê (**alîterasyon**).

Şahê ‘elîm qutbê kerîm

16. Xewsê ‘ezîm şeyxê hekîm
‘Ebdê muzaf **Qadir** bi nav
Sîret ‘efaf me’lûm bû

Hunerên Edebî: ‘Elîm, kerîm, ‘ezîm, hekîm, qadir (**tenasub**).

Kelbê kemîn Hadî bibin

17. Şahê şîrîn babê Emîn
Da wî necat rûh û **heyat**
Hetta **memat** merhum bû

Hunerên Edebî: Kelbê kemîn Hadî bibîn (**tedrîc**), heyat û memat (**tezad**).

Qutbê humam “kehfulenam”

18. Seyda bi nam Nûrşîn meqam
Qelbê siyah bû ji wî çû mah
Îslam penah qeyyûm bû

Hunerên Edebî: Qelbê siyah bû ji wî çû mah (**mecaz**).

Medhê kebîr bedra munîr

19. Ebdulqadir me’zûnê pîr
Ew bulbulê seyda gul e

Hey kir dile deyyûm bû.

Hunerên Edebî: Ew bulbulê seyda gul e (**teşbîh**), hey kir dile deyyûm bû (**husna** **te'lîl**).

18

EW DILRUBA

Ew dilruba da dil bi ba

1. Şeq bû qeba mexlûb bû

Lew çû ji heş maye nexweş

Ew bext reş meczûb bû

Hunerên Edebî: Dil û dilruba (**îştîqaq**), lew çû ji heş (**rucû'**) maye nexweş (**kinaye**), bext reş (**irsala mesel**), dengê –eyê (**asonans**) dilruba- dil da biba- bû qeba- bû (**tesmît**), çû ji heş- nexweş- reş- bû (**tesmît**).

Ew mahtab sîmîn qubab

2. Rakir niqab dil kir kebab

Hubba weten avête ten

Rûh çû beden mexlûb bû

Hunerên Edebî: Ew mahtab (**teşbîh**) sîmîn qubab, rakir niqab dil kir kebab (**mecaz û mubalexe**), dengê –ayê (**asonans**), mahtab- qubab- niqab- kebab (**muwazene**), ten- weten- bedeb- bû (**tesmît**).

Horiya bihişt der dil sehişt

3. Şewqa kenîşt lew wî dihişt

Mal û minal ehl û 'iyal

Kasa wisal metlûb bû

Hunerên Edebî: Şewqa kenîşt lew wî dihişt (**rucû'**), mal û minal û el û 'iyal (**tenasub**), dengê –iyê (**asonans**), bihişt, sehişt, kenîşt, dihişt (**muwazene**), minal- 'iyal – wisal - bû (**tesmît**).

Qelbê lihas geriya delap

4. Avêt esas go: “El xeyas”

Camek ji mey pê dil ke hey

Weslet bi tey muhûb bû

Hunerên Edebî: Qelbê lihas geriya delap (**teşxîs**), avêt esas go:”El xeyas” (**întaq**), camek ji mey (**mecaza mursel**), dengê –lyê (**alîterasyon**), mey- hey-tey- bû (**tesmît**).

Ew **nuktesenc** pur **naz û xenc**

5. Dil kir sipenc ba êş û renc

Lewra bi ser kêşa sefer

Rûh jî di ber mensûb bû

Hunerên Edebî: Naz û xenc (**sînonîm**), dil kir sipenc (**teşxîs**), êş û renc (**sînonîm**), nuktesenc- xenc- sipenc- renc (**muwazene**), ser- sefer- ber- bû (**tesmît**).

Ew mah û yûh **kasek sebûh**

6. Rête li rûh da wî futûh

Rûh hat tereb sing kir neqeb

Bal ‘erşê Reb meclûb bû

Hunerên Edebî: Kasek sebûh (**mecaza mursel**), rûh hat tereb sing kir neqeb (**mecaz**), yûh- sebûh- rûh- fûtûh (**muwazene**), tereb- neqeb- Reb- bû (**tesmît**).

Ew şeng û şox ba daç û dox

7. Qelbê kelox lê daye mox

Lew bû **nişan** da men **kişan**

Nik “**lamekân**” menhûb **bû**

Hunerên Edebî: Ew şeng û şox ba daç û dox (**tezmîn**), qelbê kelox (**teşbîh**), şox- dox- kelox- mox (**muwazene**), nişan- kişan- lamekan- bû (**tesmît**).

Çeşmê du “sad” ewwel widad

8. Wî da fuad pê bûye şad
Nageh **sitem cewr û elem**
Lê da ‘**elem** mexzûb **bû**

Hunerên Edebî: Çeşmê di “sad” (**teşbîh**), sitem, cewr û elem (**tenasub**), sad-widad- fuad- şad (**muwazene**), sitem- elem- ‘elem- bû (**tesmît**), dengê –eyê (**asonans**).

Hub kir **niyaz** dil bu **cuzaz**

9. Doste **melaz ya Reb mû’az**
Rûnişt **li ber** sohbet **eser**
Dabû **ciger** meslûb **bû**

Hunerên Edebî: Ya Reb (**nîda**), niyaz- cuzaz- melaz- mû’az (**muwazene**), li ber- eser- ciger- bû (**tesmît**).

Yek **dost û yar** şêrîn **şi’ar**

10. Sohbet **disar** bûye **diyar**
Şahê **Hezan** qutb e **bizan**
Her çi **nezan** mehcûb **bû**

Hunerên Edebî: Dost û yar (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**), yar- şi’ar- disar- diyar (**muwazene**), Hezan- bizan- nezan- bû (**tesmît**), bizan û nezan (**tezad**).

‘Umrê ‘**ezîz** çû bê **temîz**

11. ‘**Eyba xerîz jê ke kerîz**
Dil ke **dewa** bavêj **hewa**
Ew bê **newa** me’yûb **bû**

Hunerên Edebî: ‘Ezîz- temîz- xerîz- kerîz (**muwazene**), dewa- hewa- newa- bû (**tesmît**), ‘eyba xerîz jê ke kerîz (**tarîz**), dengê –eyê (**asonans**).

Rûh wek ‘eses şubhî ceres

12. Der her nefes feryadres

Nefsa rezil nabe zelil

Lewma ‘elîl meshûb bû

Hunerên Edebî: Rûh wek ‘eses (**teşbîh**) şubhî ceres (**teşbîh**), ‘eses- ceres- nefes- feryadres (**muwazene**), rezîl- zelil- ‘elîl- bû (**tesmît**), nefsa rezil (**teşxîs**).

Çavê direş qewsê dixweş

13. Zulfê hebeş ew bûne şeş

Her yek ji wan der du kevan

Avête can mes’ûb bû

Hunerên Edebî: Direş- dixweş- hebeş- şeş (**muwazene**), wan- kevan- can- bû (**tesmît**), avête can mes’ûb bû (**mecaz**).

Ûstadê xas behre xewas

14. Bûne xewas dînê menas

‘Ebdê feqîr wek min esîr

Ma’ye hesîr mesbûb bû

Hunerên Edebî: Wek min esîr (**teşbîh**), xas- xewas- xewas- menas (**muwazene**), feqîr- esîr- hesîr- bû (**tesmît**), dengê –eyê (**asonans**).

Der dil merez hubba erez

15. Doste xerez bavêj ‘iwez

Şeyxê letîf qamet elîf

‘Ûnsir nezîf mehbûb bû

Hunerên Edebî: Şeyxê letîf qamet elîf (**teşbîh**), merez- erez- xerez- ‘iwez (**muwazene**), letîf- elîf- nezîf- bû (**tesmît**), dengê –eyê (**asonans**).

Hubb û neşat bûye sirat

16. Kêşa simat bîz û şetat

Xwarin ‘ebîd şehd û ‘esîd

Dêwê merîd medrûb bû

Hunerên Edebî: Dêwê merîd medrûb bû (**mubalexe**), neşat- sirat- simat- şetat (**muwazene**), ‘ebîd- ‘esîd- merîd- medrûb (**tesmît**).

Lewmê wû’az hatî lezaz

17. Her çi hûfaz gotin xilaz

‘Aşiq ewan dîtî hewan

Şubhî ‘Ewan meşbûb bû

Hunerên Edebî: Şubhî ‘Ewan (**teşbîh û telmîh**), wû’az- lezaz- hûfaz- xilaz (**muwazene**), ewan- hewan- ‘Ewan- bû (**tesmît**).

Yar çû yefa’ jê çû şu’a’

18. Her çi xida’ go: “Elweda”

Lewra xufaş nabîne faş

Şemsa bi şaş mexzûb bû

Hunerên Edebî: Yefa’- şu’a’- xida’- elweda (**muwazene**), xuşaf- faş- şaş- bû (**tesmît**), şemsa bi şaş mexzûb bû (**teşxîs**), dengê –ayê (**asonans**).

Ev bax û rax ev hewş û cax

19. Ew Şahê Tax kir wî çirax

Lew wek esed ew mahê xed

Da me meded ye’sûb bû

Hunerên Edebî: Rax- cax- Tax- çirax (**muwazene**), esed- xed- meded- bû (**tesmît**), lew (**rucû’**) wek esed (**teşbîh**).

Seyda **sedef** zulfê bi **lef**

20. Çêkir bi **xef** meşya bi **sef**

Lê da bi **tîx** bo wî çû **mîx**

Ah û **derîx** mesbûb **bû**

Hunerên Edebî: Sedef- lef- xef- sef (**muwazene**), tîx- mîx- derîx- bû (**tesmît**), dengê –eyê (**asonans**).

Yarê **şefîq** cama ‘**eqîq**

21. Pur kir **rehîq** da min **xerîq**

Pê bûme mest ez çûm ji dest

Ev ji “**elest**” mehsûb **bû**

Hunerên Edebî: Pê bûme mest (**mecaz**) çûme ji dest (**kinaye**), şefîq- ‘eqîq- rehîq- xerîq (**muwazene**), mest- dest- elast- bû (**tesmît**), dengê –eyê (**asonans**).

Ew xwe **melek** zulf kir **xelek**

22. **Rakir belek ser çû felek**

Daim **mudam** rête bi **kam**

Dil wî **meram** mewhûb **bû**

Hunerên Edebî: Rakir belek ser çû felek (mubalexe), melek- xelek- belek- felek (**muwazene**), mudam- kam- meram- bû (**tesmît**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Ev çav **xezal** meşya bi **hal**

23. Lêvê **zelal** xemra **helal**

Da me bi **dil** ev ab û **gil**

Jê çûye **xil** mensûb **bû**

Hunerên Edebî: Ev çav xezal (**îsti'are**), da me bi dil ev ab û gil (**teşxîs û mecaz**), xezal- hal- zelal- helal (**muwazene**), dil- gil- xil- bû (**tesmît**).

Babê **Selîm** qutbê **hekîm**

24. Qelbê **seqîm** kir **musteqîm**

Şer'a **mubîn** pê bû **metîn**

Îslam û **dîn** mestûb **bû**

Hunerên Edebî: Selîm- hekîm- seqîm- musteqîm (**muwazene**), mubîn- metîn- dîn- bû (**tesmît**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Raha **cinan** hatî **mecan**

25. Îro **mecan** tê da **'iyan**

Ew **meyfiroş** hatî **xurûş**

Sohbet bi **coş** pur xûb **bû**

Hunerên Edebî: Cinan- mecan- mecan- 'iyan (**muwazene**), meyfiroş- xurûş- coş- bû (**tesmît**), ew meyfiroş (**kinaye**).

Ew mihr û **mah** dîn kir **penah**

26. Ew qutb û **şah** rakir **tebah**

'Ewn û **meded** hubba **xeled**

Da wî **semed** merxûb **bû**

Hunerên Edebî: Ew qutb û şah rakir tebah (**mecaz**), mah, penah- şah- terah (**muwazene**), meded- xeled- semed- bû (**tesmît**).

Ew mişk **bû** ber xedd û **rû**

27. Gîsû û **mû** hem sû bi **sû**

Wî kir **belav** qelqê **tevav**

Bê qeyd û **dav** mekbûb **bû**

Hunerên Edebî: Ew mişk bû (îsti'are), bû- rû- mû- sû (**muwazene**), belav-
tevav-dav- bû (**tesmît**).

Dîtin **dila** mîr û **mela**

28. 'Îşq û **wela** bûn **mubtela**

Hubba ehed **hetta** **lehed**

Tekil **kebed** meshûb **bû**

Hunerên Edebî: Hubba ehed hetta lehed (**irsala mesel**), dila- mela- wela-
mubtela (**muwazene**), ehed- lehed- kebed- bû (**tesmît**), dengê –eyê
(**asonans**).

HADÎ bû 'ey tûmar bû **tey**

29. **Ya Reb** bi **mey** tu dil ke **hey**

Babê **şêrîn** **hubb** û **evîn**

Da wî **kemîn** meczûb **bû**.

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**) bû 'ey (**teşbîh**) tûmar bû **tey** (**teşbîh**), ya Reb
(**nîda**), **hubb** û **evîn** (**îştîqaq**), êy- tey- mey- hey (**muwazene**), şêrîn- evîn-
kemîn- bû (**tesmît**), dengê –eyê (**asonans**).

19

BEHSÊ JI DIL KE

Behsê ji dil ke ey lebîb

1. Ew meqsed e ger binkerî

Bispêre destê **yek** **tebîb**

'Arif di emrê rehberî

Hunerên Edebî: Behsê ji dil ke (**teşxîs**) ey lebîb (**nîda**), bispêre destê yek
tebîb (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

Pursîm ji dilber min bi xef

2. **Kan ew dilê min çû ji kef**

Go: Purs bike ji zulfê bi lef

Mecnûn ewî ji bi xeyrkerî

Hunerên Edebî: Pursîm ji dilber min bi xef (**teşxîs**), kan ew dilê min çû bi kef (**istihfam**), go (**întaq**): purs bike ji zulfê bi lef (**teşxîs**), dil û dilber (**îştîqaq**).

Pursîm ji zulfê ruyê mal

3. **Go: Halê dil purs ke ji xal**

Xal go: Bipurse ji qewsê hilal

Dil kuşt xedengê xencerî

Hunerên Edebî: Pursîm ji zulfê ruyê mal (**teşxîs**), go (**întaq**), halê dil (**teşxîs**) purs ke ji xal (**teşxîs**), xal go: (**întaq**) bipurse ji qewsê hilal (**teşxîs**), dil kuşt (**teşxîs**) xedengê xencerî (**mecaz**), dengê –iyê (**asonans**).

Pursîm ji qewsê tûzreşî

4. **Go: Dîn î yaxûd serxweş î**

Pûrs ke ji xeddê gulgeşî

Wî dil birî bi hiletgerî

Hunerên Edebî: Pursîm ji qewsê tûzreşî (**teşxîs**), go: (**întaq**) dîn î yaxûd serxweş î (**teşxîs**), pûrs ke ji xeddê gulgeşî (**teşxîs**), wî dil birî bi hiletgerî (**teşxîs**).

Pursîm ji xeddê sorgule

5. **Şahid dibên te ber dile**

Lew dîn kirî te bulbule

Daim li baxan êwerî

Hunerên Edebî: Pursîm ji xeddê sorgule (**teşxîs**), lew (**rucû'**) dîn kirî te bulbule (**mecaz**), daim li baxan êwerî (**mecaz**).

Xed go: Ji xet purs ke xeber

6. Lewra ji xet têtin eser

Xet go: Xeta kir te sefer

Purs ke ji le'lê şekkerî

Hunerên Edebî: Xed go: Ji xet purs ke xeber (**întaq**), xet go: (**întaq**) xeta kir te sefer (**teşxîs**), purs ke ji le'lê şekkerî (**teşxîs**), xet (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

Pûrsîm ji wan le'lê reqîq

7. **Go: Xebxebê dil bir reqîq**

Maye ji çaha wê xenîq

Nabînî tu ji wê eserî

Hunerên Edebî: Pûrsîm ji wan le'lê reqîq (**teşxîs**), go: (**întaq**) xebxebê dil bir reqîq (**teşxîs**).

Mam ez li dora xebxebê

8. **Geh geh bi roj geh bi şebê**

Pûrsîm ji wê le'leyn lebê

Kan ew dilê te ji min birî

Hunerên Edebî: Geh geh (**tekrîr**), roj û şeb (**tezad**), pûrsîm ji wê le'leyn lebê (**teşbîh**), kan ew dilê te ji min birî (**istihfam û mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Go: Sed quta' çêbûn li rê

9. **E ji kê bipursim xeberê**

Rewrew bi gêr xûd raserî

Dil nabite dest ger bimirî

Hunerên Edebî: Ez ji kê bipursim xeberê (**istihfam**), dil nabite dest ger bimirî (**kinaye**).

Weqta hewale wan bi hev

10. **Kir er dilê çûyî bi rev**

Me'yûs ji dil min girtî dev

Mayîm hezîn û heyyirî

Hunerên Edebî: Kir er dilê çûyî bi rev (**teşxîs û mecaz**), me'yûs ji dil min girtî dev (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Ew **zulf û xal** û **qewsê** reş

11. Ew **xedd û xett** û le'lê geş

Ew xebxeb û çaha hebeş

Dil dan fidaya **dilbere**

Hunerên Edebî: Zulf, xal, qews, xedd û xett (**tenasub**), dil û dilber (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

Medhûş ketim ez wê deme

12. **Bûm mexzena huzn û xemê**

Xeltan dibûm di xak û demê

Efxan di keywan boherî

Hunerên Edebî: Bûm mexzena (**teşbîh**) huzn û xemê (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Mustexnî be dilber mudam

13. **Şah û geda û xas û 'am**

Seknîn li pêş wî **wek xulam**

Hîna ku rêtî kewserî

Hunerên Edebî: Şah û geda û xas û 'am (**tenasub**), **wek xulam** (**teşbîh**), dengê –ayê (**asonans**).

Madam ku min dil çû ji dest

14. Çare çî ye ey ew heqperest

Go: Mey vexwî pê bî tu mest

Behsê ji kewneyn biberî

Hunerên Edebî: Çare çî ye ey (**qelb**), ey ew heqperest (**nîda û istihfam**), go: meyvexwî pê bî tu mest (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Sed ah û ah sed û ah

15. Ey mihr û mah û qutb û şah

Mame xerîb û rûsiyah

Îmdad bike lew serwerî

Hunerên Edebî: Sed ah û ah sed ah û ah (**tekrîr**), ey mihr û mah (**nîda**), qutb û şah (**sînonîm**), dengê –ayê (**asonans**), rûsiyah (**irsala mesel**).

Îro riya meyxaneyê

16. Binbere min dîwaneyê

Da mey vexwum ji xûmxaneyê

Berba bikim derdê serî

Hunerên Edebî: Îro riya meyxaneyê (**mecaz**), da mey vexwum ji xûmxaneyê (**mecaz**), berba bikim derdê serî (**kinaye**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Seyda ku qutbê ‘ame ew

17. Pur lutf û pur in’ame ew

Mey da bi gas û came ew

‘Alem bi wî bû enwerî

Hunerên Edebî: Ew (**tekrîr**), meyvexwî da bi gas û came ew (**kinaye**), alem bi wî bû enwerî (**husna te’lîl**), dengê –eyê (**asonans**).

Rakir wî qutbê e'zeme
18. Nisbet li wî rêt herdem e
Her kes dibêt **'îsa deme**
Xweş Şahê Ebdulqadir î

Hunerên Edebî: Her kes dibêt 'Îsa deme (**telmîh**), dengê –eyê (asonans).

HADÎ esîr û bêkes e
19. **Bo wî tune feryadres e**
Geylaniyê Sanî bes e
Bo wî **hezîn û xemxwerî.**

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**), esîr, bêkes û feryadres, hezîn û xemxwerî (**tenasub**), tevahiya helbestê jî (**teşbîhul etraf**), dengê –eyê (**asonans**).

20

XWEŞ DI BURCA 'EQREBÊ DA

Xweş di burca 'eqrebê da
1. Kir tulû' **şemsa cihan**
Nûrnuma bû di xebxebê da
Ketme çaha wê 'eyan

Hunerên Edebî: Kir tulû' şemsa cihan (**îsti'are**).

Ketme çahê bi zull û zarî
2. Şox û şengê bi zulfê tarî
Kiriye tenûr vî diyarî
Hem muetter wek gulan

Hunerên Edebî: Ketme çahê (**î'ade**), şox û şengê (**tezmîn**), kiriye tenûr vî diyarî (**mecaz û mubalexe**), dengê –îyê (**asonans**).

Hem mu'etter hem munewwer

3. Bo ji wî **qelbê sinewber**

Çûnke lê daye bi xencer

Min ji 'îşqê dil yeman

Hunerên Edebî: Hem mu'etter (**î'ade**), qelbê sinewber (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Min ji 'îşqa wê şepalê

4. **Dêmdûra didan lu'alî**

Rûh ji min çû ma li balê

Ma yetîm min rûh û can

Hunerên Edebî: Min ji 'îşqa (**î'ade**) wê şepalê (**îsti'are**), dêmdûra didan lu'alî (**teşbîh**), rûh ji min çû ma li balê (**mecaz**), dengê –iyê (**asonans**).

Rûh û **can** bir ew **mecan** e

5. Dilber û hem ew me **can** e

Can çî kim bê **can canan** e

Hûriya mînû nişan

Hunerên Edebî: Can (**tekrîr**), can- mecan û canan (**îştîraq**), mecan û me can (**cinas**), dilber û canan (**sînonîm**), dengê –ayê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

Hûriya 'îna bihiştê

6. **Wê bi mujganan min kuştî**

Wî di cih da min dihiştî

Bû rewan wê bir rewan

Hunerên Edebî: Wê bi mujganan min kuştî (**mubalexe**), rewan (**tekrîr**), dengê –iyê (**asonans**).

Bû rewan ev çavxezal e

7. Wek perîsuret delal e
Min di pêda dil dinale
Caduwa şêrîndehan.

Hunerên Edebî: Bû rewan (**î'ade**) ev çavxezal (**îsti'are**), wek perîsuret (**teşbîh**) delal e, min di pêda dil dinale (**teşxîs**), caduwa şêrîndehan (**terdîd**).

Caduwa şêrînkêlam e

8. Tel'eta wê tas û cam e
Her çi jê nûş kir dî kam e
Wer ne xam e der cihan.

Hunerên Edebî: Caduwa (**î'ade**) şêrînkêlam (**terdîd**), tel'eta wê tas û cam e (**mecaza mursel**), her çi jê nûş kir dî kam e (**mecaza mursel**).

Wer ne xam e ne tamam e

9. Nûş nekir ji 'îşqê mudam e
Ji wî weye ku mey heram e
Menzera pîrê mûxam

Hunerên Edebî: Wer ne xam e (**î'ade**), ne xam e- ne tamam e (**tezad**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Menzera pîran 'ilac e

10. Dê ji wî 'aşiq rewac e
Terk dikit lew text û tac e
Ger hebit Şahê zeman

Hunerên Edebî: Menzera pîran (**î'ade**) 'ilac e (**teşbîh**), terk dikit lew text û tac e (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

Ger hebit ew Şahê Çîn e

11. **Çîne** zulfan ger bibîne

Dê bibit sewda û dîn e

Dê bibit ew **dil me can**

Hunerên Edebî: Ger hebit (**î'ade**), Çîn û çîn (**cinas**), dengê –eyê (**asonans**).

Dil me daye **çû ji me da ye**

12. Dîn dibêjin **çû ji me da ye**

Ehlê dîn gotin dewa ye

Sohbeta şoxa cinan

Hunerên Edebî: Dil me (**î'ade**), çû ji me da ye (**tekrîr**), ehlê dîn gotin dewa ye (**teşbîh**).

Sohbeta kakulreşa min

13. Lûliya **'arzxweşa min**

Sahra **turrekeşa min**

Bûye dermanê dilan

Hunerên Edebî: Sohbeta (**î'ade**) kakulreşa min, min (**tekrîr**), kakulreş, 'arzxweş, turrekeş (**tenasub**), tevahiya qiteyê jî (**teşbîhul etraf**).

Bûye dermanê zemîr e

14. Ew li **textê dil emîr e**

Dil di destê wî esîr e

Dilbera ebrû keman

Hunerên Edebî: Bûye dermanê (**î'ade**), ew li **textê dil emîr e** (**teşbîh**), dil di destê wî esîr e (**mecaz û teşbîh**), dilbera ebrû keman (**teşbîh**), dengê –yê (**asonans**), dil û dilber (**îştîqaq**), tevahiya qiteyê jî (**teşbîhul etraf**).

Dilber û hem **dilruba** ye

15. Kenz û misbah û şifa ye
Me'dena lutfê Xweda ye
Meqsela qelb û cenan

Hunerên Edebî: Dilber (**î'ade**), dilber û dilruba (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

Meqsel û hem rehberî tu

16. 'Enber û hem kewserî tu
Şubhî qend û şekkerî tu
Efseh û şêrîn zeban

Hunerên Edebî: Mesqel (**î'ade**), hem (**tekrîr**), tu (**tekrîr**), qend û şekker (**sînônîm**), qend, şekker û şêrîn (**tenasub**), tevahiya qiteyê (**teşbîhul etraf**).

Efseh û bulbul misal î

17. Tu di 'îşqê da dikalî
Seyr dikî di ewtanî 'alî
Pêşrewê şeyx û melan

Hunerên Edebî: Efseh (**î'ade**), bulbul misal î (**teşbîh**), dengê –îyê (**asonans**).

Pêşrewê dêra muxan î

18. Baniye der dil muxan î
Saqiyê xemra cinan î
Mey didî pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Pêşrewê (**î'ade**), saqiyê xemra cinan î (**mecaz**), mey didî (**mecaz**) pîr û ciwan (**tezad**).

Mey didî bi fincan û tas e

19. **Dil bi reqsî bû şunas e**

Nas kirî dêr û kenas e

Terk kirî wî xaneqan

Hunerên Edebî: Mey didî (**î'ade**) bi fincan û tas e (**mecaz**), dil bi reqsî bû şunas (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

Terk kirî libsê riya ye

20. **Gotî terka dil kişaye**

Dil bi talanê wî daye

Bûye meftûnê butan.

Hunerên Edebî: Terk kirî (**î'ade**), dil bi talanê wî daye (**teşxîs**), dengê –iyê (**asonans**).

Bûye meftûn û nezar e

21. **Talibe dîdarê yar e**

Xafilê ji kar û xesar e

Her wekî min her deman

Hunerên Edebî: Bûye meftûn (**î'ade**), her wekî min (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Her wekî min rûsiyah î

22. **Mucrîmê pîşe gûnah î**

Kes nedîtî ya ilahî

El eman seyda eman

Hunerên Edebî: Her wekî min (**î'ade**), wekî min (**teşbîh**) rûsiyah (**irsala mesel**), ya Îlahî (**nîda**), dengê –îyê (**asonans**).

El eman ya Şahê Taxî

23. Sahibe rewzat û **baxî**

Bavje wî **baxê** vî **baxî**

Da bibinim mehweşan

Hunerên Edebî: El eman (**î'ade**) ya Şahê Taî (**nîda**), bax (**tekrîr**).

Da bibînim wan gulane

24. Cindî û şêrîn melane

Dil didin hem bê dilane

Zalim in hem dilistan

Hunerên Edebî: Da bibînim (**î'ade**), dil û dilistan (**îştîqaq**), dil (**tekrîr**), dengê –iyê (**asonans**), dil didin hem bê dilan e (**mecaz**).

Zalima ji Hadî birende

25. Dil di dil da Neqşebende

Nav di Geylanî di sende

Her ewe **sultan û xan**

Hunerên Edebî: Zalima (**î'ade**) ji Hadî birende (**tedrîc**), sultan û xan (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

21

EW DILBERA LEBLALE

Ew **dilbera leblale**

1. Rux pur ji xett û xal e

Çav nergis û **xed** al e

Daye wî **dilan** nale

Hunerên Edebî: Dil û dilber (**îştîqaq**), dilbera leblale (**teşbîh**), xetr û xal û çav û xed (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –lyê (**alîterasyon**).

Dil şubhetî perwane

2. Bû ‘aşiqê şem’ane

Can daye bi **canan** e

Hem dîn û rûh û **mal** e

Hunerên Edebî: Dil şubhetî perwane (**teşbîh**), can û canan (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

Mal mailê xusran e

3. **Kêşane bi mîzan** e

Xusrana wî ruchan e

Xweş guh bide ev meqale

Hunerên Edebî: Mal (**î’ade**), kêşane bi mîzan e (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

Ev qewlê ji Qur’ane

4. Mustexnî ji tuxyan e

Lew feqrê ji fexran e

Qan’i be me min **kal** e

Hunerên Edebî: Lew feqrê ji fexran e (**rucû’**), dengê –eyê (**asonans**).

Kale ku dibe temma’î

5. Bo tûla emel ra’î

Xeyran ra tu menna’î

Guhdêrê bi guh **bale**

Hunerên Edebî: Kale (**î’ade**), xeyran ra tu menna’î (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Balê ku hebit tarî

6. Nûr lê nirêjî bi barî
‘**Arî** nebitin ji ‘**arî**
Ew balekî bed **hal e**

Hunerên Edebî: Balê (**î’ade**), arî (**tekrîr**), dengê –îyê (**asonans**).

Ger hal di qelbê rabe

7. Bê murşidî her nabe
Dê ji sohbeta peydabe
Bal mehweş e **ew hale**

Hunerên Edebî: Ger hal (**î’ade**) di qelbê rabe (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Ji vê halê mebe xalî

8. Ku xalî bî bedhalî
Nik **ehlê dilan** kalî
Nabext e xwe **betal e**

Hunerên Edebî: Ji vê halê (**î’ade**), xalî (**tekrîr**), dengê –lyê (**alîterasyon**), hal û bedhal (**îştîqaq**).

Bettal e bi nadanî

9. Qelbê nebe rebbanî
Yek mûrşide subhanî
Wek qalibê delal e

Hunerên Edebî: Bettal e (**î’ade**), wek qalibê (**teşbîh**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

Delal be bi ihsanî

10. Bikşîne bi heqqanî

Nik mûrşidê Yezdanî

Her qelbê ker û lal e

Hunerên Edebî: Delal (î'ade), her qelbê ker û lal e (**mecaz**), dengê –îyê (**asonans**).

Dunya ji ker û lalan

11. Pur bû **wekî bedhalan**

Naspêrine delalan

Qelbê xwe mah û sal e

Hunerên Edebî: Dunya ji ker û lalan (**î'ade û mecaza mursel**), wekî bedhalan (**teşbîh û mecaza mursel**), naspêrine delalan (**mecaza mursel**), mah û sal (**tedrîc**), dengê –ayê (**asonans**), dengê –lyê (**alîterasyon**).

Sal pur li me borîne

12. Me 'eql û xeber nîn e

Dunya li me pur kîn e

Heskiriye me **ev Zal e**

Hunerên Edebî: Sal (î'ade), me 'eql û xeber nîn e (**kinye**), ev Zal e (**telmîh**).

Ev Zal ku dunya ye

13. Şêrîn û şekerxend e

Wek bûkekê xwuya ye

Xeddar û heyyal e

Hunerên Edebî: Ev Zal (î'ade) ku dunya ye (**mecaza mursel**), şêrîn û şekerxend (**sînonîm**), wek bûkekê xwuya ye (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Heyyal e û hem xeddar e

14. Wek 'eqreb û hem mar e

Mel'ûn e û hem har e

Lê bi neqş û xet û xal e

Hunerên Edebî: Heyyal e (**'eks**), wek 'eqreb û hem mar e (**teşbîh**), mel'ûn e û hem har e (**tarîz**), neqş, xet û xal (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Ev xal û xettê zail

15. **Xelqî kirine cahil**

Lew ji kunha wî man xafil

Bûn 'aşiq û 'ebdal e

Hunerên Edebî: Ev xal û xettê (**'eks**), xelqî kirine cahil (**tarîz**), lew ji kunha wî man xafil (**rucû'**).

'Ebdal û bi nalîn bin

16. **Hem zar û hem bi kalîn bin**

Du'a kin ne dalîn bin

Dunya bivê ew dal e

Hunerên Edebî: 'Ebdal (**i'ade**), nalîn, zar, kalîn û dalîn (**tenasub**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

Dal e ew kese bedkar e

17. **Dunyê ra 'ilimdar e**

Axret wî ne efkar e

Bedkêşek û bedqal e

Hunerên Edebî: Dal e ew (**'eks**), bedkar, bedkêş û bedqal (**iştîqaq û tenasub**).

Fala wî kesî qenc e

18. **Ku 'aşiq û pur renc e**

Pur derd û elem senc e

Pur ahin û belbal e

Hunerên Edebî: Fala wî kesî qenc e (**kinaye**), ‘aşiq, renc, derd, elem senc (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**), pur (**tekrîr**).

Belbalê di ‘ûşşaqan

19. **Te ji destê birû taqan**

Ew **şah in û hem xaqan**

Wan zincîr û **çengal e**

Hunerên Edebî: Belbalê (**î’ade**), te ji destê birû taqan (**teşbîh**), şah û xaqan (**sînonîm**), dengê –ayê (**asonans**).

Çengal ku li dil malîn

20. **Dê jê biçitin nalîn**

Efxan û hezar kalîn

Dê dil bike zilzal e

Hunerên Edebî: Çengal e (**î’ade**), nalîn, kalîn, efxan (**tenasub**), dê dil bike zilzal e (**mecaz û mubalexe**).

Zilzalê ku dê hilbe

21. **Dê bîte wî yek cezbe**

Nefsê wî bibîne te’be

Dil geş be bi **ehwal e**

Hunerên Edebî: Zilzalê (**î’ade**), dengê –eyê (**asonans**).

Ehwal bi xwe zewqîn e

22. **Bi ‘ilm û huner nîn e**

Lakin wan ne temkîn e

Meqsûd ji wan **e’mal e**

Hunerên Edebî: Ehwal (**î’ade**), dengê –eyê (**asonans**).

E'malê ku di ber hal be

23. Nabuxt e û dê kal be

Pušt halê çi e'mal be

Wek zîvekî pur qal e

Hunerên Edebî: E'malê (**î'ade**), e'mal (**tekrîr**), wekî zîvekî pur qal e (**teşbîh**), dengê –lyê (**alîterasyon**).

Zîv qalê bi dîlanê

24. Bi **govend** û bi **şemlanê**

Bi **xava sipî milanê**

Çi nayê ji **cuhhal e**

Hunerên Edebî: Zîv qalê (**î'ade**), dîlan, govend, şemlanê, xava sipî milanê (**tenasub**), dengê –êyê (**asonans**).

Cahil ku di vê 'ursê

25. Govendê biku reqsê

Kes nabêjî nepursê

Neqşî ne bi ev hal e

Hunerên Edebî: Cahil (**î'ade û mecaza mursel**), dengê –eyê (**asonans**).

Neqşî me bi heq zanî

26. Endulqadirê Sanî

Deryayê Xweda danî

Du sohbeta **seyyal e**

Hunerên Edebî: Neqşî (**î'ade**), dengê –eyê (**asonans**).

Seylan dike jê nisbet

27. **Hem** cezbe û **hem** sohbet

Xweş **dewlet e ev dewlet**

Ya Reb nedê zewale

Hunerên Edebî: Seylan (î'ade), dewlet (**tekrîr**), hem (**tekrîr**), ya Reb (**nîda**), dengê –eyê (**asonans**).

Zail nekî xumxanê

28. **Daim kî tu meyxanê**

Jê nûş bike hem canî

Yaqûtê meya al e

Hunerên Edebî: Zaîl (î'ade), daim kî tu meyxanê (**mecaza mursel û kinaye**), dengê –eyê (**asonans**), yaqûtê meya al e (**teşbîh**).

HADÎ xwe feqîr maye

29. **Bê hal û bê mewdaye**

Dest avête derga ye

Babê şêrîn û xal e

Hunerên Edebî: Hadî xwe feqîr maye (**tecrîd**), babê şêrîn û xal e (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

PIŞKA DUWÊ

-LI DÛV HERFÊN HICAÎ-

21

ÎLAHÎ HER TU YÎ REHMAN

1. **Îlahî** her tu yî rehman, bi rehma xwe dilê mulha

Bi mey hey ke xelas ke, ji wî **derd û mihnetê** kilha

Hunerên Edebî: Îlahî (**nîda**), dengê –eyê (**asonans**), derd û mihnet (**sînonîm**).

2. Letîfa dil museffa bû, **di hîlîna xwe ya eslî**
Bi cismê fanî bû mulheq, wê dî alam û muşkilha

Hunerên Edebî: Di hîlîna xwe ya eslî (**mecaz**).

3. **Eger îro ji vê sicnê, sefer nekişînî hîlînê**
Di roja nez'ê dê bikşîne efxan, **mislê bulbulha**

Hunerên Edebî: Eger îro ji vê sicnê, sefer nekişîne hîlînê (**teşbîh û kinaye**),
mislê bulbulha (**teşbîh**).

4. Xelas nabe meger ku, **ew bisoje bi agirê 'işqê**
Ji emrazan bibe xalî, mucella be **wekî gulha**

Hunerên Edebî: Ew bisoje bi agirê 'işqê (**mecaz**), wekî gulha (**teşbîh**),
dengê –eyê (**asonans**).

5. Bi e'malê di zahir nabe nûranî dilê balî
Divê daim li nik **pîrê xerabatê vexwe mulha**

Hunerên Edebî: Divê daim li nik pîrê xerabatê (**îsti'are**) vexwe mulha.

6. **Li nik pîrê xerabatê**, wê bikşîne riyazatê
Bibîne da **munacatê, bi Rebbê Hadiyê dilha**

Hunerên Edebî: Li nik pîrê xerabatê (**î'ade**), bi Rebbê Hadiyê dilha (**tedrîc**).

7. **Necat e ger munacat e**, li nik **pîrê xerabate**
Dilan dikşîne cennate, bi sohbethayê **sunbulha**

Hunerên Edebî: Necat e ger munacat e (**î'ade**), necat û munacat (**îştîqaq**), li
nik pîrê xerabatê (**îsti'are**), dilan (**mecaza mursel**) dikşîne cennate (**mecaz**),
dengê –eyê (**asonans**), munacat e- xerabate- cennate- sunbulha (**tesmît**).

8. Eger pîrî yê **rebbanî**, te wê dîtî û hem **zanî**

Bide wî hem rûh û hem canî, “de’eddunya **wemilha**”

Hunerên Edebî: Rebbanî- zanî- canî- wemilha (**tesmît**), bide wî hem rûh û hem canî (**kinaye**).

9. Bi **ev reng** murşid û **hadî**, tu nabînî **eya HADÎ**

Wekî dîtî bi munqadî, tu nerim ke qelbê senkelha

Hunerên Edebî: Ev reng (**teşbîh**), hadî û HADÎ (**cinas**), eya HADÎ (**nîda**), wekî dîtî bi munqadî (**teşbîh**).

22

GER JI DESTÊ TE DINÊ ÇÛ

1. Ger ji destê te dinê çû duşminê te bû turab

Tu çira hesret dikêşî hem disojî wek kebab

Hunerên Edebî: Tu çira hesret dikêşî hem disojî wek kebab (**teşbîh**, mubalexe û mecaz).

2. Yek nefes mabeyna **çûn û hatinê** der dest heye

Ev qeder mexrûb bi dunyayê çî ye hem ev şitab

Hunerên Edebî: Çûn û hatin (**tezad**), ev qeder mexrûb bi dunyayê çî ye hem ev şitab (**istihfam**).

3. **Kor eger xwe ji rehberê bîna ku bigre xafil e**

Tu çira ‘eyyabê xwe lewmê dikî û hem ‘itab

Hunerên Edebî: Kor (**kinaye**) eger xwe ji rehberê bîna ku bigre xafil e, tu çira ‘eyyabê xwe lewmê dikî û hem ‘itab (**istihfam**).

4. Darwê telxe bi fayde tu ji we'vê telx çira
Ser dikêşî te'l dibî hem nabînî wan pir sewab?
Hunerên Edebî: Ser dikêşî te'l dibî (**mecaz**) hem nabînî wan pir sewab? (**istihfam**), dengê –eyê (**asonans**).
5. Her di xara sebrê da **ava heyatê** muxtefî
Tu çira kasek venaxwî her ji ev ava xwoşab
Hunerên Edebî: Ava heyatê (**kinaye**), tu çira kasek venaxwî her ji ev ava xwoşab (**istihfam**).
6. Ev hil û ça dê beden rojek bi miqraza fena
Dê muqette' be çira pur naz digerî ev siyab
Hunerên Edebî: Dê muqette' be çira pur naz digerî ev siyab (**istihfam**), dengê –eyê (**asonans**).
7. Her **per û bergê** evê şaxa dinê dê biweşe
Te di bin **dara dinê** da pur bi lezzet kiriye xwab
Hunerên Edebî: Per û berg (**sînonîm**), dara dinê (**irsala mesel û mecaza mursel**), dengê –eyê (**asonans**).
8. Her ji vê **bexçê dinê wek ba wekî dê tu biçî**
Te li ser daran çira daye xwe ev pîçan û tab
Hunerên Edebî: Bexçê dinê (**mecaza mursel**), wek ba (**teşbîh**), wekî dê tu biçî (**teşbîh**), li ser daran çira daye xwe pîçan û tab (**istihfam**).
9. Sa'eta Hadî ji dunyayê biçî qet nîne ferq
Ha tu **şah bî ya geda** bî xwabgahe ev turab

Hunerên Edebî: Sa'eta Hadî ji dunyayê biçî qet nîne ferq (**tedrîc**), şah û geda (**tezd**).

23

EV ÇAV Ê RUX Ê ZULF Ê LEB

1. Ev çav ê rux ê zulf ê leb ê sîne ê qamet

Girtîne ji şeş alî li min rahê selamet

Hunerên Edebî: Çav ê rux ê zûlf ê leb ê sîne ê qamet (**tenasub**).

2. Îro ku di destê te me rehmê bike cana

Roja ku mirim fayde çî ye ah û nedamet

Hunerên Edebî: Îro ku di destê te me rehmê bike cana (**mecaz**), roja ku mirim fayde çî ye ah û nedamet (**istihfam û kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

3. Halim ku remeq der bedene îro tu purs ke

Lew pişt mirinê fayde çî dê ferd û hicamet

Hunerên Edebî: Lew pişt mirinê fayde çî dê ferd û hicamet (**rucû'**).

4. Her roj bi xedengê muje min dikujî dibêjî:

Kanê bide heqqê muje bikşîne xeramet

Hunerên Edebî: Her roj bi xedengê muje min dikujî dibêjî (**mecaz**), kanê bide heqqê muje bikşîne xeramet (**istihfam**).

5. Der narê firaqê şewitîm xerqê di eşkim

Ev xariqê 'adet ji te çêbû û keramet

Hunerên Edebî: Der narê firaqê şewitîm (**mecaz**) xerqê di eşkim.

6. **Dikujî tu ‘uşşaqan û bi zincîrê du zulfan**

Der çahê hebeş dikî her bi melamet

Hunerên Edebî: Dikujî tu ‘uşşaqan (**mecaz**) û bi zincîrê du zulfan (**teşbîh**), çahê hebes (**telmîh**).

7. **Gava ku li ser çeşmê ‘uşşaqan dimeşî tu**

Bo xakê qedem çav dîkin cayî iqamet

Hunerên Edebî: Gava ku li ser çeşmê ‘uşşaqan dimeşî tu (**mecaz û mubalexe**), dengê –ayê (**asonans**).

8. **Ger pursî tu nîşanê qetîlê xet û xalan**

Sîma û zer û eşkê di xwe nîne ‘elamet

Hunerên Edebî: Ger pursî tu nîşanê qetîlê xet û xalan (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

9. **Carek tu bi nazdarî herî cam’i û mescid**

Teşuyiş li xetabet dê çê be hem li imamet

Hunerên Edebî: Cam’i û mescid (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

10. **Her da’ û birîn lê heye tesîrê tebîban**

Her derdê ji ‘işqê ye nexalî ji wexamet

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

11. **Her kesê ji ‘işqa zeriyan bûye birîndar**

Na nîne şifa Hadî heta roja qiyamet

Hunerên Edebî: Her kesê ji ‘işqa zeriyan (**teşxîs**) bûye birîndar (**mecaz**), na nîne şifa Hadî heta roja qiyamet (**tecrîd**).

TE LI MIN SOHTÎ CESED

1. Te li min sohtî **cesed, can û ciger qelbê lihas**

Tu dibê şubhî tenûr hîlbûye, tê nar û iras

Hunerên Edebî: Cesed, can û ciger qelb (**tenasub**), ti dibê şubhî tenûr (**teşbîh**) hîlbûye (**mubalexe**), tê nar û iras (**mecaz û mubalexe**), te li min sohtî cesed- tu dibê şubhî tenûr / can û ciger qelbê lihas- tê nas û iras (**leff û neşr**).

2. **Caduwa sîm binagûş zeriya zêrîguhar**

Daye talanê li min **mal û minal mulk û esas**

Hunerên Edebî: Caduwa sîm binagûş (**îstîdrak**), mal û minal mulk û esa (**tenasub**).

3. **Çi binalim çi bikalim çi fixan kim çi enîn**

Nade min fayde îro **çi hewar kim çi xiyas**

Hunerên Edebî: Binalim, bikalim, fixan kim, çi enîn û çi hewar kim (**tenasub**), çi (**tekrîr**), dengê –çyê (**alîterasyon**), tevahiya beytê jî (**teşbîhul etraf**).

4. **Daye min êş û elem hem kir li min cewr û sitem**

Kirime munqad û mûtî' **şubhî irazî û yeras**

Hunerên Edebî: Eş û elem hem kir li min cewr û sitem (**tenasub**), şubhî irazî û yeras (**teşbîh**), daye min êş û elem – kirime munqad û mûtî' / kir li min cewr û sitem- şubhî irazî û yeras (**leff û neşr**), dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

5. Gotî min: **Bûme 'elîl qet min nema sebrê cemîl**

Gotî: “Yestefsiru ‘indî” heçî nik min bû buxas

Hunerên Edebî: Bûme ‘elîl (**teşbîh**).

6. **Dil ji min bir bi xet û xal û ruxê şemsî misal**

Kirime medhûş û bi wî **sewtê** xweş û **dengê** xisas

Hunerên Edebî: Dil ji min bir (**tezmîn**), xet û xal û ruxê şemsî misal (**tenasub – teşbîh**), sewt û deng (**sînonîm**), kirime medhûş (**teşbîh**).

7. **Nîm bismil tu dibê bûme ji ‘ecz û kederan**

Nîne min **sebr û qerar û ne sukûn û ne libas**

Hunerên Edebî: ‘Ecz û keder (**sînonîm**), sebr û qerar (**sînonîm**), sebr û qerar û sukûn (**tenasub**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

8. **Bûme mestûrê bi tîrê mujeyê pur bi nisal**

Her kî min diye dibê ev **Eş’erî** ye ya qinas

Hunerên Edebî: Tîrê mujeyê (**mecaz**), Eş’erî (**telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

9. **Jar û naçar û birîndar û elemkêş im ez**

Her ji wan **çavêbelek zulfêxelek qewsê desas**

Hunerên Edebî: Jar û naçar û birîndar û elemkêş im ez (**tenasub**), çavêbelek zulfêxelek qewsê desas (**tenasub**), ez (**sihra helal**).

10. **Derd û êş û elemê ‘îşqê li min daye ciger**

Zer û pejmurde kirim heyet û halim bû resas

Hunerên Edebî: Derd û êş û elem (**tenasub**), zer û pejmurde kirim heyet û halim bû resas (**kinaye**).

11. **Kirime ‘arî ji hemî rutbe û emwalê dinê**

Ger wefat kim qet ji min namîne **mîras û turas**

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), mîras û turas (**sînonîm**), dengê –myê (**alîterasyon**).

12. **Sunbul û nêrgis û reyhan û binefşan û gulân**

Her ji wan bihn ke xwe dûrke tu ji kar û dukuras

Hunerên Edebî: Sunbul û nêrgis û reyhan û binefşan û gulân (**tenasub**), her ji wan bihn ke xwe dûrke ti ji kar û dukuras (**kinaye**), tevahiya beytê (**teşbîhul etraf**), gulân (**sihra helal**).

13. **Tu hezan û ji Hîzan û tu ji Nûrşîna şîrîn**

Her mededxwahî be **Hadî** bi hewar û bi xiyas

Hunerên Edebî: Hezan, Hîzan û Nûrşîn (**tenasub**), Hadî (**tedrîc**).

25

WER TALIBÊ ‘IŞQÊ BE

1. **Wer talibê ‘işqê be, belakêş û elemsenc**

Xalî be ji derdan û bibe ‘aşiqê purrenc

Hunerên Edebî: Belakêş û elemsenc û purrenc (**tenasub**), wer talibê ‘işqê be- xalî bibe ji derdan / belakêş û elemsenc- bibe ‘aşiqê purrenc (**leff û neşr**), ‘aşiq û ‘işq (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

2. **Serxweş be bi ‘işqê, ji xemê dinê reha be**

Nadanî eger tu bibî sekranê mey û benc

Hunerên Edebî: Serxweş be ji ‘işqê (**kinaye**), sekranê mey û benc (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

3. **Qarûn xeltî bû ku ewî cem’î kunûz e**

Lew ‘işq e defîne û evîn sîm û zer û genc

Hunerên Edebî: Qarûn (**telmîh**), lew (**rucû'**), defîne, sîm û zer (**tenasub**), 'iştq û evîn (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

4. Her kes ku bi cem'a zer û sîm ew heye mesrur
Qarûnsifetî tê heye nabêjîne wî qenc

Hunerên Edebî: Qarûnsifet (**teşbîh û telmîh**).

5. Ev sidq û reşadet tu bi vî seyf û xitabet
Nabêjîne te: Tu 'aqilî, bel baqilê kemsenc

Hunerên Edebî: Ev sidq û reşadet tu – nabêjîne te: Tu 'aqilî / bi vî seyf û xitabet – bel baqilê kemsenc (**leff û neşr**), dengê –iyê (**asonans**).

6. **Pîr** gotine dinê çu qerargaha me nîne
Eyyamê dinê ra bi heqîqet dibêjin penc

Hunerên Edebî: Pîr (**mecaza mursel**), dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

7. Dunyê ne meta'ê ku em pur ji wê hes kîn
Ev 'umrê li wê serfî bikin **bextê xwe kin zenc**

Hunerên Edebî: Bextê xwe kin zenc (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

8. Ev dinê bi xwe duşmin e, lê binefş xwuya ye
Teşbîhî 'erûsan e bi wî qelb û dilan henc

Hunerên Edebî: Ev dinê bi xwe duşmin e- teşbîhî arûsan e / lê binefş xuya ye- bi wî qelb û dilan henc (**leff û neşr**), ev dinê bi xwe duşmin e (**teşbîh**), lê binefş xuya ye (**teşbîh**), teşbîhî 'erûsan e (**teşbîh**), qelb û dil (**sînonîm**).

9. Ev kesl û tiwanî ku ji dest nefis û le'îne
Ba's ew e meşhûre dinê şêrîne **wek menc**

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), wek menc (**teşbîh**).

10. **Axret** ku meqamê ebed te çu ku xeybe
Nik **kordilan** nabe şîrîn hes dike wî renc

Hunerên Edebî: Axret (**mecaza mursel**), nik kordilan (**mecaza mursel**),
dengê –eyê (**asonans**).

11. **Ya Rebbî** bi îmanekî kamil ji dilê min
Sar ke tu **dinê** hubba xwe de qelbî **wekî wenc**

Hunerên Edebî: Ya Rebbî (**nîda**), qelb û dil (**sînonîm**), sar ke tu dinê
(**mecaza mursel**), wekî wenc (**teşbîh**).

12. Ev **çavê reş û qewsê xweş û ruyê geşê Turk**
Dil birine ji min hem jî ewan awirê purxenc

Hunerên Edebî: Çav, qews, rû, dil (**tenasub**), dil birine ji min (**tezmîn**),
dengê –eyê (**asonans**).

13. Ger 'işqê di dil, çi bi diçe jê xil û hem xeş
Ger pîrê me Hadî tu bi 'işqê dê bibî genc

Hunerên Edebî: Ger pîrê me Hadî (**tedrîc**) tu bi 'işqê dê bibî genc (**kinaye**),
dengê –iyê (**asonans**).

26

DILBERA SÎMÎN BEDENA

1. **Dilbera sîmîn bedena rû sebah**
Can û **dilim** kiriye birîn "bilrumah"

Hunerên Edebî: Dilbera sîmîn bedena rû sebah (**teşbîh**), can û dilim kiriye birîn “bilrumah” (**kinaye**), dengê –iyê (**asonans**).

2. Surmeli û ‘eyneli û her muje
Mawiyê zerê zulf kirin min sumah

Hunerên Edebî: Surmeli, ‘eyneli û muje û zulf (**tenasub**).

3. Xal û xet û zulf û leb û çav û dev
Şeş agir in û şeşe gulleyin şeş sebah

Hunerên Edebî: Xal û xet û zulf û leb û çav û dev (**tenasub**), şeş (**tekrîr**), xal û xet - şeş agir in / zulf û leb - şeşe gulleyin / çav û dev – şeş sebah (**leff û neşr**), dengê –eyê (**asonans**).

4. Ger hemiyê yek carekî bin şubhî top

Dê bike texrîb û wucûda siyah

Hunerên Edebî: Şubhî top (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

5. Ger bikujin seyyîd û mewla, ‘ebîd

Nîne diyet nîne qewd jî mubah

Hunerên Edebî: Seyyîd û mewla, ‘ebîd (**tenasub**), nîne (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

6. Ger bi ser kuştîyê şehîdê xwe bîn

Carekî dî hey dibin ew kin murah

Hunerên Edebî: Ew kin murah (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

7. Mewt û mirin firqeta canan bizan

Sohbeta canan e heyat û neçah

Hunerên Edebî: Mewt û mirin (**sînonîm**), mirin û heyat (**teçad**), mewt û mirin – heyat û neçah / firçeta canan bizan - sohbeta canan e (**leff û neşr**).

8. Feyz û futûh e edeba **sohbetê**

Têne qulûban hezar **inşirah**

Hunerên Edebî: Sohbet û inşirah (**sînonîm**).

9. Ger tu ji vê xemr û **meya sohbetê**

Nûş tu bikî dê tu bibî irtiyah

Hunerên Edebî: Meya sohbetê (**mecaz**), ger tu ji vê xemr – nû bikî / meya sohbetê – dê tu bibî irtiyah (**leff û neşr**).

10. **Mal û zer û sîm û ruteb** dame we

Qelbê kebab min bese hem jî surah

Hunerên Edebî: Mal û zer û sîm û ruteb (**tenasub**), qelbê kebab (**teşbîh û mecaz**).

11. **Dîn im li nik we** hemiyan hûn hemî

Dîn in li nik min ji me yek “zu salah”

Hunerên Edebî: Dîn im li nik we - dîn in li nik min (**‘eks**), dengê –iyê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

12. Her kî ji raha rûwê gulnarê yar

Yek qedehek xwar bûye musterah

Hunerên Edebî: Yek qedehek (**mecaza mursel**), dengê –ayê (**asonans**).

13. Her kî bi zincîr û serê zulfê wî

Bûye mu’elleq wî dî fewz û felah

Hunerên Edebî: Bûye mu'elleq (**teşbîh**).

14. Qametê mewzûnê wî teb'ê ke cism
Hatiye nezmê wekî 'iqdê mulah

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

15. Tel'etê mehbûbê dibin guşwar
Her wekî gilyasê di benda tufah

Hunerên Edebî: Wekî gilyasê (**teşbîh**).

16. **Ger bi xelet** carekî purskey li min
Dê bi semayî here kuşî kulah

Hunerên Edebî: Ger bi xelet (**rucû'**) carekî purskey li min, dê bi semayîhere kuşî kulah (**husna te'fil**).

17. **Murxê dilim** bendî bûye bi gîswan
Ma ji firînê per û bask û cenah

Hunerên Edebî: Murxê dilim (**teşbîh**), per û bask (**sînonîm**).

18. **Her kî bi du “sad”ê di bin herdu “nûn”**
“Seyd feqed sarkema' qurah”

Hunerên Edebî: Her kî bi du “sad”ê di bin herdu “nûn” (**teşbîh**).

19. **Dil ku we delîlê xwe dî bû zelîl**
“Meyle'in kul huwînnefsi rah”

Hunerên Edebî: Dil ku we delîlê xwe dî bû zelîl (**teşxîs**).

20. “Kul min ihtiraq binaril hewa
Necmi se’adete fiy el ufqi lah”

Hunerên Edebî: Dengê –iyê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

21. **HADÎ bizan zikrê xet û xalê dost**

Merheme bo qelbê kulê pur cerah.

Hunerên Edebî: HADÎ (**tecrîd**) bizan zikrê xet û xalê dost (**teşxîs**), merheme bo qelbê kulê pur cerah (**mecaz**).

27

EY DILÊ NADANÊ MIRIYE

1. **Ey dilê nadanê miriye şubhî lax**

Rabe tereb bîne xwe **teşbîhî şax**

Hunerên Edebî: Ey dilê nadanê miriye (kinaye) şubhî lax (**teşbîh**), teşbîhî şax (**teşbîh**), şubh û teşbîh (**îştîqaq**).

2. **Teyrekî pabesteyî tu der qefes**

Nîne meqamê te ev eywan û kax

Hunerên Edebî: Teyrekî pabesteyî tu der qefes (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

3. ‘Alime emre weten û cayê tu

Tu dibe cayî min ev senkulax

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

4. Mexzenê ekdar e dibêjin dine

“Sen ewke’ya didanime xedar lixene bax”

Hunerên Edebî: “Sen ewke’ya didanime xedar lixene bax” (**îqtibas**), dengê –eyê (**asonans**).

5. Rojekê elbet ji vê dunya denî

Tu dê bi qebrî herî ba **ax û wax**

Hunerên Edebî: Ax û wax (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

6. **Tu hê xafilî bi tamamî bira**

Rabe sefer pîşe bipirse surax

Hunerên Edebî: Tu hê xafilî bi tamamî bira (**kinaye**), rabe sefer pîşe bipirse surax (**kinaye**).

7. Nîne **qerargahê** te dunya fena

Wê tu bikî rojekê jê insilax

Hunerên Edebî: Nîne qerargehê (**mecaza mursel**) te dunya fena, wê tu bikî rojekê jê insilax (**kinaye**).

8. Pur tu mexwo ji naz û ne'îmê dinê

Pur merezek pîs e dibin intifax

Hunerên Edebî: Pur merezek pîs e (**mecaz**).

9. **Pak tu hatî bi dinê jê here pak**

Û tu meke meskenê xwe ev menax

Hunerên Edebî: Pak tu hatî bi dinê jê here pak (**irsala mesel û kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

10. Dinê bi vê wes'etê tengê bizan

'**Alem** belaye wesî' û firax

Hunerên Edebî: Dinê bi vê wes'etê tengê bizan (**mecaz**), 'alem (**mecaza mursel**).

11. Ferq û temîzî tune vî ‘esrî da

Beqle û karud û yek ew ispinax

Hunerên Edebî: Ferq û temîzî tune vî ‘esrî da (**kinaye**), beqle û karud û yek ew ispinax (**tenasub û terdîd**).

12. Şahê Buxara bi xwe rabe eger

Yek wî bibinin wê şeyxê selax

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

13. Tu dikî **newmê di firaşê herîr**

Pur hene mehrûm ji surax û burax

Hunerên Edebî: Newmê di firaşê herîr (**teşbîh**).

14. **Hubba vê dinê te kirî kor e û ker e**

Nacihî qet **şîn û girîn û surax**

Hunerên Edebî: Hubba vê dinê te kirî kor e û ker e (**tarîz û mecaz**), şîn, girîn û surax (**tenasub**).

15. HADÎ eger ‘aqil û ferzaneyî

‘Eqda vê **bûka dinê** ke infisax.

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**), bûka dinê (**îsti’are**).

28

“ELMINELLAH” KU JI LUTFA ŞEHÊ SERMED

1. “Elminellah” ku ji lutfê şehê sermed

Min dî bi ‘eyan zulfê du şehmar li ser xed

Hunerên Edebî: Mi dî bi ‘eyan (kinaye) zulfê du şehmar (**teşbîh**) li ser xed, dengê –eyê (**asonans**).

2. **Dil gestî du şehmarê** wî da zehrê helahil
Lazim ku tedawî ye bi tiryaqê **xem û derd**

Hunerên Edebî: Dil gestî du şehmarê (**teşbîh**), xem û derd (**sînonîm**).

3. Daim bi **evînê** tu ji **dil** bavê le'înî
Maldarê ne '**aşiq** rehê rahet li wî bû sed

Hunerên Edebî: Tevahiya beytê (**teşbîhul etraf**).

4. Rûalê şîrîn xalê bi wî le'lê zelal
Sohtî dilê min bi agirê 'îşqê û kirî qed

Hunerên Edebî: Sohtî dilê min bi agirê 'îşqê û kirî qed (**mecaz û mubalexe**).

5. **Hîna ku birîndar kirî dil bi şewatê**
Bilcumle ji mal û weledan dil kirî wî **serd**

Hunerên Edebî: Hîna ku birîndar kirî dil bi şewatê (**teşxîs û mecaz**), şewat û serd (**tezad**).

6. Arî ku ji **barî** bi dilan bîte mehebbet
Şa nabe bi xeyr ji **Barî** Te'ala bi tu meqsed»

Hunerên Edebî: Barî û barî (**mecaz**), dengê –ayê (**asonans**).

7. Her xamê ji 'amê çî dizanît vê meramê
Wan cah û menasib heye dilxwah neşrin qed

Hunerên Edebî: Dengê – eyê (**asonans**).

8. Her **serfî û nehwi û me'anî û beyanî**
Hem wez'iyê bê 'îşqê heba bûne ewan ked

Hunerên Edebî: Serfî û nehwî û me'anî û beyanî (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

9. Lew aletê **tefsîr** û **ehadîs** û di **fiqhê**

Tefsîr û **ehadis** seyeye derke ji dil bed

Hunerên Edebî: Lew (**rucû'**), tefsîr û ehadîs û fiqh (**tenasub**), tevahiya beytê (**teşbihul etraf**), dengê –eyê (**asonans**).

10. Dernakeve bed jê ji **dilê sahî û lahî**

Îlla ku bi 'îşqê bibehî hem jî meşhed

Hunerên Edebî: Dilê sahî û lahî (**teşxîs**).

11. Her 'îşqe bi **feryadresî tu û hewarê**

Ne **mal û minal fezl û huner 'ilmê** mucerred

Hunerên Edebî: Feryadresî û hewarî (**sînonîm**), mal û minal fezl û huner 'ilmê (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

12. Tu saxî **birîndarê birîndar** be tu saxî

Tu heyî miriye bimre tu heyî bi Muhemmed

Hunerên Edebî: Sax û mirî (**tezad**), birîndarê birîndar (**tekrîr**), heyîn û mirin (**tezad**), dengê –eyê (**asonans**).

13. Carek tu bi 'ibret **veke ev çavê di xew da**

Eskenderê Qerneyn li ku ye çêkirî wî sed

Hunerên Edebî: Veke ev çavê di xew da (**irsala mesel û kinaye**), Eskenderê Qerneyn (**telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

14. **Ev mal weled cah û ruteb** cumle ‘edûn
Gûhdêre tu Quranê ku tesdîq dike bê hed

Hunerên Edebî: Ev mal weled cah û ruteb (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

15. Roja ku du saqê te li te bene pêçan
Hesret dikişînê û nedamet kî tu bê ‘ed

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

16. **Ew kes ku ji dunê xwe kişand** û Xwedê heskir
Dîn nîne tu dînî tu esîrê sebu’ û ded

Hunerên Edebî: Ew kes ku ji dunê xwe kişand (**mecaz**), dîn nîne tu dînî tu esîrê sebu’ û ded (**tenasub**), dîn (**tekrîr**).

17. **Ey Hadî tu vî qelbê miriye hey ke** bi himmet
Der sohbeta wî Şahê Hezaniyê ji Serhed.

Hunerên Edebî: Ey Hadî (**nîda**) tu vî qelbê miriye hey ke (**nîda**), mirî û hey (**tezad**).

29

HISNÊ HESÎN ‘IŞQ E BIZAN

Hisnê hesîn ‘işqe bizan

1. Hem jî menas û hem melaz

Daim ji bo **nefsa nizan**

Her ‘işqe hamî û mu’az

Hunerên Edebî: Nefsa nizan (**teşxîs**), dengê –hyê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

Nefsa xebîsa pur xesîs

2. Nabe mûtî'û hem enîs
Her pîs e û hem nabit nefîs
Ewê bi 'îşqê bit cuzaz

Hunerên Edebî: Nefsa xebîs (**irsala mesel û teşxîs**), dengê –eyê (**asonans**).

Bifikir di vê çerxê kebûd

3. Berbad dad '**Ad û Semûd**

Kan Hatemê pur bezl wucûd

Îfna kirî wan hem fezaz

Hunerên Edebî: 'Ad û Semûd (**telmîh**), kan Hatemê pur bezl wucûd (**isihfam û telmîh**).

Her roj hezar 'ibret heye

4. **Dil kor e nefis jî hem se ye**

Hes kirye dunya qehbe ye

Hem xemra engûr wezaz

Hunerên Edebî: Dil kor e (**teşxîs û tarîz**) nefis jî hem se ye (**teşbîh**), hes kirye dunya qehbe ye (**tarîz û teşbîh û teşxîs**), dengê –eyê (**asonans**).

Dunya meta'ek fanî ye

5. **Ehlê di wê her canî ye**

Nabe ji wê qet razî ye

Îlla reziîl ehlê bezaz

Hunerên Edebî: Meta'ek fanî (**teşbîh**), ehlê di wê her canî ye (**tarîz**), nabe ji wê qet razî ye (**tarîz**), îlla reziîl ehlê bezaz (**tarîz**), dengê –eyê (**asonans**).

Hubba Xwedayê barî ye

6. Kuştî wî nefsa narî ye
Nûr daye bi alê tarî ye
Ji 'isyanê daye wî nefaz

Hunerên Edebî: Kuştî wî nefsa narî ye (**mecaz**).

Bulbul ji teyran ‘işq sot

7. ‘Uşşaqî her behsa wî got

Wan ji teyrî dî kirine sukût

Lew wan nebûn ‘işqa hezaz

Hunerên Edebî: İşq û ‘uşşak (**îştîqaq**), bulbul, ‘îşq, ‘uşşaq, teyr, sukût (**tenasub**), tevahiya qîteyê (**teşbîhul etraf**), lew (**rucû’**) wan nebûn ‘işqa hezaz.

Wê qameta şimşad û ney

8. Bîne bi kenarî tu bi mey

Mey hubb e qelb kirye wî hey

Gerçi ze’îfe **wek rezaz**

Hunerên Edebî: Wê qameta şimşad û ney (**teşbîh**), mey hubb e qelb kirye wî hey (**mecaz**), wek rezaz (**teşbîh**).

HADÎ sirata musteqîm

9. Her hubbe bû rebbê rehîm

Kuştiye wî nefsa leîm

Xeyrî ewî rê bûne şaz.

Hunerên Edebî: Hadî (**tedric**), kuştiye wî nefsa leîm (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

30

DILBERA SERWA SEHÊ MIN

Dilbera serwa sehê min

1. **Dil ji min wê kirye kerker**

Çi dibit rebbî şehê min

Ku dewa ke **dilê mermer**

Hunerên Edebî: Dil ji min wê kirye kerker (**tezmîn û teşbîh**), Rebbî (**nîda**), dilê mermer (**îsti'are**), dengê –iyê (**asonans**), çi dibit Rebbî şehê min (**istihfam**).

Kuştiyê dil hebîb e

2. Ewe **cerrah û tebîb e**

‘Arifê bi derdê keîb e

Dide wî sirke ya suker

Hunerên Edebî: Cerrah û tebîb (**sînonîm**), kuştiyê dil hebîb e (**mecaz**), dide wî sirke ya suker (**mecaz**).

Caniye can û cenan e

3. Qaidê rewza cinan e

Melceye emn û eman e

Lewleya gîso mu'enber

Hunerên Edebî: Caniye can û cenan e (**tekrîr û îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

Gerdena şûşe misalî

4. Tel'eta şemi' û şemalî

Ebrûyê qewsê hilalî

Dilê min kirine mu'etter

Hunerên Edebî: Gerdena şûşe misalî (**teşbîh**), ebrûyê qewse hilalî (**teşbîh**), dilê min kirine mu'etter (**teşbîh**).

Zeriya sorgula tel'et

5. **Wekî ronîştî** di sohbet

Meclisa dûrî bû cennet

Reqsî can û dil û ser

Hunerên Edebî: Wekî ronîştî (**teşbîh**), can û dil û ser (**tenasub**).

Lew “elest” têtê wî bîre

6. Dike zarî û nefire
Diçe hêlîna munîre
“Lamekan” gotine ew der

Hunerên Edebî: Lew (**rucû**) “elest” têtê wî bîre, “lamekan” gotine ew der (**kinaye**).

Warid ew ‘eskerê rebb e

7. Digihî **me’dena qelb e**
Zulmet û nûrê bi herb e
Zilmetê jê dike ew der

Hunerên Edebî: Digihî me’dena qelb e (**mecaz, teşxîs**), dengê –eyê (**asonans**).

Zewqiyê halê me gotî

8. Keşf kir xweş **Melê Botî**
Camide cahid gotî
Dike inkarê seraser

Hunerên Edebî: Melê Botî (**telmîh**).

Heçî erwahê “elest”î

9. Hebû wan ulfet û mestî
Ku ketin ‘alema hestî
Dikin ew dostî beraber

Hunerên Edebî: Ku ketin ‘alema hestî (**mecaza mursel**), dengê –eyê (**asonans**).

Her çi bû ji eslî cuda ye

10. **Dûr bûye ji behra Xweda ye**

Dike efxan û newa ye

Bikî da wesla muqerrer

Hunerên Edebî: Dûr bûye ji behra Xweda ye (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Hemî yek esle wucûb e

11. **Weye navê xeyb xuyûb e**

Nebûn imkan û ‘ûyûbe

Nebûn e’raz û ne cewher

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

“Îstewa” gotine ev hal

12. **Hebû ‘işq nebû xet û xal**

Nebû ‘erş û ne meh wisal

Nebû ev çerxê mudewwer

Hunerên Edebî: Hebû û nebû (**tezad**), nebû (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

Nebû e’yanê di sabit

13. **Nebû erwahê musamit**

Nebû emsalê mufawit

Nebû eşbahê mukerrer

Hunerên Edebî: Nebû (**tekrîr**) tî pê n wekî –ê û –it a dawiya bêjeyan dibin (**tersî**’).

Xwedayî kir minnet wucûdê

14. **Hemî hanine wucûdê**

Da bibin bo wî sucûdê

Bigerin şad û mufexxer

Hunerên Edebî: Xwedayî kir minnet wucûdê (**mecaz**).

Xwedê ew cinn û di insan

15. **Xelq kir cumle bi ihsan**

Da bibin secde bi iz'an

Ji bo rebbê xwe yê ekber

Hunerên Edebî: Xwedê ew cinn û di insan, xelq kir cumle bi ihsan, da bibin secde bi iz'an, ji bo rebbê xwe yê ekber (**telmîh**).

'Aşiq û yarê mecazî

16. **Ku dikin zarî û nazî**

Ji Xwedê çêbûye gazî

Tune wan 'eqlê munewwer

Hunerên Edebî: 'Aşiq û yar (**sînonîm**), tune wan 'eqlê munewwer (**kinaye**).

Wekî yek fanî bibinin

17. **Gavekê di sohbeta rûnin**

Cezbeyek dî jê bibinin

Dê bikin eslê mutehher

Hunerên Edebî: Wekî yek fanî bibinin (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Xafil û jar û feqîr in

18. **Bi hewa nefsê esîr in**

Eger em şah û emîr in

Me ne di 'eqlê enwar

Hunerên Edebî: Xafil û jar û feqîr in (**tenasub**), bi hewa nefsê esîr in (**teşxîs**), dengê –eyê (**asonans**).

Me **şeb û rûzê** xeyal e

19. **Ku çî bûn jin û rical e**

Da bikin cem'ê di mal e

Bi xweşî bikne ker û fer

Hunerên Edebî: Şeb û rûz (**muqabele**), ku çî bûn jin û rical e (**istihfam**).

Xwedê **ya Rebbî** kerem ke

20. Me ji vê fikrê bi der ke

Me bi canib xwe jî cer ke

Da bibîn cumle muzeffêr

Hunerên Edebî: Ya Rebbî (**nîda**), me bi canib xwe jî cer ke (**irsala mesel**).

HADÎ vê te pur dirêj kir

21. Te vê qirgasê qirêj kir

Te me jî ker û gêj kir

Ji Xwedê tete me rehber.

Hunerên Edebî: Hadî (**tecrîd**), te me jî ker û gêj kir (**teşbîh**).

31

REBBUL 'IBAD ÇÊKIR ME'AD

“Rebbul'ibad” çêkir me'ad

1. Da nîk û **bed** pê bin **temîz**

Mewt û heyat husn û fesad

Kir imtihan Rebbê 'ezîz

Hunerên Edebî: Mewt û heyat (**tefad**), bed û temîz (**tefad**).

Dunya **wekî şehd û esel**

2. Şêrîne bo derbê mesel

Teşbîhî sûm eheme besel

Tûje li nik ‘eqlê ‘ezîz

Hunerên Edebî: Wekî şehd û esel (**teşbîh**), teşbîhî sûm eheme besel (**teşbîh**).

Ketne di qebran bûn ‘edem

3. Eshab û hem ehlê kerem

Nîne me ‘ibret yek du dem

Ku em jî qebir dê kin gurîz

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Lewra ku nefis û hem le’în

4. Çêkirne der batin kemîn

Bûn mufside pur **buxz û kîn**

Me ji bo cehennem kirne rêz

Hunerên Edebî: Buxz û kîn (**sînonîm**), me ji bo cehennem kirne rêz (**kinaye**).

Ev çar sukûn û hem jî cû’

5. Tenhayî û terke hucû’

Gotin dike nefse xuzû’

Nefs du ne meselî hubl û kîz

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Lazim bi dest ‘işqa xedar

6. **Sotin bibîne meselî nar**

‘Arî bibe ji ‘eyban û ‘ar

Hingî dibit ew pur mezîz

Hunerên Edebî: Sotin bibîne meselî nar (**teşbîh û mecaz**), ‘eyban û ‘ar (**sînonîm**).

Zulf û rux û xalê hebîb

7. Bîne xeyalê ger lebîb
Rabite ke bi wechê ‘ecîb
Dê ew bibit xweş xîzexîz

Hunerên Edebî: Zulf û rux û xalê hebîb (**tenasub**), dengê – eyê (**asonans**).

Feyz û felah û hem necat

8. Hem kewser û abeheyat
Hubba heq hetta memmat
Hetta bi rûzê restexîz

Hunerên Edebî: Feyz û felah û hem necat (**tenasub**), kewser û abeheyat (**sînonîm**), dengê -hyê (**alîterasyon**), dengê – eyê (**asonans**).

Xweş ke bi ‘îşqê dîkê dil

9. Da xalî be ji her xişş û xil
Dûr be ji wesfa ab û gil
Dil hilbe tê sewt we’zîz

Hunerên Edebî: ‘Îşqê dîkê dil (**îsti’are**), dengê –eyê (**asonans**).

Rûne li nik **ehlî dilan**

10. Lew ew buzurg in hem kelan
Her sohbetek wan **wek gulan**
Dil pê dibit pur ‘îşq rîz

Hunerên Edebî: Ehlê dilan (**mecaza mursel**), lew (**rucû’**), wek gulan (**teşbîh**).

Her ‘abid û sofiye xam

11. Nîne ji ‘işqê wan mudam

Behsî meke û ji **kas û cam**

Nik wan nexwarin xemra tîz

Hunerên Edebî: Kas û cam (**sînonîm**), dengê –m (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

Her çi nexwar ji ‘işqê şerab

12. Dil wî nebû bi hubbê kebab

Wî fehm nekir sirra kitab

Min muxteser go hem wecîz

Hunerên Edebî: Her çi nexwar ji ‘işqê şerab (**mecaz**), hubbê kebab (**teşbîh û mecaz**).

Zerrînguhara zulfherîr

13. Gerden şemala xedmunîr

Min dî ji **min** çû sed nefîr

Ah min ji dest ev çar çîz

Hunerên Edebî: Zerrînguhara zulfherîr (**teşbîh**), gerden şemala xedmunîr (**teşbîh**), min (**tekrîr**).

Qewsê reş û zulfê di geş

14. Ew gîsuwanê miskweş

Ew xebxeb û **çaha hebeş**

Daim li dil bûn ‘etrê bîz

Hunerên Edebî: Çaha hebeş (**telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

HADÎ ji çarsed de û de

15. Îmdad teleb ke da bide

Nûr û ziya bi qelbê gede

Bilsai' welkeylu elqefiz

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**), nûr û ziya (**sînonîm**), qelbê gede (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –dyê (**alîterasyon**).

32

ELLAH KU KIR 'ÎNAYET

Ellah ku kir 'inayet

1. Mesqel wî kir dilê pas

Hem jî wî kir ri'ayet

Dil xalî kir ji weswas

Hunerên Edebî: 'Inayet, mesqel wî kir dilê pas, ri'ayet (**mecaz**), dengê –îyê (**asonans**).

Ye'nî ji dil wî zerqê

2. Avêt bi narê 'îşqê

Me'yûs kirî ji xelqê

Hem hifz kir ji ercas

Hunerên Edebî: Ye'nî ji dil wî zerqê, avêt bi narê 'îşqê (**mecaz**).

'Îşq ne bi girîn û zor e

3. Ew feyz û nar û nûr e

Dil pê herîq û sor e

Babarî kir wî iynas

Hunerên Edebî: Ew feyz û nar û nûr e (**tenasub**).

Hetta bi zulf û xalê

4. Wê dilbere delalê

Dil nîne çûş û halê

Nabit nevê ji ednas

Hunerên Edebî: Dil û dilber (**îştîqaq**).

‘Îşq gerçi ew mecaz e

5. Wê behs ji xet û xaz e
Bal heq ve karsaz e
Rojê me pê çin **ey nas**

Hunerên Edebî: ‘Îşq gerçi ew mecaz e (**mecaz**), ey nas (**nîda**), dengê –eyê (**asonans**).

Ah vê pere tu bes ke

6. Derbas ke tu jî les ke
Her tu ji Xwedayî hes ke
Razî be tu bi palas

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Ew kes ku hes kir Allah

7. **Dil wî disoje her gah**
Her geh dikêşit ew ah
Da bikuje nefis û xennas

Hunerên Edebî: Ew kes ku hes kir Allah (**mecaz**), dil wî disoje her gah (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**), da bikuje nefis û xennas).

Rê dûr û pur dirêj e

8. Qelbê me pur qirêj e
Me nekir ew nimêj e
Men’a me ke ji encas

Hunerên Edebî: Rê dûr û pur dirêj e (**kinaye**), qelbê me pur qirêj e (**teşxîs**), dengê –eyê (**asonans**).

Desmêj û mêjê sûrî

9. Dil nabe pê belûrî
Jê naçitin kedûrî
Me nîne ‘eqlê ekyas

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

“Înnesselatu tenha”

10. Guldêrin hûn bi dilha
Quran dibêje ev ha
Man em bi feqr û iflas

Hunerên Edebî: Dengê -nyê (**alîterasyon**).

Ger tu divê şerî’et

11. Tethîr bikî tebîet
Dûr be ji her çi bîd’et
Seydayî be bi enfas

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Her nefes û mewaqît

12. Ku tenê wan yewaqît
Zayi’ meke bi hewanît
Ev lu’lu û ev elmas

Hunerên Edebî: Ev lu’lu û ev elmas (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Ger tu divê xelas bî

13. Hem ‘aşiq û ji xewas bî
Vê behre da xewas bî
Îmdad ke Xewsê Ervas

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), îmdad ke Xewsê Ervas (**nîda**).

Her ‘iŝq e rehberê te

14. **Hem sîm û hem zerê te**

Hem mêw û hem berê te

Hem bo te Xizir Îlyas

Hunerên Edebî: Hem (**tekrîr**), hem sîm û hem zerê te (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**), Xizir Îlyas (**telmîh**).

HADÎ me qutb û rehber

15. **Hem padîŝah û serwer**

Hem ŝahê bazê ekber

ŝahê Hezan e heq nas.

Hunerên Edebî: Hadî (**tecrîd**) me qutb û rehber (**teşbîh**), padîŝah û serwer (**sînonîm û teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

33

TESFIYA DIL KE BI MEY

Tesfiya dil ke bi mey

1. **Fayde çi ev rîŝ û ŝaş**

Bîne bi saz wî çû ney

Guh mede libsê qumaŝ

Hunerên Edebî: Tesfiya dil ke bi mey (**mecaz û teşxîs**), (dengê –eyê (**asonans**)).

Batinî be tu murîd

2. **Zahirî be nebeyîd**

Dê bi vî dêwê merîd

Kor bibe ŝubhî xufaŝ

Hunerên Edebî: Batinî û zahirî (**tezad**), kor bibe ŝubhî xufaŝ (**teşbîh û mecaz**).

Her çi ewwel wî hebûn

3. Ulfet û ‘îşq û cunûn

Dê bibe îro zebûn

‘Aşiq û zar û qelaş

Hunerên Edebî: Dengê –ûyê (asonans).

Seh kirî dil yek surûş

4. Lew dike ew pur xurûş

Dîza wî tê pur bi cûş

Çê dibe jê irti’aş

Hunerên Edebî: Lew (rucû’).

Kibir û riya û hesed

5. Reş kirine wan **kebed**

Sahibe wan bûne **bed**

Gerçi bineqşîne qaş

Hunerên Edebî: Kibir û riya û hesed û kebed û bed (**tenasub**), dengê –eyê (asonans).

Se’yê di ‘îşqê bike

6. Neqşî be zewqê bike

Çi dikî bi sidqê bike

Rast û durist be tu baş

Hunerên Edebî: Rast û durist (**sînonîm**), dengê –iyê (asonans).

Rast bû elîf bû ser e

7. Her çi ku xwar e xere

Dil tijî şûr û şere

Kare wî her tîm kelaş

Hunerên Edebî: Her çî ku xwar e xere, dil tijî şûr û şere, kare wî her tim kelaş (tarîz), dengê –eyê (asonans).

‘Aşiqê şûrîde be

8. Her bi wî pejmurde be

‘Eqlê me’ad dîde be

Bes ke ji ‘eqlê me’aş

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (asonans).

Awirê **wan** dilberan

9. Nazê **ewan** ‘enberan

Bo dilê **wek xenceran**

Cerhe dîke **qelbê laş**

Hunerên Edebî: Wan- wan / dilberan- ‘enberan (**muwazene**), **wek xenceran (teşbîh)**, **qelbê laş (teşbîh)**.

Zulfê rûmal û delal

10. **Gîsuwê şebreng xal**

Lêvê şîrîn û zelal

Merhem e bo qelbê xaş

Hunerên Edebî: **Zulfê rûmal û delal (teşbîh)**, **gîsuwê şebreng xal (teşbîh)**, **merhem e bo qelbê xaş (mecaz)**, dengê –eyê (asonans).

Tu were carek bi naz

11. **Rûnê li ser çesmê baz**

Derxe bi çengal û gaz

Tu ji dilim xaş û qaş

Hunerên Edebî: **Rûnê li ser çesmê baz (teşbîh)**, dengê –eyê (asonans).

Her **tu yî mewcûd û bes**

12. Hem **tu yî me'bûd û bes**

Hem **tu yî meqsûd û bes**

Rebbî nekî min tu şaş

Hunerên Edebî: Tu yî- ûd û bes (**tersî'**), hem tu yî (**tekrîr**), û bes (**tekrîr**),
Rebbî (**nîda**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Dunyê bi xwe me'ber e

13. Gotinê hem qenter e

Namîne kes lê ser e

Ceng û cidal û sewaş

Hunerên Edebî: Cegn û sewaş (**sînonîm**), ceng û cidal û sewaş (**tenasub**).

Sorgul û hem jî binefş

14. Xeddê geş ew zulfê reş

Wek wî tune xûb û xweş

Hem jî heşaş û beşaş

Hunerên Edebî: Sorgul û hem binefş (**teşbîh**), wek wî tune (**teşbîh**) xûb û
xweş (**sînonîm**), dengê –şyê (**alîterasyon**).

HADÎ ji qewsê hilal

15. Bûye birîndar û lal

Têtiye kerb û melal

Care û hame û taş.

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**), care û hame û taş (**tenasub**).

DIL KU XEM Ê DERD Ê 'IŞQDil ku **xem û derd û 'işq**

1. Tê nebe nabe xelas
Bavê bi wê j'qelbê zirq
Hilbe tê nibrasê xas

Hunerên Edebî: Xem û derd û 'işq (**tenasub**), dengê – eyê (**asonans**).

Dax ke bi 'işqê dil e

2. Jê here xişş û xil e
Fayde çi xelwe û cil e
'İşq e melaz û menas

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).**Nefsê xebîs û ker e**

3. Sewq ke di xeyrê here
Ga ku di cotî nere
Lazime jêra misas

Hunerên Edebî: Nefsê xebîs (**irsala mesel**) û ker e (**tarîz**).**Qelbê ker û kor û lal**

4. **Ger nexwe xemra helal**
Nîne wî yek **cezb û hal**
Nabe ji cinse xewas

Hunerên Edebî: Qelbê ker û kor û lal (**tarîz û tenasub û teşxîs**), ger nexwe xemra helal (**teşxîs**), cezb û hal (**sînonîm**).

Rûne li nik **dilberan**

5. Tevbide wan şehperan

Dil bi xwe da keyberan

Jê here ew has û bas

Hunerên Edebî: Dil û dilber (**îştîqaq**), dil bi xwe da keyberan (**teşxîs**), dengê –eyê (**asonans**).

Nazê şêrîn kakulan

6. Zulfê reşê ser milan

Sohbeta **ehlê dilan**

Her sê xweş in **wek lewas**

Hunerên Edebî: Ehlê dilan (**mecaza mursel**), wek lewas (**teşbîh**).

Çav reşê nirkisîn

7. Qeddê bilinde hesîn

Gerdena sîmîn mesîn

Dil di ewa bû reqas

Hunerên Edebî: Çav reşê nirkisîn (**teşbîh**), qeddê bilinde hesîn (**teşbîh**), gerdena îmîn mesîn (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Her kî bi ixlasê tam

8. Rûne li nik **ehlê cam**

Dê buxwe daim mudam

Nisbet û hem ixtisas

Hunerên Edebî: Ehlê cam (**mecaza mursel**), dengê –îyê (**asonans**).

Çarsed û hem hî du şeş

9. Feyz dê ji çarsed û şeş

Not û duwê kir wî xweş

Sediyê ewan imtisas

Hunerên Edebî: Çarsed û hem hî du şeş, feyz dê ji çarsed û şeş, not û duwê kir wî xweş (**tarîx**), dengê –eyê (**asonans**).

Qelbê reşê qîrweş

10. Ger neke sohbet wî geş
Her dê **bîmar be û nexweş**
Nabîne ew inhimas

Hunerên Edebî: Qelbê reşê qîrweş (**teşbîh**), bîmar û nexweş (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Sohbeta ehlê dilan

11. **Şubhî binefşe û gulan**
Xud bîniya van milan
Ba'isê feqr û xesas

Hunerên Edebî: Sohbeta ehlê dilan (**mecaza mursel**), şubhî binefşe û gulan (**teşbîh**).

Paşve çûn ev xweş melan

12. Hûn werin **ey cahilan**
Bihn kin ji **werd û gulan**
Mebine ji feyzê mehas

Hunerên Edebî: **Ey cahilan (nîda)**, **werd û gul (sînonîm)**.

Sohbeta fedla Xweda

13. Gêra Xweda va wî da
Nabêje **şah û geda**
Bûye misliman şemas

Hunerên Edebî: Şah û geda (**muqabele**).

Şeytan di damar kira

14. Sed kiriye **ey bira**

Behreye nura sera

Nakî tu qet ihtiras

Hunerên Edebî: Ey bira (**nîda**), dengê –eyê (**asonans**).

HADÎ Xweda **hadî** ye

15. Teblîx ji te kafî ye

HADÎ mûzil barî ye

Dûr be ji ehlê şeyas.

Hunerên Edebî: HADÎ (**terdîc**), Hadî û hadî (**cînas**), dengê –ayê (**asonans**).

35

EY DILÊ TÊRE BI 'IŞQÊ

1. **Ey dilê têre bi 'işqê** tu bike kesbê **beyaz**

Da bibî me'dena **enwarê** Xweda **şubhî riyaz**

Hunerên Edebî: Ey dilê têre bi 'işqê (**nîda**), şubhî riyaz (**teşbîh**), işqê-enwarê / beyaz- riyaz (**tesmît**).

2. Dilê insanî ku ji yenbû'ê evînyê vexwar

Mislî zer' e venexwe abê ji emtar û hiyaz

Hunerên Edebî: Mislî zer' e (**teşbîh**).

3. Dil tijî reyn û deren bûye tedawî me nekir

Çi beladet li me ku bûyîne em cumle xezaz

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

4. Ger serî êşe li te yaxud elem bête didan

Dê tedawî tu bikî bi sendel û hem jî bi humaz

Hunerên Edebî: Ger serî êşe li te yaxud elem bête didan (**kinaye**), dengê –
eyê (**asonans**).

5. Ev dilên qasî û mermer ji dinê hes dikin ew

Bûne ker nabihin ew pendê hemî bûne meraz

Hunerên Edebî: Ev dilên qasî û mermer (**îsti'are**), ew (**sihra helal**), denê –
eyê (**asonans**), bûne ker nabihin ew pendê hemî bûne meraz (**tarîz**).

6. Nekirin nasî tebiban îlahiyê dilan

Çû ku xud bîne heyin qelbê ewan nabe mezaz

Hunerên Edebî: Dengê –nyê (**alîterasyon**).

7. Dil bi çakûç û kûlinkan û keranê sohbetê

Ger nebe nerimî ji wî naweşe pas şubhî fuzaz

Hunerên Edebî: Ger nebe nerimî ji wî naweşe pas (**mecaz**) şubhî fuzaz
(**teşbîh**).

8. Sohbetê pê dibe hey qelbê miriye şubhî miyah

Dibe fersûde **qulûbê** ger bibe ev av muzaz

Hunerên Edebî: Hey û mirî (**tezad**), şubhî miyah (**teşbîh**), qelb û qulûb
(**îştîqaq**).

9. Nabe hişyarê ji xew dîdeyê ev qelbê xwar

Lew bi xeflet te ewî kil kiriye bûye xemaz

Hunerên Edebî: Lew (**rucû'**), bi xeflet te ewî kil kiriye bûye xemaz
(**mecaz**).

10. Erşê rehman e bizan qelbê heçî mu'mînê pak

Te çira kiriye dilê xwe ji bo şeytanî izaz

Hunerên Edebî: Te çira kiriye dilê xwe ji bo şeytanî izaz (**istihfam**), dengê –
eyê (**asonans**).

11. Oelbî memsûhe dike ji sohbetê nifrîn û be'ad

Ger le' î n cutiye wî qelbê **şebah lehmê 'ezaz**

Hunerên Edebî: Şebah lehmê 'ezaz (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

12. **Şubhî cu'le** dike nifrîn ji bihna di gulan

Xistiye rewsê wî pozê dike bihn wî bi xezaz

Hunerên Edebî: Şubhî cu'le (**teşbîh**).

13. Ne **siyanet ne diyanet** ji wî kes nabîne qet

Wî **xiyanet wî cinayet** kirî rêz meselî fizaz

Hunerên Edebî: Siyanet- xitanet / diyanet- cinayet (**muwazene**), ne siyanet
ne diyanet- wî xiyanet wî cinayet/ ji wî kes nabîne qet- kirî rêz meselî fizaz
(**leff û neşr**), meselî fizaz (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

14. Dil ku mehbûbê Xweda bit û bi wî ra bû nevîn

Bûye memsûx û bûye qasî bi **teşbîhî qizaz**

Hunerên Edebî: Teşbîhî qizaz (**teşbîh**), dengê –byê (**alîterasyon**).

15. Raheta dîn û dinê her bi evînê tu bizan

HADÎ her ehlê **dil** in **dil** dikin ew **şubhî mihaz**

Hunerên Edebî: Dil (**tekrîr**), şubhî mihaz (**teşbîh**), dengê –îyê (**asonans**).

RAST Û DURIST EZ DIBÊM**Rast û durist** ez dibêm

1. Ferşê kîrim heq bisat

Dil ku ji ‘îşqê bû kêm

Naciye dê heq sirat

Hunerên Edebî: Rast û durist (**sînonîm**), dil ku ji ‘îşqê bû kêm (**mecaz**).**Beldeyê ‘îşqê xweş e**

2. Tê bike carek meşe

Dê bike **qelbê reşe**

Her bi Xwedê irtibat

Hunerên Edebî: Beldeyê ‘îşqê xweş e (**mecaza mursel**), tê bike carek meşe (**mecaz**), qelbê reş (**irsala mesel**), her bi Xwedê irtibat (**kinaye**).

Menzerê xûb û munîr

3. **Pîrê direwşen demîr**

Bûn ji bo balê derîr

Murşidê heq bê şîtat

Hunerên Edebî: Pîrê direwşen demîr (**teşbîh**).**Gisuwê mencesterî**

4. **Zulfê di mawîzerî**

Çar mûjî û derwerî**Dane dilim pûr şewat****Hunerên Edebî:** Gisuwê mencesterî (**teşbîh**), zulfê di mawîzerî (**teşbîh**), çar mûjî û derwerî (**teşbîh**), dane dilim pûr şewat (**kinaye**).

Tel'etê gulnarê yar

5. **Qelb û dilm kiriye nar**

Wirdê wî ye **ah û zar**

Tê ji wî sewt û siyat

Hunerên Edebî: Qelb û dil (**sînonîm**) kiriye nar (**mecaz û mubalexe**), ah û zar (**sînonîm**).

Turreyê 'enber şemîm

6. Hatî li ser **dêm û dêm**

Dîn bûm û dil bû dunîm

Gûft û go bû şat û bat

Hunerên Edebî: 'Enber şemîm (**teşbîh**), dêm û dêm (**tekrîr**), dîn bûm û dil bû dunîm (**mecaz**), gûft û go (**sînonîm**), dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

Her kî wî **camek mudam**

7. Rêtî bi kam wî di kam

Dûr bû ji sofîyê xam

Xaneqe hişt û ribat

Hunerên Edebî: Camek mudam (**mecaza mursel**), dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

Meyxûrê mey engûrî

8. Bû ji Xwedê dûr û berî

Serxweşê 'îşqê zerî

Bû ji bo lutfê menat

Hunerên Edebî: Meyxûrê mey engûrî (**kinaye**), serxweşê 'îşqê zerî (**mecaz**).

Mey bixwe tu ji xwe herî

9. Her çi vexwar vî derî

Bû welî di serwerî

Dûr bû ji bihna hutat

Hunerên Edebî: Mey bixwe tu ji xwe herî (**kinaye**), bû welî di serwerî (**mecaz**), dûr bû ji bihna hutat (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Min divî 'esrî nedî

10. Yek bo ji heq bû kedî

Her kî min dî wî xwe dî

Ma di nêve ehlê ritat

Hunerên Edebî: Dengê –dyê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

Nik Xwedê dil her neşîn

11. Tu rê li dil bireşîn

Beyta le'în helweşîn

Da her bi avêji çirat

Hunerên Edebî: Beyta le'în helweşîn (**mecaz**), dengê –ayê (**asonans**).

Mesken û mal û minal

12. Ehlê dilan dî xeyal

Me'dûmê mehze bi hal

Dunye û milk û rihat

Hunerên Edebî: Mesken û mal û minal (**tenasub**), ehlê dilan (**mecaza mursel**), dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

Zêrê zer û zîvê qal

13. Her kê hebandî **bû zal**

Hubba dinê ye webal

Bo wê meken hûn ziyat

Hunerên Edebî: Bû zal (**teşbîh**).

Hubba Xweda ye necat

14. **Kewser û şehd û nebat**

Dil bi wî dîtî heyat

Sahibê wî bû 'etat

Hunerên Edebî: Kewser û şehd û nebat (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

HADÎ bizan tu yeqîn

15. Rehberê **hubb û evîn**

Her ewe "heblulmetîn"

Hem jî surûr û neşat.

Hunerên Edebî: Hubb û evîn (**sînonîm**), dengê –hyê (**alîterasyon**), dengê –
eyê (**asonans**).

37

BULBUL BI HEZAR AWAZ

Bulbul bi hezar **awaz**

1. Bo gul heye ew çilmaz

Wek ney e bi sewt û saz

Her 'işqê wî kir îqaz

Hunerên Edebî: Bulbul bi hezar awaz (**teşxîs û întaq**), awaz, ney, sewt û saz
(**tenasub**), wek ney (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), her 'işqê wî kir îqaz
(**teşxîs û întaq**).

Pur car behar tê em

2. Der xefletin û dûr xem

Neyê me tereb yek dem

Em xişkin û hem cim'az

Hunerên Edebî: Em xişkin û hem cim'az (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîtersyon**).

Ger 'aşiqê wî baxî

3. Wek sofiyê bardaxî

Beji **Taxî** hewar **Taxî**

Qêrin ke **wekî ku qaz**

Hunerên Edebî: Wek sofiyê bardaxî (**teşbîh**), taxî (**tekrîr**), wekî ku qaz (**teşbîh**).

Carek bi tereb rabe

4. Bayê seba li babe

Pur 'aşiq û şeyda be

Amanc be ji bû lihaz

Hunerên Edebî: Pur 'aşiq û şeyda be (**mecaz**), dengê –byê (**alîterasyon**).

Roj ku li hemel ca ke

5. Xwe 'aşiq û sewda ke

Imdadê ji seyda ke

Efxan ke bi sed elfaz

Hunerên Edebî: 'Aşiq û sewda (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Kibir û hesed û xudbîn

6. Berbad ewan da dîn

Bavêjî bi evîn ev kîn

Dûr be ji heçî cewaz

Hunerên Edebî: Kibir û hesed û xudbîn (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

Xweş dewlet e pur faiq

7. Ger tu de bibî 'aşiq

Nûş ke tu ji meya raiq

Guh jê nedêre û wi'az

Hunerên Edebî: Ger tu bibî 'aşiq (**kinaye**), nûş ke ji meya raiq (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Wu'azê murrain in

8. Ageh ji dilan nînin

Xûdraiyê di xudbîn in

Qewlê di wanê fezzaz

Hunerên Edebî: Xûdraiyê di xudbîn (**îştîqaq**), qewlê di wanê fezzaz (**teşbîh**).

'Aşiq di riya dostî

9. Her çi ku hebûn mestî

Da û wî nekir sistî

Bu 'aşiqê dil lezlaz

Hunerên Edebî: Bu 'aşiqê dil lezlaz (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Ger **hubb û evîn** bi **dil**

10. Sebr nake demek bê xil

Her **dilkul** e pê der kil

Ba **dil** heye ew milmaz

Hunerên Edebî: Hubb û evîn (**sînonîm**), dil û dilkul (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

‘Aşiq û terebê **HADÎ**

11. **Hadî** ji bo her **nadî**

Nadanî bi ‘işqê **nadî**

Ev **qelb û dil** bi xezxaz.

Hunerên Edebî: Hadî û Hadî (**cinas**)î, ‘aşiq û terebê Hadî (**tedrîc**), nadî (**tekrîr**), qelb û dil (**sînonîm**), dengê –ayê (**asonans**), ‘aşiq û ‘îşq (**îştîqaq**).

38

EV HERDU ÇAVÊ NERGİSÎN

1. Ev herdu du çavê **nergisîn** wan **dil ji min bir** bê **niza**’

Her didu qewsê **qelemîn** wan tîr li dil dan bê **difa**’

Hunerên Edebî: Nergisîn û welemîn / niza’ û difa’ (**tewşîh**), dil ji min bir (**tezmîn**), wan tîr li dil dan bê difa’ (**mecaz**).

2. Dil bi zincîrê du zulfan bû muqeyyedha esîr

Axirî dil **dîn** bû û her çi **dîn** bi zincîrn muta’

Hunerên Edebî: Dîn (**tekrîr**), dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –îyê (**asonans**).

3. Qameta şimşad û ney hem tel'eta gulnarê nar

Her kê dit wî go ji bo can û dilê xwe: "Elweda"

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

4. **Pur elemkêş û birîndar û nehîf u bêkes im**

Nake pursê qet li min mehbûb û yara ca yefa’

Hunerên Edebî: Pur elemkêş û birîndar û nehîf u bêkes im (**tenasub**).

5. Tewqê gerden her kê dît ew sa'dê simînê yar

Pêve da **teyrê humayî** saye û dî irtifa'

Hunerên Edebî: Teyrê humayî (**irsala mesel**), dengê –eyê (**asonans**).

6. Ger bike teşrîf bi ser balînê bîmarê xwe dost

Navê **bîmar** ku şifaye da ku bê ser rû şu'a'

Hunerên Edebî: Bîmar û şifa (**tezad**).

7. **Lezzet û zewq û tereb** nîne di esbabê dinê

Lew ji wan elbette rojek dê bikî tu inqita'

Hunerên Edebî: Lezzet û zewq û tereb (**tenasub**), lew (**rucû'**), dengê –eyê (**asonans**).

8. "**Qurretula' yn**" û heyat û "**Cennetulme'wa**"'ye 'işq

Her bi wî safî dibî ji emraz û xalî ez ziya'

Hunerên Edebî: "**Qurretula' yn**" û heyat û "**Cennetulme'wa**"'ye 'işq (**tenasub û teşbîh**), Her bi wî safî dibî ji emraz û xalî ez ziya' (**mecaz**).

9. Çeşmê "**sad**"a burhê "**nûn**"a zilfê "**dal a qedelif**

Bir ji min sebr û qerar û taqet û mal û meta'

Hunerên Edebî: Çeşmê "**sad**"a burhê "**nûn**"a zilfê "**dal a qedelif** (**tenasub û teşbîh**), sebr û qerar (**tenasub**), mal û meta' (**sînonîm**).

10. Mam di vê hebsa dinê da be **Enîs û bê Celîs**

Bes bide min **ey şepalê** 'ecz û alam û suda

Hunerên Edebî: Enîs û bê Celîs (**telmîh**), ey şepalê (**nîda û îsti're**), dengê –eyê (**asonans**).

11. Tu ji derdan nabî xalî ta nebînî derdê 'îşq

Lew hemî cah û ruteb bê 'îşq hene bê intifa'

Hunerên Edebî: Tu ji derdan nabî xalî ta nebînî derdê 'îşq (**mecaz**), lew (**rucû'**).

12. Bê xeber mergî ji xwe dûr ew dibîne bê guman

Çar diwarê cesed nik min lehed hat bê xida'

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

13. Der dilê her kê hesed nîne xema dozex tine

Lew dibên **pêta hesed** bû tuxmê dozex "bilsema"

Hunerên Edebî: Lew (**rucû'**), pêta hesed (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

14. Kûzka seyyad ji xar û xes hebûn pişdanuha

Teylesan û xirqeyê çeşmîne ye ú şemla zira

15. Em bi vi 'umrê qesîr ' aciz hene ji dunya denî

Way ji bo Xizrê ku mehbûs e bi 'umrê bê qita'

Hunerên Edebî: Way ji bo Xizrê ku mehbûs e bi 'umrê bê qita' (**telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

16. Tu li qelbê pak nezer ke ne li van şaş û cuban

Çeşmê sethî ra ji behra pur guher kef bû qina'

Hunerên Edebî: Qelbê pak (irsala mesel), dengê –eyê (**asonans**).

17. Qet tine toz û xubarek çeşmê rojê ra yeqîn

Lê remed girtiye çavan nabînin **şemsa lema'**

Hunerên Edebî: Şemsa lema' (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

18. Ger bi şiddet tu hebî **teşbîhî elmasê hedîd**

Dê bi "esreb" şeq bibî xudbîn me be hem jî re'a'

Hunerên Edebî: Teşbîhî elmasê hedîd (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

19. Nazdarê pûr "teneu'um" rê bi dostî nabe ew

'Aşiqî sun'ê ewane ku belakeş bin ciya'

Hunerên Edebî: Dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

20. **Guft û goyê** nasihan baye dil ku bû siyah

Lew miriye nişter qebûl nake ji wan xwîna zira'

Hunerên Edebî: Guft û go (**sînonîm**), lew (**rucû'**), miriye nişter qebûl nake ji wan xwîna zira' (**mecaz**).

21. Her çi bednek qenc barî qenc ew riswa dibin

Lubbê lewzê telx dinêv şekker bizan telxe beşa'

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

22. Rûne nik **ehlê dilan** tu **her** sebah û **her** mesa

Da bibe rewşen dilê te hem bibine iltima'

Hunerên Edebî: Ehlê dilan (**mecaza mursel**), her (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

23. Sa'etek sohbet li nik **ehlê dilan** HADÎ bizan

Çêtire ji sed salî zuhda xişk bê nûr û şu'a'.

Hunerên Edebî: Ehlê dilan (**mecaza mursel**), HADÎ (**tedrîc**).

BOSTAN E 'UMRÊ INSAN**Bostan e 'umrê insan**

1. Me ji wî nexwar berbax
Payizê daye ser wan
Bûn xişk darê wek nax

Hunerên Edebî: Bostan e 'umrê insan (**teşbîh**), wek nax (**teşbîh**).

'Umrê me bê beha bûn

2. Serf bû bi fikrê Qarûn
Mûsayê weqt û Harûn
Nas me nekiriye ev çax

Hunerên Edebî: S erf bû bi fikrê Qarûn (**telmîh**), Mûsayê weqt û Harûn (**teşbîh û telmîh**).

Dil jar û pur 'elîl e

3. Bîmar û pur kelîl e
Bispêrne yek delîl e
Derman ke da bibe sax

Hunerên Edebî: Dil jar û pur 'elîl e (**teşxîs**), bîmar û pur kelîl e (**teşxîs**), derman ke da bibe sax (**kinaye**).

Dil menzerê Xweda ye

4. Dûr ke ji "masiwa" ye
Da bête wî cela ye
Çav wî kesb ke ma zax

Hunerên Edebî: Dil menzerê Xweda ye (**teşbîh**).

Qelbê selîme xaşî'

5. Der **heşr û neşrê** nafi'

Ewlad û male mani'

Ku dil bi zikrî be dax

Hunerên Edebî: Heşr û neşr (**telmîh**), ku dil bi zikrî be dax (**mecaz**).

Me'mûr ke dil bi 'işqê

6. Bes ke ji zuhd û zirqê

Mu'tad be tu bi sidqê

'Arif be **wek Şehê Tax**

Hunerên Edebî: Wek Şahê Tax (**teşbîh**).

Salûsiya bi cam e

7. Meqbûlê her 'ewame

Nas nakin ehlê cam e

Ger camê cam ke îblax

Hunerên Edebî: Nas nakin (**kinaye**) ehlê cam e (**mecaza mursel**), cam (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

Hubb û evîn û dostî

8. Bo heq bike bi duristî

Dûr be ji **kesl û sistî**

Ta ku kilk ûle çoq ax

Hunerên Edebî: Hubb û evîn (**sînonîm**), û dostî (**tenasub**), kesl û sistî (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Bulbul sifet be ey can

9. Ber sorgulê ji canan

Bikşîn **seher tu efxan**

Dûr be ji xûrab û hem zax

Hunerên Edebî: Bulbul sifet be (**teşbîh**) ey can (**nîda**), seher û efxan (**sînonîm**), can û canan (**îştîqaq**).

Hubba Xweda necat e

10. Hem sokker û nebat e

Wî da dilan heyat e

Dîn ra 'emûde hem max

Hunerên Edebî: Hem sokker û nebat e (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Dunya ecûz e pîr e

11. Wek bûk e hem bi mîr e

Xapandî **şah û mîr e**

Wek heyv e mar e leddax

Hunerên Edebî: Dunya ecûz û pîr e (**kinaye**), wek bûk e (**teşbîh**), şah û mîr (**sînonîm**), wek heyv e mar e (**teşbîh**).

Ev sal çi pur wexîm e

12. “Xeyn” û “şîn” “kaf” û “cîm” e

Qetl û qital 'ezim e

Der koh û sehl û hem rax

Hunerên Edebî: Ev sal çi pur wexîm e, “Xeyn” û “şîn” “kaf” û “cîm” e (**tarîx**), qetl û qital (**îştîqaq**).

Yek noqteyek ji 'îd ket

13. Hemd pişt wi hat bi 'illet

Me ji dest wî pur dî zehmet

Xelq bûn bi zulmê ewzax

Hunerên Edebî: Yek noqteyek ji 'îd ket, hemd pişt wi hat bi 'illet (**mu'emma**), dengê –eyê (**asonans**).

Emn û eman û rahet

14. Vî weqtî kiriye rihlet
Me'dûm e 'edl û rehmet
Nas bûn siba' û hilyax

Hunerên Edebî: Emn û eman û rahet (**tenasub**).

HADÎ nema himayet

15. Hem qedr û hem ri'ayet
Melce bes e bi dirayet
Qutbê Hezan şehê Tax.

Hunerên Edebî: HADÎ nema himayet (**tedrîc**), dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**).

40.

DILBERA ZULFEYN LI XEDDEYN BELAV

1. Dilbera zulfeyn li xeddeyn belav
Can û **dil û dîn ji min bir** wê belav

Hunerên Edebî: Dil û dîn ji min bir (**tezmîn**).

2. Kir li **dil** ewwel wê hezar îltifat
Dawî surûr û tereb û i'tîlaf

Hunerên Edebî: Dil (**mecaza mursal**).

3. Weqta ku mu'teda bi ulfet bû dil
Hem jî bi vê ni'metê kir i'tîraf

Hunerên Edebî: Dengê –tê (**alîterasyon**).

4. Paşî bi tîran û xedengê muje

Kiriye birîndar wê dil bê xilaf

Hunerên Edebî: Kiriye birîndar wê dil bê xilaf (**kinaye**).

5. **Dilber û mehbûban** ewan ‘adet e
Ku li ‘uşşaqê xwe bikin i’tisaf

Hunerên Edebî: Dilber û mehbûb (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

6. **Sebr û tehemmul** divê muştâq kin
Da ku bibe de’weyê di ‘îşqê ji lav

Hunerên Edebî: Sebr û tehemmul (**sînonîm**).

7. Xutweya ewwel di riya ‘îşqê da
Gotine serzûne bizan bê guzaf

8. **Bigre ji xawer biçe ta bi exter**
Dê û ha se’be ku ne ‘aşiq bi çav

Hunerên Edebî: Bigre ji xawer biçe ta bi exter (**tedrîc**), dengê –îyê (**asonans**).

9. ‘Îşq çu naye du serî **ey bira**
Ba nik serê jêr ji ser roje saf

Hunerên Edebî: Ey bira (**nîda**), ba nik serê jêr ji ser roje saf (**tedrîc**), dengê –eyê (**asonans**).

10. **‘Îşq e bû safî ji bo cumle ‘ilel**
‘Aşiq e ku ji cumle ‘ilel bû mu’af

Hunerên Edebî: ‘Îşq e bû safî ji bo cumle ‘ilel, ‘aşiq e ku ji cumle ‘ilel bû mu’af (**‘eks**).

11. ‘Işq e te’elluq ji dilan bavêje der
‘Aşiq e ku hubba dinê dûr xe ji nav

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

12. ‘Işq bi zor û bi zer nayête dest

Feyza Xwedê ye heçî dî bû ‘efaf

Hunerên Edebî: ‘Işq bi zor û bi zer nayête dest (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

13. Dil ji hemî cah û ruteb kiriye sar

Yar bi dû nûnan û bi dû sade çav

Hunerên Edebî: Yar bi dû nûnan û bi dû sade çav (**teşbîh**), dil ji hemî cah û rutel kiriye sar (**mecaz**).

14. Dost bi du xeddeynê di gulgûn û geş

Siqleta dareynan ji dil kir xifaf

Hunerên Edebî: Dengê –dyê (**alîterasyon**), dengê –îyê (**asonans**).

15. Her kî di nêv damê du zulefeynê wê

Daneyê xalê di wê di ketiye dav

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

16. Her kesê carek dimre **ey bira**

‘Aşiqê miskîn dimre **zehf û zaf**

Hunerên Edebî: Ey bira (**nîda**), zehf û zaf (**sînonîm**).

17. ‘Eyn û du dal û du elîf ba û qaf

Rê, jî di axir li min kir rê şefaf

Hunerên Edebî: ‘Eyn û du dal û du elîf ba û qaf, rê, jî di axir li min kir rê şefaf (**mu’emma**).

18. Xeyrî Xweda her çi ku noqsan heye

Me'den e bo neqs û şeran bêxilaf

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

19. HADÎ ji qeyd û ji izafê derî

Wahid e her mutleq û dav tav û av.

Hunerên Edebî: Dengê –ayê (**asonans**).

41

YA REB ÇI DIBIT GER BI ME DÎ

1. **Ya Reb** çi dibit ger bi me dî îro tu tewfîq

Da ji çaha wucûdê biderîn pak û bi tezwîq

Hunerên Edebî: Ya Reb (**nîda**).

2. **Lew** ‘umr bi xeflet çû û nefis ma denes û pîs

Der qeydê hewa û hewesî maye bi tewsîq

Hunerên Edebî: Lew (**rucû’**), hewa û hewes (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

3. **Vê bûka dinê** gelkî selatîn û emîran

Der gerdena xwe **mislî qelade kisra te’liq**

Hunerên Edebî: Bûka dinê (**îstî’are**), mislî qelade kisra te’liq (**teşbîh**).

4. Hem gelkî weliyanê Xweda **mislê di seyda**
Pişt dane dinê bi sê kevran kirine wî tetlîq
Hunerên Edebî: Mislê di seyda (teşbîh).
5. Ev nefis bi **teswîl** û le'în hem jî bi **telbîs**
Me ji **tewbe** û ta'atê kirin xafil û **te'wiq**
Hunerên Edebî: Teswîl- tewbe / telbîs- te'wîq (muwazene).
6. Ê'azê bi elfazê dikin we'zê belîxe
Înzarê ji dozex dikin û cennetê teşwîq
Hunerên Edebî: Dengê –zyê (alîterasyon), dengê –eyê (asonans).
7. Tesîr ji wan nabine kes der dil û canî
Lew 'ûcbê 'eceb der dilê wan çêkirî tezwîq
Hunerên Edebî: Lew (rucû'), dengê –eyê (asonans).
8. Ger hes ke Xwedê feyzê birêje bi qulûban
Dê se'yê di meyxanê bikin rast û bi tedqiq
**Hunerên Edebî: Dê se'yê di meyxanê bikin rast û bi tedqiq (mecaz), dengê –
eyê (asonans).**
9. **Lew** 'işqe ku tethîrê dike dil ji 'uyûban
Hem zahir û hem batinê wan ew dike tet tetbîq
Hunerên Edebî: Lew (rucû'), zahir û batin (tezad).
10. Der **mektebê** 'uşşaqî tine behsê ji we'zê
Her **meşqê** mehebbet dikin ew tehrîr û **tenmîq**

Hunerên Edebî: Mektebê- meşqê - we'zê - tenmîq (**tesmît**), dengê –eyê (**asonans**).

11. Lakin di vî 'esrî hemî **nas** bûne di **sûrî**

Me'nayê ji sûret nekirin nas û ne tefrîq

Hunerên Edebî: Nas û sûrî (**tezad**), me'nayê ji sûret nekirin nas û ne tefrîq (**kinaye**).

12. Her kes ku di sûret dimeşî bihna ji me'na

Nayête meşam çunke tekr sûretê temzîq

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

13. Ew kes ku ji wan **miskê** du zulfeynê **delalê**

Bihn kir wî **niqabê** ji dilê xwe kirî **texrîq**

Hunerên Edebî: Miskê- niqabê- delalê- texrîq (**tesmît**).

14. Ew **mentiqê** şêrîn ji du leb le'lê **şepalê**

Dil **hanê** tereb can û ciger hem kirî **tehrîq**

Hunerên Edebî: Mentiqê- şepalê- hanê- tehrîq (**tesmît**).

15. Ey Hadî di her nadî munadî dîke gazî

Ku 'îşqe terîq û nabihin em jî ji tehmîq.

Hunerên Edebî: Ey Hadî (**nîda**), nadî û munadî (**cînas**), dengê –îyê (**asonans**).

1. Qet jê nekir wî infikak

Dil ma di xeyala zulf û xal

Kirine bi hevra îştibak

Hunerên Edebî: Dil ma di xeyala zulf û xal (**kinaye**), dengê –ayê (**asonans**).

Dil şubhî Tûr e pur bi nûr

2. Hate ewî feyz û surûr

Hem ji futûh û hem hubûr

Dengê tereb jê çû semak

Hunerên Edebî: Dil şubhî Tûr e (**teşbîh û telmîh**), hem (**tekrîr**), dengê –ryê (**alîterasyon**).

Dil mislî kûhê Bagir e

3. Pêt û şewat jê namire

Her agirê wî gurgur e

Nefsê ji vê dîti hilak

Hunerên Edebî: Dil mislî kûhê Bagir e (**teşxîs û teşbîh**), pêt û şewat (**sînonîm**), her agirê wî gurgur e (**mecaz**), dengê –îyê (**asonans**).

Yar hat bi naz û dilberî

4. Wê **dil ji min bir** yekserî

Lêda xedengê xencerî

Dil ma ji min der xûn û xak

Hunerên Edebî: Dil ji min bir (**tezmîn**), lêda xedengê xencerî (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Saqîdi bezmê mey gerand

5. Her çi ku **sax bû wî mirand**

Perde ji qelbê wan derand

Sax bûn ebed hem xûb û nak

Hunerên Edebî: Saqî di bezmê mey gerand (**kinaye**), sax û mirand (**tezad**), perde ji qelbê wan derand (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Ger ew şepala zulf herîr

6. Gerden ji şûşa mustenîr
Carek bibîne dil zerîr
Perde ji dil dê ew ke çak

Hunerên Edebî: Ew şepala zulf herîr (**teşbîh**), perde ji dil dê ew ke çak (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Dilber bi sehnê sewme' e

7. Ger meş ke carek bi şe'se'e
Sofî û zahid berqe'e
Dê ji **dil** xwe bavin ew jî bak

Hunerên Edebî: Dilber û dil (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

Ebrûhilala çavxezal

8. Da min ji dû le'lê zulal
Du **kas** ji wê xemra helal
Xem çû û dil bû derdnak

Hunerên Edebî: Ebrûhilala çavxezal (**teşbîh**), kas (**mecaza mursel**), dengê –ayê (**asonans**).

Zulfê du dalê rûyî mal

9. Qamet li min kir **şubhî dal**
Min bi zilletê kir payêmal
Min gotê: La qesdi suwak

Hunerên Edebî: Şubhî dal (**teşbîh**), min gotê: la qesdî suwak (**teşxîs**).

Ayîneyê her çi dilberan

10. Daim li dil dan xenceran

Bikujin 'ûşaqan bi keyberan

Lew wan tine qet xwûn û bak

Hunerên Edebî: Daim li dil dan xenceran (**kinaye**), bikujin 'ûşaqan bi keyberan (**mecaz**), lew (**rucû'**), dengê –eyê (**asonans**).

'Ûşşaqê 'adet wan ew e

11. Der pencê bazê yar kew e

Yan **şubhî şexsê di xewe**

Nayê ji wî deng û herak

Hunerên Edebî: Şubhî şexsê di xewe (**teşbîh û mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

'Işq û terîq bû zahirî

12. Seş gaze şaş li ser serî

Dîlan û reqse û çar perî

Rebbî ezeh haza we zak"

Hunerên Edebî: Ser (**cînas**), seş (**tekrîr**), dîlan û reqs û çar perî (**telmîh û tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

"Men lem yekun fi fikrihî

13. Qesden lehu mîn zikrihî

Bel yera fexre emrihî

Fehwe muraîn zu hilak"

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Ya Reb xelas ke **me ji me**

14. Her gav û sa'et **me bi me**

Nik dil munîra **şubhî me**

Nefs û le'in bin xeşminak

Hunerên Edebî: Ya Reb (**nîda**), me (**tekrîr**), şubhî me (**teşbîh**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Ger dil mirî **qîza tirî**

15. Vexwe ji destê dêmdurî

HADÎ wî kesb kir serwerî

Lew **'îşq û hub** tê tuxmê nak.

Hunerên Edebî: Qîza tirî (**teşbîh**), **HADÎ** (**tedrîc**), **'îşq û hub** (**sînonîm**), dengê –îyê (**asonans**).

43

XWES TAL'I Û BEXT E EV HAL,

1. Xweş **tal'i û bext** e ev hal

Du şems ku burcê hût kin iqbal

Hunerên Edebî: Tal'i û bext (**sînonîm**), du şems ku burcê hût kin iqbal (**mecaz**).

2. Ew herdu ji meşriq bi der bên

Ron kin li min herdu çav û bal

Hunerên Edebî: Dengê –iyê (**asonans**).

3. Yek van wî medarê semaye daim

Yek perdenişîn di menzila mal

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

4. **Yek şemsê di ger ji qible rabe**

Ew mexzenê feyze hem jî ifzal

Hunerên Edebî: Yek şemsê di ger ji qible rabe (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

5. **Geh** em di **sema û geh** di ‘erze

Ew ‘erşî û ferşiye "bila qal"

Hunerên Edebî: Sema û ‘erze (**težad**), geh (**tekrîr**).

6. Bo wî tune qet kusûf esla

Hem nake ufûl hene bi yek hal

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

7. Der leyl û nehar bi yek qerar e

Yek reng e **di hefte' û meh wisal**

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), di hefte' û meh wisal (**tedrîc**).

8. **Eflakê qulûb wî cilwegah e**

Der her seher û xudû û asal

Hunerên Edebî: Eflakê qulûb wî cilwegah e (**teşxîs**).

9. **Tenur wî kirî qulûbê 'uşşaq**

Geriyana **bi misalê feddeyê qal**

Hunerên Edebî: Tenur wî kirî qulûbê 'uşşaq (**mubalexe û mecaz**), bi misalê feddeyê qal (**teşbîh**).

10. Bend kir wî dilan bi neqşê nûrî

Lew gotine neqşebende "balibal"

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (asonans).

11. Ev şemsê di 'erşe wî ser û pay

Qelb jî ji wî çê dibe bi ikmal

Hunerên Edebî: Qelb jî ji wî çê dibe bi ikmal (**mecaz**), dengê –eyê (asonans).

12. Ew kes ku vexwar ji dest wî camek

Bû puxte' û hey nemaye ew kal

Hunerên Edebî: Ew kes ku vexwar ji dest wî camek (**mecaza mursel**), dengê –eyê (asonans).

13. Dil wî dê bibe **bi şubhî bedrê**

Dê bejine wî: **Tu yî elf qal**

Hunerên Edebî: Şubhî bedrê (**teşbîh**), tu yî elf qal (**teşbîh**).

14. Me'wa wi hezar qulûb û can e

Sê rub'ê ji wî bav ber **cihê dal**

Hunerên Edebî: Cihê dal (**teşbîh**).

15. Her kes ku di sohbeta wî rûne

Dê ji dil wî here 'umûm û bulbal

Hunerên Edebî: Dê ji dil wî here 'umûm û bulbal (**mecaz**).

16. **Bi ixlas û mehebbet û bi teslîm**

Dil nûrî dibin **ciwan û hem kal**

Hunerên Edebî: Bi ixlas û mehebbet û bi teslîm (**tenasub**), ciwan û kal (**tezad**).

17. Ber fergê enamê **xas û 'amî**

Ya Reb bide wî dewam û imhal

Hunerên Edebî: Ya Reb (**nîda**), xas û 'amî (**tezad**).

18. Ber nehcê qewîm û musteqîm her

Teşwiq dikim bi fesi û icmal

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

19. Neqşî bi weqar e zikrê wan xef

Der batinî aşna ne **dev lal**

Hunerên Edebî: Dev lal (**kinaye**).

20. Ba berîqeq û def bi reqs û dîlan

Neqşî me nedî bi ev heram hal

Hunerên Edebî: Ba berîqeq û def bi reqs û dîlan (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

21. Tehsîn bike her kî vî heramî

Der kufre diçit bi hukmê îhlal

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

22. HADÎ bi Xwedê tu mustecîr be

Ev 'esr bi fisge zulme idlal.

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**), dengê –eyê (**asonans**).

EV DU ŞEHMAR IN LI SER MIL

1. Ev **du şehmar in** li ser mil, ya **du zulfê mişk fam**
Ya **du fitrak in** ji bo nexcîr ya **du qeyd û dam**

Hunerên Edebî: Şehmar in- fitrak in / fam- dam (**tewşîh**), du- du (**tersî'**), du (tekrîr), ev du şehmar in li ser min, ya du zulfê mişk fam (**tecahula 'arif**), ya du fitrak in ji bo nexcîr ya du qeyd û dam (**tecahula 'arif**).

2. **Sorgul in ev herdu ya du xedd û ya du mahn ew**
Ya **du şems in du hilal in, dor ewan kirine dewam**

Hunerên Edebî: Sorgul in ev herdu ya du xedd û ya du mahn ew (**tecahula 'arif**), du (**tekrîr**), şems û hilal (**tezad**), Ya du şems in du hilal in, dor ewan kirine dewam (**tecahula 'arif**).

3. **Ev du perwîn in li dor mahê dîkin cewelan gelo**
Ya **ji zerrîn du guhar in kirine ber sûret qiyam**

Hunerên Edebî: Ev du perwîn in li dor mahê dîkin cewelan gelo (**tecahula 'arif**), Ya ji zerrîn du guhar in kirine ber sûret qiyam (**tecahula 'arif**).

4. "Hecerul-eswed" bû dêm û çûm tewafê bejine min
Ya li ser dêmê hebibê xalê reş bûn sehê dam

Hunerên Edebî: Ya li ser dêmê hebibê xalê reş bûn sehê dam (**tecahula 'arif**).

5. Ew **du "nûn"ê sernigûn in bin ewan "sad" bûn reqem**
Ya **du bûrh in çêşmê badam girtine benda meqam**

Hunerên Edebî: Du "nûn"- du bûrh / reqem – meqam (**tewşîh**), Ya du bûrh in çêşmê badam girtine benda meqam (**tecahula 'arif**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

6. Ew du rişte dur di nêv lala ne ya didanê yar

Ya mujakê çeşmê şehlan in dilan dan ber siham

Hunerên Edebî: Ya mujakê çeşmê şehlan in dilan dan ber siham (**tecahula ‘arif**), dengê –ayê (**asonans**).

7. Ew du nuqre sîm min di bin abenûsê reş şîrîn

Ya binagûşê şepalê dêm kezî ser bûn lisam

Hunerên Edebî: Ya binagûşê şepalê dêm kezî ser bûn lisam (**tecahula ‘arif**), şepal (**îsti’re**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

8. Yek behek min dî di bin du sêbê sor vî baxî da

Ya çena yarê dibin xeddeynê gulgûn dêm imam

Hunerên Edebî: Ya çena yarê dibin xeddeynê gulgûn dêm imam (**tecahula ‘arif**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

9. Ev elîf ya serwe berçû ya xwe neyşekker min dî

Ya ne turkam kir qiyam û dêm qedd û bala tamam

Hunerên Edebî: Ev elîf ya serwe berçû ya xwe neyşekker min dî (**tecahula ‘arif**), ya ne turkam kir qiyam û dêm qedd û bala tamam (**tecahula ‘arif**), qiyam, dêm û bala (**tenasub**), dengê –myê (**alîterasyon**).

10. Ev melek ya meh felek ya hûrîmînu bû min dî

Ya perî peyker hebîbê şubhî xûr nûr da wî 'am

Hunerên Edebî: Ev melek ya meh felek ya hûrîmînu bû min dî (**tecahula ‘arif**), ya perî peyker hebîbê şubhî xûr nûr da wî 'am (**tecahula ‘arif**), şubhî xûr nûr (**teşbîh**), melek, felek, hûrîminû (**tenasub**).

11. **Ke'be ye ya "Cennetul-Firdews" e ev ya tîbe ye**

Ya bi gundê şahid û mehbubê turka xwe giham

Hunerên Edebî: Ke'be ye ya "Cennetul-Firdews" e ev ya tîbe ye (**tecahula 'arif**), ya bi gundê şahid û mehbubê turka xwe giham (**tecahula 'arif**).

12. **Haci ye ji "Beytul-heram" tên ku dikim ez wan şîrîn**

Ya du destê min hemail li gerdena dostî bû şam

Hunerên Edebî: Ya du destê min hemail li gerdena dostî bû şam (**tecahula 'arif**).

13. **Ew mesîn zîv e mi dî ya nirgila sîmîne ew**

Ya ne îro ez dibînim gerdena yara humam

Hunerên Edebî: Ew mesîn zîv e mi dî ya nirgila sîmîne ew (**tecahula 'arif**), ya ne îro ez dibînim gerdena yara humam (**tecahula 'arif**).

14. **Bulbul e ev ya hezar e tê ji wê nexmatê xweş**

Ya cigersoz û birîndar Hadiyê şêrînkêlam

Hunerên Edebî: Bulbul e ev ya hezar e tê ji wê nexmatê xweş (**tecahula 'arif**), ya cigersoz û birîndar Hadiyê şêrînkêlam (**tecahula 'arif**), Hadî (**tecrîd**), dengê –eyê (**asonans**).

45

MIN JI DIL BÛ CARÎ

Min ji dil bû carî **efxan û zarî**

1. **Da seh ke şêrîn bi min de teskîn**

We ger ne îro wek seylê şîro

Eşkê dixwun in dê min ke tetmîn

Hunerên Edebî: Efxan û zarî (**sînonîm**), wek seylê şîro (**teşbîh**), eşkê dixwun in dê min ke tetmîn (**mecaz**).

Ev her çi **dilber** wan **dil kir wek ber**

2. Dest wan bi xencer **dil kirine kerker**

Her çi 'uşaq in ji sebrê taq in

Nalîn û kalîn wan resm û ayîn

Hunerên Edebî: Dil û dilber (**iştîqaq**), dil kir wek ber (**cînas û teşbîh**), dil kirine kerker (**teşbîh**), dest wan bi xencer (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

Meyla di yarê wê nazdarê

3. Da min qerarê ji **beyt û darê**

Dê ser li babim li cewlan xwuya bim

Teşbîhî goyîn dê bikime nalîn

Hunerên Edebî: Beyt û dar (**sînonîm**), teşbîhî goyîn (**teşbîh**), dengê –ayê (**asonans**).

Dê serf û nehwe serf kim bi mehwê

4. Mentiq bi qehwê sekrê bi sehwe

Dê ez bi dil **kim** na be dexel **kim**

Sûret bi rengîn dil be bi sergîn

Hunerên Edebî: Kim – kim (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**), sûret bi rengîn dil be bi sergîn (**tarîz**).

Ey dil tu rabe bes ke ji xwabe

5. Dunya serab e nadete abe

Tu nakî debrê dê biçî qebrê

Ba **ah û nalîn** dê li wi kî temkîn

Hunerên Edebî: Ey dil (**nîda**), ah û nalîn (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Dunya mirar e bi cewr û xesare

6. Paşî zerar e xelq bûne har e

Dukjin bi zulme hev kirine qiyme

Nas bûne bê dîn bê rehm û te'mîn

Hunerên Edebî: Paşî zerar e xelq bûne har e (**tarîz**), dukjin bi zulme hev kirine qiyme (**teşbîh û mecaz**), nas bûne bê dîn bê rehm û te'mîn (**teşbîh**).

'Ibret nemaye dil bê dewa ye

7. We'z bû hebaye dîn bû hewa ye

Lew zêr xwuya kir wî dîn bi ba kir

Xelq bûne gurgîn pur bûxz û pur kîn

Hunerên Edebî: Lew (**rucû'**) zêr xwuya kir (**teşbîh**) wî dîn bi ba kir (**mecaz**), xelq bûne gurgîn (**teşbîh**) pur bûxz û pur kîn (**tarîz**), pur (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

Ref' bû **diyanet** hem jî **emanet**

8. Pîrbû **xiyanet** nîne **siyanet**

Wekî dewaran berdî beyaran

Xwarin bû şêrîn guh nade kes dîn

Hunerên Edebî: Diyanet- xiyanet / emanet- siyanet (**muwazene**), weî dewaran (**teşbîh**) berdî beyaran (**tarîz**).

Ev ehlê ev weqt dîn cah û hem rext

9. **Pur bûne dil sext ji axret ve bedbext**

Guh nadine 'ilmî meyl dane zulmî

Dîn bûye texmîn ker kirine tehsîn

Hunerên Edebî: Pur bûne dil sext ji axret ve bedbext (**tarîz**), guh nadine 'ilmî meyl dane zulmî (**tarîz**), dîn bûye texmîn ker kirine tehsîn (**tarîz**).

Îmam Xezalî ew rutbe 'alî

10. Xweş soft lualî got wî bi delalî
Dê ji dest emîran hem jî debîran
Kasid be **ev** dîn ew weqte **ev** hîn

Hunerên Edebî: Îmam Xezalî (**telmîh**), ev (**tekrîr**), dengê –îyê (**asonans**).

Qet kes te dîtî xwe ji zulmê girtî

11. **Qazî û muftî dîn dan bi purtî**
Şeyxan bi tacan mela bi kacan
Xapadine **Şemdîn Şahîn û Tacdîn**

Hunerên Edebî: Qazî û muftî dîn dan bi purtî (**tarîz**), şeyxan bi tacan mela bi kacan (**tarîz**), Şemdîn Şahîn û Tacdîn (**telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Ya Reb tu çêkî feyzek bi **rêkî**

12. Me heq **di rê kî** kirne bi kerê kir
Delîl ku gur be dê dil jî ker be
Cirtik dê bavên şakin şeyatîn

Hunerên Edebî: Ya Reb (**nîda**), rêk û di rê kî (**cînas**), delîl ku gur be dê dil jî ker be (**tarîz**), cirtik dê bavên şakin şeyatîn (**tarîz**).

Bikine yeqîne ev serserî ne

13. **Vî terzî dîn e ku mal civîne**
Da bibne ew **nas** mal bidne wan **nas**
Bibine ji betalîn zallîn muzillîn

Hunerên Edebî: Bikine yeqîne ev serserî ne (**tarîz**), vî terzî dîn e ku mal civîne (**tarîz**), nas (**tekrîr**).

Her çi ku nefse wî dîti keys e

14. Go reqs min bes e şeytan ku nehs e

Go: Lêdin hûn def reqs kin bi lef lef

Hûn bibine 'alîn 'alî murîdîn

Hunerên Edebî: Go: Lêdin hûn def reqs kin (**kinaye**) bi lef lef (**tedrîc**), 'alîn û 'alî (**îştîqaq**), dengê –eyê (**asonans**).

Nefs û le'în e gotin: Me dîn e

15. Def reqsê nîne beyreq şêrîn e

Beyreq ku kir sor dê bêne bin gor

Dê bikne kalîn şewq dê be şêrîn

Hunerên Edebî: Nefs û le'în e gotin: Me dîn e (**întaq û teşxîs**), dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

Şeytan ku dersan da van xesîsan

16. Gotin: Me dîsan dur dî di kîsan

Şeytan bi hîlan wan hanî dîlan

Jin hatin û nêrîn ba xeml û tezyîn

Hunerên Edebî: Şeytan bi hîlan wan hanî dîlan (**mecaz**), dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

Emrê bi **me'rûf** ev gave **melfûf**

17. Bi husne **mewsûf** menhiyê **mekfûf**

HADÎ te heq go nas bûne bê go

Dan fi'lê şeytîn terwîc û tehsîn

Hunerên Edebî: Me'rûf- mewsûf / melfûf- mekfûf (**muwazene**), dengê –eyê (**asonans**).

JI DEST WÊ SERWÊ BALAYÊ

Ji dest wê serwê bala yê

1. Min dîtî zehmet û derd e

Ji ser şemsa muheya yê

Ku avêt pêçe û perde

Hunerên Edebî: Pêçe û perde (**kînaye**), dengê –eyê (**asonans**).

Ji wê şemsê dilê bîmar

2. Heraret dîtî wî sed car

Ji xwe çû qet nema hişyar

Ji nû ve de birîn serde

Hunerên Edebî: Ji wê şemsê dilê bîmar (**teşxîs**), ji xwe çû qet nema hişyar (**kinaye**).

Di rêya dilbera şêrîn

3. Didim can û dil û hem dîn

Heçî ku seh kin ev ayîn

Dê bêjin: Xweş ciwan murde

Hunerên Edebî: Dengê –dyê (**alîterasyon**).

Çu dît min ew **qed û qamet**

22. Qiyamet "qultu: **Qed qamet**

Himûmel-bal qed damet"

Dê bèn: Ev **sax** e ya **murd** e

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**), sax û murd (**tezad**), qed qamet- qed û qamet (**cînas**).

Ketim vê ceng û xewxayê

23. Ji **Belqisê** xeber nayê

Meger hudhud ji Sebayê

Beşaret bîne ev 'erde

Hunerên Edebî: Belqis û hudhudê ji Sebayê (**telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Hemel mehmel ku avêtî

24. Li sewr kir mehmel û purtî

Vê burcê bi 'eks kir kurtî

Dê nîz bi ew siyeh çerd

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Eger ew gîsoyê terrar

25. Ji ser dêmî berevde yar

Li min dê rûn bike **ev dar**

Bibe jî toz û hem gerde

Hunerên Edebî: Ev dar (**mecaza mursel**), dengê –ryê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

Ji xeml û rîşî û cekbend

26. Dilê min kir wê **qeyd û bend**

Li min kir çar teref derbend

Xwedê kî îro min berde

Hunerên Edebî: Qeyd û bend (**teşbîh**), li min kir çar teref derbend (**teşbîh û mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Bi çav û dêmê enwer min

27. Bi kuşt û hiştî esmer min

Dê sax bim bête ger ser min

Li min ke misk û mawerde

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

Zuhel dê li min bibe şems e

28. **Dê çar bigre cihê xemse**

Di nûrê dê bibim xemse

Xwuya be nazperwerde

Hunerên Edebî: Dê çar bigre cihê xemse (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Zimistan hat û buhorî

29. **Negirte bihn gula corî**

Rebî' hat û tu ney dûrî

Tu bihn ke ev gula zerde

Hunerên Edebî: Rebî' (**nîda**), tu bihn ke ev gula zerde (**kinaye**).

Ewan du bedr û du sadan

30. **Ewan du qewsê seyyadan**

Li min wan çar teref dadan

Dê yar dil min bi xencer de

Hunerên Edebî: Dê yar dil min bi xencer de (**kinaye**), dengê –dyê (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

Ji wan wek lu'luê dindan

31. **Dilê min daye ber sindan**

Li gundan bûme sergerdan

Feqîr û jar û pejmûrde

Hunerên Edebî: Ji wan wek lu'luê dindan (**teşbîh**), feqîr û jar û pejmurde (**tenasub**), li gundan bûme sergerdan (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Kemer dê li kû bike bende

32. **Miyan mûya şekerxende**

Birêje ji ger du leb qende

Dê tîrek ew li eş'er de

Hunerên Edebî: Şekerxende (**teşbîh**), dê tîrek ew li eş'er de (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

Du xed wê **wek gula sor e**

33. Kezî wê leylê deycûr e

Dehan xunçeyê pur hûr e

Dibêm lew cewherek ferd e

Hunerên Edebî: Wek gula sor e (**teşbîh**), lew (**rucû'**), dengê –eyê (**asonans**).

Xeza vî rûh û **canê min**

34. Şifa derdê **cananê min**

Zulal e ji lêvê xanê min

Ku ser can û dilim berde

Hunerên Edebî: Can û cenan (**îştîraq**), ku ser can û dilim berde (**mecaz**).

Ji wan tîrê xedengê wî

35. **Ji wan** xweş **sewt û dengê wî**

Ji wan sîmzend û **çengê wî**

Ji min çû xwab û hem xirde

Hunerên Edebî: Ji wan – xedengê wî / ji wan dengê wî / ji wan çengê wî (**tersî'**), sewt û deng (**sînonîm**), dengê –wyê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

Eger carek bi **dildarî**

36. Tu teşrîf kî evî **darî**

Bibêjî rûh de yek carî
Bidim dê rûh **wekî burde**

Hunerên Edebî: Darî û dildarî (**cinas**), wekî burde (**teşbîh**), dengê –îyê (**asonans**), dengê –ryê (**alîterasyon**).

Dinê pur bû ji terraran
37. Tu dil mespêre van xaran
Ku me'dûd in ji xam karan
Dilê xwe bi Şahê enwer de

Hunerên Edebî: Dengê –ayê (**asonans**).

Ji mehbûban ew e serwer
38. **Nebat û şehd û hem şeker**
Dirêje di sohbetê kewser
Tu dil bi ev şah û qeyser de

Hunerên Edebî: Ji mehbûban ew e serwer (**teşbîh**), nebat û şehd û şeker (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

Çû **Hadî** naz ji wî zanî
39. Li 'eksa naz ser danî
Beyan kir cayê ev xanî
Nezer de textê ev nerde.

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**), dengê –eyê (**asonans**).

1. Heq nabêje kes yek mû

Bûn xain û bedzumre

Her kes buye ew bedgo

Hunerên Edebî: Ya Reb (**nîda**), çi ye ev ‘esre (**istihfam**), heq nabêje kes yek mû (**tarîz**), bûn xain û bedzumre (**tarîz**), her kes bûye ew bedgo (**tarîz**), bedgo û bedzumre (**îştîqaq**).

Dîn dane bi **dînanan**

2. **Zanin xwe ji dîndaran**

Yek dîn e gul û xaran

Xwe ji dîn kirine yeksû

Hunerên Edebî: Dîn û dînar (**cînas û tarîz**), zanin xwe ji dîndaran (**tarîz**).

Seyyadê di **Fûm girtî**

3. Heyyalekê Dêrcimtî

Da cem' bikin pirtî

Reqisîn û li def dano

Hunerên Edebî: Fûm girtî (**mecaza mursel**).

Sor keske ji beyraqan

4. Dane serî mizraqan

Dan ser milê çîpçaqan

Hal gotin û hejiyano

Hunerên Edebî: Dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

Gotin de bi irşadî

5. Der her badî û nadî

Meş kîn bi vî mu'tadî

Filyetbu'a min xano"

Hunerên Edebî: Dengê –dyê (**alîterasyon**), dengê –îyê (**asonans**).

Hetta bi Licê hatin

6. Dîtin ku evan qatin

Bûn tab'i û **bûn** matin

Ev Kalî û Dilwano

Hunerên Edebî: Bûn (**tekrîr**), dengê –tyê (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

Yek pîre Qelendirwan

7. Tecwîz da wan ev awan

Got mescidê kin dîlan

"Şedwa 'ela ma kano"

Hunerên Edebî: Got mescidê kin dîlan (**mecaz**), dengê –wyê (**alîterasyon**).

Ev **cahil û nadan** in

8. Reqqasê di meydana in

Bi ev hale xwe şadan in

"Qed şanowa we ma zano"

Hunerên Edebî: Cahil û nadan (**sînonîm**), dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

Şahid ji bo halê **wan**

9. Reqîsîne di malê **wan**

Nêv ehl û 'iyalê **wan**

Qencê di ewan qurdo

Hunerên Edebî: Wan (**tekrîr**).

Munkerê bûye **me'rûf**

10. **Me'rûfê** bûye **melfûf**

Heqqî ku bûye mekfûf

"La yedrun ma qalo"

Hunerên Edebî: Munkerê- me'rûfê / me'rûf- melfûf (**muwazene**), dengê –
fyê (**alîterasyon**).

Ev dewrê exber da em

11. Bûn sahibê **derd û xem**

Pur bû li me **hem jî hem**

Heyr mane di nêv evdo

Hunerên Edebî: Derd û xem (**sînonîm**), hem (**tekrîr**), dengê –myê
(**alîterasyon**).

Pejmurde bû ev 'alem

12. **Wek gurg** bû benî adem

Geriyani ji bo dîn ev dem

Du çav li min bûn du co

Hunerên Edebî: Wek gurg (**teşbîh**), du çav li min bûn du co (**teşbîh**), dengê
–eyê (**asonans**).

Dûr be tu ji bedhalan

13. **Der roj û meh wisalan**

Tu get meke ev qalan

Der kûh tu bike koko

Hunerên Edebî: Der roj û meh wisalan (**tedrîc**), dengê –eyê (**asonans**).

Tu ji tel'etê mehtabe

14. **Vexwe tu meya nabe**

Mêjke bike mihrabe
Wan qewsê keman ebro

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), vexwe tu meya nabe (**mecaz**), wan qewsê keman ebro (**teşbîh**).

Bispere xwe heq pîran

15. **Wek begler û hem mîran**

Dor xwe meke tu ji tîran
Da bêne te tîr îro

Hunerên Edebî: Wek begler ûhem mîran (**teşbîh**), dor xwe meke tu ji tîran (**mecaz**).

Xîret ke xwe bighîne

16. Tu bi dilbera şêrîne
Da ji dil te bibe kîne
Te'tir te bike bi gîso

Hunerên Edebî: Dengê –îyê (**asonans**), dengê –tyê (**alîterasyon**).

Dil ku nebe rebbanî

17. Ger 'alimê nadanî
Min ji bo dil xwe zanî
Xalê ruxê wî daro

Hunerên Edebî: Dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

Min qet nedî deyyare

18. Ku bi quwetê nevvare
Ferqed bi gul û xare

Ew nas bike bi kef no no

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (asonans).

Ger talibê dîdarî

19. Bikşîne ji dil zarî

Da tu bikî wî yarî

Bihn kî ji gula mîno

Hunerên Edebî: Bihn kî ji gula mîno (**teşxîs**), dengê –îyê (asonans).

Îslam bû xerib ev gav

20. **Her kes bûne ew bê çav**

Ferq naxine dav û gav

Hem şîrîn û hem bihno

Hunerên Edebî: Her kes bûne ew bê çav (**kinaye**), hem (**tekrîr**), dengê –îyê (asonans).

Her çi ku mû'în dîn e

21. **Ya Reb** wî bişidîne

HADÎ tu bê amîne

Xelq lal in û hem bêgo.

Hunerên Edebî: Ya Reb (**nîda**), dengê –îyê (asonans), dengê –nyê (alîterasyon).

48

JI XEDDÊ SORGULÊ XWE

1. **Ji xeddê** sorgulê xwe kirime dil **key**

Reşandî wê li dil min camekî **mey**

Hunerên Edebî: Ji xeddê – reşandî wê / key – mey (**tewşih**).

2. **Ji gulnarê ruxê xwe canê min soht**

Dil weşayê min wê kiriye hem şey

Hunerên Edebî: Ji gulnarê ruxê xwe canê min soht (**mecaz**).

3. Ji xeyran ku dilê xwe tu ke xalî

Heçî exyar ji dilê xwe kiriye min qey

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

4. Mebe dilbendê vê dunya denî ye

Dê **bimirin** namîne yek ferdekê **hey**

Hunerên Edebî: Bimirin û hey (**tezad**).

5. **Li kû ye qeyser û fexfûrê Çînî**

Li kû ye Keyqûbad û Xusrew û key

Hunerên Edebî: Li kû ye qeyser û fexfûrê Çînî (**istifam**), li kû ye Keyqûbad û Xusrew û key (**istihfam û telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

6. Bi hemyanan hebe ger te denanîr

Tu nabî **wekî mustesqjyê** ney rey

Hunerên Edebî: Dengê –nyê (**alîterasyon**), **wekî mustesqjyê** (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

7. Eger şahanê pêşîn zulmê pişt xwe

Bibînin dê bibin **sed wax** û **sed wey**

Hunerên Edebî: Wax û wey (**sînonîm**), sed (**tekrîr**).

8. Ji bo **ehlê dinê** tu can fidayî

Ji ehlê dil dikî idbar û hem ley

Hunerên Edebî: Ehlê dinê (**mecaza mursel**), dengê –dyê (**alîterasyon**), ehlê dil (**mecaza mursel**), dengê –eyê (**asonans**).

9. **Mebe dil xişkê wek dara di xişke**

Bi ‘îşq û şewq û zewq be tu wekî ney

Hunerên Edebî: Mebe dil xişkê (**teşbîh**) wek dara di xişke (**tekrîr û teşbîh**), bi ‘îşq û şewq û zewq (**tenasub**) be tu wekî ney (**teşbîh**).

10. **Bi şubhî şax li ba be tu bi 'îşqê**

Wekî Behmen bihorî hem jî ev dey

Hunerên Edebî: Şubhî şax (**teşbîh**), wekî Behmen (**teşbîh û telmîh**), dengê –eyê (**asonans**).

11. **Di îşê rah qewîm û musteqîm da**

Bike meş da nebî çal û tu hem xey

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

12. **Tu zakir be di asal û xudûwan**

Ji mala ye'ni defter tu bike tey

Hunerên Edebî: Dengê –ayê (**asonans**).

13. **Zemanê axir e heq nabe meqbûl**

Dibînî tu ku heq go bûye ew'ey

Hunerên Edebî: Bûye ew'ey (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

14. **Dibinî cahilê nadanê ehmeq**

Ji zeyya 'aliman çêkiriye we zey

Hunerên Edebî: Dibinî cahilê nadanê ehmeq (**tarîz**), zey (**tekrîr**).

15. Tu bispêre Xwedê Hadî umûran

Xwedê qudret dikî her tişt û her şey.

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**), her tişt û her şey (**sînonîm**).

PIŞKA SÊYÊ

-ŞEŞ XIŞTE LI SER HINDEK ŞÊ'RÊN MELAYÊ CIZÎRÎ-

49

BIKE REHMÊ LI ME EY DÊMDÛR

Bike rehmê li me **ey dêmdûra zerrîn bi serê**

Lew ji mêj ve tijî dil bûne ji derd û kederê

1. Dil bi van **derd û xeman** her ew e bot e meqerê

Qasidek nîn e verêkin du selaman di berê

Hunerên Edebî: Ey dêmdûra zerrîn bi serê (**nîda**), derd û xem (**sînonîm**).

Ey nesîmê sibehê ma di mecala seherê

Sed selaman bigehîne ji me wê lebşekerê

Hunerên Edebî: Ey nesîmê sibehê ma di mecala seherê, sed selaman bigehîne ji me wê lebşekerê (**nezîre**).

Wesf û nişanê di **wê daim melan miskê Tetar**

Ser du haman du birû girtine çî şemsiye war

2. **Herdu zulfê wê di ser rû bûne ew merwehedar**

Pur şêrîn û şekkerîn e **bi şebah qendê qumar**

Hunerên Edebî: Wê daim melan miskê Tetar (**teşbîh**), herdu zulfê wê di ser rû bûne ew merwehedar (**teşbîh**), şêrîn û şekkerîn û qend (**sînonîm û tenasub**), bi şebah qendê qumar (**teşbîh**).

Nêrgiza nazik û ter neyşekera mest û xumar
Dêmdur û le'lebb û muhteşem û mu'teberê
Hunerên Edebî: Nêrgiza nazik û ter neyşekera mest û xumar, dêmdur û le'lebb û muhteşem û mu'teberê (**nezîre**).

- Şah e ew hem ji selatînê buzurg e bi 'eyan
Ji **dur û le'l û yewaqut** kemerek wê li miyan
3. **Ey seba** tu ku gihiştî bide ruwan keleyan
Dest li ser hev tu binê qesrê hebîbê ku xwiyan

Hunerên Edebî: Dur û le'l û yewaqut (**tenasub**), ey seba (**nîda**), dengê –eyê (**asonans**).

Astan û şebekan û kûlek û pencereyan
Da bi miskînî û zarî tu bibûsî di berê

Hunerên Edebî: Astan û şebekan û kûlek û pencereyan, da bi miskînî û zarî tu bibûsî di berê (**nezîre**).

- Min ku wan çavê xezalî diye ez bê xeber im**
Her yekî carek **dimre** hero ez sed **dimirim**
4. Qed û balayê tenk xwe bi şebek rûh digirim
Dil û can kir me bi qurban û li dor te digerim

Hunerên Edebî: Min ku wan çavê xezalî diye ez bê xeber im, min ku wan çavê xezalî (**îsti'are**) diye ez bê xeber im (**teşbîh**), dimre û dimire (**tekrîr**).

Ez bi wê qamet û bejnê li te sondê dixurim
Bes ke ey padişeha min li esîran xederê

Hunerên Edebî: Ez bi wê qamet û bejnê li te sondê dixurim, bes ke ey padişeha min li esîran xederê (**nezîre**).

- Her cih û menzilê mehbûbe mubarek çu semer
Der û dîwarê wê derman e ji bo can û ciger
5. Daruwê derd û birîna ne hemi axa wê der

Te ziyaret ku kir ew **dar û ber û kûhê** qemer

Hunerên Edebî: Dar û ber û kûh (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

Tozekê bîn bi xwe ra ta bikrîn kuhlê beser

Li terîqa qedema dilberê wê rehguzerê

Hunerên Edebî: Tozekê bîn bi xwe ra ta bikrîn kuhlê beser, li terîqa qedema dilberê wê rehguzerê (**nezîre**).

Dê bisoje dil û can hem jî fîda bin wê gelek

Ku bibînin ku di meşriq bi derhat roja felek

6. Salkê rahê mehebbet "seblunnari selek"

Husn û behcet wê nehiştî ji bo hûriyan û melek

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Dêmê bedr û eniyî zulf li ser bûne helek

Erqeman helqe û ger dane li dewra qemerê

Hunerên Edebî: Dêmê bedr û eniyî zulf li ser bûne helek, erqeman helqe û ger dane li dewra qemerê (**nezîre**).

Min kirî seyr û sulûkî di hemî cih û mekan

Min nedî **meselî te xwudkar** û selatîn ji şehar

7. Ne perî min bi **meselî te** ne hûriyê di cinan

Ne şekerxendê hebîbek **di hemî sal û mehan**

Hunerên Edebî: Meselî te xwudkar (**teşbîh**), meselî te (**teşbîh**), di hemî sal û mehan (**tedrîc**).

Ne bûyîne ne dibin wek te şepalê di cihan

Kê dîn meseli te sîmînten u zerrînkemerê

Hunerên Edebî: Ne bûyîne ne dibin wek te şepalê di cihan, kê dîn meseli te sîmînten u zerrînkemerê (**nezîre**).

Agir û pêt û perengê dilê me kiriye kebîb

Ji piyan keftin û qudret me nema meşî û debîb

8. Her kê ditin me li halê me dikin huzn û nehîb

Zar û efxan û girîn me di dinê bûye nesîb

Hunerên Edebî: Agir û pêt û perengê (**tenasub**) dilê me kiriye kebîb (**mecaz**), zar û efxan û girîn (**tenasub**), dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –ayê (**asonans**).

Ji ber ahên me di dev agir û dûd bêt ne ‘ecib

Me di dil da heye narek ku disojit seqerê

Hunerên Edebî: Ji ber ahên me di dev agir û dûd bêt ne ‘ecib, me di dil da heye narek ku disojit seqerê (**nezîre**).

Şubhetî peykê Xweda ruh el emîn î tu bi bext

Mehremane tu diçî nik hemî şahanê li text

9. Bi Xwedê kî tu diçî nik şehê min bê dilê sext

Seh bikê dur û cewahir ku ji leb wî tê bi lext

Hunerên Edebî: Şubhetî peykê Xweda (**teşbîh**).

Da bibînî senema min ne bigîn xwe bedî bext

Bike telxîsê cewabê me ji vê muxteserê

Hunerên Edebî: Da bibînî senema min ne bigîn xwe bedî bext, bike telxîsê cewabê me ji vê muxteserê (**nezîre**).

Me derê rehm û ûmêdê li xwe îro vekirin

Tu li halê me bipurse di dinê hêj nemiriyin

10. Em du'ago ne ji bo te ne ji qismê bekerîn

Bûne pejmurde û bêhal hemi xwab û xurîn

Hunerên Edebî: Bûne pejmurde û bêhal hemi xwab û xurîn (**tenasub**), dengê –iyê (**asonans**).

Qederek şefge ji lutf te temenna dikirîn

Da me mehrûmî nedîrî tu ji lutf û neverê

Hunerên Edebî: Qederek şefge ji lutf te temenna dikirîn, da me mehrûmî nedîrî tu ji lutf û neverê (**nezîre**).

Me li halê xwe gelek pûrsî nedî ji karekî

Elem û derd û xemên dil li me bûn pur barekî

11. Mexzena lutf heqe şahê meyê munbarekî

Dê biçîn nik wî bi zarî bi me de yek carekî

Hunerên Edebî: Elem û derd û xemên (**tenasub**), dengê –eyê (**asonans**).

Ma bi zehrê şekerî dost bixwûnit carekî

Erzehala ku nivîsî me bi xwûna cigerê

Hunerên Edebî: Ma bi zehrê şekerî dost bixwûnit carekî, erzehala ku nivîsî me bi xwûna cigerê (**nezîre**).

Dê bi 'îdê bighîn waye xwuya kir me hilal

Dê binûşin ji **lebê le'lê** wê xweş xemra helal

12. Pişî her 'usrekê yûsrek heye îro tu menal

Dê li me rehmê bike **ew zeriya hûrîmisal**

Hunerên Edebî: Lebê le'lê (**teşbîh**), ew zeriya hûrîmisal (**teşbîh**).

Lew ku pur şefqe didîrit kerem û lutf û kemal

Ah ji dest remz û surên wê dur û gewher xebere

Hunerên Edebî: Lew ku pur şefqe didîrit kerem û lutf û kemal, ah ji dest remz û surên wê dur û gewher xebere (**nezîre**).

Dikujin dost û 'uşaqê xwe heçî serwê sih in
Nabêjin pîreciwan e ya melê xweş bi rih in
13. Dil bi xencer lê didin **ah û fixanan** jê dibihin
Nîne wan pakî ji kes **şubhî şehan der keleh in**

Hunerên Edebî: Ah û fixan (**sînonîm**), şubhî şehan der keleh in (**teşbîh**).

Bi Xwedê qet te di dil da ji Xwedê tirs nehin

Dikirî zulm û cefayê tu li min vê qederê

Hunerên Edebî: Bi Xwedê qet te di dil da ji Xwedê tirs nehin, dikirî zulm û cefayê tu li min vê qederê (**nezîre**).

Nik te her hûrî û perî di e'rabin û culf
Te tune qet qusûr xeyr ku di we'dê dikî xulf
14. Me ji bil te ne mehebbet bi kesê daye ne ulf
Şirê pê kuştî muhibban neketî carekê xulf

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Bisk û gîsû ji herîr in qeseb in turre û zulf

Te ji kafûr e beden, xal ji miskê teterê

Hunerên Edebî: Bisk û gîsû ji herîr in qeseb in turre û zulf, te ji kafûr e beden, xal ji miskê teterê (**nezîre**).

Yarê kuşt dostê xwe wê di belayê hiştî
Ne kefen kir ne bi xasil ewî dayî tiştî
15. **Hadiyê mehcûr ji yarê serî danî xiştî**
Yar digel dost û hevalan li hewayî kuştî

Hunerên Edebî: Dengê –iyê (**asonans**), Hadiyê mehcûr ji yarê serî danî xiştî (**tecrîd**).

Paşî wan gezmeyê çehvên te Melayî kuştî

Ma xedeng in dikirin qet li me êdî eserê?

Hunerên Edebî: Paşî wan gezmeyê çehvên te Melayî kuştî, ma xedeng in dikirin qet li me êdî eserê? (**nezîre**)

50

KIR ME HER ROJ HEZAR NALE

Kir me her roj hezar nale û yar qet nabihî
Bûme mehbûsê ji derd û ji xeman der vî cihî

1. Kî li şeh 'erz bike halê eşîrê vî dehî
Ku bûye jar û nehîf zer bûye **wek rengê bihî**

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**), wek rengê bihî (**teşbîh**).

Ey nesîmê sibehê ma di mecala subehî

Sed selaman bigehîne li me wî padşehî

Hunerên Edebî: Ey nesîmê sibehê ma di mecala subehî, sed selaman bigehîne li me wî padşehî (**nezîre**).

Dilbera hûrî û perî peykera ebrû ji hilal
Tine bo wî di hemî 'esrê ne emsal û heval

2. **Her wekî şaxê nebat e** bi şêrînî û delal
Tu dibê li cennetê firdewsê heşînek bû nihâl

Hunerên Edebî: Dengê –lyê (**alîterasyon**), her wekî şaxê nebat e (**teşbîh**).

'Er'era qametelif neyşekkera şox û şepal

Nazika sîmînten û Xusrew û zerrîn kulehê

Hunerên Edebî: 'Er'era qametelif neyşekkera şox û şepal, nazika sîmînten û Xusrew û zerrîn kulehê (**nezîre**).

Ey seba tu key diçî qesra hebîba zerî zulf
Bi edîbane tu meş ke bi hezar hurmet û ulf

3. Tu metirse ji we şimşîrê ku nakeftiye xulf

Bi Xwedê kî ku di vê **we'd û niyazî** bekî xulf

Hunerên Edebî: Ey seba (**nîda**), we'd û niyaz (**sînonîm**), dengê –uyê (**asonans**).

Di berî da tu bibûsî bi dused zarî û lutf

Asitan û der û dîwar û şubakên qelehê

Hunerên Edebî: Di berî da tu bibûsî bi dused zarî û lutf, asitan û der û dîwar û şubakên qelehê (**nezîre**).

Bi şebêh murxê seher nalîne min li dora çemar

Bûme me' den ji her xusse û 'ecz û el-eman

4. **Hem hedef bûme ji bo tîr û sihamê du keman**

Min bi tehrîr kirî te'yînê hezar êş û heman

Hunerên Edebî: Bi şebêh murxê seher (**teşbîh**), bûme me'den (**teşbîh**), hem hedef bûme ji bo tîr û sihamê du keman (**teşbîh**).

Nemaye cewr û cefa û elem û derd û xeman

Dî bi destê zeriye muhteşemê serw û sehê

Hunerên Edebî: Nemaye cewr û cefa û elem û derd û xeman, dî bi destê zeriye muhteşemê serw û sehê (**nezîre**).

Turka min ji neslê şehan e di bine meslihetê

Wê riyaset li du cihan e di her memleketê

5. **Geh** bi qehrê dike me' mûr û **geh** rehmê didetê

Dibe mehbûb li me ke şefqe **şubhî mam û metê**

Hunerên Edebî: Geh- geh (**tekrîr**), şubhî mam û metê (**teşbîh**).

Bike dilber ji rûyê 'adilî û merhemetê

Rehmekê kit bi feqîran û bipirsit gilehê

Hunerên Edebî: Bike dilber ji rûyê 'adilî û merhemetê, rehmekê kit bi feqîran û bipirsit gilehê (**nezîre**).

Batinî bo te xerab e ma derûnek me heye

Zahirî bûne perîşan ma bi rûnek me heye

6. Ji **agir û pêtê** derûnê **me** furûnek **me** heye

Di kile ji **derd û xeman** dikê kedûnek me heye

Hunerên Edebî: Batinî û zahirî (**tezad**), agir û pêt (**sînonîm**), me (**tekrîr**), derd û xem (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Ma ji ber zerb û fîraqa te sukûnek me heye?

Cerg û dil herdu bi nalîn e wekî çeng û jehê

Hunerên Edebî: Ma ji ber zerb û fîraqa te sukûnek me heye? Cerg û dil herdu bi nalîn e wekî çeng û jehê (**nezîre**).

Dinale ji destê hebîbê me dil û rûh û rewan

Me di şam û seheran gaziye **wek kebk û kewan**

7. **Meselî haim** li hemî deşt û çiyay bûne rewan

Bûne pejmurde bizan rastî dîn ney di rewan

Hunerên Edebî: Dinale ji destê hebîbê me dil û rûh û rewan (**teşxîs û tenasub**), wek kebk û kewan (**teşbîh**), meselî haim (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Heq dizanit di şevan şubhetî avên di rewan

Me bi dil zarî û kalîn e heta subhgehê

Hunerên Edebî: Heq dizanit di şevan şubhetî avên di rewan, me bi dil zarî û kalîn e heta subhgehê (**nezîre**).

Her kî carek wî tu dîtî ji bo te her dimirit

Rojekê ger te nebîne dê kerasî li xwe biderit

8. Ji bedel nan û edam derd û siqam dê bixurit

Mislî beytê bi tewafê jî li dor te bigerit

Hunerên Edebî: Mislî beytê (**teşbîh**), rojekê ger te nebîne dê kerasî li xwe biderit (**mecaz**).

**Hecurul-Eswed bidirit dest ziyaret bikirit
Nezir min bit bigirim xwas terîqa Mekkehê**

Hunerên Edebî: Hecurul-Eswed bidirit dest ziyaret bikirit, nezir min bit bigirim xwas terîqa Mekkehê (**nezîre**).

Ger qebûl ket dê bidim rûhê bi wî "bikema sema"
Dê li dor wê bigirim "hetta emwetu xema"

9. Dê bi qurban û fida kim ji bo wê canî "cema"
Her çi bî ji wî dê binûşim bila sem bit "ema"

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**).

**Dîn eger bête beha can didirim lê "emma"
Me hezar canê 'ezizi dihilbitin di behê**

Hunerên Edebî: Dîn eger bête beha can didirim lê "emma", me hezar canê 'ezizi dihilbitin di behê (**nezîre**).

Gavekê rûne di sohbet bi wî dil tu bikelîn
Cesed û can û ciger hem jî bi 'îşqê biqelîn

10. Li me dî ger bi sihaman li te em nafitilîn

Tu ji qudret xemilî can û dilan tu bihelîn

Hunerên Edebî: Cesed û can û ciger (**tenasub**), tu ji qudret xemilî can û dilan tu bihelîn (**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

**Perdeya xêlî û çarê tu ji ser dêmi hilîn
Da ji şewqa te bi xef bit şefeqa mihr û mehê**

Hunerên Edebî: Perdeya xêlî û çarê tu ji ser dêmi hilîn, da ji şewqa te bi xef bit şefeqa mihr û mehê (**nezîre**).

Me sefer kir bi serîfî di hemî ber **wekî berq**
Hem di behran geriyan pur nema bête me xerq

11. Me nedî **wek te letîfek ji piyan ta ser** û ferq
Te bi vê husn û cemalê hemî 'adet kiri xerq

Hunerên Edebî: Wekî berq (**teşbîh**), wek te letîfek (**teşbîh**) ji piyan ta ser (**tedrîc**).

Qet dibit wek te şepalê ne di Şam û ne di şerq
Kî nişan da di cehan mislî te xundkar û şehê?

Hunerên Edebî: Qet dibit wek te şepalê ne di Şam û ne di şerq, kî nişan da di cehan mislî te xundkar û şehê? (**nezîre**).

Mushefa husna te tefsîra kemala te didit
Hem perê behsê ji qedd û ji nihala te didit

12. **Saqî ger mey bi me dit ji xemra helala te didit**

Merhema rîşa derûn le'la zulala te didit

Hunerên Edebî: Saqî ger mey bi me dit ji xemra helala te didit (**mecaz**), dengê –ayê (**asonns**).

'Alemek şehdeyiya husn û cemala te didit
Tu Zuleyxaya zeman î û çi hacet medehê

Hunerên Edebî: 'Alemek şehdeyiya husn û cemala te didit, tu Zuleyxaya zeman î û çi hacet medehê (**nezîre**).

Xwedê hifza te ke daim ji hemî xafil qedan
Hem tu mehfûz û mesûn bi ji hemî çeşmbedan

13. **Bike xidmet ji bo te cumle mulûk şubhî gedan**
Te bikî **quwet û qudret** bi hemî dest û yedan

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**), şubhî gedan (**teşbîh**), quwet û qudret (**sînonîm**).

Heq nighdarê te bit padişeha serwê qedan

Bi kinarê me feqîran bike carek nighê

Hunerên Edebî: Heq nighdarê te bit padişeha serwê qedan, bi kinarê me feqîran bike carek nighê (**nezîre**).

Li te xetme di dinê husn û cemal û hemî zeyn

Dilberan kir ne delalî û melahet ji te deyn

14. Lu'lu dur û cewahir te li gerden bûye reyn

Xidmeta te li şehan bû ji firûzatê li 'eyn

Hunerên Edebî: Dilberan kir ne delalî û melahet ji te deyn (**mecaz**), dengê – eyê (**asonans**).

Xûb î û dilber î û naz î telettuf bi te şeyn

Xusrewa padişehan î we xwedana cebehê

Hunerên Edebî: Xûb î û dilber î û naz î telettuf bi te şeyn, xusrewa padişehan î we xwedana cebehê (**nezîre**).

Her kî şeh rahê di 'îşqê da meşî dî qerehek

Wî di dil da nema ehzan û xummum û terehek

15. Hem li dor xeyma dilê xwe ji surûr dî berehek

HADÎ ji xûma elest xwar şerabê sebehek

Hunerên Edebî: Hadî (**tedrîc**), dengê –eyê (**asonnas**), dengê –hyê (**alîterasyon**).

Ji ezel heq bi Melê daye ji 'îşqê qedehek

Ta ebed mest û xerabîn ji meya wê qedehê

Hunerên Edebî: Ji ezel heq bi Melê daye ji 'îşqê qedehek, ta ebed mest û xerabîn ji meya wê qedehê (**nezîre**).

MIN ISTIMDAD E DAIM

Min istimdad e daim her ji wî sultanê kewneynê

Ku îro ez nezer dim sîmelîfa “beynixedeyn”ê

1. Bidim wî dil fida kim can bibim meftûnê terefeynê

Xwedê hes ke dinûş kim ez meya safî ji le’leynê

Hunerên Edebî: Xwedê hes ke dinûş kim ez meya safî ji le’leynê (**mecaz**), dengê –iyê (**asonans**).

Ji mabeyna du ebruwan dibînim qabe qewseynê

Te’alî Ellah binê remzê çî reng avêhte mabeynê

Hunerên Edebî: Ji mabeyna du ebruwan dibînim qabe qewseynê, Te’alî Ellah binê remzê çî reng avêhte mabeynê (**nezîre**).

Ji min dil bir du seyyadan ji nêv ehşa û ekbadan

Kirin min dût ji ewladan **ji ehbaban û ehfadan**

2. **Derî li min çar teref dadan di nêva agirê cadan**

Hebîba nazika şadan bibîne wî di e’yadan

Hunerên Edebî: Ji min dil bir (**tezmîn**), ewladan û ehbaban û ehfadan (**tenasub**), derî li min çar teref dadan di nêva agirê cadan (**mubalexe û mecaz**), dengê –ayê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

Bine “nûn”ên li ser “sad”an ku katib goşe lê badan

Seraser qaf ta qaf e rumuza "hikmel-'eyn"ê

Hunerên Edebî: Bine “nûn”ên li ser “sad”an ku katib goşe lê badan, seraser qaf ta qaf e rumuza "hikmel-'eyn"ê (**nezîre**).

Mebe xafil di vê keştê serî dê danî ser xiştê

Dinê **lew** pur kesan kuştî gelek ji hem yetîm hiştî

3. **Ji xak û axê** yek miştî bi xeflet tu çî rûniştî

Ji ‘işqê çêke yek keştî suwar be lê bi helmiştî

Hunerên Edebî: Dengê –şyê (**alîterasyon**), dengê –îyê (**asonans**), ax û xak (**sînonîm**), lew (**rucû'**), ji 'îşqê çêke yek keştî suwar be lê bi helmiştî (**mecaz**).

Beqa nînin li bo tiştî heta kengê bikîn piştî

Di 'îşqa wan perîrûyan werin dunyayê da deynê

Hunerên Edebî: Beqa nînin li bo tiştî heta kengê bikîn piştî, di 'îşqa wan perîrûyan werin dunyayê da deynê (**nezîre**).

Werin hûn ey gelî nasan vexwun hûn mey bi sed tasan

Xelas bin hûn ji weswasan bibin dûr hem ji xennasan

4. Bibin dil pak ji ednasan berî bin hûn ji ecnasan

Hebîba taca her rasan bi **wan du burhê wek dasan**

Hunerên Edebî: Werin hûn ey gelî nasan (**nîda**) vexwun hûn mey bi sed tasan (**mecaz û mubalexe**), wan du burhê wek dasan (**teşbîh**).

Bi berqa şîr û elmasan bi tîrêjên di şhkasan

Seraser ehlê dunyayê disojin "turfetl-eyn ê

Hunerên Edebî: Bi berqa şîr û elmasan bi tîrêjên di şhkasan, seraser ehlê dunyayê disojin "turfetl-eyn ê (**nezîre**).

Ji dest wê dilber û gorî ji wê xed sorgul û nûr î

Dibînim zulm û hem cewrî ne **da ser min sî wek 'ewrî**

5. Wî da min mihnet û mewrî heme daim di vê tewrî

Te dîtî HADÎ teb'i sewrî belîx be ew bi şaş gewrî

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**), da ser min sî wek 'ewrî (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Mela "billah" di vî dewrî bi vî rengî bi vî tewrî

Nîşan da wek Nîşanî kes deranîn dur ji behreynê

Hunerên Edebî: Mela "billah" di vî dewrî bi vî rengî bi vî tewrî, nişan da wek Nişanî kes deranîn dur ji behreynê (**nezîre**).

52

ME DÎTÎ JI DESTÊ DILDARÎ

Me dîtî ji destê dildarî hezaran lewn û şetm û şeyn

Feqîr û jar û du ‘eyn li me bû carî **wekî du ‘eyn**

1. **Şubih bêjing û xirbalê** li me dil kun kirî bê meyn
Bi sed we’dan me dil şake bi remz û awirê terefeyn

Hunerên Edebî: Wekî du ‘eyn (**teşbîh**), şubih bêjing û xirbalê (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Mela me li gerdena dilber ji nû sed bûse mayin deyn

Mecalî dê bixwazim jê, dibê deynê te “fewq el-‘eyn”

Hunerên Edebî: Mela me li gerdena dilber ji nû sed bûse mayin deyn, mecalî dê bixwazim jê, dibê deynê te “fewq el-‘eyn” (**nezîre**).

Li qedd û bejn û balayê ji mêj ve em nezerdarîn

Ji xeddê sorgul û çavê di nergis xweş 'etirdarîn

2. **Ji wan du le'lê qend û şekkerîn** em pur şukurdarîn
"Elest" da em ji wê dara mehebbet ber semerdarîn

Hunerên Edebî: Qedd û bejn û balayê (**tenasub**), Ji xeddê sorgul (**teşbîh**) û çavê di nergis (**teşbîh**) xweş 'etirdarîn, ji wan du le'lê (**teşbîh**) qend û şekkerîn (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Bi remza qabe qewseynê ji wan birhan xebardarîn

"Featil-qewse barîha ela ya ramiy el-qewseyn"

Hunerên Edebî: Bi remza qabe qewseynê ji wan birhan xebardarîn, "Featil-qewse barîha ela ya ramiy el-qewseyn" (**nezîre**).

Ne 'erş û ferş û kursî û qelem bûne di 'inwanî
Xwedê kenzek bû mexfî 'aşiq û me'suq di wî Sanî

3. Di xeyb bû 'ilm û 'eyn û rûh misal û new'ê insanî
Nebûn ev penc te'eyyûn her ji rûh imkan e ger zanî

Hunerên Edebî: 'Erş û ferş û kursî û qelem (**tenasub**), 'aşiq û me'sûq (**îştîqaq**), rûh misal (**teşbîh**), dengê –nyê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

Ji sirra "la mekan" wacib tenezzul kir di imkanî

"Fe eyn el-i'lmu eyn el-eyn we eyn el-'eynu iz la eyn"

Hunerên Edebî: Ji sirra "la mekan" wacib tenezzul kir di imkanî, "Fe eyn el-i'lmu eyn el-eyn we eyn el-'eynu iz la eyn" (**nezîre**).

Kewakib xweş li dor bedra muheyra dostê sat'i tîn

Du şemsan ez dibînim xweş ji şerqê çehre tal'i tîn

4. Reqîbî herdu zulfê wî ji metle' şemsê man'i tîn

Ji dur û cewheran xaman bi çend xermihre qan'i tîn

Hunerên Edebî: Du şemsan ez dibînim (**îsti'are**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Ji mabeyna du ebruyan peyapey bergê lam'i tîn

Bi eynê ger bibî safe çî nûrek sirf e ew mabeyn

Hunerên Edebî: Ji mabeyna du ebruyan peyapey bergê lam'i tîn, bi eynê ger bibî safe çî nûrek sirf e ew mabeyn (**nezîre**).

Tesellî qet nema bo min dê **can û ser** dirêkim ez

Dibe 'imran û avayî li ser qewsê pirê kim ez

5. Eger ewlad ne salih bin dê çî bi qiz û kurî kim ez

Bi emrê te humayûn van bi sergûn dê li ku rêkim ez

Hunerên Edebî: Can û ser (**mecaza mursel**) dengê –eyê (**asonans**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Bi destûra te da wî jî ji vê navê verêkim ez

Fe seffil-'eyne nûr el-eyn 'ela ya zeyne kulle iz-zeyn"

Hunerên Edebî: Bi destûra te da wî jî ji vê navê verêkim ez, fe seffil-'eyne nûr el-eyn 'ela ya zeyne kulle iz-zeyn" (**nezîre**).

Ji derdan nabî qet xalî eger îro nebî Neqşî

Tu bîn bîra xwe wê roja suwar bî tu li vî ne'şî

6. Were bi 'işqa perîrûyan xelas be ji hebsa vî ferşî

Letaif jî bikin seyran biçin ser destê wi 'erşî

Hunerên Edebî: Letaif jî bikin seyran biçin ser destê wi 'erşî (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

Buhayê 'işweyek le'lan me yekser "ma melek" bexşî

Dil û can ji li ser danî û zalim hêj dibêjit deyn

Hunerên Edebî: Buhayê 'işweyek le'lan me yekser "ma melek" bexşî, dil û can ji li ser danî û zalim hêj dibêjit deyn (**nezîre**).

Xwedê muhî mumîte her xwidanê qelbê qasî tu

Ew e mun'im ew e muhsin ji in'ama wî nasî tu

7. Ew e mu'tî ew e man'i li qet'a xeyrê dasî tu

Tu Hadî her Xwedê nas be li eytaman be kasî tu

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**).

Mela her wî bibîn her wî eger her wî binasî tu

"Huwe-me' bud wel-meşhudu bel la xeyre fid-dareyn"

Hunerên Edebî: Mela her wî bibîn her wî eger her wî binasî tu, "Huwe-me' bud wel-meşhudu bel la xeyre fid-dareyn" (**nezîre**).

1. Bo çi ez seh dikim ji vê gunbeda exzer nişan
Gote min: Hicret ku kir ji vê dunyayê Qutbê Hezan

Hunerên Edebî: Ey felek (**nîda**), hesret û derd û fixan (**tenasub**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Me'dena lutfa îlahî menbe'a feyza Xweda

2. Wî bi himmet zulm û xeflet kir ji dinyayê cuda
Heqq e ger cumle terennum kin bi ev **sewt û seda**

Hunerên Edebî: Sewt û seda (**sînonîm**), dengê –myê (**alîterasyon**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Kûhe 'irfan 'erşê rehman mexzena 'ilm û weqar

3. Yemmê ihsan ehlê wicdan pîrê sohbet pur nisar
Murşidê Yezdan î û sultanê 'uşsaqê kubar

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Dehşet û hîret li min daye nizanim ez çi kem

4. Qet nema xalî ji **derd û mihnet û xem** yek rikem
Hew dibînim ez dibêjim hem ji pur nalîn dikem

Hunerên Edebî: Derd û mihnet û xem (**tenasub û sînonîm**), dengê –yê (**asonans**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Sa 'eta meyxaneyê hem jî meqamê suhbetê

5. Ez dibînim hem teweccuh gaha Şahê nisbetê
Bê teweqquf ez dibêjim wah li min vê firqetê

Hunerên Edebî: Dengê –myê (**alîterasyon**).

Cumle 'alem derdmende ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Her kesê ji le'lê zelalî wî vexwarî şerbetek

6. Ya xwe seh kir wî bi îxlas û mehebbet suhbetek
Ew dibêjit çunke daye wî heyat û ulfetek

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn u fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Gewher û dur û yewaqit ku ji leb wî date der

7. Mustem'i meqbûl di dêran wan di nêv can û ciger
Cunke emrazê di dil davête der wan ser te ser

Hunerên Edebî: Gewher û dur û yewaqit (**tenasub**) ku ji leb wî date der
(**mecaz**), dengê –eyê (**asonans**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Firqeta seyda û xewsê e'zîmî hêj hebûn

8. Hicreta Geylaniyê Sanî **ji dil kir min** zebûn

Dîn û sewda bûme îro ez dibêjim erxenûn wan

Hunerên Edebî: Ji dil kir min (**tezmîn**), dengê –eyê (**asonans**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Derdekî zor û giran e nayête mi'yar û hisab

9. Firqeta Şahê Hezan e **ey gelî eshabê bab**

Qet li min nakin nesîhet mame ez bê sebr û tab

Hunerên Edebî: Ey gelî eshabê bab (**nîda**), dengê –ayê (**asonans**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr u ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Warisê pêxemberî bûn ew di vî 'esrî yeqîn

10. **Dax kirî can û dilê me bi sohbeta şehd û şîrîn**

Bûme medhûş û dibêjim: Kan gelo babê Şîrîn

Hunerên Edebî: Dax kirî can û dilê me bi sohbeta şehd û şîrîn (**mecaz**),

bûme medhûş û dibêjim: Kan gelo babê Şîrîn (**istihfam**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Şubhetî hezretê Farûq ez dibêjim ji dehşetê

11. **Sax e pîrê min nexwarî wî mergê şerbetê**

Cunke tê min bîre textê suhbet û hem nisbetê

Hunerên Edebî: Şubhetî hezretê Farûq (**teşbîh û telmîh**), sax û merg (**tezad**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dîkin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Min di vî 'esrî nedî qutbek bi **tekmîl û kemal**

12. **Ku tedawî ke dilan gahî bi cemal û geh bi celal**

Bil ji Ebdulqadirê Sanî Geylanî misal

Hunerên Edebî: Tekmîl û kemal (**îştîqaq**), ku tedawî ke dilan gahî bi cemal û geh bi celal (**mecaz**), geh (**tekrîr**), bil ji Ebdulqadirê Sanî Geylanî misal (**teşbîh**), dengê –ayê (**asonans**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dîkin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Xaliq û Rebbê ehed "yewmul-ehed" da wî necat

13. **"Xeyn" û "şin" û "kaf" u "waw"ê dame tarîxa wefat**

Razî û merzî di "Cennatul-ne'îm" dîtî heyat

Hunerên Edebî: "Xeyn" û "şin" û "kaf" u "waw"ê dame tarîxa wefat (**tarîx**).

Cumle alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dîkin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Maye bê **sebr û qerar** û derdmend û mustemend
14. HADÎ kem geşteyê te ye cudayê dilkemend
Lazim e ji bo wî bibêje ew bi burhan û sened

Hunerên Edebî: Sebr û qerar (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

Şubhetî seydayê Taxî merqeda wî li Palî ye
15. Wî helandî can û dil şubhî 'Izamê Balî ye
Her çi ku çav pê ketî daim ji derdan naliye

Hunerên Edebî: Şubhetî Seydayê Taxî (**teşbîh**), wî helandî can û dil
(**mubalexe û mecaz**) şubhî 'Izamê Balî ye (**teşbîh**).

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fixan pîr û ciwan

Hunerên Edebî: Nalîn û kalîn û fixan (**tenasub**), pîr û ciwan (**tezad**).

54

HER JI FIRQETA ŞAHÊ HEZAN

Her ji firqeta Şahê Hezan

Can û ciger min kir fîxan

Memlu ye dil ji **derd û xeman**

1. Xew nayê çavan qet şevan

Cav ji dirêjin estêran

Jar û nehif mame 'eyan

Derdekî pur **zor û giran**

Wa firqetê wa firqetê

Hunerên Edebî: Derd û xem (**asînonîm**), jar û nehîf (**sînonîm**), zor û giran (**sînonîm**), wa firqetê wa firqetê (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

Teng bû li min **cih û mekan**

Reş bû li min dewrê zeman

Mame feqîr û bênişan

2. Zer bûme wek bergê xizan

Kûl bû li min cerg û cenan

Sewda û dîn bûm bê guman

Wa firqeta Şahê Hezan

Wa firqetê wa firqetê

Hunerên Edebî: Cih û mekan (**sînonîm**), zer bûme wek bergê xizan (**teşbîh**), wa firqetê wa firqetê (**tekrîr**).

Hicret ku kir ew şeh cenab

Jar û nehîf bûm wek hubab

Cerg û dilê min kir kebab

3. Hûn ji min mekin lewm û i'tab

Derdê di min bûn bê hisab

Qutbê zeman li min bû xiyab

Dunya di çav min bû serab

Zehre li min **ab û xoşab**

Şahê Hezan ket bin niqab

Qîrîn dikim bê sebr û tab

Xeltan dibûm di xak û turab

Ew pîrê suhbet mustetab

Ew me'dena sidq û sewab

Keftî di nêv perde hicab

Bû li min elem ekl û şerab

Wa firqetê wa firqetê

Hunerên Edebî: Jar û nehîf (**sînonîm**) bûm wek hubab (**teşbîh**), cerg û dilê min kir kebab (**mecaz û teşbîh**), dunya di çav min bû serab (**teşbîh**), ab û xoşab (**îştîqaq**), wa firqetê wa firqetê (**tekrîr**).

Dunya li min pur bû elem
Efxan dikim ez **dem bi dem**

- Derdê di min nayê qelem
4. Rabû li min Rom û 'Ecem
Karê min e ceng û selem
Rakir ji derdan min 'elem
Li min wunda bû şah û Cem
Êstir dibarin şubhî çem
Goya min xwarî zehr û sem
Sebr û qerar li min bû 'edem
Der bû ji cergim xwûn û dem
Ey dost û yaran ez çi kem
Şahê Hezan çû da me xem
Ew sorgula baxê Irem
Hesret ji da min **hem jî hem**

Wa firqetê wa firqetê

Hunerên Edebî: Dem bi dem (**tekrîr û tederîc**), êstir dibarin şubhî çem (**mubalexe û teşbîh**), sebr û qerar (**sînonîm**), der bû ji cergim xwûn û dem (**mecaz û mubalexe**), ey dost û yaran (**nîda**) ez çi kem (**istihfam**), ew sorgula baxê Îrem (**teşbîh**), hem jî hem (**tekrîr**), wa firqetê wa firqetê (**tekrîr**).

Ew şeyxê pur suhbet eser
Şems bûn ji bo dîn hem **qemer**

- Hem qasiyê **dil şubhî ber**
5. **Lew** nabîne kor mah û mehr
Çunke weliyê pur huner
Şubhî digirim avane her

Pê ji wan diçin emrazê sedr
Nêzîkî wan in bêxeber
Her çî ku dûr in têne ser
Êş û elem ji wan tene der
Gava ziwa bit her çî ber
Poşman dibin ew bê beser
Me bi wi neşuşt can û ciger
Hem ji dibêjin pur keder

Wa firgetê wa firqetê

Hunerên Edebî: Şems û qemer (**tezad**), dil şubhî ber (**teşbîh**), lew (**rucû'**), şubhî digirim avane her (**teşbîh**), poşman dibin ew bê beser (**kinaye**), wa firqetê wa firqetê (**tekrîr**).

Cumle ji hicret bûne mat
Rey bû li wan weqt û **heyat**
Hesret dikêşin ta **memat**

6. Jar bûne **wek 'ezm û rufat**

Wax wax dibêjin qat bi qat
Şahê Hezan çûn kir wefat
Suhbet şîrîn pîrê hirat
Geylaniyê bi nam û sîfat
Irşad ku kir li cumle cihat
Eshab ji nefis dîtî necat
Wergirt ji dest wî wan xelat
Bûn sahibê cezb û sebat
Emrazê dil bûn ji wan şetat
Avêtî wan neqşê simat
Bûn mexzena her wardat
Lew deng ji wan daim dihat

Wa firgetê wa firqetê

Hunerên Edebî: Heyat û memat (**težad**), wek 'ezm û rufat (**teşbîh**), wax wax dibêjin qat bi qat (**tekrîr**), bûn mexzena her werdat (**teşbîh**), wa firqetê wa firqetê (**tekrîr**).

Ew murşidê pur '**edl û dad**

Irşad ku kir li cumle 'ibad

Azad dibûn ji xil û fesad

7. Her kes diditin wan murad

Lew suhbetek şêrîn sedad

Daim dikir li cumle bilad

Pur nûr dibûn qelbê kesad

Jê her diçûn bûxz û i'nad

Seydayê Taxî paknejad

Dabû bi wî 'işqek şidad

Wî bi suhbetê da dil reşad

Nefs jî dihatin inqiyad

Wî da dilan hubb û wedad

Bûn sahibê 'eqlê me'ad

Deng tê ji wan şam û midad

Wa firqetê wa firqetê

Hunerên Edebî: 'Edl û dad (**sînonîm**), wa firqetê wa firqetê (**tekrîr**).

Ew şeyxê pur husn û delal

Ew kewser û aba zulal

Ew pirê pur suhbet li bal

8. **Ew** meş'ela nûra celal

Ew sahîbe "hisnul-xisal"

Nûra Xwedayê layezal

Daim li ser bûn ba kemal

Ew faniyê mutleq misal

Ew Xews u qutbê pur cemal

Yek suhbetek wî da wisal
Nefsî xelas kir ji qîl û qal
Da Hadî jî yek cezb û hal
Irşad ku kir li sehl û cibal
Cezbe dihat jin û rical
Daim dibin roj û kiyal

Wa firqetê wa firqete

Hunerên Edebî: Ew (**tekrîr**), da Hadî jî yek cezb û hal (**tedrîc**), wa firqetê wa firqetê (**tekrîr**).

55

DI ÎRO EZ DI NÊV CEYŞÊ HUMÛMAN DA

Di îro ez di nêv ceyšê **humûman** da **'elemdar im**

Di teswîd û di tebyîza **xumûman** da **qelemdar im**

1. Di "re' sul-mal"ê **sebr û taqetê** da ez selemdar im

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Humûman – xumûman / 'elemdar im – qelemdar im (**tewşîh**), sebr û taqet (**sînonîm**), dengê –myê (**alîterasyon**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Di vî 'esrî nedî min qet bi **meselî Qutbê Geylanî**

Bi himmet hem bi nisbet xeyr ji Ebdulqadirê Sanî

2. Dibêm hîna ku xaib bû li min ew qutbê rebbanî

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Meselî Qutbê Geylanî (**teşbîh**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**), dengê –eyê (**asonans**).

Weliyê pur mezin daim dibin setr û qubabêne

Ji bê ixlasî 'esra wan dibin lew û i'tabene

3. Çiku wan cehd nekir nas kin ku çendan bin niqabêne

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Weliyê pur mezin daim dibin setr û qubabêne (**teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Heçî ku di suhbet û hem ji teweccuh wêde rûniştî

Bizan şeytan ji xwe dûr kir û nefsa xwe ji hem kuştî

4. Ti hesret dê bibêjim ta serê min bête ser xîştî

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Bizan şeytan ji xwe dûr kir û nefsa xwe ji hem kuştî (**mecaz**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Çi xweş nûr û cemala "la yezal"i bû di vî dehrî

Hezaran wax nekir nas min bi tamamî wî di vi 'esrî

5. Li min heqq e terennum kim **bi vê beytê heta qebrî**

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derde firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Bi vê beytê heta qebrî (**tedrîc**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Hezaran derd û xem daim di nêv canê mine punhan

Şeb û rojan ji min tê nalîn û kalîn û hem efxan

6. Li min wunda bû Şahê min dibêjim ez bi sed nalan

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sani birindar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Şeb û roj (**muqabele**), nalîn kalîn û efxan (**tenasub**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Esasek wî ji nû danî ji bo qesra dil û dîn e

Bi sohbet hem bi nisbet kir wî hey ev **qelbê miskîn e**

7. Çu dildarê xwe dil wunda kirî gotî bi nalîn e

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Esasek wî ji nû danî ji bo qesra dil û dîn e (**mecaz**), qelbê miskîn (**teşxîs**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Meqamê suhbeta Şahê Hezan Şemizdîn dibînim ez

Wekî textê di Hezan û wekî Nûrşîn dibînim ez

8. Min got xaib **wekî babê 'Elauddin dibînim ez**

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Wekî textê di Hezan û wekî Nûrşîn dibînim ez (**teşbîh**), wekî babê 'Elauddin dibînim ez (**teşbîh**), dengê –nyê (**alîterasyon**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Ji wê xweş suhbeta cazibeya Şahê Hezan her dil

Museffa ye ji emrazan û xalî ji wesfa ab û gil

9. **Wekî wunda li dil bû şeh wî got û hem şikest wî mil**

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Wekî wunda li dil bû şeh (**teşbîh**) wî got û hem şikest wî mil (**mecaz**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Heçî hîna ku rûništa muraqîb çav bida ser hev

Digirtî çavê dil ji دنیا û ji 'uqbayê bizan bêxef

10. **Wî canê xwe dikir weqfe di irşada 'ibadan tev**

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sani birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Digirtî çavê dil (**teşxîs**), wî canê xwe dikir weqfe di irşada 'ibadan tev (**mecaz**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Çi xweş nûr bû di islame çî xweş "heblul-metîn" bû ew

Çi xweş qutbê medar bû ew çî xweş misbaha din bû ew

11. Wefata şeh heçî seh kir wî hem ji dîn bû ew

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birindar im

Ji derde firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Çi xweş û bû ew (**tekrîr**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

Ji dur û cewheran pur bû **şebihê behrê 'umman bû**

D şer û'lme batin da **wekî Luqman û Selman bû**

12. Dbêjim ba sened daim dil wî 'erşê rehman bû

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahe Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Şebihê behrê 'umman bû (**teşbîh**), wekî Luqman û Selman bû (**teşbîh û telmîh**), dengê –ayê (**asonans**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**).

'Eceb xellaqê 'alem suhbetek şêrîn bi wî dabû

Heçî ku ditibûn gotin yeqîn ew Xews û Seyda bû

13. Selîm ser **çû** bi meqlûbî di çav xwe **çû** li Xeyda bû

Ji derd û hesreta Geylaniye Sanî birindar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Çû (tekrîr), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (tewşîh).

Çi xweş bedrek mucella bû 'erûsek pur muhella bû

Ji 'îşqê dil mûxella bû bi wi islam mu'ella bû

14. Bi ewsafê hemîd e zatê wî daim mutella bû

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birîndar im

Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Dengê –lyê (alîterasyon), dengê –eyê (asonans), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (tewşîh).

Hezar û sê sed û bist û şeşan da xem li min danî

Wefat û rihleta Şahe Hezan Geylaniyê Sanî

15. Cemad ewwel di bîst û hest di merqed girtî mihmanî

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birindar im

Ji derde firqeta Şahê Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Hezar û sê sed û bist û şeşan da xem li min danî, wefat û rihleta Şahe Hezan Geylaniyê Sanî, cemad ewwel di bîst û hest di merqed girtî mihmanî (tarîx), dengê –eyê (asonans), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (tewşîh).

Wekî Geylaniyê Sanî tu nabînî di vî anî

Were Hadî ji bo qutbê zeman be mersiyexwan î

16. Bibêj wa firqeta Şahê Hezan Geylaniyê Sanî

Ji derd û hesreta Geylaniyê Sanî birindar im

Ji derde firqeta Şahe Hezan daim elemdar im

Hunerên Edebî: Wekî Geylaniyê Sanî tu nabînî (**teşbîh**), were Hadî ji bo qutbê zeman be mersiyexwan î (**tedrîc**), ji derd û hesreta- ji derdê firqeta / birîndar im – elemdar im (**tewşîh**)

56

KASEK ŞERABA ZILLETÊ

Kasek şeraba zilletê

1. **Camek ji qehwa mihnetê**

Da min bi kîn û kurbetê

Hesret û derdê firqetê

Kasek şeraba zilletê (**mecaza mursel**), camek ji qehwa mihnetê (**mecaza mursel**), dengê –eyê (**asonans**).

Can û ciger kirye birîn

2. **Qelb û dilan kirye hezîn**

Sebr û qerar kirye tunîn

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Qelb û dil (**sînonîm**), sebr û qerar (**sînonîm**).

Dunya di çav min kir 'edem

3. **Da min xem û derd û elem**

Bê hiş kirim hem jî esem

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Xem û derd û elem (**tenasub**), bê hiş kirim hem jî esem (**kinaye**), dengê –eyê (**asonans**).

Bê 'eql û bêcan **ez kirim**

4. **Bê şah û bêxan ez kirim**

Dilsoz û buryan **ez kirim**

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Ez kîrim (**tekrîr**), dengê –êyê (**asonans**).

Fîrqet ji canan zehmet e

5. **Mewt û mirin** yek sa'ete
Her gav dide dil kurbet e
Hesret û derde fîrquetê

Hunerên Edebî: Mewt û mirin (**sînonîm**), dengê –eyê (**asonans**).

Bênûr kirî beyta dil e

6. Hem ji şikandî bask û mil e
Le kir hezar cerh û kul e
Hesret û derdê fîrquetê

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Bêmal û bêhal **ez kîrim**

7. **Bêqal û hem lal ez kîrim**

Hem pîr û hem kal ez kîrim

Hesret û derdê fîrquetê

Hunerên Edebî: Ez kîrim (**tekrîr**), bêqal û lal (**sînonîm**), hem (**tekrîr**), pîr û kal (**sînonîm**), dengê –myê (**alîterasyon**), dengê –eyê (**asonans**).

‘Alem bi terzek dî gerand

8. Şahan ji text û bext rand
Her sa'etek xelq pur mirand
Hesret û derdê fîrquetê

Hunerên Edebî: Dengê –eyê (**asonans**).

Naçar û bê zar **ez kîrim**

9. Bê beyt û bê dar **ez kîrim**
Bê newm û bîdar **ez kîrim**
Hesret û derdê fîrquetê

Hunerên Edebî: Ez kırım (**tekrîr**), dengê –eyê (**asonans**).

Hêstir ji çavan kirye xwar

10. Memzûc kirî bi xunê 'ezar

Da 'aşiqan ev reng şî'ar

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Da 'aşiqan ev reng şî'ar (**teşbîh**), dengê –ryê (**alîterasyon**).

Dil sar kirî ji mal û minal

11. Hem jî ji rutbe û cah û hal

Pur kir di dil meyla wisal

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Dengê –iyê (**asonans**).

Reş kir li min rojek şeve

12. Dost û biran kir ji min reve

Xelq anî seyra min teve

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Reş kir li min rojek şeve (**kinaye**), dengê –iyê (**asonans**).

Ebkem **kirim** ebter **kirim**

13. **Jar û nehîf û zer kirim**

Mecnûn û dîn ji der kirim

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Kirim (**tekrîr**), jar û nehîf û zer (**tenasub**), mecnûn û dîn (**sînonîm**), dengê –iyê (**asonans**).

Derdek li min kir sed hezar

14. Efxan ji min anî diyar

Da min du 'eynê eşkbar

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Derdek li min kir sed hezar (**mubalexe**).

Rêya Hezan li min bûye nûn

15. Şahê li wê wunda dibûn

Da min ji sazan erxenûn

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Rêya Hezan li min bûye nûn (**teşbîh**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

Dewran li min pur reş kirî

16. Mexlûq hemî bê heş kirî

Teşbîhî bê rûh leş kirî

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Dewran li min pur reş kirî (**mecaz**), mexlûq hemî bê heş kirî (**mecaz**), teşbîhî bê rûh leş kirî (**mecaz û teşbîh**), dengê –eyê (**asonans**).

HADÎ bi efxan haniye

17. Wê li guş 'ûzlet daniye

Dunya dibêjit faniye

Hesret û derdê firqetê

Hunerên Edebî: Dengê –ayê (**asonans**), dengê –nyê (**alîterasyon**).

ENCAM

Di vê xebatê de em li ser mijara “Hunerên Edebî di Dîwana Hadî (Seydayê Licî) de” rawestiyan. Teza me ji 3 beşan pêk hat. Di beşa yekem de li ser jiyana kesayet û berhemên Hadî hat sekinandin. Di beşa duyem de li ser 44 hunerên edebî yê ku di dîwanê de hatine dîtin yek bi yek hat rawestîn. Hunerên edebî bi awayekî berfireh hatin pênasekirin û ji Dîwana Hadî jî ji bo her hunerekê mînakê hat dayin û mînak hat îzehkirin. Di beşa sêyem de jî dîwan ji destpêkê heta bi dawiyê hat nivîsîn û her 44 hunerên edebî hatin destnîşankirin.

Di encama xebata xwe de me dît ku Mihemed Hadî 44 hunerên edebî di dîwana xwe de bi kar aniye. Bi riya bikaranîna van huneran helbestên wî bêtir bi ta'm û rengîn bûne. Mihemed Hadî ji 44 hunerên edebî hinekan bêtir bi kar aniye. Ev yek ji aliyê edebî ve ne kêmasiyek e helbet. Li gorî hizr û fikra nivîskar, bikaranîna huneran jî tercîhek e û terza nivîskar nîşan dide.

Di dîwanê de me bikaranîna 44 hunerên edebî tespît kir. Bi awayekî jimareyî ev huner dikarin weha werin nîşandan:

Asonans: 557, teşbîh: 375, mecaz: 211, sînonîm: 158, tekrîr: 152, tenasub: 143, alîterasyon: 126, kinaye: 106, teşxîs: 91, mecaza mursel: 73, nîda: 66, telmîh: 61, teza: 59, î'ade: 46, îsti'are: 46, mubalexe: 44, tarîz: 40, nezîre: 40, tesmît: 39, tedrîc: 39, rucû': 36, muwazene: 32, tecahula 'arif: 26, istihfam: 26, irsala mesel: 23, cînas: 23, tecrîd: 22, tewşîh: 22, teşabîhu'l etraf: 19, leff û neşr: 18, husna te'lîl: 15, tezmîn: 13, muqabele: 12, întaq: 12, terdîd: 11, tarîx: 6, îqtibas: 6, sihra helal: 5, 'eks: 5, tersî': 4, mu'emma: 3, îstidrak: 2, qelb: 1, mulemme': 1.

Wekî tê dîtin Mihemed Hadî di helbestên xwe de hunerên edebî zêde bi kar aniye. Ji nav van huneran jî herî zêde hunera asonansê (557) hatiye bikaranîn. Li pey asonansê wekî tê dîtin teşbîh, mecaz û sînonîm jî gelekî hatine bikaranîn. Çend hunerên edebî jî bi tenê carekê hatine bikaranîn (mulemme' û qelb). Ji bilî hejmara bikaranîna van huneran tê dîtin ku teşbîh û îsti'are bi piranî bi şibandînen qalibî (wek, wekî, şubhî, mislî) hatine çêkirin.

Tenasub, tezdad, mecaz û teşbîhul etraf jî bi awayekî serkeftî hatine çêkirin, jî bo çêkirina van huneran ji wateya bêjeyan ya yekem ya duyem hatiye îstîfadekirin. Ji bo çêkirina ev huneran jî divê ji aliyê hafîzaya bêjeyan ve nivîskar xurt be. Ji ber ku nivîskarê me ev huner di gelek helbestan de bi kar aniye em dikarin bibêjin ku xwediyê hafîzeyek baş e.

Sînonîm di edebiyata klasîk de zêde hatiye bikaranîn lê belê cudahiyeke nivîskarê me ji nivîskarên wê serdemê heye. Ew cudahî jî ew e ku nivîskarê me Hadî, di çêkirina vê hunerê de bi piranî her du bêje jî ji kurdî tercîh kiriye. Ev yek jî girîngiya ku dide zimên nîşan dike.

Bi riya hunera istihfâm û tecahula ‘arif tiştên ku xwestiyê bêtir bide ber çavan derxistiyê meydanê. Bi riya pîrskirinan tiştên ku dizanîbû dîsa aniye zimên, da ku zîqbûnekê (focus) li ser merama xwe ava bike. Ev huner aliyê nivîskar yê ‘eqlî derdixê meydanê lewra lîstika bi bêjeyan karekî dijwar e û her kes vê yekê nikare bike. Em di gelek mînakên Hadî de rastî ev her du huneran tên.

Bi çêkirina hunera husna te’lîlê xeyalên xwe aniye ziman. Mînak derketina tavê bi daxwaza dîtina yarê re girêdaye, mînakên bi vî rengî xeyalên wî û ‘alema xeyalên wî nîşan didin. Ew ‘alem jî deriyê fikir û ramanên Hadî dide ber çavan. Her weha hunerên wekî, mecaza mursel, mubalexe, kinayeyê jî bi awayekî serkeftî bi kar aniye. Ev huner jî wekî hunera husna te’lîlê cîhana wî ya xeyalî deşîfre dike.

Ji bilî van huneran, hunerên bêtir bi şikil ve girêdayîne jî zêde hatine bikaranîn. Wek muwazene, tewşîh, tasmît, tersî’, î’ade û ‘eksê. Hunera mulemme’ê jî bi nimûneyekê tê dîtîn. Di mulemme’ê Mihemed Hadî de em rastî qabîliyet, zanabûn û çêjeke edebî tên. Lewra Mihemed Hadî di vê mulemme’ê de 4 ziman (tirkî, kurmancî, erebî, farisî) bi kar aniye. Bi tena serê xwe ev huner zanabûnekê dixwaze.

Di gelek mînakên de jî em rastî hunerên wekî telmîh, nîda, tekrîr û tarîzê hatin. Bi riya hunera nîda û tarîzê hawar û gazind û rexneyên ku xwestiyê vebêje aniye zimên. Bi riya telmîhê jî qisse û bûyerên girîng bikar aniye û ligel vê yekê derdê xwe bi riya tenê navekî gihandiye xwîneran. Ev bikaranîn jî aliyê wî yê ‘ilm û zanatîyê derdixê holê.

Hunerên wekî îştîqaq, sînonîm û irsala mesel xezneya wî ya bêjeyan bi awayekî eşkere derdixe meydanê. Lewra kesek ku hay ji koka bêjeyan, ji biwêj û gotinên pêşiyane tunebe, nikare van huneran bi awayekî serkeftî bi kar bîne. Ev yek jî aliyê wî yê folklorîk û ‘ilmî derdixe pêşberî xwîneran.

Bikaranîna hunera tezmînê aliyekî nivîskar ê veşartî derdixe meydanê. Bi riya tespîtkirina vê hunerê em digihêjin nivîskarên ku ji aliyê Hadî ve hatine şopandin. Mînak, di helbesta xwe ya bi şiklê mulemme’ê hatiye nivîsîn de rengê Xanî tê de tê dîtin. Lewra wekî tê zanîn di edebiyata kurdî de yekem kesê ku mulemme’ nivîsiye Ehmedê Xanî ye. Her weha şopa Mela û Feqî jî bi saya hunera tezmînê tê dîtin û tê tespîtkirin. Di gelek helbestan de em hevokên ku ji bo Mela û Feqî bûne wekî mohr dibînin. Wekî mînak “şox û şeng”, “dil ji min bir, dil ji min”, “muflîs im ‘alem xerab”. Ev mînanan ji me re pir nas tên. Ji van jî eşkere dibê ku Hadî şopgerekî nivîskarê klasîk e û ji gelek aliyan ve jî wan ji xwe re wekî îdol wergirtiye.

Bikaranîna van huneran aliyê Hadî yê hunerî û kesayeta wî ya edebî derxistiye pêş. Em dikarin bibêjin ku nivîskarê me di her hevokê de hunerek û carna jî ji yekê zêdetir huner bi kar aniye. Lê belê zimanê wî her çiqas tije bi huner bin jî dîsa bi hevokên sade helbestên xwe nivîsandiye. Digel vê yekê hin helbestên wî jî pir giran hatine nivîsîn. Sedema vê yekê jî ew e ku di hin helbestan de bêjeyên erebî û farisî pir bi kar aniye.

Mihemed Hadî di malbateke mezin hatiye dinyayê û perwerdehiyek saxlem sitendiye. Em di nav helbestên wî de aliyê wî yê perwerdehiya medreseyê, xwendina metnên klasîk yê nivîskarên beriya wî, rengê serdema ku tê de dijiya, hizra tesewif û terîqetê, aliyê wî yê dînî û bûyerên girîng yê serdema wî dibînin. Di gelek helbestên xwe de gel bi zimanekî tund rexne dike. Rexneyên wî jî, aliyê wî yê civakî derdixe pêş. Di helbestên wî yê di vê terzê de kesên ku piştî xwe dane gelên xwe û çavên xwe girtine bi zimanekî tund rexne dike. Di gelek cihan de ew zimanê tund digihêje asta dijûnan jî.

Ji gelek helbestên wî em fêhm dikin ku Mihemed Hadî endameke terîqeta Neqşibendîtiyê ye. Hadî di gelek helbestên xwe de bi awayekî eşkere behsa terîqeta

Neqşîbendiyê dike. Di gelek helbestan de jî pesn û methê şêxê terîqetê dike, behsa murîdên terîqetê û hin qaîde û zikrên xwendekarên terîqetê dike.

Di ser nivîsandina *Dîwana* Hadî de her çiqas çendîn sal derbas bûbin jî, *Dîwan* ji ta'm û çêja xwe tiştek wenda nekiriye. Ji bil qîmeta vê berhema hêja ji bo xebatên nû jî amade ye. Ji gelek aliyên dîtir xebat li ser wê dikarin bîn kirin.

Ev xebata me di vê qadê de xebata yekem e. Em hêvî dikin ku ev xebat rê li gelek xebatên mezin û hêja veke. Lewra kesayetek mîna Mihemed Hadî divê neyê îhmalkirin û gelek aliyên wî yê dîtir derkevin meydanê.



ÇAVKANÎ

- Abdulrezaq, J. N. (2017). *Binyatê Honerî di Destana Zembîlfiroş ya IFeqiyê Teyran û Miradxanê Bazidî" da*. Mardin : Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Acar, H. (2016). *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*. Stenbol: Nûbihar.
- Adak, A. (2014). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. Stenbol: Nûbihar.
- Adak, A. (2017). Serdema Xalidîtiyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk. *Kürt Tarihi*, 61-67.
- Adak, A. (2018). *Belaxet (Rewanbêjî)*. Mardin.
- Akın, E. (2017). *Melaye Ciziri'nin Gazellerinde Kullanılan Edebi Sanatlar*. Muş: Zanîngeha Muş Alparslanê.
- Arabî, İ. (2015). *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*. İstanbul: Litera Yayıncılık.
- Aslan, Ş. (2005). *Ferhenga Biwêjan*. Amed: Söz Gazetecilik Yayın Tic. A.Ş.
- Bedlîsî, Ş. (2012). *Şerefname*. Stenbol: Avesta.
- Beg, M. E. (2002). *Dîroka Kurd û Kurdistanê*. Stenbol: Avesta .
- Bolelli, Y. D. (2000). *Belagat Kur'an Edebiyatı, beyan-meanî-bedî'*. İstanbul: Rağbet Yayınları.
- Bozarlan, M. (1994). *Mem û Zîn*. Stenbol: Deng.
- Cîhanî, P. (2013). *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*. İstanbul: Nûbihar.
- Cizîrî, M. (2012). *Dîwan*. Ankara: T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı.
- Dêreşî, S. (2011). *Dîwana Feqiyê Teyran*. Ankara: Lîs.
- Devellioğlu, F. (2008). *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Sözlük*. Ankara: Aydın Kitabevi Yayınları.
- Dilçin, C. (2009). *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Doskî, T. İ. (2012). *Dîwana Hadî Mela Mihemedê Liceyî*. İstanbul: Nûbihar.
- Durmuş, İ. (2003). *Meani*. Ankara: TDV Yayınları.
- Ergin, C. (2008). Geçmişten Günümüze Liceli Alimler. *Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri* (s. 328- 329). Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Farqînî, Z. (2004). *Ferhenga Kurdî-Türkî*. İstanbul: Zend Bilim Kültür Eğitim Basın Yayın .

- Geverî, A. (2017). Nakşibendîlik'in Kuruluşu ve Tarihsel Gelişimi Üzerine. *Kürt Tarihi*, 39- 43.
- Hacımuftuoğlu, N. (1992). *Beyan*. İstanbul: TDV Yayınları.
- Kaşani, A. (2015). *Tasavvuf Sözlüğü*. İstanbul: İz Yayıncılık.
- Kılıç, H. (1992). *İslam Ansiklopedisi*. TDK.
- Kılıç, H. (1992). *İslam Ansiklopedisi*. Ankara: TDV Yayınları.
- Korkusuz, M. Ş. (1997). *Tezkire-i Meşayih-i Amid*. İstanbul: Yeni Güven.
- Kubat, M. (2017). *Mevlana Halid-i Bağdadi Sufi Kelamı*. İstanbul: Hikmetevi Yayınları.
- Külekçi, N. (1999). *Açıklamalar ve Örmeklerle Edebi Sanatlar*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Orak, K. Y. (2013). *Belagat Geleneğimiz ve Belagat-i Lisan-ı Osmanî*. İstanbul: Kitabevi .
- Özden, E. (2000). *Karacaoğlan Şiirlerinde Edebi Sanatlar*. Edirne: Yüksek Lisans Tezi.
- Resûl, L. A. (2017). *Ciwankariya Peyvan di Helbestên Kurdî yên Salim de*. Van: Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê.
- Reşad, A. N.-F. (2009). *Mükemmel Osmanlı Lügatı*. İstanbul: Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Salih, ' . (2018). *Ciwankarî le Şi'rî hawçerxî Kurdî da: Bo Nimûney Şi'rekanî Goran 'Ebbas*. Bîngol: Zanîngeha Bingölê.
- Saraç, M. A. (tarih yok). *Muamma ve Divan Edebiyatındaki Seyri*. Makale.
- Saraç, P. D. (2007). *Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat*. İstanbul: 3F Yayınevi.
- Saydun, E. (2018). *Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî di Dîwana Feqiyê Teyran de*. Van: Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê.
- Tahir, M. M. (2013). *Osmanlı Edebiyatı -Belagat-*. Ankara: Kurgan Edebiyat Yayınları.
- Tenik, A. (2015). *Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*. İstanbul: Nûbihar.
- Tok, V. A. (2011). *Edebi Sanatlar Ansiklopedisi*. Konya: Literatürk.
- Uysal, R. S. (2010). *Belagat ve Edebi Sanatlar Lügatı*. İstanbul: Doğu Kitabevi.
- Xemgîn, E. (2004). *Kürdistan Tarihi*. İstanbul: Doz Yayıncılık.

Zivingî, M. E. (2013). *Gerdeniya Gewherî/ Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*. Stenbol: Avesta.





T.C

**MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYEDE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

Yüksek Lisans Tezi

HADİ (SEYDAYÊ LICÎ) DİVANINDA EDEBİ SANATLAR

Aynur ILI

16711024

Danışman

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin- 2019

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

TezBaşlığı

HUNERÊN EDEBÎ DI DÎWANA HADÎ (SEYDAYÊ LICÎ) DE

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 301 sayfalık kısmına ilişkin 01 / 08 / 2019 tarihinde tez danışmanım tarafından Turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 3'tür.

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dâhil

5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar.....
.....

Mardin Artuklu Üniversitesi Turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Aynur İLİ

Öğrenci No: 16711024

Programı: Kürt Dili ve Kültürü

Statüsü: Yüksek Lisans

Tarih ve İmza



Danışman Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak



A.B.D. Başkanı Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak

